



K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**DENGBÊJÊN JIN YÊN RADYOYA  
ERÎVANÊ**

Habibe POLATTAĞ

19711016

Şêwirmend

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn - 2022

K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**DENGBÊJÊN JIN YÊN RADYOYA  
ERÎVANÊ**


Habibe POLATTAĞ

19711016

Şewirmend

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn - 2022

	T.C. MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ	Doküman No	M2.FRM.048
		Yayın Tarihi	01/01/2022
	TEZ ONAY SAYFASI FORMU	Revizyon No	00
		Revizyon Tarihi	
		Sayfa No	1 / 1

ÖĞRENCİ BİLGİLERİ			
Adı ve Soyadı	Habibe Polattağ	Öğrenci No'su	19711016

LİSANSÜSTÜ PROGRAM BİLGİLERİ		
KAYITLI OLDUĞU	Enstitünün Adı	Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü
	Anabilim Dalı	Kürt Dili ve Kültürü
	Program Adı	Tezli Yüksek Lisans

#### TEZ SAVUNMA JÜRİSİ KARARI

Yukarıda bilgileri verilen öğrencinin hazırladığı “DENGBEJÊN JIN YÊN RADYOYA ERİVANÊ” başlıklı Yüksek lisans tezi ile ilgili 30.06.2022 Perşembe günü saat 13:00’da yapılan Tez Savunma Sınavı sonucunda, Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliği uyarınca tezin kabulüne oybirliğiyle karar verilmiştir.

		Tarih	30.06.2022
Üyeler	Unvanı, Adı Soyadı	İmza	
Danışman	Doç. Dr. Hayrullah Acar		
Üye	Doç. Dr. Mustafa Aslan		
Üye	Dr. Öğr. Üyesi İlyas Suvağci		
Üye			
Üye			

#### ONAY

Enstitü Yönetim Kurulumuzca görevlendirilen ve yukarıda bilgileri verilen jüri üyeleri tarafından uygun görülmüş bu tez, Enstitü Yönetim Kurulumuzun ..... tarihli ve ..... sayılı kararıyla kabul edilmiş ve onaylanmıştır.

Unvanı Adı Soyadı	Görevi	İmzası
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK	Enstitü Müdürü	

Hazırlayan (27/09/2021) Kalite Koordinatörü	Onaylayan (28/09/2021) Rektör Yardımcısı
--	---

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum **Dengbêjên Jin ên Radyoya Erîvanê** adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin 5 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

30.06.2022

Habibe POLATTAĞ

## PÊŞGOTÎN

Edebiyata dengbêjîyê têgeheke gelek berfireh e. Li gel vê yekê tesnîfên ku heta niha hatine kirin gelek kêr in. Her wiha xebatên li ser dengbêjan jî kêr in. Van salên dawî li Bakûr xebatên akademîk li ser mijarê tîr kirin lê ev xebat li hember berfirehiya sehayê kêr dimînin.

Xebatên ku li ser dengbêjîyê ne bi piranî behsa dengbêjên mêr kirine. Dema ku behsa jinan û dengbêjîyê tê kirin bi piranî jin weke temayek hatine nirxandin. Di hin xebatan da jî ji ber sedemên polîtîk rola jinê hatiye romantîzekirin. Erotîzma jinê, bedewiya wê bi berfirehî bûne mijara xebatên dengbêjîyê lê xebatên ku li ser dengbêjên jin lêkolînê kirine gelek kêr in. Ji ber vê yekê me di vê xebatê da hewl da ku em jinê weke afirînerê edebiyata dengbêjîyê têkin mijar û astengîyên ku di îcrakirina dengbêjîyê da derketine pêşberî wan şênber bikin. Me di encama vê xebatê da dît ku jinên ku dengbêjîyê kirine rastî gelek tundiyan hatine. Ev tundî hem ji hêla hêzên serdest ve hem jî ji hêla civatê ve hatiye meşandin.

Gelek dengbêjên jin hene ku li hember keda xwe ya di vî warî da neketine lîteratura dengbêjîyê jî. Yanî keda jinan a li ser dengbêjîyê zêde nehatiye vekolîn. Me xwest ku bi vê xebatê balê bikişînin ser vê valahîyê û ji bo xebatên berfirehtir rêyek vekin.

Di amadekirina vê xebatê min alîkarî ji gelek kesên hêja girt. Di serî da ji bo rênişandan û alîkarîya şêwirmendê xwe birêz Doç. Dr. Hayrullah Acar spasîyên xwe pêşkêş dikim. Ji bo alîkarîya wan spasîya Dr. Mustafa Aslan, Dr. Îlyas Suvağci, Zeyneb Yaş, Têmûrê Xelîl, Mahmut Beğik, Aslîka Qadîr û Prîskê Mihoyî dikim. Di vir da divê spasîyek taybet ji du hevalnên xwe yê hêja Kadriye Toprak û Stranê re jî bikim. Wan di pêvajoya nivîsîna tezê da motîvasyonek mezin dan min. Kadriye di peydekirina çavkanîyan bû alîkar. Stran jî şaşîtyên rêziman û îmlayê kontrol kir.

Me xebata xwe di du beşan da amade kir. Di destpêkê da bi giştî dengbêjî hate nasandin û rola jinan ya di civaka kurdî da hat nirxandin. Di beşa yekem da jîyana kurdên Kafkasyayê û dîroka wan bi berfirehî hat nasandin. Dûre jî bi giştî behsa dîrokçeya radyoyên bi kurdî hat kirin û xebatên Radyoya Erîvanê û bandora wê ya li ser gelê kurd hat destnîşankirin. Di beşa dawî da jî dengbêjên jin ên ku li Radyoya Erîvanê strane hatin nasandin.

## KURTE

Edebiyata dengbêjîyê di çanda devkî ya kurdî da hêmayeke giring e. Dengbêjî ji xeynî ji fonksiyonên xwe yên esasî ji bo kurdan bûye çavkanîya dîrokê jî. Îcrakarên dengbêjîyê di nav gel da bûne xwedîyê statuyek baş. Ji serdemên kevn heta niha jinan jî mêran jî vê hunerê îcra kirine lê ji ber sebebên civakî jinan di dîwanan da zêde cih negirtine. Me xweste bi vê tezê serpehatîya dengbêjîyê jin binasin. Pirsên me yên sereke ev bûn: Gelo jinan di edebiyata dengbêjîyê da roleka çawa lîstine, gelo jinan di avakirin û îcrakirina hunera dengbêjîyê da rastî pirsgirêkên çawa hatine, gelo hêmanên ku di vî warî da karê wan hêsan an jî zehmet kirine çi ne?

Bi guherînên polîtîkayên Sovyetê yên di warê perwerdeyê da geşedanên mezin di nav kurdên Kafkasyayê derketin holê. Xwendîna bi kurdî hişmendiyek neteweperwer bi wan ra peyda kir. Kurdan bi vê hişmendîyê di warê edebiyat, akademî û muzîkê da karên gelek giring kirin. Di nav van xebatan da ya herî ku deng da bêguman Radyoya Erîvanê ye. Dengbêjîya kurdên Kafkasyayê bi saya Radyoya Erîvanê bû xwedîyê arşîveke baş. Ev arşîv ji bo muzîka kurdî bû çavkaniyeke sereke. Radyo bûbû cîyê îcrakirina dengbêjîyê û jinan darfeta ku di dîwanan da nedîtibûn di radyoyê da dîtibûn. Ev yek ji bo kurdan tiştêkî nû bû. Kesên wekî Fatma Îsa, Belga Qado, Aslıka Qadir û gelekên din ligel zextên civakî û malbatî karê dengbêjîyê meşandin û di dîroka dengbêjîya kurdî da cihê xwe girtin.

Bi guherînên civakî û teknolojik çanda dengbêjîyê û muzîka kurdî jî kete qonaxeke nû. Bi têkçûna pergala patronajê êdî dengbêjî ji dîwanan derket û kete ser plakan û radyoyan. Di vir da xala giring ew e ku êdî jinan jî derfet dîtî ku weke îcrakar zêdetir di dengbêjîyê da derkevin pêş. Ev yek di serî da ji alîyê civakê va nedihate qebûlkirin û jinên ku dengbêjîyê dikirin rastî gelek zextan dihatin. Di vê mijarê da Radyoya Erîvanê û kurdên Kafkasyayê mînakên baş in.

**Peyvên Sereke:** Radyoya Erîvanê, dengbêjî, Aslıka Qadir, Fatma Îsa, Belga Qado, Sûsika Simo, Zadîna Şekir.

## ÖZET

Dengbêjlik geleneği kürtlerin sahip olduğu sözlü kültürün en önemli unsurlarından biridir. Dengbêjlik, ana fonksiyonlarının yanısıra kürtler için tarihi belge olma özelliğine de sahip olmuştur. Dengbêjlik sanatını icra edenler halk arasında önemli bir statüye sahip olmuşlardır. Dengbêjlik eski dönemlerden beri hem kadınlar hem de erkekler tarafından icra edilmiş fakat sosyal sebeplerden dolayı kadınlar divanlarda pek yer alamamışlardır. Bu tezle kadınların dengbêjlik serüveninin tanımaya çalıştık. Tezin ana soruları şunlardı: Kadınlar dengbêjlik geleneğinde nasıl bir rol oynadı, Kadınlar dengbêjlik sanatını üretirken ve icra ederken nasıl sorunlarla karşılaştılar, bu alanda onların işini kolaylaştıran ve zorlaştıran unsurlar nelerdir?

Kafkas Kürtleri Sovyetler birliğinin değişen eğitim politikaları sayesinde önemli gelişmeler yaşadı. Kürtçe eğitim onlara milli bir bilinç kazandırdı. Kürtler bu milli bilinçle edebiyat, akademi ve müzik gibi alanlarda önemli çalışmalara imza attı. Bu çalışmalar içinde en çok ses getiren ve tanınan kuşkusuz Erivan Radyosudur. Kafkas Kürtlerinin dengbêjlik mirası Erivan Radyosu sayesinde önemli bir arşive sahip oldu. Bu arşiv aynı zamanda kürt müziğinin de başlıca kaynaklarından birisi oldu. Radyo, dengbêjliğin yeni icra merkezi olmuştu. Kadınlar da icracı olarak divanlarda bulamadıkları fırsatı radyoda buluyordu. Bu kürtler için yeni bir durumdu. Fatma İsa, Belga Qado, Aslıka Qadir ve daha birçok dengbêj toplumsal ve ailevi baskılara rağmen radyoda dengbêjliği icra ettiler ve dengbejlik geleneğinde kendilerine yer buldular.

Teknolojik ve sosyal değişimlerden sonra dengbêjlik geleneği ve Kürt müziği de yeni bir döneme girmiş oldu. Yeni dönemde radyo ve plaklar patronaj sisteminin yerini aldı. Burada dikkat çeken en önemli noktalardan birisi de kadınların da artık dengbêjlik icrasında öne çıkmak için fırsat bulmasıdır. Bu durum önceleri toplum tarafından kabul edilmiyordu ve dengbêjlik icrasında sesini duyurmaya çalışan kadınlar bir çok baskıyla karşı karşıya kalıyordu. Bu konuda Erivan Radyosu ve Kafkas Kürtleri önemli bir örnek oluşturuyor.

**Anahtar Sözcükler:** Ervan Radyosu, dengbêjlik, Aslıka Qadir, Fatma İsa, Belga Qado, Sûsika Simo, Zadîna Şekir.

## ABSTRACT

Kurds have a rich oral tradition. Dengbêj literature is one of the most important elements of this culture. In addition to its main functions, the Dengbêj also had the feature of being a historical document for the Kurds. Those who practiced the art of dengbêj had an important status among the people. Dengbêj has been performed by both women and men since ancient times, but due to social reasons, women could not take part in council. With this thesis, we tried to recognize the dengbêj adventure of women. The main questions of the thesis were: What role did women play in the dengbêj tradition, What kind of problems did women face while producing and performing the art of dengbêj, what are the factors that make their work easier and more difficult in this field?

Caucasian Kurds have experienced significant changes thanks to the education policies of the Soviet Union. Education in Kurdish gave them a national consciousness. With this national consciousness, the Kurds carried out important works in fields such as literature, academia and music. Undoubtedly, Yerevan Radio is the most influential and well-known among these works. Thanks to Yerevan Radio, the dengbêj legacy of the Caucasian Kurds has an important archive. This archive also became the main source of Kurdish music. Radio became the new execution center of dengbêjism. Women, as performers, found the opportunity on the radio that they could not find on the sofas. This was something new for the Kurds. Fatma Îsa, Belga Qado, Aslıka Qadir and many more dengbêj performed dengbêj on the radio despite social and family pressures and found a place for themselves in the dengbêj tradition.

After the technological and social changes, the tradition of dengbêj and Kurdish music entered a new era. In this new era, radio and records replaced with the patronage system. One of the most striking points here is that women now have the opportunity to stand out in the performance of dengbêj. This situation was not accepted by the society before, and women who tried to make their voices heard in the performance of dengbêj were faced with a lot of pressure. Radio Yerevan and the Caucasian Kurds set an important example in this regard.

**Key Words:** Yerevan Radio, dengbêj, Aslıka Qadir, Fatma Îsa, Belga Qado, Sûsika Simo, Zadîna Şekir.

# NAVEROK

<b>PÊŞGOTÎN</b> .....	<b>v</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>vi</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>vii</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>viii</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>xi</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
<b>I. METODOLOJÎ</b> .....	<b>1</b>
A. Mijar, Giringî, Armanc .....	1
B. Çarçove, Rêbaz, Çavkanî, Pirsgirêk û Astengîyên Lêkolînê .....	2
<b>II. DENGÊJÎ DI ÇANDA KURDÎ DA</b> .....	<b>3</b>
A. Taybetîyên Dengbêjîyê .....	4
B. Jin di Folklorê Kurdî da .....	10
C. Jin: Afirînerên Dengbêjîyê yên Hem Nepen Hem jî li Ber Çavan.....	14
D. Çend Jin ên ku di Dengbêjîyê da Derketine Pêş .....	23
<b>BEŞA YEKEM</b> .....	<b>31</b>
<b>JÎYANA KURDÊN SOVYETÊ</b> .....	<b>31</b>
1.1. Dîroka Kurdên Kafkasyayê .....	31
1.2. Li Sovyetê Rewşa Kurdan ya Siyasî .....	34
1.3. Pêşketina Çanda Kurdan li Sovyetê .....	37
1.4. Xebatên Akademîk .....	42
1.5. Edebiyat/Wêje .....	47
1.6. Şano û Sînema .....	49
1.7. Çapemenî.....	52
<b>BEŞA DUYEM</b> .....	<b>55</b>
<b>RADYOYA ERÎVANÊ</b> .....	<b>55</b>
2.1. Destpêka Weşana Radyoyên bi Kurdî.....	55
2.2. Dîrokçeya Radyoya Erîvanê.....	59
2.3. Bandora Radyoya Erîvanê.....	62
2.4. Ji Alîyê Dengbêjîyê ve Radyoya Erîvanê.....	65
2.5. Dengbêjên Radyoya Erîvanê .....	68
2.6. Di Radyoya Erîvanê da Rola Jinan.....	70

2.6.1.	Sûsika Simo .....	74
2.6.2.	Fatma İsa.....	81
2.6.3.	Aslıka Qadir.....	89
2.6.4.	Belga Qado .....	105
2.6.5.	Zadîna Şekir.....	110
2.6.6.	Dîlbera Wekîl.....	113
2.6.7.	Xana Zazê .....	118
2.6.8.	Kubara Xido.....	119
2.6.9.	Cemîla Çawiş.....	120
<b>ENCAM.....</b>		<b>122</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>		<b>124</b>
<b>PÊVEK.....</b>		<b>136</b>

## KURTEBÊJE

- b.n.b.** : berhema navborî
- c.** : cild
- DEY** : Dewletên Emerîka yê Yekgirtî
- Ed.** : edîtor
- h.b.** : heman berhem
- hwd.** : her wekî din
- j.** : jimar
- r.** : rûpel
- veg.** : veguhezîner
- wer.** : wergêr
- weş** : weşan
- YKSS** : Yekîtîya Komarên Sovyetê yê Sosyalîst

# DESTPÊK

## I. METODOLOJÎ

### A. Mijar, Giringê, Armanc

Mijara vê xebatê dengbêjîya jinan e. Em ê bi vê tezê di mînaka Radyoya Erîvanê da dengbêjîya jinan binirxînin. Ligel dengbêjîya jinan jîyana kurdên kafkasyayê û Radyoya Erîvanê jî bi berfirehî dê bibe mijara teza me. Em ê hewl bidin ku bi vê tezê dengbêjîya jinan bidin nasandin û rola wan ya di dengbêjîyê da destnîşan bikin.

Jin di çanda kurdî ya devkî da gelek çalak in. Gelek cureyên çanda devkî hene ku ji alîyê jinan ve hatine afirandin û îcrakirin. Dengbêjî jî ji wan cureyan yek e. Gelek berhemên dengbêjîyê ên klasîk cara ewil ji alîyê jinekê va hatîne gotin û belav bûne. Jin di îcrakirina dengbêjîyê da jî gelek çalak bûne û di gelek qadên jîyanê da weke dengbêj cih girtine. Di vî warî da dengbêj û stranbêjên Radyoya Erîvanê yê jin mînakên giring in. Lihember vê rastîyê di derbarê wan da xebateka akademîk ku bi hûrgilî behsa wan bike tune ye. Ji ber vê yekê me hewl da ku vê valahîyê bi teza xwe dagirin.

Di vê xebatê da armanca me ew bû ku di mînaka Radyoya Erîvanê da li ser dengbêjên jin lêkolîneke bikin û serpêhatîya dengbêjîya wan binasin. Me xwest ku keda jinan ya li ser vê hunerê dastnîşan bikin û astengîyên ku di vê rêyê da darketine pêşberî wan li ber çavan raxînin. Di mijara dengbêjîya jinan da xebatên ku jinan weke afirîner û îcrakarên edebiyata dengbêjîyê kirine mijar kêr in lawra me hewl da ku bi xebata xwe balê bikişînin ser vê valahîyê jî û ji bo xebatên berfirehtir rêyek vekin.

## **B. Çarçove, Rêbaz, Çavkanî, Pirsgirêk û Astengîyên Lêkolînê**

Mijara vê xebatê her çiqas dengbêj û stranbêjên jin ên Radyoya Erîvanê bin jî ji bo zelalkirina mijarê em li ser rola jinê ya di civata kurdî da jî sekinîn. Ji bo ku baştir were dîtin ku jinan bi çî awayî û di şert û mercên çawa da vî karî meşandine me li ser jinên ku di vî warî da hatine nasîn jî agahiyên da. Her weha ji bo fêmkirina rewşa kurdên Kafkasyayê me di derbarê dîrokçeya kurdên Kafkasyayê da agahî dan û bi berfirehî behsa şert û mercên kurdên Sovyetê kir. Bi vê yekê me xwest ku atmosfera serdema Radyoya Erîvanê baş were dîtin. Ji ber nîqaşên derbarê dengbêjiya jinan da me hin nirxanidinan li ser dengbêjiyê kir. Me di teza xwe da kesên ku piştî hilweşîna pergala patronajê berhemên dengbêjiyê ên klasîk gotine weke dengbêj qebûl kir û teza xwe li gor vê nirxandinê amade kir.

Ji bo vê xebatê me du rêbazên lêkolînê bikar anîn. Yek jê analîza naverokê ye. Ya din jî hevpeyvîn e. Di çavkanîyên li ser mijarê da gelek şaşî û nakokî hebûn. Me ji bo sererastkirin û gihandina agahîyên rasttir çar hevpeyvîn kirin. Ji bilî hevpeyvînan me li ser gelek pirtûk, kovar, gotar, tez, belgefilm û bernameyên televizyonan lêkolîn kir û agahîyên di van çavkanîyan da nirxand. Di encama vê lêhûrbûnê da me dît ku gelek nakokî hem derbarê kurdên Kafkasyayê da hem jî derbarê dengbêjên jin da hene. Ji bo sererastkirina agahîyên şaş me du rêbaz bikar anîn: Yek jê me ji lêkolînerên ku di vê qadê da xebitîne pirsî. Rêbaza me ya din jî berawirdkirina çavkanîyên nivîskî û dîtbarî bûn. Plana xebata me weke destpêkê û du beş hate organîzekirin. Di nivîsîna teze da me rêgeza ji tevahîyê ber bi perçeyê ve bikar anî (Berjêrwerî/deduction/tümdengelim).

Me ji bo vê xebatê bi Zeyneb Yaş û Mahmut Beğik ra hevpeyvîna xwe rû bi rû kir. Ji ber ku Têmûrê Xelîl û Aslıka Qadir li Ewropayê dijîn me bi wan ra jî li ser sepana zoomê hevpeyvîn çêkir. Heta dawîya nivîsîna teze jî ez bi van çar kesan ra di têkilîyê da bûm û min bi telefonê ji bo zelalkirina agahîyên tevlihev fikrên wan pirsî. Xeynî ji van kesan me ji bo bidestxistina çavkanîyan bi kesên weke Mustafa Aslan, Prîskê Mihoyî, Celîlê Celîl, Îbrahîm Şahîn, Karîna Wezîr, Cewad Merwanî, Tosinê Reşîd û Nîhad Gultekîn bi rêya telefon û medyaya civakî hevdîtin kirin. Ev kes her yek ji bo bidestxistina agahîyên baştir rêyên nû li ber min vekirin.

Gelek jinên ku li Radyoya Erîvanê strane vî karî ji ber sebebêb civakî bi nepenî meşandibûn. Ji ber vê yekê tespîtkirina agahîyên di derbarê wan da gelek zehmet bû. Kêmbûna çavkanîyên derbarê wan da û nakokîyên di çavkanîyên heyî da jî zehmetîyek din bû. Me di Radyoya Erîvanê da sî û çar dengbêjên jin tespît kir lê tenê derbarê neh kesan da agahîyan bi dest xist û kire mijara teza xwe.

## II. DENG BÊJÎ DI ÇANDA KURDÎ DA

Derbarê dengbêjîya jinan da gelek nîqaş hene. Hin lêkolînerên ku em ê di beşên din da behs bikin karê ku jin dikin bi stranbêjîyê sînardar dikin hin kes jî li dij vê yekê derdikevin. Ku mebest dengbêjîya dîwanan an jî patronaj be Gula File û Pero di vir da dibin mînak.<sup>1</sup> Xeynî ji Gulê û Peroya Kor navê Hemîde jî di çavkanîyan da derbas dibe Hemîde di salên 1900an da li Hekkarîyê jîyaye.<sup>2</sup> Peroya Kor li herêma Bişêrîyê dengbêjîyê kiriye û di dîwanan straye. Ku ji dengbêjîyê meqsed dengbêjîya dîwanan be ev sê mînak tenê jî bes in ku mirov karibe behsa dengbêjîya jinan bike. Li alîyê din tê zanîn ku jinan di qadên biçûk û civînên navxweyî da dengbêjîyê kirine. Li hin deveran jî di konan da dema ku civata dengbêjîyê dihate amadekirin perdeyek di navbera jin û mêran da dihate danîn û jinan li dû vê perdeyê distran.<sup>3</sup>

Di vê tezê da mebesta me ew e ku em derbarê dengbêjîya jinan da lêkolîn bikin. Xebatên ku weke dengbêj behsa jinan dikin herî zêde behsa Eyşe Şan û Meyrem Xanê dikin lê gelek jinên dengbêj ên hemdemê wan hene ku gelek kêmtên nasîn. Di vî warî da Dengbêjên Radyoya Erîvanê mînakên baş in. Derbarê wan da agahî gelek kêmtên in û yên ku hene jî gelek şaşî û nakokîyan dihewînin. Me di vê

---

<sup>1</sup> Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl, *Zargotîna Kurda*, înstîtûta Kurdzanîyê, Wien, 2016, r. 613.

<sup>2</sup> Selda Öztürk, "Kadın Kimliği Bağlamında Kültürel Bellek ve Van Merkezdeki Kadın Dengbêjliği Yansımaları". Zanîngeha İstanbul Teknikê, Şaxa Makezanîsta Musîka Tirkî, Teza Masterê ya Çapnebûyî, 2012. r. 109.

<sup>3</sup> <http://kurdîst.ru/2012/09/13/fatma-isa-dengbeja-kurd-ya-geleri/>

xebatê da hewl da ku derbarê wan da zêdetir agahiyan bidest bixin û yên şaş jî heta ji me tê sererast bikin.

Me xebata xwe di çarçoveya van pirsan da amade kir: Gelo jinan weke dengbêj di çanda kurdî da roleke çawa girtine? Wan berhemên xwe çawa afirandine û çawa îcra kirine? Ew di vî warî da rastî pirsgirêkên çawa hatine? Tiştên ku karê wan hêsan an jî zehmek kirine çi ne? Di mînaka Radyoya Erîvanê da weşanên radyoyan bandoreke çawa li îcrakirina dengbêjiya jinan kiriye? Bi lêgerîna bersivên van pirsan em hêvî dikin ku rola jinan ya di warê dengbêjiyê da bi giştî şênber bikin û ji bo xebatên berfirehtir rêyek vekin.

## A. Taybetîyên Dengbêjiyê

Di çanda kurdî da dengbêjî xwedîyê cihekî taybet e. Kurd, ji ber ku dereng derbasî çanda nivîskî bûne heta roja me jî çanda xwe û dîroka xwe bi awayeke devkî gihandine roja me. Veguhestina çandê bi berhemên devkî pêk hatiye. Yek ji wan cureyên berhemên devkî jî dengbêjiyê ye. Kurdan her çiqas berhemên xwe yên devkî derbasî nivîsê kiribin jî çanda wan ya devkî niha jî didome. Wekî ku Selda Öztürk jî anîye ziman “Dengbêjiya kurdî ji ber kêmasiya çavkaniyan bi Evdalê Zeynikê tê destpekirin lê hin çavkanî behsa dengbêjê Mîr Şeref (Mîrê Hîzanê) Selîm Silêman jî dikin.”<sup>4</sup>

Lêkolîner dengbêjiyê weke “dengbêjiya di bin patronajê da û dengbêjiya serbixwe”<sup>5</sup> dikin du beş. Dengbêjên ku di bin sîya hamiyek da bûn hunera xwe di dîwanên mîr û began da îcra dikir. Dengbêjên serbixwe li gundan digeriyan û hem di dawetan da hem jî di şevbuhêrkan da karê dengbêjiyê dikirin û debara xwe bi vî karî dikirin. Yıldırımçakar jî dengbêjiyê weke dengbêjiya klasîk û ya modern dike du beş. Ew tîne ziman ku bi pêşketina amûrên teknolojiyê guherînên civakî îmkân daye jinan ku vê hunerê îcra bikin.<sup>6</sup> Li gor tesnîfa Yıldırımçakar, dengbêjiya klasîk dengbêjên

<sup>4</sup> Öztürk, h.g. r. 10.

<sup>5</sup> Hêja. “Mîkro-Tekoşin û Makro –Şoreşa Dengbêja Jin” *Zarema*, hejmar 4, Stenbol, 2015, r. 39.

<sup>6</sup> Mehmet Yıldırımçakar, “Dengbêjiya Jinê Ji Hêla Patronaj, Perwerdehî, Rol û Nêrîna Civakî û Îcrakirina Hunerê Ve” *Kurdîname*, j. 2. r.88-89.

dîwanan an jî ên di bin patronajê d; dengbêjîya modern jî kesên ku berhemên dengbêjîyê piştî hilweşîna patronajê îcra kirine îfade dike.

Hemû nirxên ku miletekê ji serdemên berê da afirandine û gihaştîye roja îroyîn weke çandê tîn pênasekirin. Têgeha çandê ji serdemên çûyî heta roja me hemû serpêhatî û bîr û bawerîyên miletekê nîşanî mirov dide. Her neteweyek çanda xwe nifş bi nifş heta roja me anîye. Veguestina çandê bi rêya vegotinên devkî gihaştîye nifşên nû. Piştî belavbûna nivîsê gelek millet dîroka xwe û çanda xwe derbasî nivîsê kirine. Di nava kurdan da heta salên nêzîk jî çanda devkî serdest bû lewre hê jî çanda wan a devkî zindî ye. Di civaka kurdan da dengbêjî ji bo belavbûn û veguestina çandê hêmayeke giring e.

Li her deverên cîhanê navên cuda li vebêjên çîrokan hatine kirin “Vegotina çîrokan li Rojava bi Homeros dest pê kiriye û berbelav bûye. Di serdema navîn da li Ewropayê ji van kesan ra digotin ‘*minstrel*, li Îngilistanê jî weke *bard*, ‘*jester* û ‘*mamur*, li Fransayê weke ‘*trubadur* an ‘*truver* dihatin binavkirin”<sup>7</sup> Li gor ku Pariltî radigihîne li Ewropayê çîrokbêjên gerok li bazaran xelk li dora xwe dicivandin û çîrok digotin. Li Hîndistanê *Vedayan* çîrokan bi awayeke devkî gotine. Îro jî li Hîndistanê çîrokbêjên bi navê *harikatha* vê çandê didomînin. Di çanda Japonan da jî kesên ku weke *heike* tîn binavkirin vî karî kirine, li Kore û Malezyay û Çînê jî kesên ku karê bi vî rengî dikin hene û ew jî bi vî karî debara xwe dikin. Dîsa li Asyaya Navîn kesên ku çîrokan dibêjin weke *şaman*, *kam* an *baksî* hatine binavkirin û karê wan pîroz hatiye dîtin. Di nava tirkên anatolyayê da jî çîrokbêj weke *ozan*, *aşık* an *meddah* hatine binavkirin. Di nava ereban da jî beriya îslamiyetê çîrokbêjên bi navê *esmar*, piştî îslamiyetê jî *qassas* hebûne. Li Îranê jî kesên bi navê *neqqal* (neqilker), *qise-xan* û *şehname-xan* vî karî dikirin”<sup>8</sup> Ev kes di nava çînên serdest da xwedîyê payeyeke mezin bûn. Di qonaxan da, di serayan da û dîwanan da ciyeke wan yê taybet hebû. Ew di nava gel da jî xwedîyê qedreke giran bûn. Wan bi vegotinên xwe dîroka serdestan neqlî pêşerojê dikir, bi stranên xwe şahîyeke di nava gel da çêdikirin û bi çîrokên xwe destan, efsane û evîne ji gel re vedigotin.

Heman mînak di çanda kurdî da ji bo dengbêjan jî hene: Hin dengbêj di dîwanên mîr û began da xwedîyê statuyeye bilind bûn hin ji wan jî di dawet û şevbuhêrkan da kêfxweşîyê didan xelkê. Mehmet Uzun vê yekê weha tîne ziman:

<sup>7</sup> Abidin Pariltî, *Dengbêjler - sözün yazgısı*, İthaki, İstanbul, 2006. r. 48-49.

<sup>8</sup> Pariltî, h.b. r. 51-52.

“Hemû derî ji dengbêj ra vekirî bûn, milletê guh dida gotînên dengbêj û bi xebera wî fikir. Dengbêj di nava malbat, ‘eşîr û gundên dijmin da jî bi rehetî digeriyan. Ne kes jî wan ditirsiyan ne jî kes bi awayeke neyînî nêzîkê wan dibû.”<sup>9</sup>

“Dengbêj, mijareke rojane an dîrokî li gor meqameke bi enstruman an bê enstruman îcra dikin. Şerê nav ‘eşîran, evîn, karesatên xwezayî jî mijarên wan hinek in.”<sup>10</sup>

Gelek ji wanan amûreke lêdanê bikar nayînin. Tenê destê xwe didin ser kerrikê guhê xwe û dibêjin. Lê yê ku amurên wekî tembûr, ribab, bilûr û kemanê bikar tînin jî hene. Dengbêj bi xwe jî çî jin, çî mêr dibin, vebêj in. Ji sepandina hunera xwe çêjeke mezin distînin, bi dil û can hunera xwe ve têne girêdan.<sup>11</sup>

Ew serpêhatîyên civakî di stranên xwe da zindî dihêlin. dama ku stranên wan digihîjin nifşên nû ev bûyer jî di hafizaya gel da tîn parastin. Bi gotineke din dengbêjan serpêhatîya gelê kurd nifş bi nifş heta roja me anîne. dengbêj jî ber fonksiyona veguhestina çandê û bûyerên dîrokî wekî hafizaya gel jî tîn pênasekirin. dengbêj heta niha bi navên cuda hatine binavkirin. Çîrokbêj, stranbêj, kilamxan, stranvan, qesîdebêj û mitrib hin jî van in.

Pênaseyên li jor her çiqas li ser dengbêjîyê agahîyên giştî bidin jî bi tena serê xwe têrî pênaseya dengbêjîyê nakin lewra divê dengbêjîya di bin patronajê da û dengbêjîya serbixwe jî were nasîn.

Patronaj ew tişt e ku kesekî xwedî dasthilat (qral, padişah, mîr an beg ) kesekî hunermend, nivîskar, şair an zana, li qesr û qonaxên xwe hîmaye dike. Ev kes di qesr û qonaxan da wekî memûr in û debara xwe bi pîşeyê xwe û di bin hîmaya padişah an mîr da dikin. Ev kes bi berhemên xwe di xizmeta hamîyên xwe da ne. Hunermend bi taybetî şair û dengbêj di berhemên xwe da pesnê hamîyên xwe didin û bi vê yekê sipasîya wan dikin. Hunermend û zanayên di bin patronajê da bi saya hamîyên xwe dikarin bi rehetî berhemên xwe biafirînin û belav bikin. Patronaj hem jî alîyê aborîyê ve hem jî ji alîyê ewlehîyê ve ji wan ra dibe darfeteke mezin. Bi saya vê pergalê

<sup>9</sup> Mehmet Uzun, *Dengbêjlerim*, İthaki, İstanbul, 2005. r. 30.

<sup>10</sup> Canser Kardaş, “Tarihsel Olayların Dengbêjler Aracılığıyla Sözlü Kültüre Aktarılması”. Batman University International participated Science and Culture Symposium, 18-20 April 2012 Batman, r. 201.

<sup>11</sup> Tekin Çiftçi, “Di Çarçoveya Çanda Devkî De Di Nav Civaka Kurdan De Dengbêj û Saziya Dengbêjîyê”, *International Journal of Kurdish Studies*, 2015, r. 110-124.

hunermand hem di nava gel da dibe xwedîyê statuyê hem jî dikare tenê li hunera xwe hûr bibe. Mîr an padişahên ku hamîtiya hunermendan dikin di berhemên wan da wekî lehengên mezin, camêr û bi edalet tên teswîrkirin û bi vî rengî nav û dangê wan belav dibin. Em dikarin patronajê bi têgehên îro bişibînin sponsorîyê jî.

“Mîrên kurdan jî, di serayên xwe de, hamîtiya edîb û dengbêjan kirine û li ser kawdan û geşedana wê tradîsyonê roleke pîrr mezin lîstine. Sîstema hamîtiyê, di berhemdariya edebî û hunerî de li gor pergaleke tradîsyonel rû daye. Di medrese, mizgeft û meclîsên mîran de gelek zana, edîb, hozan, dengbêj û sazende hatine hîmayekirin.”<sup>12</sup>

Di serdema mîrektîyan da mîran dengbêjan hîmaye dikirin. Çavkanîyên nivîskî li ser vê mijarê kêma in lê yê heyî têra xwe agahîyan didin. Ji ber kêmbûna dokumanên nivîskî navên dengbêjên di bin patronajê da kêma in. Ên heyî ev in: Selîm Silêman, Evdalê Zeynikê, Gula Fille, Karapêtê Xaço, dengbêj Çingo, Şerîfê Çingo, Biroyê Şerqî, Şêx Silê, dengbêj Sidiqo, Ehmedê Fermanê Kîkî,<sup>13</sup> û Pero.<sup>14</sup>

Dengbêjên serbixwe an jî dengbêjên ku ne xwedîyê hamîyekî ne li gundan digerin, di dawet û şevbuhêrkan da hunera xwe îcra dikin û debara xwe bi vê yekê dikin:

“Dengbêj her tim li coxrafyaya Kurdistanê digeriyan. Wan bi vê yekê çanda kurdî ya neteweyî jî di nava gel da belav dikirin. Dengbêjan çîrokên xwe zêdetir êvaran di şevbuhêrkan da vedigotin. Bi taybetî di şevên zivistanê yê dirêj da. Xeynî ji vana li devera Colemêrgê kesên bi navê dengbêjên dîlanan jî hene û ew havînan diçin zozanan û kîngê bê xwestin stranên xwe dibêjin. Ji bilî ev kesên ku bi navê “Mîtrib” tên zanîn zêdetir li devera Mêrdînê dengbêjîyê îcra dikin. Mîtrib, stranên xwe bi sazê xwe yê bi navê ribabê dibêjin. Yê ku li tembûr û saz dixistin jî hebûn. Wan li gundan çîrok, stran an jî lawikan digotin. Tiştên ku digotin li ser kêf û şahîyê bûn. Dengbêjên ku havînan li zozan û gundan digeriyan jî hebûn. Wan çîrokên

---

<sup>12</sup> Zeki Gürür, “Dengbêjî Di Pêwendîya Patronajê De” Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî Yê Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanîsta Ziman û Kultura Kurdî. Teza Masterê ya çapnebûyî, 2014. r.43.

<sup>13</sup> Gürür, h.g. r. 17-73.

<sup>14</sup> Celîl, h.b. r.613.

xwe digotin û xelatan werdigirtin. Dengbêjan di şevên zivistanê da li dîwanxaneyê gundan distirîn.”<sup>15</sup>

Dengbêj dema ku diçe cihekî, axa an pêşengê wê derê kê be li mala wî distirê. Dengbêjên ku li gund diman çîrokên xwe li ber girseyeke mezin digotin. Dengbêjan li hin deveran bi saz digotin li hin cihan jî bê saz digotin. Mînak li Colemêrgê saz nayên bikaranîn. Sazên ku tên bikaranîn jî li gor deveran diguherin. Li Kafkasan qewal û duduk, li Mêrdîn, Amed û Rihayê saz, ribab û tembûr derdiketin pêş.<sup>16</sup>

Wekî ku li jor jî xuya dike dengbêjî li gor çînên civakî diguhere. Di nava çînên bilind da xwedîyê payeyê mezintir in û ji alîyê aborîyê da tenê bi hamîyên xwe ve girêdayî ne lewre ew di berhemên xwe da herî zêde pesnê hamîyên xwe didin. Carinan jî ew nêrînen xwe di derbarê karên hamîyên xwe da tînin ziman. dengbêjên di nava gel da jî xwedîyê statuyê baş in û ji alîyê gel ve tên hezkirin û bi rêzdarî tên pêşwazîkirin. dengbêj piştî ku çîroka xwe diqedîne gundî xelatên wekî ceh û genim didin wan. dengbêjên ku li gundan digerîyan debara xwe bi alîkarîya axa û gundîyan dikirin. Mînaka ku Parilti ji Muhsin Kızılkaya neqil dike balkêş e:

Hecî Kerik wekî listikvanekî çîrokan pêşkêş dike. Ew ji bo vegotina çîrokên xwe mehên havînê tercîh dike. Çîroka wî ya herî navdar jî Rustemê Zal e. Ew çîrokeke aloz û dirêj bû. Yê ku guhdar dikirin bi hêsani nîkarîbûn jiber bîkirana. Xala herî giring jî ew bû ku her kes herî zêde dixwest ku li vê çîroka wî guhdarî bike. Her ku vê çîrok bigota ji guhdaran berxîkek dixwest. dema ku wî çîrokê bicoş digot tu kesî çavê xwe jê venediqetand û berxîka ku wî dixwest bêyî îtiraz didanê. Hecî Kerik salê carekê dardiket xebatê. Wî du mehan dev ji kar û barê xwe berdida û derdiket turneya vegotina çîroka Rustemê Zal, zozan bi zozan digeriya. Wî ji her zozanekê çend heb berxik werdigirt. dema ku turne diqediya wî têra zivistanekê berxik ji xwe re berhev dikirin.<sup>17</sup>

Derbarê berhemên dengbêjîyê û naveroka wan da jî gelek lêkolîn hatine kirin. heta li gor van nirxandinan nîqaşa “gelo kî dengbêj e kî stranbêj e” derketîye holê. Ji ber vê yekê em ê niha li ser cureyên dengbêjîyê hin agahîyan bidin û mijara dengbêjî û stranbêjîyê binirxînin.

---

<sup>15</sup> Parilti, h.b. r.82,83.

<sup>16</sup> Parilti, h.b. r.83,85.

<sup>17</sup> Parilti, h.b. r.85,86.

Di hemû berhemên edebî da tesnîfên li ser cure û teşeyê hene. Teşe bi giştî qewareya berheman, serwa û paşserwayê îfade dike. Cure jî naveroka berheman îfade dike. Mijara berhemekê cureya wê dîyar dike. Mînak stranên ku behsa êş û kesera mirinê dikin weke *stranên şîne* an *lawij* tên binavkirin. Em dikarin berhemên dengbêjîyê jî li gor teşeya wan û cureyên wan têkin du beş lê mixabin xebatên li ser cure û teşeyê gelek kêr in. Ji ber vê yekê jî li ser mijarê termînolojîyek bi rêkûpêk derneketiye holê. Di nava herêman da navên cuda li heman cureyê hatine dayîn.<sup>18</sup> Ev jî ji bo tesnîfêke standart zehmetîyêke din e. Ji bo teşeyê zêdetir hewcedarî bi berhemên nivîskî heye lê ji bo cureyê heman pirsgirêk tune ye lewre em li ser cureyên dengbêjîyê zêdetir xwedîyê agahiyan in û xebat jî li ser cureyê li gor teşeyê zêdetir hene.

Nezan, radigihîne ku di nav berhemên devkî da herî zêde ên epîk hene. Ew ji bo cureyan tesnîfêk weha dike: Xelkên deştê ji vana re dibêjin *delal*, xelkên çiyayî dibêjin *lawikê siwaran*. *Lawij* di cenazeyan da tên gotin. *Kilamên dilan* xwedîyê qewareyêke serbest û hêsan in. Stranên şahî û govendê *dîlok* û *berdolavîyên* ku jin li ber rîstina hirîyê dibêjin. Li gor tesnîfên giştî jî cureyên berhemên dengbêjîyê ev in: kilam, stran, lawik, şer, dîlok, heyranok, payîzok, şeşbendî, bêlîte/bêrîte, şîn, destan.<sup>19</sup> Dema ku du kes bi hev ra stranekê bêjin ev jî bi peyva “duqolî” tê binavkirin.<sup>20</sup>

Berhemên dengbêjîyê li gor hin şert û mercan tên dabeşkirin. Heta li gor vê dabeşkirinê hin îcrakar weke dengbêj hin ji wan jî weke stranbêj tên qebûlkirin. Mînak hin kes tenê îcrakirina dîwanan weke dengbêjîyê qebûl dikin hin kes jî li gor naverok û cureyê hunermendan weke dengbêj an jî stranbêj qebûl dikin. Gumgum, dengbêjî û stranbêjîyê ji hev cuda dike. Li gorî wî stranbêj stranên ku berê ji aliyê dengbêjan ve hatine afirandin û hatine gotin di roja me de dibêjin.<sup>21</sup> Beğik jî pênaseyek weha dike: “Dengbêj di heman demê de dibe ku stranbêj be jî. Dengbêj stranên berê û yên ku dengbêjên din afirandine dikare bêje û dibêjin jî. Divê bi şertê

---

<sup>18</sup> Canser Kardaş, “Dengbêjlikte Tür ve Şekil Tasnifleri Üzerine Bir Değerlendirme.” Zanîngeha Şîmexê, Sempozyuma Navneteweyî ya Çanda Dengbêjiye û Dengbêj, 19-20 Avrêl 2019 Şîmex. r.39.

<sup>19</sup> Kardaş, h.g. r.45.

<sup>20</sup> Hevpeyvîna me ya bi Mahmut Beğik ra.

<sup>21</sup> <http://kovarabir.com/abdurrahman-gumgumkurt-folkloru-ve-resonun-stranlarinda-kurt-folklor-unsurlari-1/>

ku naveroka kilamê neguhêre, karibe kilamên heyî bêhtir bixemilîne, lê zêde jî bike.<sup>22</sup> Beğik di hevpeyvîna xwe da jî weha dibêje:

Bi min dengbêj ew kes e ku hem stranên xelkê dibêje hem bi xwe jî sitranan çêdike. Bi min di dengbêjîyê da ast hene. Ên ku kilamên kesên din dibêjin. Ev astekî ye, ev bi xwe jî jê ra bîrekî lazim e û me'rifetek, hunerek jê ra lazim e. Ên ku bi xwe sitranan çêdikin, hene destanan dibêjin çunkî destan bavê helbest û pexşanê ye, bavê romanê ye. Di nava destanê da mîtoloji heye. Li "Memê Alan" binêre têda mîtoloji heye, gotin heye, behsa bûyerê dike. Bi bûyerê ra jî tu dibînî kilamê dike navê. Dibê Zînê weha got Memê weha got.

Li gor mînakên li jor em dibînin ku dengbêjîyê heta roja me guherînên giring derbas kiriye. Dengbêjî ji dîwanan derbasî radyoyan bûye û îro jî ev kevneşopî ne bi halê xwe yê resen be jî tê îcrakirin. Divê ev yek ne weke dejerenasyonê lê weke geşedanek/adaptasyonê were nirxandin lewre ku ev adaptasyon nebûya niha dê dengbêjî bi temamî ji holê rabûya. Divê neyê jibîrkirin ku dengbêjî ji bo muzîka kurdî jî bûye hîmek jêneger û ku îro em dikaribin behsa muzîka kurdî bikin ev jî bi saya mîrasa dengbêjîyê ye.

Ji ber ku mijara teza me dengbêjên jin in û hemû dengbêjên ku mijara me ne di radyoyayan da hunera xwe îcra kirine em ê jî wan li gor dengbêjên modern û yên serbixwe (yên ne di bin patronajê da) binirxînin.

## **B. Jin di Folklorê Kurdî da**

Jin di afirandin û veguhastina folklorê kurdan da xwedîyê roleke mezin in. Ev yek jî bo hemû keresteyên folklorê kurdî derbasdar e. Her wiha jinan di veguhastina van berheman da jî roleke giring girtine. Beriya ku em rola jinê di folklorê kurdî da binirxînin em ê li ser rola jinê ya di civaka kurdî da bisekinin da ku bandora jinê ya li ser folklorê kurdî baştir were fêmkirin.

---

<sup>22</sup> Mahmut Beğik, "Dengbêj Resoyê Gopala", Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Kultura Kurdî, 2013. r. 23.

Dema ku cihê jinan di civaka kurdan da tê nîqaşkirin hin nêrînên cuda derdikevin pêşberî mirov. Di dawîya sedsala 19an da oryantalistên Rojavayî li ser kurdan xebatan kirine û di van xebatan da behsa jinên kurdan û cudahîyên wan ên ji milletên din kirine. Li gor hin lêkolanan jinên kurd ji yê tirk, ereb û farisan cuda ne û ji wan azadtir û bihêztir in. Ely B. Soane (sûbayeke îngilîz e) weha dibêje:

Jin (di zewacê da) xwediyê azadiyeke giring e. Jinên kurd li hember xweşikbûna xwe ya fizîkî, bi taybetmendiyên xwe ên kedîkirî jî layiqê pesindanê ne. Ew xwezayî, wêrek û ji çîneke baş in. Ew dilovanîya camêr a ku di nava jin û mêrên kurd da heye, bi tu awayî di nava gelên ku hindiktir hov in da nay zanîn.<sup>23</sup>

Mela Mehmûdê Bazidî jî tîne ziman ku keç û bûkên kurdan xwe ji xerîban venaşêrin û weha dibêje:

Waqî'a revîna jinan ji mêran di nêv wan da adet nînin, jin û keçêd wan ji kesê narevên, weko milletê efrenciye ew jî serbest in, lakin biwê i'tiqadê ku ew xerabiyê naken, illa eger yekê ji wan şûla xerab kirên, çare nînin elbete ewê dikujên<sup>24</sup>

Millingen jî weha dibêje:

Ew di warê civakî û polîtîk da ji nijada xwe tiştê ku dikeve para wan distînin û di vê mijarê da jinên misilman ji ên din jêhatîtir in. Jineke kurd pêdivîyên 'eşîreta xwe, xwîndariyên wê planên wê û peymanên wê ên veşartî hemûyan dizane... Jina serokeşîrê Mîlanê Omer Axa, hem şêwirmenda wî hem sekretera wî hem jî xeznedara wî bû. Wê bi wêrekîya mêrekî pirsgerêkên 'eşîra xwe hel dikir û îdare dikir. dama ku mêrê wê mir ew digel ku bîst û du salî bû jî îtibara giregirên 'eşîrê wergirt û hewl da ku li ser wan bandoreke mezin çêke. Jinên kurd bi qasî mêrên xwe jêhatî, nebez û hişyar in. Ew her tim amade ne ku li hespê xwe siwar bibin. Ew hespan pir baş neajon jî dama ku mêrên wan li hespan siwar dibin xwe digihînin wan.<sup>25</sup>

Gerokê Îtalyan Pietro Della Valle jî radigihîne ku "jinên kurd bi awayeke azad û bêyî ku ruyê xwe bipoşin digerin. Ew hem bi xerîban ra hem jî bi niştecihan ra bi rehetî diaxivin."<sup>26</sup>

<sup>23</sup> Şehrazad Mojab, (Ed.), *Devletsiz Ulusun Kadınları*, Avesta, Sitenbol, 2013, r. 290.

<sup>24</sup> Mela Mehmûdê Bazidî, b.n.b. r. 51.

<sup>25</sup> Veg. Mojab, h.b. r. 293.

<sup>26</sup> Veg. Mojab, h.b. r. 285.

Li jor di mînaka Ely B. Soane da behsa jinên ji rêzê tê kirin û di uslûba Soane da nêrîna wî ya oriyantalîst dîyar e. Em di mînaka Millingen da portreya jineke xwedî hêz dibînin. Ew hêz jî tenê bi destê jinên ji çîna serdest dikeve. Yanî jinek ji bo ku bibe xwedî hêz divê an ji malbata mîran be an jî ji malbata serokeşîran be. Bazidî jî vê yekê weha piştrast dike:

“Jinêd maqûlêd wan jî roja koçê li hespê çê siwar dibin û çek û sîlahan girê didê û rim digirîne destêd xwe û ew dikevne pêşiya koçêd bi xemil û ser bi zêr. Bi vê terzê dikevne pêşiya koçêd xwe, lakin jinêd feqîran zarok jî li goşê (koşê) keçêd xwe dajon û diçin.”<sup>27</sup>

Ev hemû mînak bi rastî jî cudahiya jinên kurd ji milletên cîran nîşan didin. Jinên kurd li gor ên tirk ereb û farisan hinek azad bin jî ev azadî mutleq nîne û nay wê maneyê ku ew bi mêran re wekhev in. Campanil ji bo jinên kurd weha dibêje:

Jin li ber mêrê xwe li piya disekin. Heman tiştî zarok jî dikin. Jin qet bi mêran ra xwarin naxwin û li cihê ku mêr lê be jî naxwin. Jin mecbûr e ku ji mêrê xwe re xwarinê amade bike û xwarina ku ji ber mêr dimîne xwarina wê ye. Jin weke dilê mêrê xwe tên ditin lewre mêr hemû pêdiviyên wê jê re tîne.<sup>28</sup>

Bazidî jî li ser vê mijarê weha dibêje: *...heta jinêd xwe û keç û da û xwehêd xwe jî elbete qetil diken... ji axa û rîsipîyêd wan kesek pirsîyarê naken ku te ji boyê çî eve kuşt.*<sup>29</sup>

Em ji mînakên li jor dibînin ku di civaka kurdî da azadbûn û xwedîhêzbûna jinê tiştekî îzafî ye. Jinên kurd di hin waran da azad û xwedî hêz in lê divê ney jîbîrkin ku jinên ku xwedî hêz in bi piranî ji çîna serdest in. Xaleke giring jî li ser bihêzbûn û azadbûna jinê ew e ku bi piranî jin piştî ku digihîjin temenekî mezin azad dibin an hêzekê bi dest dixin. Li gor van hemû agahiyan em dikarin bêjin ku jinên kurd ligel hin cudahîyan, di bin çandê bavkanî da bi qasî jinên milletên din rastî zextan hatine. Ev yek di folklorê kurdî da jî bi zelalî xwe nîşan dide.

Jinên kurd di gelek berhemên folklorîk da weke afrîner û îcrakar derdikevin pêş. Mînak: hilberîner, îcrakar û veguhêzerên lorî û zêmaran bi temamî nebe jî jin in.<sup>30</sup> Wek ku li jor hat behs kirin gelek berhemên dengbêjîyê jî cara ewil jin dibêjin.

<sup>27</sup> Bazidî, b.n.b. r. 51.

<sup>28</sup> Veg. Mojab, h.b. r. 286.

<sup>29</sup> Bazidî, b.n.b. r. 55.

<sup>30</sup> İlyas Suvağci, “Zayenda Civakî di Lorîyên Kurdî da” *Anemon*, j. 9(3) 2021, r. 763-770.

Jin weke çîrokbêj û stranbêj jî di folklorê da dertên pêş. Cemîla Celîl li ser pîrsa Kaşgar Oremar rola jinan di folklorê kurdî da weha rave dîke:

Rola jina Kurd him di civakê da (civaka Kurdî, ne ya îslamî), him di malê da berbiçav û xurt bûye, ne kêmi rol û bandora mêra bûye. Jina Kurd him çekdar bûye, him jina dilovan, him dayka dilnazik û heyran bûye, him cînara baş û xebatkara mala xwe. Dilê nazik timê dengbêj e. Di nava zargotina Kurda da tune bergeh, ku hunermendiya jina Kurd têda cî negirtiye. Stranên evîndariyê di keçkanyê da ji wanara meydana diharkirina hiss û evîna gur bûne: ber edetên kevin – dengê dijberiyê. Di nava xebat û karê nav malê da (Teşîrêstinê, meşkê, dankutê, danhêrkê, qehwe hêrandinê, tewinkariyê) strane. Stran xebata giran hêsa kiriyê. Wana straye bi hevra, bi kom, hinekan jî veğerandine. Stranên şîne milkê jina bûne. Stranên dilkovaniyê şîna giran sivik kirine. Ê her weha, gava dîroka Kurda jî vedikî, dibînî ku aqil, kemal, sirafet û hunermendiya jina Kurd ji tebyeta Kurdaye çiyayî xuliqiye. Dot û zeriyên Kurda siruştî, wek cimaet dibêje ji dayîna Xudê hunermend bûne, ji çalakiya nava civatê da bêpar nemane. Mîrasa kal û bava, di gela bergeha zargotinê da payê pirê jin parastine û jiyandar kirine.<sup>31</sup>

Jin di folklorê kurdî da hem weke temayek, hem jî weke afirînerê berhemên folklorê xwediyê cihekî giring in. Temaya jinê bi taybetî di çîrok û stranên evînî da derdikevin pêşberî me. Jin di van berhemên da weke aqilmend, evîndar, şervan, cadûker an hîlekar derdikevin pêş. Mînak: Di destana *Xanê Lepzêrîn* da Xanê Kurdan di mijarên giring da bi dêya xwe re dişêwire. Dêya wî weke aqilmendek şîretan lê dîke û pêşniyarên xwe li ser tekoşîna wî ya li hember Şahê Îranê tîne ziman.<sup>32</sup> Di hinan da şervan e.

“Di gelek çîrokên lehengiyê de, em li jinên şervan ku piştî şerekî dûvdirej, tam di kêliya ku têk biçin de, rûpoşa wan dikeve erdê û rastî dertê holê, rast tîne. Di dîroka Kurdan ya sedsala bîstan da ji nav kurdan gelek jinên şervan derketine. Vê berxwedana jinê di nava stranên nijadî, siyasî û netewî de jî cihê xwe girtiye. Gelek kilamên ku li ser şervanên jin hatine gotin hene. Hinek ji van kilaman ji aliyê şervanan bixwe ve hatine gotin.”<sup>33</sup>

Di hinan da evîndar e û ji bo evîna xwe stran dibêje:

<sup>31</sup> <https://pirtukweje.wordpress.com/2017/05/24/hevpeyvinek-taybeti-bi-mamosta-cemila-celil-ra/>

<sup>32</sup> Yaşar Kaplan, *Beyt û Destanên Kurdî*, Nûbihar, Stenbol, 2019, r. 21-118.

<sup>33</sup> Yaşar Kaplan, h.b. r. 166.

Gede lawikê min derket ji konê mezin  
Koloz xar kir, delîl ez im  
Gede lawiko zozanê bilind  
Çi li xezala digerî?  
Were çolbîyê gunda xezal ez im<sup>34</sup>

Weke ji mînakên li jor jî dîyar dibe rola jinê di folklorê kurdî da xwedîyê cihêkî berfireh e û li benda xebatên curbicur e. Ji ber ku mijara me dengbêjî ye em ê niha karîgerîya jinan ya di dengbêjîyê da binirxînin.

### **C. Jin: Afirînerên Dengbêjîyê yê Hem Nepen Hem jî li Ber Çavan**

Di çavkanîyên li ser dengbêjan da zêdetir behsa dengbêjên mêr tê kirin. Em dizanin ji xwe ji ber çanda bavkanî di nava kurdan da jinan karê dengbêjîyê weke mêran bi awayeke aşkera îcra nekirine. Ji ber vê yekê jî li hember ku navê gelek dengbêjên mêr gihastîye roja me navê dengbêjên jin gelek kêr in. Lêkolîner vê yekê bi çanda kurdan ya bavkanî û bandora dîne îslamîyê ve girê didin. Lê weke em ê di beşên din da bibînin di civaka kurdên êzdî da jî gelek astengî li ber dengbêjî û stranbêjîya jinan çêbûne. Her çiqas jin di warê dengbêjîyê da rastî gelek astengîyan hatibin jî karê dengbêjîyê berdewam kirine û weke afirînerên berhemên dengbêjîyê di çanda kurdî da cihê xwe girtine.

Dengbêjên weke Gulê, Hemîde, Pero, Meyrem Xan, Fatma Îsa û Eyşe Şan nûnerên dengbêjên jin ên ewil tên binavkirin. Îro, şert û mercên jinan li gor serdemên berê baştir bûne lewre jin bi awayeke hêsantir dikarin karê dengbêjîyê bikin.<sup>35</sup> Dîsa jî di nava gel da qismek hê jî bi awayeke neyînî li hunera wan ya dengbêjîyê dinihêre.

Weku ku li jor jî hate behskirin jinan di nav civakê da weke mêran derfet nedîtine ku bi serbestî karê dengbêjîyê bikin. Jinan ji ber adetên çanda bavkanî nikaribûn weke mêran gund bi gund bigerin û di dîwanan da dengbêjîyê bikin. Ev tê wê maneyê ku jinan ji alîyê aborîyê da ji vî karî sûd wernegirtine. Di heman demê da ew statu û rêzgirtina ku di dengbêjîyê da dibe para mêran jî bi dest nexistine. Çavkanî nîşan didin ku li hember vê yekê jinan dîsa jî karê dengbêjîyê kirine û hunera xwe dûrê sehneyê (an jî dîwanan) be jî afirandine. Herweha jinan di

<sup>34</sup> Heciyê Cindî, *Folklorê Kurmancîyê*, Lîs, Amed, 2016. r. 373.

<sup>35</sup> Yıldırımçakar, h.g. r. 95.

veguhastina dengbêjîyê û hêmanên devkî ên din da jî roleke aktîf girtine. Jin berîya serdema modern ji perwerdehîya zarokan perpirsiyar bûn. Wan zarokan bi lorî, çîrok û kilaman mezin dikirin. Bi vê yekê jî çandê vediguhastin nivşên nû û gelek dengbêjên navdar cara ewil ji dêya xwe an jî ji pîrika xwe berhemên dengbêjîyê guhdar dikir. Lêkolîner Zeyneb Yaş li ser mijarê tespîtên xwe weha îfade dike:

jin wek çîrokbêjekî, wek keseka ku ramana jîyanê dikare veguhezîne însanekî... min 110 hunermend di du cildên Şakar (*Şakarên Muzîka Kurdî*) de nivîsîne. Ez dikarim bêjim ji sedî heştê yê wan rol modela wan dêya wan bûne. Di vir de erê jin ne dengbêjên ku em bêjin civata ne. Em ê vê veqetînin ji dengbêjîya ku jin bi xwe diafirîne, peyda dike.... Em ê yekî ji yekî kêmtir an zêdetir nebînin lê karê hunerî dengbêjan kiriye ama bîngeh û asasê wê jin e lê belê jinan jî ew tiştê ku jinan kiriye mixabin di nav civatê de nehatiye naskirin, nehatiye biqîmetkirin. Ji ber wê yekê navek lê nehatiye kirin. statuyek wan tune bûye.<sup>36</sup>

Ji bo dengbêjîya ku di bin banê patronajê da ye tenê du mînakên jin hene ew jî Gula Fille û Pero ne lê agahîyên derbarê wan da jî tenê devkî ne yanî derbarê wan da agahîyên nivîskî di dest da tune ne. Em ji ansîklopedîya Celîlê Celîl hîn dibin ku Dengbêjeka bi navê Pero di dîwanan da straye û bi Evdalê Zeynikê re jî stranan gotîye. Hemû xebatên ku behsa Evdalê Zeynikê dikin behsa Gula Fille jî dikin û radigihînin ku Gulê di dîwana Surmeli Mehmed Paşa da dengbêj bûye û bi Evdal ra ketiye lecê. Li gorî ku Ahmed Aras radigihîne Evdalê Zeynikê di vê lecê da zora Gulê biriye û bi ser ketiye.

Piştî sê roj û sê şevan Gulê dest li ber Evdal datîne, dibê Evdal haza ku tu şairî û şairekî bê emsal î... Evdal dibê: Gulê tu jî şaireke pir mezin î. Heta niha tu kesî li pêşya min ewqasî berxwe nedaye.<sup>37</sup>

Ev sê mînak îhtîmala hebûna dengbêjên jin ên ku di dîwanan da dengbêjîye kirine tîne bîra mirov. Li alîyê din rastiyek weha jî heye ku Dengbêj Gulê dibe ku ji ber ku ne misilman bûye karibûye dengbêjîyê bi mêran ra bike û di dîwanan da bistirê. Mehmûd Evdila (Beğik) tîne ziman ku dibe ku Gulê kurdeka Mesîhî (Xirîstîyan) be jî.<sup>38</sup> Weke ku di mînakên li jor jî hate dîyarkirin jinên ku ji çîna bilind bûne xwedîyê hêzekê bûne û karibûne li derveyê adetên civakê tevbigerin. Yanî ku

<sup>36</sup> Hevdîtina me ya bi Zeyneb Yaş ra.

<sup>37</sup> Ahmet Aras, *Evdalê Zeynike*, Nûbihar, Stenbol, 2018. r. 41-48.

<sup>38</sup> Hevpeyvîna me ya bi Mahmut Beğik ra.

vê hêzê dîtîbin îhtîmal heye ku di dîwanan da jî weke dengbêj cih girtîbin. Tiştêkî din jî ew e ku di dîroka wêjeya kurdî da gelek helbestvanên jin hene. Feqî Huseyin Sagniç ji edebiyata Yaresanan navê gelek helbestvanên jin dide: Celale Xanima Loristanî, Rihan Xanima Loristanî, Lîza Xanim, Xatû Mey Zerd, Daye Xanima Serketî, Fatîme Loriya Goranî, Yay Hebîbeya Şarezûrî, Nazdar Xanima Şîrazî, Nergîz Xanima Şarezûrî, Xatûn Dayrakî Rezber, Xatûn Zerbanuya Derzyanî, Senem Xanima Dewdanî û Mestûre Kurdistanî.<sup>39</sup> Ku jinan weke şair di wêjeya kurdî da cih girtîbin helbet weke dengbêj jî girtine lê ji ber çanda devkî ne tenê dengbêjên jin, ên mêr jî bi demê re hatine jibîrkirin û dîroka dengbêjîya kurdî bi çavkaniyan herî dûr gihîştîye Evdalê Zeynikê û Gula Fille. Bazidî jî tîne ziman ku keçên kurd jî xwendine û perwerde ji meleyan dîtine. Jin di heman demê da bi mêran re beşdarê dîwanan jî bûne.<sup>40</sup> Li hember vê yekê derbarê dengbêjîya wan da agahî tune ne. Helbet zelalkirina vê mijarê lêkolîneke berfirehtir dixwaze û ne mijara vê xebatê ye. Niha em ê li ser pîrsgirêkên ku jinan di warê dengbêjîyê da jîyane bisekinin.

Em ji çavkanîyan dizanin ku jinan di hemû warên jîyanê da wekî dengbêj cih girtine. Mînak: “Di nava kurdan da şahîyeke ku salê du caran tê pîrozkirin heye. Ev şahî di demsalên payîz û biharê da tê pîrozkirin. Navê vê şahîyê *serûn* e. Ev şahî, şahîya jinên kurd a herî girîng e. Di van şahîyan da jinên ji rêzê û yên ku ji çîna serdest in bi hev re ji mêran dûr heta êvarê stranan digotin, govend digirtin û xwarinan dixwarin.”<sup>41</sup> Li gor agahîyên ku Bazidî dide, di nav civaka kurdan da pîrejîn, ciwanan li dora xwe dicivînin û li ser kar û barê dinyayê, li ser dîrokê (şer, serhildan, bûyerên xwezayî), li ser adet û rusumatên kurdan heta tecrubeyên xwe ji wan re dibêjin. Yanî wan perwerde dikin.<sup>42</sup> Ev rola jinan a li ser perwerdehîyê û li ser veguhestina çanda devkî nîşan dide.

Ew jî mewlud didene xwendin, mêr cuda û jin cuda zad û te’aman tedarik diken û bixuran disojin. Dawetên wan zaf bi deng û bi stran in ew berîte dibêjin, bi govend stran û bi reqs dikin. Jin û mêr, keç û law hemû bi hev re di destê hev da govend digirin û keç û bûkên wan dilîzin û stranan dibêjin.”<sup>43</sup>

<sup>39</sup> Feqî Huseyin Sagniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstituya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2014. r. 88-172.

<sup>40</sup> Bazidî, b.n.b. r. 58.

<sup>41</sup> Veg. Mojab, h.b. r. 286.

<sup>42</sup> Bazidî, b.n.b. r. 57.

<sup>43</sup> Bazidî, b.n.b. r. 50-60

Jinan di van civînan da mêwlûd xwendine û duayan kirine. Herwiha wan di dawetan da jî gelek stran afirandine û gotine. Yıldırımçakar radigihîne ku “Di jîyana rojane da bi tenê jin lorî û zêmar/şînî’yan dibêjin. Ev cure bi tenê malê jinan in. Jin van cureyan diafirînin û dibêjin. Mêr ne vana diafirînin ne jî dibêjin.<sup>44</sup> Tekîn Çiftçi di xebata xwe ya bi navê *Kilam û Jin* da îstîsnayekê pêşkêş dike. Çiftçi, hevpeyvînek bi dengbêj Zekî ra kiriye û di wê hevpeyvîne da tê ragihandin ku dengbêj Zekî, piştî mirina kurê xwe ji bo wî zêmarek çêkiriye.<sup>45</sup> Lê dîsa jî zêmar bi piranî ji aliyê jinan ve hatine gotin û di nava gel da jî ev yek weha tê zanîn.

Ji agahîyên li jor jî dîyar e ku jinan karê dengbêjîyê di nava civatên jinan da, di dawetan da li şahî û pîrozbahîyên gelerî û di şînan da kirine. Yanî di her warê jîyanê da jinan berhemên dengbêjîyê ava kirine û hem bi afirandina berhemên xwe hem jî bi veguhestina van berhemên bûne parçeyek çanda devkî ya kurdî. Lê belê di civaka kurdî da ji bo dengbêjîyê karê jinan ne hêsan bûye. Ji ber zextên civakî jinan wekî dengbêjên mêr nikaribûne bi rehetî dengbêjîyê bikin û berhemên xwe belav bikin. Ew, rastî gelek astengî û zextan hatine. Li gor agahîyên di dest da beriya îslamiyetê jin azadtir bûn û karê dengbêjîyê jî bêyî ku werin astengkirin îcra kirine. Pariltî li ser mijarê weha dibêje:

Di nava kurdan da dengbêjên jin hebûne lêbelê ew derneketine pêş. Jin, heta ku kurd dîne îslamiyetê qebûl kirine bi mêran re xwedîyê heman şert û mercan bûne. Piştî îslamiyetê bi zextên dîni ev wekhevî kêmbûye lê bi tamamî têk neçûye lewre kurd ji hin adetên xwe qet venegeriyane. Îcrakarên kilaman bi piranî jin bûn. Îro niha jî gelek kilamên ku berbelav in ji devê jinan hatine gotin. “Lawikê Metînî”, “Derwêşê Evdî” û “Ehmedo Ronî” ji vana hinek in.<sup>46</sup>

Dîsa em ji Pariltî hîn dibin ku beriya îslamiyetê jinan li ba mêran jî stranan gotine lê piştî îslamiyetê tenê di civatên jinan da strane. Piştî îslamiyetê dema ku jinek li cihekî ku mêr lê ne stran bigota konên wan bi perdeyan dikirin du cih. Ev rewş di nava kurdên êzîdî da cuda bûye. Jinên kurd ên êzîdî di warê dengbêjîyê da ji yê din azadtir bûne. Lewre dengbêjên jin di nava wan da zêdetir in û ev jin

---

<sup>44</sup> Yıldırımçakar, h.g. r.92.

<sup>45</sup> Tekin Çiftçi, *Kilam û Jin*, Nûbihar, Stenbol, 2017. r. 72.

<sup>46</sup> Pariltî, h.b. r. 21-22.

dikaribûn bi mêran ra jî kilamên xwe bigotana.<sup>47</sup> Weke ku em ê di beşên din da bibînin ev rewşa jinên êzîdî bi demê ra guherîye û di serdema Radyoya Erîvanê da jinên êzîdî jî ji ber dengbêjî û stranbêjîyê rastî gelek zextan hatine.

Ji ber tunebûna çavkanîyan niha nayê zanîn ku di serdemên berê da jin di warê dengbêjîyê da rastî pirsgirêkên çawa hatine. Weke ku li jor jî hatiye behskirin dengbêjên jin ku navê wan tê zanîn yên herî kevn Gulê, Pero û Hemîde ne. Piştî wan yên ku navên wan tên zanîn û di derheqê wan da çavkanî hene ên herî kevn Eyşe Şan, Meyrem Xan, Aslîka Qadir û Fatma Îsa ne. Pirsgirêkên ku di warê dengbêjîyê da derketine pêşiya wan ji xebatên ku li ser wan hatine kirin tên zanîn. Em derbarê pirsgirêkên dengbêjên jin ên serdema dawî da yanî yên di roja me da jî ji teza Selda Öztürk û belgefilma Rewşan Çeliker agahîyên giring hîn dibin.<sup>48</sup> Öztür ji bo teza xwe li Wanê bi dengbêjên jin re hevpeyvînek kiriye. Dengbêjên weke Gazin (Raziye Kızıl), Dengbêj Meryem (Meryem Tuncer), Dengbêj Mukaddes (Perihan Yıldırım), Dengbêj Muhacir (Muhacir Adsız) û Kevser Ersöz pirsgirêkên ku derketine pêşberî wan anîne ziman û di gel van pirsgirêkan jî karê xwe yê dengbêjîyê bînavber meşandine.

Pirsgirêkên herî mezin ji ber çanda bavkanî û ji ber hincetên dînî derketine pêşberî jinan. Jin bi qedexekirin û zextên curbibur re rûbirû mane. Aynur Doğan li ser mijarê weha dibêje: “Kêmbûna dengbêjen jin ji ber bawerîya dînî ye. Strîna jinê weke guneh û şermekî hatiye dîtin. Bi piranî jinan stranên kurdî afirandine lê ji aliyê mêran ve hatine gotin.”<sup>49</sup> Dengbêjî bi hinceta ku guneh e li jinan hatiye qedexekirin. wan ji ber vê yekê karê dengbêjîyê di civatên navxweyî da meşandine. Dengbêj Muhacir tîne ziman ku ji ber gunehbûnê dev ji dengbêjîyê berdaye. *Min xwe neda vî karî, min xwe da dîne xwe û Qur’ana xwe. Kalê min li Îranê xelîfe ye, wê çavê min kor bibe.*<sup>50</sup> Dengbêj Mukaddes dema ku behsa qeydkirina dengê xwe cara yekem di teyibek da dike weha dibêje:

Bi bûka malê re, me xelkên malê di xew ra kir. Qedexe ye, dê çawa jinek di teyibê da dengê xwe qeyd bike, stran bêje. Tiştêkî wisa tune ye,

<sup>47</sup> Pariltî, h.b. r. 21-22.

<sup>48</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=0K0It8H28d8>

<sup>49</sup> Rojda Zaman, “Bir Direniş Hikayesi Dengbêj ve Stranbêj Olarak Eyşe Şan”. Zanîngeha Bilgiyê, Şaxa Zanistên Civakî, Teza Masterê, 2019. r. 22.

<sup>50</sup> Öztürk, h.g. r. 164.

qedexe heye, mirin heye. Wê te bêyî dudilî şerjê bike wele [ji bo mêrê xwe dibêje]. Dikin yanî. Me jî bi nepenî dengbêjîyê kiriye<sup>51</sup>

Wan di stranên xwe da zext û pirsgirêkên ku di civakê da derketine pêşberê wan anîne ziman. Eyşe Şan di strana xwe ya bi navê *Derdê Hewîyê* da gazinên jinekê ji hêwîfîyê tîne ziman:

Wele te nagirim, bile te nastînim  
Derdê hewîyê bile nakişînim  
Dayê ez nagrim, bavo ez nastînim  
Jinê wî didu ye çavê wî birçî ye  
Li malê pêv çûye wele nastînim  
Dayê ez nagrim, bavo ez nastînim  
Welle te nagirim, bile te nastînim  
Jinê wî çar in bi dost û yar e  
Welle te nastînim, bile te nastînim<sup>52</sup>

Ji ber ku Eyşe Şan dengbêjî kiriye xizmên wê qedexe kirine ku biçê welêt û dayîka xwe bibîne. Wê xemgînîya xwe jî di strana “Heywax Dayê” da anîye ziman:<sup>53</sup>

Dayîkê qurban ava çemê Diyarbekirê dîsa îro têye leme leme  
Dayê qurban ji xwe re pêlê tu li ser pêlê dixê davê ser kelem e  
Hecî Xanim dîsa îro dile min şewitî, dayîka min ket bîra min e  
De hêstirê çavên min xerîba Xwedê  
Fena barana biharê tê ji xwe renasekine  
De heywax dayê, xerîb im dayê,  
De heywax dayê bêkes im dayê,  
Kesê min nema li rûyê vê dinyayê dayê,  
Derdgiran im dayê.  
De heywax dayê, mala minê, mala minê  
Dayîka min dinale haya min tunîn e,  
Der û cîran dibên,  
Elîf Xatûn em ê bang kine keçika te Zehra, Salihayê  
Hecî Xanim dibê, ez naxwazim kesê, bira neye ser min e

<sup>51</sup>Öztürk, h.g. r. 159.

<sup>52</sup><https://www.youtube.com/watch?v=MWKn7TuQYvE>

<sup>53</sup>Zaman, h.g. r. 55-56.

De Hûn ê ji bo Xwedê têlêfonê vekin, li têlê xin  
 Bira Eyşana mina dilşewitî were, ezîzê(a) ber dile min e  
 De bira were min bibe doxtor û hekîma  
 Welle ji xeynî Eyşana min kesê min tunîn e  
 De heywax dayê, xerîb im dayê,  
 De heywax dayê bêkes im dayê  
 Kesê min nema li rûyê vê dinyayê  
 Ez bimirim dayê.  
 De heywax dayê, mala mi şewitî, mala mine dayê  
 Kula Xwedê bikeve mala bavê Osê Salihayê  
 Dizanibûn ez li ku me, xeberekî ji bo xêra Xwedê nedane min e  
 Welle heyfa şîr û emekê te dane ewladê bêxêr  
 Li koşê xestexanê bêkes û bêxwedî,  
 Zehra û Elî nehatine ber sere te ne dayê  
 De heywax dayê, xerîb im dayê,  
 Heywax dayê ez bimirim dayê,  
 Welle kesê min nema li rûyê vê dinyayê dayê,  
 Bêkes im dayê.<sup>54</sup>

Li Bakûr, “Îro çanda bavkanî bi temamî nebe jî di çanda kurdî da berbelav e. Pergala eşîretê bi mudaxele-yên siyasî û tevgerên civakî qels bû.”<sup>55</sup> Vê qelsbûnê di civakê da cihê jinê jî guherande, zextên ku li ser jinan hebûn bi temamî ranebûbin jî hinek sivik bûn. Dengbêjêke weke Eyşe Şan bi saya vê guherînê li bajarên Tirkîyeyê xebatên xwe domand û dengê xwe li hemû erdnîgarîya kurdan belav kir. Wê dîsa jî gelek zehmetîyan kişand lê ji guherînên civakî sud wergirt û nav û dengê xwe li hemû welat belav kir.

Nêrîna dengbêjên mêr jî ji bo dengbêjîya jinan gelek bi pisrgirêk e. Dema ku jin bibe mijara berhemeke dengbêjîyê gelek pesnê wê tê dayîn, bedewiya wê, zîrekiya wê, qedr û qîmeta wê bê hed û bê hesab e. Dengbêjên mêr hemû mal û milkên xwe heta canê xwe jî li serê dide lê dema ku jin weke dengbêjek derdikeve holê em, rastî helwesteke gelek cuda tên.

<sup>54</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=R83ex3UOAMS>

<sup>55</sup> Zaman, h.g. r. 25.

Hin dengbêjên mêr ji ber hostatiya strangotina dengbêjên jin bi pesindari behsa wan dikin û dibêjin ku mêran dengbêjîyê ji jinan girtine lê hin ji wan jî qabiliyeta jinan kêr dibînin. Li gor fikra wan xwedîyê çanda dengbêjîyê mêr in. Ev du nêrînen li dij hev jî bi pirsgirêk xuya dikin. Yek jê dibêje “me qethiyen nikaribû weke wan xweş bixwenda lê mêrên kurd pir tund in, dengbêjîyê li jinan qedexe dikin” an jî dibêjin “jin fedî dikin”... Nêrîna duyem jî bi awayeke aşkera hebûna jinê ya di vî warî da red dike.<sup>56</sup>

Dengbêj Muhacir Adsız jî derbarê mijarê da weha dibêje: “Piştî ku ez zewicîm stirîna min qedexe bû, dema nezewicî bûm min digote. Min li dîwanan digote lê bavê min nedihêşte ku derkevim dîwanên mêran.”<sup>57</sup> Ji van mînakên diyar e ku mêr bi du awayan li hember dengbêjîya jinê disekin. Ya yekem ew e ku mêran jinê di hunera dengbêjîyê da ji xwe re weke reqîb dîtine lewre bi kêmdîtin behsa wan kirine. Ya duyem jî jinekê dema ku bi karê dengbêjîyê mijûl bûye di civakê da pêşiya her kesî an mêrê wê an jî bavê wê li hember wê derketîye.

Astengîyeke din jî helwesta dewletên serdest a li hember ziman û çanda kurdî ye. Dewletên serdest bi taybetî di mijara ziman da gelek tund in û dengbêj jî rastî vê tundîyê hatine û tên. Helbet ev zextên hêzên serdest ne tenê ji bo jinan ji bo hemû dengbêjan bû lê ji ber ku mijara me dengbêjên jin in em ê tenê behsa astengîyên li ber jinan bikin. Piştî ku li Îranê Humeynî dibe desthilatdar li hember stranbêjan, bi taybetî jî li hember jinan pêşî tê girtin. Îran Xanim jî yek ji wan e. Ew ji ber zextên dewletê mecbûr dimîne ku xebatên xwe bi nepenî bimeşîne.<sup>58</sup> Dengbêj Gazin di salên 1990an da ji ber ku stranên kurdî gotiye sê doz lê hatine vekirin û ceza lê hatîye birîn. Ev zextên li ser wê di wan salan da namîne û di Cotmeha 2010an da dîsa salek ceza lê tê birîn. Sebeba vê yekê jî dîsa du stranên kurdî ên bi navê “Megrî” û “Lo Lawo” ne. Hozan Canê (Saide Înac) di 20 saliya xwe da ji ber ku stranên bi kurdî dibêje tê girtin. Di 2018an da dîsa tê girtin û bi endamîya rêxistinê tê sûcdarkirin. Li hember ku parêzerên wê bêsûcbûna wê îspat dikin dîsa jî ceza lê tê birîn.<sup>59</sup> Canê piştî îtiraza parêzerên wê hat berdane lê di vê navberê da du sal di girtîgehê da ma.<sup>60</sup>

Di derbarê jinan da mijareke din jî ew e ku gelek stranên ku ji aliyê jinan ve hatine afirandin ji aliyê mêran ve hatine gotin û belav bûne. Hemû çavkanî li ser vê

---

<sup>56</sup>Öztürk, h.g. r. 129.

<sup>57</sup>Öztürk, h.g. r. 115.

<sup>58</sup> Zeyneb Yaş, “Dengbêjîya Serhedê Ji Ser Zarê Jinekê: Îran Xan (Mucered)”, *Dilop*, j. 14, r. 49-49.

<sup>59</sup> <https://artigercek.com/index.php/haberler/hozan-cane-davasi>

<sup>60</sup> <https://www.rudaw.net/kurmanci/middleeast/turkey/01102020>

mijarê li hev dikin. Ji ber ku jinan nikaribûne weke mêran bi rehetî derkevin nava civatan û li gund û bajaran bigerin nikaribûne hunera xwe di nava gel da belav bikin. Stranên ku ji devê jinan tên gotin bi piranî mêran ji jinan guhdar kirine û di nav gel da belav kirine û gihandine heta roja me. Li ser mijarê mînakeke şênber jî heye: Dengbêj Reso li Qereyazîyê li gundê Qizqanîyê stranekê ji jineke bi navê Cewê guhdar kiriye û ji ber kiriye. Dema ku Reso stranê ji ber dike û ji Cewê re dibêje ew kêfxweş dibe ku dê strana wê bi saya Reso belav bibe û ney jibîrkirin.<sup>61</sup> Gelek stranên ku ji devê jinan hatine gotin bi vî awayî gihîştine roja me û bûne anonîm. Lê pirseke weha heye “gelo hemû stranên ku ji devê jinan tên gotin bi rastî jî jinan afirandine *an fanteziya mêrekî ye? An çiqasî wê rast e, çiqasî wê fantezî ye?*”<sup>62</sup> Hêja di gotara xwe da vê pirsê dike û ji bo zelalkirina mijarê metodeke lêhûrbûnê pêşniyar dike. Bi bikaranîna ziman (bi peyvên ku hatine bikaranîn û uslûb) û bi perspektîfa axiverê/a stranê ev yek dikare were zelalkirin.

Bi destpêka weşanên radyoyê ji bo jinan derfet çêbû ku dengê xwe di nav hemû civakê da belav bikin. Ev yek di dengbêjîyê da serdemeke nû bû. Ne tenê ji bo jinan ji bo hemû dengbêjan guherînên mezin derketin holê. Êdî dengbêjek ne tenê li herêmekî, dikaribû li hemû welat nav û dengê xwe belav bike. Sîstema patronajê hilweşîya lê radyoyan vê valahîyê dagirt. Çi jin çi mîr hemû dengbêjên ku îro dengê wan gihîştîye roja me bi saya van qeydên plak û radyoyan e. Di vir da radyoyên herî giring bêguman Radyoya Bexdayê û Radyoya Erîvanê ne. Dengbêj û stranbêjên weke Eyşe Şan, Meyrem Xan, Îran Xan, Nesrîn Şêrwan, Elmas Xan, Fewzîye Mihemed, Gulbihar (Fayîze/Fatima) Mihemed di radyoya Bexdayê da; Sûsika Simo, Fatma Îsa, Aslîka Qadir, Belga Qado, Zadfîna Şekir, Cemîla Çawiş<sup>63</sup> û geleyen din jî bi Radyoya Erîvanê derfet dîtine ku stranên xwe bi hemû gelê kurd bidin nasîn. Mînakên ku em ê niha li jêr bidin jî bi piranî di van radyoyan da deng vedane.

---

<sup>61</sup>Belgefîlmê Reso: <https://www.youtube.com/watch?v=AiR84j5L-mU> 15 Çile 2021.

<sup>62</sup>Hêja, h.g. r. 41.

<sup>63</sup>Zeyneb Yaş, *Şakarên Muzîka Kurdî*, weş. Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, 2015, r. 98-421 (c.1), 74-381 (c.2).

## D. Çend Jin ên ku di Dengbêjîyê da Derketine Pêş

Wekî ku di beşên din da jî hate dîyarkirin derbarê dengbêjan da agahîyên me gelekî kêmtir in. Hejmara dengbêjên ji vê kevneşopîya ku ji sedan salan maye heta roja me ya îro gelekî kêmtir in. Ji ber sebebên ku di beşên din da hatine dîyarkirin hejmara dengbêjên jin hîn kêmtir e û agahîyên derbarê wan da jî kêmtir in. Di çanda kurdî ya devkî da dengbêjên ku navê wan tê zanîn ên herî kevn Evdalê Zeynikê û Gula File ne. Derbarê Evdalê Zeynikê da gelek xebat û lêkolîn hene. Di van hemû xebatan da behsa Gulê jî tê kirin lê xebateke serbixwe ku li ser Gulê be tune ye. Weke ku li jor hate behskirin dengbêjeka bi navê Pero jî heye û bi Gulê re hemdem e. “Dîsa tê qalkirin ku di serê salên 1900î da li Hekarîyê dengbêjeka bi navê Dengbêj Hemîde jî hebûye.<sup>64</sup> Nav û dengê van jinan tevî çîroka jîyana wan di nava gel da belav bûne lê belê kesekî li dengê wan guhdarî nekiriye”.<sup>65</sup> Dengbêjên jin ên ku Öztürk bi wan re hevdiştin pêk anîne jî derbarê dengbêjên wekî Gulê, Pero û Hemîdeyê da agahî dane. Öztürk jî, di listeya dengbêjan da van navan rêz dike: Gulê, Gulîzer, Kubara Xido, Pero, Nazdar Ferhat, Cemîla Çawiş, Elmas Xanim, Sûsika Simo, Zadîna Şekir, Îran Xanim, Meyrem Xan, Eyşe Şan, Fatma Îsa, Hemîde, Elmas Mihemed, Xana Zazê, Aslîka Qadir û Raziye Kızıl (Gazin)<sup>66</sup> Mihemed Ava jî di pirtûka xwe ya bi navê *dengbêj, Çîrokên Kilaman, Radyoya Erîvanê* da behsa şeş dengbêjan dike ku navê wan di listeya Öztürk da jî hene: Cemîla Çawiş, Sûsika Simo, Zadîna Şekir, Meyrem Xan, Fatma Îsa, Aslîka Qadir.<sup>67</sup> Niha em ê li jêr bi kurtasî behsa çend dengbêjên ku em derheqê wan da xwedî agahî ne bikin û wan bidin naskirin. Bi vê danasînê dê şert û mercên jinan di warê dengbêjîyê da baştir were dîtin.

**Meyrem Xan:** Meyrem Xan bi navê “Siltana Kurdan” hatiye nasîn. Meyrem Xan di sala 1904an da li gundê Dêrgola Şirmexê ji dayik bûye.<sup>68</sup> Li gor hin çavkanîyên din jî ew ji ‘eşîreta Xanî ye û li Colemêrgê hatiye dinê. Wê hunera muzîkê di civatên dengbêjan da hîn kiriye. Piştî ku komara Tirkîyeyê ava bûye ew

---

<sup>64</sup>Yıldırımçakar, h.g. r. 91.

<sup>65</sup> Selda Öztürk, “Kadın dangbêjler: ‘Van Kadın Sanatçılar Dayanışma Ve Yardımlaşma darneği Örneği’”, *Toplumsal Cinsiyet*, 2013, j. 6, r. 46.

<sup>66</sup>Öztürk, 2012, h.g. r. 10.

<sup>67</sup> Mihemed Ava, *dangbêj, Çîrokên Kilaman, Radyoya Erîvanê*, Ar, Stenbol, 2016.

<sup>68</sup>Ava, *h.b.* r. 90.

çûye binxetê û zewicîye. Ji ber ku mêrê wê nexwestiye ew stranan bêje Meyrem Xan ji mêrê xwe qetiyaye.

Li gor ku tê zanîn yekem dengbêja ku stranên bi kurdî tomar kirine Meyrem Xan e.<sup>69</sup> Meyrem Xan stranbêja yekem e ku bi kurmancî plak derxistîye. Piştî kurmancî wê bi soranî jî plak derxistine û ev ji bo soranî jî bûye plaka yekem ku jinekê derxistîye. Ji 200 hebî zêdetir stranên wê di Radyoya Bexdayê da hatine tomarkirin. Ew di sala 1924an da çûye Zaxoyê û heta 1936an li wir maye. Ji wir derbasî Mûsilê bûye, ji wir jî çûye Bexdayê. Li Bexdayê hunermendên weke Nesrîn Şêrwan, Elî Merdan, Mihemed Arifê Cizrawî, Hesen Cizîrî, Tahir Tofîq û Seîd Axayê Cizîrî nas kirine û bi wan re di Radyoya Bexdayê da weke hunermend xebitîye. Meyrem Xan tevli pêşbaziyekekê dibe ku Radyoya Bexdayê li dar dixê. Ew di vê pêşbaziyekekê da bûye yekem. Piştî vê serkeftinê Meyrem Xan di Radyoya Bexdayê da dest bi kar kiriye. Meyrem Xan, gelek stranan afirandiye û gelek jî ji nava gel berhev kirine. Strangotina Meyrem Xan, gelek xwezayî bûye û wê di kilamên xwe da kurdîyeke zelal bi kar anîye. Meyrem Xan di 1949an da li Bexdayê li nexweşxaneyê Mîr Îyas wefat kiriye. Li gor rîwayeteke din jî li Mûsilê rehmet kiriye.<sup>70</sup>

**Eyşe Şan:** Eyşe Şan di sala 1938an da li Amedê ji dayik bûye. Ew di nava gel da wekî Şahbanûya bêtac û bêtext, Eyşana Kurd, Eyşe Xan, Eyşana Osman, Eşyana Elî jî tê zanîn.<sup>71</sup> Eyşe Şan ji malbateke malmezin e. Bavê wê jî dengbêj bûye. Eyşe Şan bi saya dengbêjiya bavê xwe, ji biçûktîya xwe da dengbêjiyê nas kiriye. Ew ji dîwanên ku di mala wan da pêk dihatin fêrî muzîk, stran, çand û dîroka kurdî bûye. Wê bi wan dîwanan perwerdeyeke baş wergirtiye. Eyşe Şan li Amedê di civatên jinan da kilamên kurdan ên navdar û îlahî digotin.

Eyşe Şan bi daxwaza bavê xwe, lê bêyî dilê xwe zewicîye. Ji ber vê yekê piştî demeke kurt ji mêrê xwe veqetiyaye. Ew piştî hevberdanê çûye Entabê. Wê li Radyoya Entabê plakek ku ji stranên kurdî û tirkî pêk tê amade kiriye. Eyşe Şan di sala 1963an da çûye Stenbolê û li wir konser dane. Wê di wan konseran da stranên bi kurdî û tirkî gotine. Eyşe Şan piştî du kasetên ku bi piranî bi tirkî bûn kasetên bi

<sup>69</sup> Öztürk, 2012, h.g. r. 116.

<sup>70</sup> Melahat Uluç, "Meryem Xan û Temaya Hizinê Di Kilamên Wê da" Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Kultura Kurdî. Teza Masterê ya çapnebûyî, 2021. r.22-31

<sup>71</sup> Rojda Zaman, "Bir Direniş Hikayesi: dangbêj ve Stranbêj Olarak Eyşe Şan" Zanîngeha İstanbul Bilgiyê, Enstituya Zanistên Civakî, Teza Masterê ya Çapnebûyî, 2019. r. 42.

kurdî jî çêkirine. Ew bi stranên wekî *Lê Lê Ximşê, Lorke, Siverek Yollarında û Gurbette* navdar bûye. Wê di sala 1972an da li Almanyayê wekî keseka nefikirî jîyana xwe domandîye û piştî ku keça wê ya du salî Şehnaz wefat kiriye gelek zehmetî kişandine. Wê di vê serdemê da strana xwe ya navdar *Qederê* çêkiriye. Eyşe Şan di 1979an da çûye Bexdayê û li Radyoya Bexdayê bi kurdî stranên xwe gotine. Ew li wir bi navê Eyşana Elî hatîye nasîn. Paşê dîsa vegeŕiyaye Tirkîyeyê û li Îzmirê bi zarokên xwe re maye. Eyşe Şan, stranên bi erebî û farisî jî gotine. Ew, bi hunermendên weke Nuri Sesigüzel, Ali Ekber Çiçek û Orhan Gencebay re jî derketiye ser dikê. Hemû xizmên Eyşe Şan û malbata wê ji ber ku stranan gotiye, gazin jê kirine û gefa kuştinê lê kirine. Ew ji ber vê yekê qet nikaribûye vegere Amedê. Diya wê tenê lê xwedîtî kiriye lê ji ber gefan dema ku diya wê li ber mirinê bûye jî nikaribûye biçe wê bibîne. Heta nehêştine ku biçe gora diya xwe jî ziyaret bike. Eyşe Şan li ser vê êşê kilama bi navê *Heywax Dayê* çêkiriye. Eyşe Şan di Berfanbara 1996an da li Îzmirê ji nexweşîya penceşêrê rehmet kiriye. Xizmên wê nehêştine ku wesîyeta wê bi cih were û destûr nedan ku cenazeya wê li Amedê were veşartin.<sup>72</sup>

**Îran Mucered (Îran Xan):** Di sala 1950-51ê da li herêma Biradost, li gundê Înkesû ya li bajarê Urmîyeyê yê Rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. Malbata wê cotkar e. Îran Xanim bi kesek bi navê Seîd re dizewice û li gundek bi navê Somanava bicih dibe. Ji zaroktîya wê da meyla wê li ser denbêjîyê hebûye. Piştî ku ew bi dengbêjîya xwe navdar dibe navê Îran Xanim bikar tîne. Hevjînê wê jî piştgirî dide hunera wê.<sup>73</sup>

Radyoya Urmîyeyê, Tehranê û Kirmanşanê di sala 1979an da dest bi weşana kurdî dikin. Ev weşan bi zaravayê kurmancî ne. Weşana wan heftê niv saet e. hunermendên weke Birê (Xalê Birê/İbrahîm Newrozî), Mistefa Elîzade û Hemîd Yûsif li wir dixebitîn û ew pêşniyar dikin ku Îran Xanim were û li wir weke hunermend cih bigire. Îran Xanim ligel ku di temenekî ciwan da bû jî li seranserê herêmê weke dengbêj navdar bûbû. Ew di sala 1971ê da bi awayekî fermî li Radyoya Urmîyeyê dest bi karê dengbêjîyê dike û bi awayekî profesyonel karê wê yê hunerê dest pê dike. Ew heta sala 1979an heftê du rojan ji gundê xwe tê bajarê Urmîyeyê û li radyoyê stranên xwe dibêje. Wê di radyoyê da bêhtirî 200 stranî tomar kirine. Îran

<sup>72</sup>Öztürk, 2012, h.g. r. 120-124.

<sup>73</sup> Yaş, b.n.b. (c.2) r. 77-78.

Xanim di dema xwe da dengbêja tekane ye ku li Rojhilatê bi zaravayê kurmançî straye û deng daye. Ew xwedîyê dengê zelal û şîyaneke dengbêjîya xurt bûye. Bi saya serkeftina xwe ya li radyoyê dengê xwe di nav hemû kurdan da belav kiriye. Naveroka stran û kilamên wê bi giştî li ser pirsgirêkên civakî û neteweyî ne û herweha folklorîk in jî. Stranên ku wê bi xwe jî afirandine hene.

Îran Xanim piştî ku mêrê wê careke din dizewice ji wî diqete û vedigere ba malbata xwe. Ew piştî demekê bi Dadaş Nasirî ra dizewice û li Tehranê bicih dibe. Piştî sê salan ew li bajarê Dîlemanê (Selams) bi hevjinê xwe re dikanekê vedike û 15 salan li wir dimînin. Paşê cardin vedigerin Urmîyeyê. Piştî ku Xumeynî dibe desthilatdar li hemberî stranbêjan, bi taybetî jî li hemberî ên jin pêşî tê girtin. Ji ber vê yekê Îran Xanim nikare bi awayeke aşkera hunera xwe îcra bike lê bi awayeke veşartî karê xwe didomîne. Di vê navberê da ew beşekê ji stranên xwe dişîne Tirkîyeyê û li wir dide çapkirin. Îran Xanim di sala 2001ê da li Urmîyeyê di encama xwekuştinê da jîyana xwe ji dest daye. Li gor hin îddîayan mirina wê bi destê kurê mêrê wê bûye lê îddîa bi awayeke resmî nehatiye pesendkirin. Îran Xanim 31 salan dengbêjî kiriye û arşîveke mezin li dû xwe hêştiye. Arşîva wê ya li Radyoya Urmîyeyê wenda ye. Kopyayên kasetên wê hatine parastin û gihîştine roja me. Navê çend stranên wê ev in: Arifo Lawo, Bajo Emrê Min, Bavê Lalo, Delal Ez Bi Heyran, Delal Lo, Delalê Malê, Dilê Min Loy Loy, Domam û Pismam, Filîtê Quto, Hedo Rabe, Kurê Xelkêyo, Lê Lê Yemman (Domamê) Şerê Cezo, Salih Begê, Yar Gewrê.<sup>74</sup>

**Elmas Xan (Elmas Mihemed):** Elmas Xan di sala 1894an da li gundekî Şirnexê jidayik bûye. Elmas Xan bi navê Elmas Kurdî û Dayika Hunera Kurdî jî tê nasîn. Ew dotmama Meyrem Xan e. Dewleta Osmanî di sala 1915an da weke gelek binemalan malbata wê jî nefiyê Zaxoyê kirin. Wê demê Başûr di bin desthilatîya îngilîzan bû. Weke gelek denbêjan meyla hunerê ji zaroktîya wê da dest pê dike. Elmas Xan yekem hunermenda kurd e ku bi zaravayê kurmançî stranên xwe qeyd kirine. Wê di nav salên 1926-1928an da li kompanîya “Pholyphon Bexda” stranên xwe yê bi navê Hey Lo Delal, Dayê Rebenê, Qulungo, Teyrê Spî Me, Xelîlê Xazî û gelekên din tomar kirine. Elmas Xan, bi kesekî îngilîz ra dizewice û li Bexdayê bi

---

<sup>74</sup> Yaş, h.g. r. 14-49.

cih dibe. Keçeka wan bi navê Hesîbe çêdibe. Piştî ku karê hevjinê wê li Iraqê diqede dixwaze ku Elmas Xan jî bi wî re biçê welatê wî lê Elmas Xan vê yekê qebûl nake.<sup>75</sup>

Îmkanên wê yên maddî jî gelekî baş bûne. Kîjan dengbêj wê çaxê çûbe Bexdayê teqez li mala Elmas Xan maye. Kilamên wê yên duqolî hene. Wê ev stranan bi Nesrîn Şêrwan û Meryem Xan ra gotine.<sup>76</sup> Elmas Xan di Radyoya Bexdayê da ji xeynî strangotinê bêjerî û rêveberiyê jî kiriye. Wê bi dotmama xwe Meyrem Xan re gelek xebatan kirine. Karê wan ê li Radyoya Bexdayê û berhevkirina stranên kurdî ji vana hinek in. Ji stranên ku berhev kirine “Qumrikê Sêva Ticara” û “Gulşenî” bi Meyrem Xanê ra dibêje û “Lê Lê Emo” jî bi Seîd Axayê Cizîrî û Hesen Cizîrî ra duqolî distirên. Bi saya karê wê yê li Radyoya Bexdayê têkiliyeke wê ya baş bi gelek hunermend û rewşenbîrên wê demrê re çêdibe. Elmas Xan herî dawî di sala 1945an da li companîya Colombis Bexdayê strana xwe ya bi navê “Gulşenî” tomar dike. Ew 24 salan li Radyoya Bexdayê dixebite û gelek dengbêj û hunermend bi saya wê dengê xwe tomar dikin. Elmas Xan ji sala 1957an pêda êdî di radyoyê da stranan nabêje û tenê di şevbuhêrkên dost û hevalan da distrê. Elmas Xan di sala 1974an da li Bexdayê wefat dike. wê li dû xwe gelek stranên tomakirî weke mîras ji gelê kurd ra hêştine.<sup>77</sup>

**Dayika Cemal (Şêrîn):** Dayika Cemal di sala 1908an da li Silêmanîyê jidayik bûye. Ew bi eslê xwe ji Kurdên Cihû yên bajarê Silêmanîyê ye. Navê bavê wê Îbrahîm Yaqûb e. Malbata wê ji Silêmanîyê koçî Helepçeyê dike, piştê ji wir jî diçin Bexdayê. Navê wê yê rastîn Ferhe Behîce ye. Ji ber ku ew jineke xweşik û lihevhatî bûye û xwedîyê mîhrîbaniyeke berbiçav bûye navê Şêrîn û Dayika Cemal (Dayika Xweşikbûnê) lê hatiye kirin. Wê di dawet û şahîyan da stran gotine. Di sala 1925an de bi navê Dayika Cemal, li şirketa pîlak/qawanan a Beyzafon, Odyon çend stran û meqamên kurdî ên navdar bi dengê wê tên tomakirin. Dayika Cemal, di navbera salên 1925-1926an da çar plakan tomar dike ku wê çaxê emrê wê 22-23 sal in. Stranên ku wê li ser pîlaqan tomar kirine ev in: Wetanê Min Kurdistan e, Rohî Şîrîn, Sewze Mero(Şînkahî Neçe), Derdek'im Girtûwe, 'Esl û Weslê'm Silêmanî, Hey Bênin Bênin, Amîn û Amîn, Gwêgirin Refîqan(Bibîhîzin Dostan).

---

<sup>75</sup> Yaş, b. n. b. (c.1.) r. 99.

<sup>76</sup> Hevdîtina me ya bi Mahmut Beğik ra.

<sup>77</sup> Yaş, h.b. (c.1.) r. 100-101.

Dayika Cemal, yekemîn jina kurd e ku bi kurdîya soranî stran li ser sêlikan/plak tomar kirine. Ew di nav gel da pir hatiye hezkirin lê nayê zanîn ku çima dev ji karê dengbêjîyê berda ye. Hin stranên Dayika Cemal ku di arşîva Radyoya Bexdayê da ne jî ev in: Hey Belar û Belar, Hey Axa û Axa, Hey Gul Hey Gul, Xanimî Silêmanî, Şalîston, Lew Male Hate Der, Ey Awêney Dilber, Nesrîn e Gul Nesrîn e, Nabye Biçînî Nabye, Emîn Dekem Medihî Şêrî Cîhanman, Wesêet Bê Eger Mirdim, Çaw Mest, Amînê Taqaney Daye. Dayika Cemal, di sala 1979an da li Bexdayê wefat kiriye û li goristana Şêx Me'rûf hatîye veşartin.<sup>78</sup>

**Dengbêj Gazin (Raziye Kızıl):** Dengbêj Gazin di sala 1955an da hatiye dinê. Ew li Tetwanê li qezaya Sorpê/Mila Dêrê (Reşadiye) li gundê çûrşên (önsis/yaslıca) ji dayik bûye. Navê bavê wê Talib, navê diya wê Eqlîma ye.<sup>79</sup> Bavê wê ji 'eşîra Cango ye. Ew ji Xorasanê hatine wir. Gazin qet neçûye dibistanê lê ew bi hewldanên xwe hînî xwendin û nivîsînê bûye. Gazin di çardeh saliya xwe da hatiye zewicandin. Piştî ku ew zewicîye çûye Wanê. Pênc zarokên wê hene. Çar keçik in, yek jî kur e. Dema ku ew li gund bû bavê wê strangotinê jê re qedexe kiribû lê wê jî di dawetan da li ba jinan, li çiyayan û civînên jinan stran gotine. Piştî ku zewicî jî hevserê wê ji bo xebatên wê yên dengbêjîyê piştgirîyê dayê. Gazin ji bo xebatên dengbêjîyê çûye Stenbolê û li wir çend kasetan derxistine lê ji ber zextên civakî vê yekê ji kesên derdora xwe bi qasî heft salan veşartiye.<sup>80</sup>

Gazin ji bo ku jin bi serbestî dengbêjîyê bikin û ji bo berdewamiya çanda dengbêjîyê di 2011an da Komeleya Dengbêjên Serhedê ava kiriye û li vir jinên dengbêj civandîye. Gazin komeleyê weke dibistanek bikar anîye û perwerdeya dengbêjîyê daye zarokên piçûk. Di Malbata Gazin da gelek dengbêj hene. Bavê wê, apê wê, birayê wê amojina wê û gelek xizmên wê jî dengbêj in. Ew di nava vê çandê da ji zaroktiya xwe da hînî dengbêjîyê bûye. Gazin jî dengê xwe weha pênase kiriye: *Dengê min çiyayî û qulingî ye.*<sup>81</sup> Li gund di dawetan da hemû kes mecbûr bû ku bizanibûya kilaman bêje, Gazin jî bi çar pênc hevalên xwe re diçû dawetan, ku ji gundên derdorê kes bihatana dawetê ew bi keçikên wan re diketin lecê. Albumên wê ev in: *Domamê Domamê, Sînanê Krîv, Evdalê Zeynikê, Xelîlê Xazî, Gewra Min, Xalê*

<sup>78</sup> Zeyneb Yaş, "Bi Zarê Jinekê Cara Ewil Stranên Bi Soranî Li Ser Pilaqan: Dayikî Cemal", *Dilop*, j.7, Stenbol, 2019, r. 46-48.

<sup>79</sup> Leyla Mîhrînaz Engin, "Dengbêj Gazin ve Göç" *Kürt Tarihi*, J, 26, 2016, r. 44.

<sup>80</sup> Öztürk, 2012, h.g. r. 149-155.

<sup>81</sup> Leyla Mîhrînaz Engin, h.g. r. 45.

*Cemil, Meyremê, Mûşa Şewitî û Kilamên Serhedî*. Gazin bi birayê xwe, Aşiq Leylî û Dengbêjên Komeleya Jinên Hunermend û Dengbêj re jî albumên hevpar amade kirine.<sup>82</sup> Gazin di albumên xwe da hem stranên gelerî gotiye hem jî stranên ku wê honandiye gotiye. Ew weke berhevkarê tevgeriyayê û stranên ku ji nava gel berhev kirine qeyd kirine. Teyib û kasetên wê ji bo qeydê her dem amade bûne. Dema ku gotinek an helbestekê bihata bîra wê derhal qeyd dikir.

Gazin li Radyoya Erîvanê pir guhdarî kiriyê û ev radyo gelek karîgeriyê lê kiriyê. Ji ber vê yekê dema ku ew ji bo konserê çûye Erîvanê xwestiye ku cihê ku qeydên Radyoya Erîvanê hatine çêkirin bibîne.<sup>83</sup> Gazin li derveyê welêt jî hatiye nasîn û hin konseran dane. Ji vana ya herî girîng projeya Ji Wanê Heta Yerîvanê ye (Vandan Erîvana). Ev proje di çarçoveya bernameya Normalkirina Têkilîyên Tirkîye û Ermenistanê da pêk hatiye. Yekîtiya Ewropayê jî piştgirî daye vê bernameyê. Gazin û Aşiq Leylî ji bo vê projeyê li Tirkîyeyê û Ermenistanê sê konseran dane.<sup>84</sup> Gazin di tebaxa sala 2018an da li Wanê ji ber nexweşiya mêjî (beyin kanamasî) çûye rehma xwedê.

**Banû Şîrwanî (Mah Banû):** Banû Şîrwanî di sala 1926an da li gundê Welî Awa yê li ser bajarê Qûçan, li parêzgeha Xorasanê jidayik bûye. Di zaroktiya wê da dêya wê wefat dike. Bavê wê Ebas Qulî wê xwedî dike. Dengê bavê wê gelek xweş bûye. Ew jenyarê (sazbend) quşme û neya heftbend bûye û di dîwana Melek Hisên Xan da cih digirt (pişikdarî dikir). Ebas Qulî Mah Banû jî bi xwe ra dibir van dîwan û şahîyan. Mah Banû bi saya van şahî û dîwanan muzîk û dengbêjiya kurdî baş nas kiriyê. Ew di deh salîya xwe da stranên ku fêr bûbû bi dutarjenê Melek Hisên Xan û neya bavê xwe pêşkêş dike. Ev yek rê li ber hunera wê vedike.

Banû Şîrwanî di bîst salîya xwe da bi Elî Ekber Qehremanlû re dizewice û keçeka wê çêdibe. Lê hevjinê wê piştî du salan wefat dike. Mah Banû piştî salek ji gundê xwe diçe bajarê Qûçanê û di sala 1956an da jî diçe bajarê Meşhedê. Di heman salê da diçe Radyoya Meşhedê. Di serdana wê ya yekem da bi serkeftî tê pêşwazîkirin û çend salan stranan li Radyoya Meşhedê tomar dike. Ji ber rewşa kurdan ya li rojhilat pêdivî nehatîye dîtin ku stranên wê werin belav kirin. ên ku

---

<sup>82</sup> Öztürk, 2012, h.g. r. 150-152.

<sup>83</sup> “Belgefilma Gazin”, Pel Tv, Dîroka Gihandinê: 08.02.2021.

[https://www.youtube.com/watch?v=agN\\_SLmsTHY](https://www.youtube.com/watch?v=agN_SLmsTHY)

<sup>84</sup> <https://armenia-turkey.net/tk/from-van-to-yerevan-concert-in-yerevan>

gihîştine roja me jî ji zardevê gel hatine veguhastin. Stranên wê ên tomarkirî didin xuyakirin ku ew di hunera dengbêjîyê da gelek şareza û bihêz bûye. Bi tenê 27 peste, lawik û heyranokên wê mane. Ji vana tenê 9 hebên wan ji aliyê kalîteya deng ve baş in. Ev berhemên tomarkirî bi tenê jî ji bo folklorê kurdên Xorasanê ên wê serdemê çavkanîyeke resen in. Banû Şîrwanî yekem jin e ku bi muzîkjen û hunermendên bi nav û deng ên Radyoya Meşhedê re hevkarîyê kiriye û arşîva stranên kurdî ên wê deverê dewlemend kiriye. Mah Banû di sala 2005an da li bajarê Meşhedê wefat kiriye.<sup>85</sup> Di lînkê di jêrenotê da mînakek ji stranên wê hatiye dayîn.<sup>86</sup>



---

<sup>85</sup> Koleksiyona hunermendan ya Enstituya Kelepûrên Kurdî.

<sup>86</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=DcxMOAyhRec>

# BEŞA YEKEM

## JÎYANA KURDÊN SOVYETÊ

### 1.1. Dîroka Kurdên Kafkasyayê

Weke ku tê zanîn kurd ji ber sebebên cur bi cûr li welatên cuda belav bûne. Ji parzemîna Asyayê heta Ewrûpayê hema bêje li her welatek hejmareke kurd kêr zêde heye. Li Kafkasyayê jî kurd xwedî hejmarek mezin bûne. Dîroka kurdên Kafkasyayê digihîje heta dewleta Şedadîyan.

“Di sedsala 10an heya sedsala 13an herema ku di navbera çemê Kura û çemê Erez da dima di bin hukumdarîya Şedadîyan da bû, ev cara ewilîn bû refên qebîleyên kurdan ber bi Kafkasyayê aqincî dibûn.”<sup>87</sup>

Dewleta Şedadîyan di avadarî û cotkarîyê da navdar bûn, wan bajarê Anîyê ava kirine û li ser çemê Erezê pira Xudaferînê çêkirine. Piştî têkçûna Şedadîyan kurd li wir weke dewlet nebûn desthilat lê di bin desthilatiya dewletên din da li wir jîyana xwe domandine û di wan dewletan da bûne xwedî hêzeke siyasî. Mînak di dewleta Gurciyan da du serekên kurdan Îvanê Çepildirêj û Zekarê Çepildirêj xwedî hêzeke siyasî bûn.<sup>88</sup>

Di van salên dawî de ji ber lêkolînên derbarê kurdan de zêde dibin, di derheqê dîroka kurdan de agahîyên nû dertên holê. Dîroknasên gurcî didin zanîn ku di sedsala 10an de kurd li vê herêmê hikûmeteke bi navê Rewadî ava kirine. Tê zanîn ku Selaheddîn Eyyûbî bi xwe jî kurdekî ji eşîra rewadiyan e. Piştî Rewadiyan li vê deverê meriv dikare behsa çend hikûmetên kurdan yêrî din jî bike. Deylemî û Mîhranî ji van hikûmetan du heb in. Tê zanîn ku di destxeta ermenî ya bi navê Matenadaran de beşek kurdî ya di derbarê van kurdan de heye.<sup>89</sup>

<sup>87</sup> Ömer Orhan, “Temayên Bingehîn Ên Poetikaya Şikoyê Hesên” Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstituya Zimanên Zindî, Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, 2020, r.25.

<sup>88</sup> Sedat Ulugana, “Kurdolojiya Sovyetê û Kronolojiya Edebiyata Wê Ya Kurdî (1922-1991)” *Wêje û Rexne*, j. 9/10, 2017, r. 37.

<sup>89</sup> Ulugana, h.g. r. 37.

Ji van agahiyan em dibînin ku dîroka niştecihbûna kurdan li Kafkasyayê digihîje demên gelek kevn. Gelek kurd wê demê koçî Gurcistanê kirin lê bi demê ra di nav gelê gurcî da heliyan.<sup>90</sup>

Dema ku em li serdemên nêzîktir dinihêrin ji ber şerên navxweyî û şerên dewletên desthilatdar, kurd weke koçber mecbûr mane ku biçin Kafkasyayê. Di sedsalên 18 û 19an da kurd dîsa weke koçber berê xwe dan Kafkasyayê.

... Di dawîya 1820an de, wekî encama şerên rûs-tirk û rûs-farisan, Transkafkasyaya ku Gurcistan, Ermenistana Rojhilat û Azerbaycana Bakûr vedihewand, bi awayekî mayînde beşeke Împeratoriya Rûsyayê pêk anî. Ji wê demê pêve Transkafkasya bû parçeyeke jênegar ya Împeratoriya Rûsyayê... Di dema desthilatiya Nadir Şah de (1736-1747) hinek kurd li sînorên Îranê yên bakûr û rojhilat-bakûrê ji nû ve hatine bicihkirin. Bi taybetî ji bo parastina sînorê Îranê rojhilata bakûr li wîlayeta Xorasanê. Yên din li ser sînoran man ku hîn nû di navbera Îran û Împeratoriya Rûsyayê de hatibûn avakirin, yanê li ser xaka Tirkmenistanê; li wir nêzîkî 3000,000 kes hebûn. Piraniyeke zêde ya kurdên Tirkmenistanê dûçarê pêvajoya asîmilasyonê bûn.<sup>91</sup>

Tosinê Reşîd jî li ser mijarê weha nivîsîye:

Yekem pêla koçberên kurda berbi Pişkavkazê, ku heta îro jî nifşên wan mane, ew 24 eşîrên kurdan bûn, ku sedsalîya XVI şahê Îranê Ebbas I, ji bo parastina tixûbê împêratorîya xwe, yê bakûr-rojava, ji rojhilata Kurdistanî anîn û li deverekê bi cîh kirin, ku beşê wê deverêyî mezin îro dikeve nav Azerbacanê (Kurdistana Sor), beşek jî dikeve nav Ermenistanê (Derelegeza berê) Çend eşîrên kurdên musulman di dawîya sedsalîya XVII ji deverên Rihayê û Maraşê koçî başûra Gurcistanê dikin û li deverên Mêsxêt û Acar bi cîh dibin.<sup>92</sup>

<sup>90</sup> Tosinê Reşîd, "Kurdên Yekîtiya Sovyetê: Berê û Niha", *Birnebûn*, j.42, Stockholm, 2009, r. 13.

<sup>91</sup> Xanna Omerxalî, "Li dewletên Sovyeta Berê Kurd Bi Perspektîfa Dîrokî û Çandî", *wêje û rexne*, j.9/10, 2017, r. 24.

<sup>92</sup> Tosinê Reşîd, h.g. r. 13.

Kurdên êzîdî li dewleta Osmanî rastî gelek zextan dihatin. Wan jî ji ber van zextan di sedsala 18an da (di sala 1770an da) tevî 4.000 malbat koçî Gurcistanê kirin û li bajarê Tilbîsê bicih bûn. Lê koçberîya kurdan bi girseyî berbi Pişkavkazê ji sedsala XIXan dest pê dîke.<sup>93</sup>

Piştî cengên Rûsîya-Pêrsîya (1804-1813 û 1826-1828) û bi taybetî piştî peymana Turkmênçayê (1828), mafên taybetî ji bo kurdan û ermenîyan, wekî bikaribin koçî deverên împêratorîya Rûsîya bikin, hatin misoger kirin. Êdî sala 1807an 600 malbetên kurd li Qerebaxê bi cîh dibin... piranîya kurdên êzîdî piştî cenga Qirimê (1853-1855) û cenga Rûsîya-Osmanîya (1877-1878) koçî Ermenistana îroyîn kirine. Di wê navberê de, sala 1874an du eşîrên êzîdîya 'Rojkî' û 'Sîpkî' koçî parêstgeha Qersê dikin, ku wê demê bin destê rûsan de bû... Salên Cenga Cihanîyê ya Yekem hema bêjî êzîdîyên Serhedê gişk (ji wan êzîdîyan re Zozanî jî dibêjin) revîne Ermenistana îroyîn û parek jî ji wir derbasî Gurcistanê bûn.<sup>94</sup>

Weke ku li jorê hat dîyarkirin kurdên ku koçî Kafkasyayê kirine herî zêde li sê welatan bicih bûne. Ev jî Azerbaycan, Gurcistan û Ermenistan in. Kurd di salên 1937-1938 û 1943-1944an da ji alîyê dewleta Sovyetê ve cardin hatin nefîkirin û vê carê jî li cihên weke Ozbekistan, Qazaxistan û Qirgizistanê jî belav bûn.<sup>95</sup> Eskerê Boyik rewşa kurdan a wan salan û nefîkirinên serdema Stalin weha tîne ziman:

“Civaka kurd ji rûyê wê zulmê derbne mezin sitendin. Kurdên Naxîcêvanê yê komara Azerbaycanê (1937), kurdên Gurcistanê (1944), hinek jî yê Ermenistanê nefî kirin Komarên Asyaya Navîn û Qazaxistanê. Ji surr, sarmê birçîbûn û nexweşîyan gelek rêda qirr bûn. Wan salan girtîgeh tije girtî bûbûn. Gelek hatin gulekirin, bê ser berate unda bûn. Di şerê cîhanê yê duyem da gelek kurd di artêşa rûs da çûn şer û pîrî ji wan venegerîyan.<sup>96</sup>

<sup>93</sup> Tosinê Reşîd, h.g. r. 13-14.

<sup>94</sup> Tosinê Reşîd, h.g. r. 14.

<sup>95</sup> İsmet konak, “Sovyet Kürtlerinin 1937-1938 Sürgünü” *Kürt Tarihi*, j. 4. 2013, r.22-23.

<sup>96</sup> Eskerê Boyik, *Çanda Kurdên Sovyetê*, Deng, Stenbol, 2012, r. 16.

## 1.2. Li Sovyetê Rewşa Kurdan ya Siyasî

Weke ku li jor jî hat diyarkirin dîroka kurdan li Kafkasyayê gelek kevn e. Tekoşîna daxwaza mafên wan jî bi qasî koçkirina wan kevn e lê em ê di vê binbeşê da tenê behsa hewldanên wan ên ji destpêka damezirandina Sovyetê heta roja me bikin. Kurd ji aliyê siyasî ve li Kafkasyayê xwedîyê dîrokeke trajîk in. Di her serdemê da rastî nefîkrin, asîmîlasyon û zextên curbicur hatine. Li hember van zehmetîyan dema ku behsa kurdên Sovyetê tê kirin fikreke wisa bi mirov re çêdibe ku Sovyetê ji dilê xwe hin mafan daye kurdan û kurdan qet ji bo van mafan tekoşîn nekirine. Li dewleta Sovyetê statuya kurdan di çarçoveya “hiqûqa mafên kêmetewan” da bû û li gor vê hiqûqê rewşa wan a siyasî diyar dibû.<sup>97</sup> Hemû çavkanî di heman fikrê da ne ku Dewleta Sovyetê kurdan ji bo berjewendîyên xwe yê siyasî bikar anîye.

Kurdan li meclîsên dewletên ku bi Sovyetê ve giradayî bûn weke parlementer cih girtin û li deverên ku kurd lê dijîyan di rêveberîyên herêmî da peywîrên girîng bi dest xistine. Piştî damezirandina komara Ermenistanê, li perlementoya Ermenistanê ji bo kurdan jî cihekî hat dayîn. Serekê ‘eşîra Hesenîya Ûsiv Beg li parlamentoyê kurdan temsîl kir. Wî perwerdeyek baş dîtiye, êzîdî û ermenîyan li gel wî rêzeke baş digirtin. Di sala 1918an da dema ku koçberên êzîdî hatin Ermenistanê Ûsiv Beg di bicihkirina wan da roleke mezin lîst.<sup>98</sup> Ûsiv Beg berpirsiyarê hemû êzîdîyên Rûsyayê bû.<sup>99</sup>

Kesên ku di radyo û rojnameyê da xebitîne û xebatên kurdzanîyê kirine pirî ji wan weke siyasetmedar jî peywîran girtine ser xwe û kurdan di siyasetê da jî temsîl kirine. Hin kes jî ne tenê di nav kurdan da di hemû Sovyetê da navdar bûbûn. Mînak: Fêrikê Egît Polatbekov. Ew li Rusyayê beşdarî Şoreşa Oktiyabrê bûye û endamê hikûmeta Sîbîryayê bû. Ew di heman demê da şair bû jî. Çîngîz Îldîzm wezîrekî hikûmeta Azerbaycanê bû û di nameyên xwe da navê bi “Kurd Çîngîz Îldîzm” kurdûna xwe eşkere dikir da ku wî weke Azerî nehesibînin. Çîngîz Îldîzm wezîrê Sovyeta berê ê yekem bû ku bi awayeke resmî çûbû Emerikayê. Kesên weke Şemo Têmûrov, Cerdoyê Gêncî, Nadoyê Xido Maxmûdov, Semend Siyabendov, Mîroyê

---

<sup>97</sup> Ali Ağcakulu “Ortadoğu’da Kürtçe Radyo Yayınları: Erivan Radyosu Örneği (1955-1990)”, Zanîngeha Marmarayê, Enstituya Lêkolînên Rojhilata Navîn, Beşa Dîroka Siyasî, Teza Masterê, 2012, r. 60.

<sup>98</sup> Omerxalî, h.g. r.27.

<sup>99</sup> Boyik, h.b. r.180.

Esed, Xalit Çetoyev, Egîte Meto, Avdantîlê Fetî, Sîsa Huseyn, Tîtalê Efo, Salihê Bekir bi siyasetê re eleqedar bûn û ji parlementerîyê heta serokatiya navçeyan peywirên cuda girtin ser xwe.<sup>100</sup>

Di vê rewşê da her çiqas kurdan li Dewleta Sovyetê gelek destkeftinên çandî bidest xistibin jî ji alîyê mafên siyasî ve rewşa wan tu car saxlem nebûye. Di vê mijarê da mînakê herî berbiçav damezirandina Kurdistana Sor e.

Kurdistana Sor di sala 1923an da li herêma Kelbecer, Qubatlî û Laçînê (Qerebaxa Çiyayî) hat damezirandin.<sup>101</sup> Moskovayê, vê otonomîyê bi sê armancên sereke ava kir: 1- Ji bo têgihîştina sosyalîst ku ev têgihîştin hêvîya azadîyê dide miletan (ji vir meqsed propagandaya komunizmê ye), 2- Ji bo feydeyên xwe yê rêveberîya xwe, 3- Ji ber dengeyên siyasî ên navnetewî.<sup>102</sup> Paytexta eyaleta Kurdistanê weke Pîrcahan hate pejirandin û pişt re jî bajarê Laçîn li ser Abdallarê hate avakirin. Bolşevîkê Azerî Hûsnû Hacîyev weke serokê rêveberê a eyaleta Kurdistanê hate tayînkirin. Navçeyên Kariqışlak, Kalbajar (Kelbecar), Qubatlî, Kutirlî, Kurdhaci û Miradxanlı jî bi Kurdistanê ve hatin giredan. Li gor çavkanîyên wê demê bi giştî li Azerbaycanê 41 hezar kurd dijîyan. Ji wan kesan 37.182 kurd li eyaleta Kurdistanê dijîyan. Kurdên li Kurdistana Kafkasyayê dijîyan ji %72.3 nûfusa herêmê pêk dianîn. Niştecihên Karqışlak, Kalbajar, Kutirlî, Kurd Hacî û Miradxanlı ji rêjeya sedî 99 ji kurdan pêk dihat.<sup>103</sup>

Azerbaycan û Ermenistan ji bo herêma ku Kurdistana Sor lê ava bûbû di nav şer de bûn. Otonomiya Kurdistana Sor di nav her du dewletan da bû herêmeke tampon û her tim alozî derdiketin. Ev otonomi di 1929an da bi gilîyên Azarbaycanê ji alîyê Moskovayê ve hate hilweşandin.<sup>104</sup> Di sala 1929an da Kelbecer, Laçîn, Gubedlî û Zengelan ku ev herêm ji Qezaya Kurdistanê pêk tîn bi herêma Qerebaxê ve hatin girêdan. Piştî demeke kurt, ev bajarên Kurdistana Sor bi biryara hikûmeta Azerbaycanê, di 25ê gulana 1930î de ji Qerebaxê hatin hildan û cardin wekî Rêveberîya Kurdistanê hatin rêkxistin. Navenda rêveberîyê ji nû ve bû Laçîn. Pareke bajarê Cebraîlê jî bi rêveberîya Kurdistanê ve hate girêdan, hidûdê reveberîya

<sup>100</sup> Wezîrê Eşo, *Kilam û Pênus*, Lîs, 2018, r. 53-54.

<sup>101</sup> Ulugana, h.g. r.52.

<sup>102</sup> Şamîl, h.b. r. 46-47.

<sup>103</sup> Nofâl Shriniov, "Folklorê Kurdên Azerbaycanê" Zaningeha Mêrdîn Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî, Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, 2017, r.21.

<sup>104</sup> Ulugana, h.g. r.52.

Kurdistanê firehtir bû. Ev rêveberîya ku 75 rojan dom kir jî di 23ê tirmeha 1930î da bi biryareke Yekîtîya Komarên Sovyetê ên Sosyalîst (YKSS) û hikûmeta Azerbeycanê ve ji holê hate rakirin.<sup>105</sup>

Gerek bê gotin, wekî otonomîya Kurdistana Sor ne bi dilê ermenîya, ne jî yê azarîya bû. Ermenî li dij bûn, ji ber ku ne dixwestin navbera Ermenistan û Qerabaxê de otonomîya kurdan hebe, azarî jî wê bawarîyê bûn, wekî beşeke axa wan dane kurdan. Çiqas jî Kurdistana Sor wek devereke otonom ji sala 1930-î nema, lê dîsan jî hetanî sala 1938an li wê deverê çalakîyên çandî û perwerdeyî berdewam bûn. Navbera salên 1930-1938 an li dora 30 pirtûkên kurdî bi alfabe ya ser bingeha tîpên latînî çap dibin, li dibistanan zimanê kurdî dihat xwendin, ji sala 1931ê rojnama ‘Kurdistana Şorevî çap dibû. Di sala 1932an de ji bo amadekirina mamostayên zimanê kurdî, beşa kurdî li kolêja Perwerdeyê ya bajarê Şûşî tê vekirin. Lê wê xweşîyê dirêj dom nekir, rêprêsiyayên rêjîma Stalîn, yê salên 1937-1938 bi hovîtkî nemirovane ji aliyê serokê Azerbacana Sovyêtîyê, Mîrcefer Bagîrov de dijî kurdan hatin bi kêr anîn. Dibistanên kurdî, beşa kurdî ya kolêja Perwerdeyê hatin girtin, çapkirina pirtûkên kurdî hat rawestandin, bi hezaran kurd di nav wan de gelek ronakbir, welatperwer û kesên navdar, bi tawanên bê bingeh hatin zîndan kirin, nefa kirin û kuştin... Ji sala 1938an karbidestên Azerbacanê bi hovîtkî nebînayî dijî kurdan sîyaseta bişkavtin, asîmîlekirinê bi rê ve birin. Heta peyva ‘kurd’ hat qedexe kirin. Armanca vê sîyasetê bi tam asîmîlekirina kurdan bû... jimara kurdên Azerbacanê di sala 1926an de 41.193 bû û di sala 1959an de dakete 1.482<sup>106</sup>

Piştî belavbûna Sovyetê di navbera Ermenistan û Azerbaycanê da şer derket. Di vî şerî da nezikî sed hezar kurd hatin kuştin, yê mayî ji aliyê her du dewletan ve hatin nefikirin. Piştî van bûyeran kurdan ji bo parastina mafên xwe yê netewî rêxistina “Yekbûn”ê ava kirin. Armanca vê rêxistinê ji nû ve avakirina Kurdistana Sor bû. Rewşenbîrên weke Memed Babayev û Kinyazê Îbrahîm ji bo vê armancê ketin nava hewldanan lê bi ser neketin.<sup>107</sup>

Dema ku ermenîyan Qerebaxê dagir kir, bi awayekî lezgîn “Otonomîya Kurdistana Sor”, ji raya giştî ya cîhanê re eşkere kirin. Vakîl Mûstafayev û çend kurdên din ji Êrîvanê anîn Qerebaxê û bi devê wan

---

<sup>105</sup> Şamîl, h.b. r. 53.

<sup>106</sup> Reşîd, h.g. r.15-16.

<sup>107</sup> Ulugana, h.g. r.52.

deklarasyonek weşandin. Lê li vir şaşitîyeke trajîkomîk hebû; roja ku deklarasyon hate xwendin, di Qerebaxê de ji bilî Mûstafayev û hevalên wî tu kurdek nemabû. Piştî vê pêvajoyê hem rewşenbîrên kurd ên Ermenistanê û hem jî yên Azerbaycanê ji bo statuya kurdan dikevin nav têkilîyên siyasî. Ermenistan, li dijî kurdan polîtîkayeke qirêj dimeşîne û kurdên misilman û yên êzîdî berdide pêsîra hev. Sehîdê Îbo (yê nivîskarê romana bi navê *Kurdê Rêwî*) hemberî vê polîtîkaya qirêj derdikeve û ji bo yekîtiya kurdan xebatan dimeşîne. Îbo ji ber van xebatên xwe ji aliyê hêzên tarî ve di sala 1991ê de li Êrîvanê tê kuştin. Di sala 1995an de jî, li Bakûyê Bînbaşîyê kurd yê bi navê Manaf Hesenov ji aliyê îstixbarata azerîyan ve hat kuştin. Tawana Hesenov, karên wî yên kurdolojîyê bûn.<sup>108</sup>

### 1.3. Pêşketina Çanda Kurdan li Sovyetê

Dewleta Sovyetê ji ber sebebên siyasî giringiyek mezin daye milletên li welatê xwe. Bi taybetî jî eleqeyek mezin nîşanê kurdan daye. Dewleta Sovyetê ji bo ku kurd xwe ji aliyê çandê ve pêşda bixin gelek derfetan dane wan. Kurdan jî bi van derfetan xwe gelek bi pêşda xistin. Ev pêşketin weke ronesansa kurdan hatiye binavkirin.<sup>109</sup> Eskerê Boyik, xebatên çandî û yên perwerdehîyê weke sê dewran dinirxîne.<sup>110</sup> Ez ê jî li gor vê tesnîfê hewl bidim ku pêşdaketina çandî ya kurdên Sovyetê binirxînim.

Ji pey damezirandina qeydê Sovyetê ra, çawa seva hemû gel û netewên wî welatî, wusa jî ji bo kurdan mecal û îmkanê pêşdaçûyîne çêbûn. Hema salên ewilîn da guhdariya mezin hate danîn li ser halê gelên şûndamayî, kêmnîyê, ji nav wan hildana nexwendîtiyê, hazirkirina kadrên milletiyê, pêşvaçûyîna medeniyet û rewşenbîriyê.<sup>111</sup>

---

<sup>108</sup> Ulugana, h.g. r.53.

<sup>109</sup> Eşo, h.b. r. 45-57.

<sup>110</sup> Boyik, h.b. r. 12.

<sup>111</sup> Boyik, h.b. r. 9.

Dîroka xebatên kurdnasîyê ya Rûsan heta sedsala 19an diçe. Balyozê Rûs Aleksandre Jaba bi rêya Mela Mehmûdê Bazidî belgeyên gelek giring li ser kurdan arşîv dike.<sup>112</sup> Piştî Jaba, xwendekara wî Margarîta Rûdenko jî hin xebatên giring dike lê xebatên li ser kurdî ên ji bo perwerdekirina kurdan ji salên 1920an dest pê dikin.<sup>113</sup> Li Ermenistanê yek ji pêşengên êzîdîyan Êsiv Beg bû ku li meclîsa Ermenistanê parlementer bû. Bi pêşengîya wî li bajarê Ermenistanê Gumrûyê cara yekem konferansekê ji bo êzîdîyan pêk hat. Serokatîya kongreyê Êsiv Beg û Hakop Xarazîyan kirin. Di konferansê da mijarên sereke ev bûn: Mafên êzîdîyên li Ermenistanê, pêşxistina rewşa êzîdîyan, pirsgrêkên koçberan ên civakî û aborî û perwerdeya êzîdîyan.<sup>114</sup> Ermenistan bûye navenda xebatên çandî lê li deverên din jî gelek xebat hatine kirin.<sup>115</sup> Xabata ewilîn li ser zimanê kurdî alfabeya Lazo (Hakop Xarazîyan) ye. Ev alfabe heta sala 1929an li dibistanan bû bingeha dersên kurdî.<sup>116</sup>

Hema ji destpêka damezirandina komara Ermenistana Sovyêtê (29.11.1920), serokatîya komarê biryar da ku li dibistanên gundên kurdan zimanê kurdî bê xwendin. Ji bo vî karî pêwîstî, pêdivîya alfabeke zimanê kurdan hebû. Di sala 1921ê de, Lazo (Hakob Xazaryan) ser bingeha tîpên ermenî alfabeya zimanê kurdî çêdike û havîna wê salê yekem pirtûka bi zimanê kurdî “Şems” çap dibe. Berê li sêwîxanan (berî gişkî ya Aştarakê), dû re jî di gundên kurdan de zaro bi vê pirtûkê fêrî xwendin û nivîsara zimanê kurdî dibin. Êdî sala 1921ê di 5 gundên kurdan de dibistanên kurdî tên vekirin.<sup>117</sup>

Kurdan li Ermenistanê mafên çandî yên dîyar bi dest xistin. Ew cara ewil bû ku dîyasporaya kurd li welatê sirgunê bûn xwedî radyo, perwerde û weşana bi zimanê xwe yê zikmakî.<sup>118</sup> Ji ber ku kurdên li Ermenistanê bi piranî êzîdî bûn van xebatan zêdetir bi destê kurdên êzîdî çêdibûn. Di dîne êzîdîtîyê da xwendin guneh bû loma xwendin û nivîsîn di nav wan da gelek kêmbû. Piştî alfabeya Lazo ya bi tîpên

<sup>112</sup> Erhan Çağlayan, “Rusya’da Kürdolojinin Gelişim” *Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, j.13, 2015, r. 324-325.

<sup>113</sup> Eskerê Boyik tîne ziman ku Împeratoriya Rûsyayê beriya damezirandina Sovyetê di nav salên 1900-1904an da jî sê heb dibistanên ku bi rûsî ders didin vekirîye. Ev dibistan perwerdeya seretayî dida lê ji ber bûyerên wan salan zû hatin girtin.

<sup>114</sup> Kamran Elend, *Kimliği Terennüm Etmek, Erivan Radyosu Kürtçe Yayını*, İletişim, 2021, r.57.

<sup>115</sup> Eskerê Boyik, h.b. r. 6.

<sup>116</sup> Burcu Özdemir, Ayna Askeroğlu Arslan, “Rusya’nın Kürdoloji Çalışmaları (1787-1947)”, *İnsan&İnsan*, j, 17, 2018, r. 204.

<sup>117</sup> Reşîd, h.g. r. 22.

<sup>118</sup> Omerxalî, h.g. r.29.

Ermenî ji bo hînkirina xwendin û nivîsînê alfabeyê bi tîpên latînî hate amadekirin. Di kongreya kurdî ya yekem (1925) da daxwaza amadekirina vê alfabeyê hate kirin<sup>119</sup> “Bi spartina hukumata komara Ermenistanê, di sala 1928an da Erebê Şemo û Îsahak Mêragûlov elfeba kurdî ya bi tîpên latînî damezirandin. Di heman salê da pirtûka *Xwe Bi Xwe Hînbûna Kurmancî* çap bû. Ev kitêba kurdî ya pêşîn e ku bi tîpên latînî çap bûye.<sup>120</sup> Piştî pirtûkên dersan hatin amade kirin û li gundên êzîdiyan dersên kurdî dest pê kirin.

ji sala 1930î ew alfabe di dibistanên kurdî de dihat bi kar anîn. Ji 31.03. 1930 rojnama ‘Rîya Teze’ bi wê alfabeyê tê weşandin. Sala 1931ê kolêja Pişkavkazêye Perwerdeyê, ya kurdî tê vekirin, ku ji bo dibistanên kurdî mamostan amade dikirin. Sala xwendinêye 1931/32 li Ermenistanê 27 dibistanên kurdî hebûn, di sala 1937an de jimara wan dibistanan digihîje 48 an. Ji sala 1929 an heta 1932an 21 pirtûkên dersan tên çap kirin. Di sala 1925an de Ermenistan dibe mazûvana kongira kurdên Pişkavkaz<sup>121</sup>

Dema ku van dibistanan nû vebûbûn di nav kurdan da kesên ku karibin dersan bidin pir kêr bûn lewre Ermenîyên kurdîxêv mamostetîyê dikirin. Hakob Hazaryanê ku weke Lazo di hate nasîn pêşengê van xebatan bû. Wî ne tenê li Ermenistanê, li Gurcistanê jî bi Ahmedê Mirazî û hin kesên din re pêşengiya vekirina dibistanan kir. Ligel Lazo û Ahmedê Mirazî di sêwîxaneyê da Elîxan Şakirov, Kamil Bedirxan û Nûrê Polatovayê jî ders didan.<sup>122</sup> Li bajarên weke Tilbîs, Têlav û Batumê jî ji bo zarokên kurd ên sêwî dibistan vebûn. Di navbera 1931-32an da li Ermenistanê jî nehan zêdetir pirtûk ji rûsî û ermenkî ji bo kurdî hatin wergerandin. Di heman demê da 40 heb dibistan hatin vekirin. Di van dibistanan da nêzî 70 mamosteyên kurdî û 2000 xwendekar hebûn. Ji bo mamosteyan enstîtuyek hat vekirin. Di Yekîtiya Nivîskarên Ermenî da beşek ji bo nivîskarên kurd jî hate vekirin. Yekem xebata wan a weşandî *Şivanê Kurmanca* ye. Van salan ji alîyê çandê va weke salên zêrîn tên binavkirin. Di sala 1934an da konferanseke ji bo nivîsandina bi kurdî û wêjeya kurdî hat lidarxistin.<sup>123</sup> Konferansa kurdî li Erîvanê pêk hat, di vê konferansê da mebest ew bû ku xebatên heta wê rojê hatine kirin werin standartîzekirin,

---

<sup>119</sup> Reşîd, h.g. r. 22.

<sup>120</sup> Boyik, h.b. r.13.

<sup>121</sup> Reşîd, h.g. r. 22.

<sup>122</sup> Eşo, h.b. r. 33.

<sup>123</sup> Omerxalî, h.g. r. 30.

afirandina zimanekî edebî yê kurdî û niqaşkirina pirsgirêkên kurdan ên li dewleta Sovyetê.<sup>124</sup> Mijarên ku di konferansê da hatine niqaşkirin ev in:

- 1- Têkilîyeke netewî û çandî di navbera kedkarên kurd û Şoreşa Octoberê da
- 2- Xebatên kurdî yên di Enstîtûya Çand û Dîrokê da
- 3- Têkilîya civatê û aboriya navbera kurdan bi xwe da û tesîra wê ya li ser zimên
- 4- Kêşeyên giştî yên zimanê kurdî
- 5- Îmlaya alfebeya kurdî ya latînî
- 6- Esasên Gramera Kurdî
- 7- Prensîbên çêkirina termînolojîya kurdî<sup>125</sup>

Piştî vê konferansê xebatên gelek giring tên kirin. Zimanê kurdî di zaningehan da dibe mijara xebatên zanistî. Ya herî giring jî ev e ku vê carê xebatên kurdî ji aliyê kurdan bi xwe ve tên meşandin û êdî kadroyeke ku bi xwe kurd e derdikeve holê. Li Sovyetê ji kadroyên kurdan yên ewilîn çend navên ku derketine pêş ev in: Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Qanatê Kurdo, Cerdoyê Gêncî, Wezîrê Nadîrî, Casîmê Celîl, Etarê Şero.<sup>126</sup>

Cudatiya serdema ewilîn ew e ku dewleta Sovyetê giringîyek mezin daye xwendin û perwerdekirina kêmetewan, bi taybetî jî daye kurdan. Pirsgirêk ew bû ku di nav kurdan da kesên ku hem xwende bin û hem jî bi kurdî baş zanibin tunebûn. Yê heyî jî çand û dîroka xwe nas nedikirin. Piraniya nivîsên wan hem ji aliyê ziman ve hem jî ji aliyê naverokê ve qels bûn. Lê ji bo pêşerojê hîmek baş hate avêtin û bi saya van xebatan kurd ji bo xwendin û pêşketinê amade bûn.<sup>127</sup>

Serdema duyem ji sala 1937an heta sala 1955an didome.<sup>128</sup> Kurdên Sovyetê di dema Stalin da sê caran tên nefîkirin. Ya yekem di 1937an da pêk hat. 12 gundên kurdên misilman ji Ermenistan û Azerbaycanê mişextî Qazaxistan û Asyaya Navîn dikin. Li gor hejmarên fermî 800 kurd hatin nefîkirin. Cara duyem di sala 1944an da ji kurdên misilman 9.000 kes hatin nefîkirin. Vê carê wan ji Gurcistanê mişextê

---

<sup>124</sup> Orhan, h.g. r. 21.

<sup>125</sup> Şamil, h.b. r. 96.

<sup>126</sup> Boyik, h.b. r. 13-14.

<sup>127</sup> Boyik, h.b. r. 15.

<sup>128</sup> Boyik, h.b. r. 15.

Qazaxistan û Ozbekistanê kirin. Di vê dîrokê mêr bi tevahî bûbûn leşkerê Artêşa Sor lewre mişextîyên 1944an piraniya wan jin û zarok bûn. Cara sêyem jî di sala 1947an da beşek ji kurdên êzîdî ji Gurcistanê mişextî Qazaxistan û Asyaya Navîn kirin. Ev kurdên êzîdî piştî mirina Stalin dîsa vegeyîyan Ermenistan û Gurcistanê, ji yê sala 1937an jî tenê çend malbat karibûn vegeyîyan cihê xwe yê berê.<sup>129</sup>

Di vê serdemê da xala herî berbiçav zextên dewleta Sovyetê ye lewre ji ber van zextan weke mîletên din kurd jî rastî nefikirin û girtinê hatin, karên wan ji wan hat sitandin. Di nav van şert û mercên zehmet da kar û barên li ser kurdî jî rawestiyên.<sup>130</sup> Li hemû Sovyetê ji ber nêrîna neyînî ya li dijî alfabeya latînî, xwendin û nivîsandina alfabeya latînî ya kurdên Ermenistanê hat rawestandî. Pirtûkên bi alfabeya latînî hatin qedexekirin. Rewşenbîrên kurdan wekî “sîxurên rojava” hatin dîtin<sup>131</sup> Erebe Şemo nefiyî Sîbîrê kirin, Heciyê Cindî, Gerdoyê Gêncî, Ahmedê Mirazî hatin girtin. Di dibistanan da dersên kurdî rawestîyan, alfabeya latînî hat qedexekirin û di şûna wê da ya bi tîpên krîlî hat amadekirin. Di sala 1941an da hukumata Ermenistanê biryar da ku alfabeya kurdî biguhezînin tîpên krîlî û vî karî sipartin Heciyê Cindî. Piştî demekê êdî li gundên kurdan bi vê alfabeyê dersên kurdî dihate dayîn. Ev alfabe heta hilweşîna Sovyetê yanî heta sala 1990î ji aliyê kurdên Sovyetê ve hatiye bikaranîn.<sup>132</sup> Ji hilweşîna Sovyetê heta roja me jî alfabeya latînî ya Celadet Bedirxan bikar tînin.<sup>133</sup>

Di serdema duyem da karê herî berbiçav xebatên şanoyê ne. Di binbeşa şanoyê da dê li ser şanoyê agahîyên berfireh werin dayin. Li hember ku di serdema duyem da bêdengiyek çêbû jî kar û barên ku di serdema yekem da hatin kirin hîmek saxlem danîbû û piştî ku zextên li ser kurdan kêmbûn li ser vî hîmî car din xebatên kurdî geş bûn.

Bi destpêka xebatên bi kurdî li Kafkasyayê termînolojîyeke taybet ya kurdên Kafkasyayê derket holê. Ji vê termînolojîyê çend mînak ev in:

**Muzîkar/muzîkkar:** muzîkjen

**Dengnivîsîn:** qeydkirina deng

---

<sup>129</sup> Ulugana, h.g. r. 39.

<sup>130</sup> Reşid, h.g. r.13.

<sup>131</sup> Hejarê Şamil, *Diyaspora Kürtleri*, Peri Yayınları, 2005, r.98.

<sup>132</sup> Boyik, h.b. r.15.

<sup>133</sup> Têmûrê Xelîl, *Xelîlê Çaçan Xizmeta Malbatekê a 100 salan*, Lîs, 2021, r. 225.

**Dengnivîs/ Dengnivîsok:** aleta qeydkirinê

**Nivîsar:** qeyd

**Fonda zêrîn:** arşîva Radyoya Erîvanê ya stranên kurdî

**Radyokompozîsyon:** şanoya radyoyê

**Dûrdîtînok:** televîzyon

**Karê deştê:** xebata sehayî

**Bêjer:** spîker

**Zargotin:** folklor

Serdema sêyem, ji sala 1955an heta roja me ye. Di salên 1955an da dîsa xebatên kurdî geş bûn. Encama perwerdehîya salên borî di vê serdemê da baş tê dîtî. Vê carê di her warî da berhem tên dayîn. Ji bo kurdan di warên weke akademî, edebiyat, perwerdehî, sînema, şano û çapemenîyê da pêşdaketinek mezin derdikeve holê. Ji ber ku di vê serdemê da xebat pir in û di warên curbicur da pêk hatine ez ê wan li gor serenavan dabeş bikim.

#### **1.4. Xebatên Akademîk**

Weke ku li jorê jî hat dîyarkirin dîroka lêkolînên li ser kurdan diçe heta sedsala 19an. Bi perwerdekirina kurdan û afirandina kadroyekê bi kurdî ev xebat ketin rêyeke din û ji bo kurdolojîyê çavkanyeke mezin derkete holê. Akademisyen Joseph Abgarivich Orbeli weke avakarê xebatên kurdî yên modern tê hesabandin. Di 1959an da bi însiyatîfa Orbelî di Zanîngeha Leningardê da li Enstituya Xebatên Rojhilatê Koma Xebatên Kurdî hate sazîkirin. Ev komxebat di cîhanê da bûye navenda xebatên kurdî ya yekem. Ev koma kurdologan bi awayeke çalak li ser zimanê kurdî û zaravayên wê xebitîn.<sup>134</sup> Erebe Şemo û Qanatê Kurdo li vir xebatên li ser rêziman kirin. Piştî mirina Orbelî Qanatê Kurdo bû serokê beşê.<sup>135</sup> Qanatê Kurdo ji sedî zêdetir monografi, pirtûk û gotarên zanyarî li ser ziman, zargotin û dîroka kurdî weşand. Kurdo, ji 20î zêdetir kurdzan perwerde kir. Xebatên wî ên sereke li jêr in:

*Rêzimana Zimanê Kurdî-Kurmancî (1957)*

---

<sup>134</sup> Omerxalî, h.g. r. 30.

<sup>135</sup> Ulugana, h.g. r. 40.

*Ferhenga Kurdî-Rûsî* (1960)

*Ferhenga Kurmanci-Rûsî-Sorani* (bi Zara Yusupova re-1983)

*Berawirdkirina Rêzimanên Diyalektên Kurdî* (kurmanciya jor û kurmanciya jêr-1973)

*Tarixa Edebiya Kurdî* (1983-1985)

*Gramera Zimanê Kurdî* (1990)

*Diwazdeh Waryantên Mem û Zîn* (1996?)

10 pirtûkên wî ên dersê li Ermenistanê hatine weşandin.<sup>136</sup> Kurdo heta dawîya jîyana xwe (1985) serokatiya beşê kir. Ji zanyarên ku hîmê Kurdolojîya Sovyetê danîye yek jî Qanatê Kurdo ye. Kurdo li derveyê Sovyetê jî hatiye naskirin. Pirtûkên wî li welatên weke Iraq, Swêd û Almanyayê hatine weşandin. Ew bûye Endamê fexrî yê Akademiya Iraqê ya Zanistên Kurdî û Enstituya Kurdî ya Parîsê<sup>137</sup>

Rûdenko jî li ser wêje û etnografyaya kurdî lêkolîn kirine. Wê li ser folklor û çanda kurdî ji sedî zêdetir gotar û pirtûk nivîsîne. Rûdenko klasîkên weke *Mem û Zîn*, *Şêxê Sen'an*, *Leyla û Mecnûn* ji kurdî wergerandine rûsî. Rûdenko di heman demê da bi dîrok û folklorê kurdî re jî eleqeder bûye. Wê li cihên weke Azerbaycan, Ermenistan û Gurcistanê berhevkarîyê kiriye. Rûdenko kataloga hemû destxetên kurdî ên li zanîngeha petersburgê ne amade kir, xizmeta wê ya herî mezin ji bo kurdî ev e.<sup>138</sup> Hin xebatên wê yên din jî ev in:

*Çîrokên Kurdî* (1959)

*Çîrok û Pêşgotinên Kurdî* (Bi Qanatê Kurdo re-1961)

*Helbestên Kurdî Yên Şînê* (1982)

*Helbestên Şairên Kurd Ên Neçapkirî* (1972)

Rûslan Sobolov (1926-2003) jî li ser rêzimana kurdî xebatên giring kirine. Bi taybetî li ser fonetîk û morfolojîyê berhem dane û ji bo kurdî ferhengeke etîmolojîk amade kirine. Yevgeniya Vasilyeva jî ji yek kurdologên rûsan e. Wê gelek berhemên li ser dîrok û wêjaya kurdî wergerandiye rûsî. *Şerefname* û *Dîroka Erdelan* ji vana hinek in. Vasilyeva ji salên 1955an da dest bi lêkolîna dîroka kurdî kirîye û îro jî di warê kurdolojîyê da gelek navdar e. Wê li ser kurdolojîyê 7 pirtûk û ji 50 hebî zêdetir

---

<sup>136</sup> Boyik, h,b, r. 462.

<sup>137</sup> Çağlayan, h,g, r. 326.

<sup>138</sup> Çağlayan, h,g, r. 327.

gotaran nivîsîne. Ji xeynî vana divê navê M. Gastarya, O. Jigalina, M. Lazarev û Ş. Mgoi jî ji bo xebatên kurdî werin gotin. Piştî hilweşîna Sovyetê xebatên kurdî kêm bûn lê niha jî berdewam in. Niha xebatên kurdî li Rûsyayê li du navendan didomin. Yek jê koma kurdologên ku di sala 1959an li Akademiya Zanistî Ya Rûsya Enstituya Şerqiyatê dest bi xebatan kiribûn e. Di vê komê da kurdologên bi navê Y. Vasilyeva, O. Calilov, J. Musaelyan, Z. Yusupova, N. Safonov niha lêkolînan dikin. Ya din jî navenda xebatên kurdî ye ku di sala 1994an da hate damezirandin <sup>139</sup>

Bi saya Heciyê Cindî li Zanîngeha Erîvanê, di beşa Rojhilatzanîyê da, Para Kurdzanîyê vedibe,<sup>140</sup> Cindî serokatiya beşê dikir. Piştî wî Xalit Çetoyêv, Şekroyê Xudo, Maksîmê Xemo û Karlanê Çaçan serokatiya vê beşê kirin.<sup>141</sup> Heciyê cindî beriya 1955an jî gelek xebatên giring kirine û weke bavê zargotina kurdî hatiye nasîn lê wî di her cureyên wêjeyê de berhem dane. Kulliyata wî pir berfireh e. Boyik, berhemên wî weha tesnîf dike:

15 pirtûkên folklorzanîyê û edebiyatzanîyê,  
12 berhevokên zargotinê,  
7 pirtûkên pedagojîyê,  
33 pirtûkên dersan,  
19 berhevokên tercume.<sup>142</sup>

Ji van xebatên wî çend mînak ev in:

*Folklor Kurmanca* (1937) bi Emînê Evdal re,  
*Hikayetêd Cimeata Kurda* (Di navbera 1961ê û 1990ê 6 cildên vê berhemê tên çapkirin.)  
*Kilamêd Cimeta Kurmanca*<sup>143</sup>

Di salên 1960-1970an da li Azerbaycanê li Enstituya Îlmî ya Rojhilatê di beşa akademiya ilmî da beşa kurdzanîyê tê vekirin. Li vir kesên weke Elî Gelawêj, Rehîm Qazî, Huseyîn Kurdoxlî, Şamil Eskerov, Zumrûd Şefiyeva û Mehemed Şemsî li ser kurdî xebatan dikin. Van kesan di demeke kurt da xebatên giring çap dikin. Di

<sup>139</sup> Çağlayan, h,g, r. 327-328.

<sup>140</sup> Reşide Değirmi, "Hêmanên Folklorîk Di Romana Hewarî Ya Heciyê Cindî De" Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstituya Zimanên Zindî, Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, 2019, r.18.

<sup>141</sup> Boyik, h,b, r. 445.

<sup>142</sup> Boyik, h, b, r. 135.

<sup>143</sup> Değirmi, h, g, r. 20.

derbarê kesên weke Şerefxan Bidlîsî, Evdila Goran, Cegerxwîn da xebatên akademîk tîn kirin. Kurdên perçeyên din bi taybetî ên Iraqê tezên xwe li vê akademîyê diparêzin. Îzzedin Mistefa Resûl, Kemal Mezher, Nesrîn Fexrî, Kerem Amoyev û Rehîm Qazî ji vana çend kes in. Li vê enstituyê klasîkên kurdî jî wergerandine zimanê azerî û çap kirine. Li Azerbaycanê piştî Kurdistana Sor navê kurd ji nasnameyan hate derxistin û weşana kurdî hate qedexekirin lê piştî hilweşîna Sovyetê bi hewldanên Şamil Eskerov û Ahmedê Hepo nêzî 10 pirtûkên kurdî hatin weşandin. Dîsa piştî hilweşîna Sovyetê di sala 1990î da li Azerbaycanê Navenda Çanda Kurd “Ronahî” tê avakirin, rojnameya Dengê Kurd (1992) û Dîplomat (2003) dest bi weşanê dikin. Di radyoya Azerbaycanê ya dewletê da hefteyê du caran 15 deqîqe bi kurdî weşan tê kirin (1993)<sup>144</sup>

Malbata Celîlan jî di derbarê kurdî da xebatên mezin kirine. Wan li derveyî Sovyetê jî xebatên folklorê kirine. Casimê Celîl tevî çar zarokên xwe kullyatek mezin ji bo kurdolojîyê ava kiriye. Casimê Celîl ji sala 1930yî virde bi awayek aktîf di nav karên weşan, perwerde û wergera kurdî da cih girtiye. Casimê Celîl di weşanxaneyê dewletê ya Ermensitanê da serokê beşa kurdî bû. Wî li wir redaktorîyê kirîye û helbest, gotar û destanan nivîsîne. Dema ku Radyoya Erîvanê vedibe Casimê Celîl dibe berpirsiyarê beşa kurdî. Ew sê sal vî karî dike dûre di heman beşê da dibe berpirsiyarê beşa muzîk û edebiyatê, Casimê Celîl vî karî heta sala 1963an didomîne. Zarokên wî Ordîxan, Celîl, Cemîla û Zînê jî di warê folklor, dîrok, muzîk û wergerê da xizmetên giring kirine.

Celîlê Celîl li zanîngeha Erîvanê beşa dîroknasîyê diqedîne. Piştî li Lenîngardê di beşa Rojhilatzanîyê da li ser serhildanên kurdan ên di sedsala 19an da teza xwe diparêze. Di navbera salên 1964-1992an da li Zanîngeha Erîvanê di beşa rojhilatzanîyê da weke kurdolog dixebite. Piştî hilweşîna Sovyetê diçe Ewropayê û li Zanîngeha Vîyanayê xebatên xwe yên li ser kurdî didomîne. Di xebatên wî da berhevkirina zargotina kurdî cihekî mezin digire. Wî bi Ordîxanê Celîl û Cemîla Celîl ra nêzî 20 pirtûkên berhevkarîyê çap kirine. Zîna Celîl ji vana hinekan wergerandiye zimanê rûsî û lîtvani. Celîlê Celîl zanyarê yekem e ku metnên êzîdiyan berhev kirine û çap kirine. Herweha wî li ser dîne Êzdayetîyê gelek gotaran jî nivîsîne. Celîlê Celîl bi xebatên xwe li ser dîroka kurdan gelek tiştan berhev kirine.

---

<sup>144</sup> Boyik, h,b, r. 456-458.

Boyik ji kulliyata wî 30 mînanan dide ku li ser dîrok, çand zargotin û wêjeya klasîk ya kurdan in.<sup>145</sup>

Celîlê Celîl, piştî hilweşîna Sovyetê li kitêbxaneyên Ewropayê destxetên bi kurdî berhev kirine. Wî li Viyanayê enstituyek ava kirîye û niha xebatên xwe li wir didomîne.<sup>146</sup> Celîlê Celîl keresteyên ku di warê zargotina kurdî da bi Ordîxanê Celîl re berhev kirine dê di enstituya xwe de weke 25 cild çap bike. Heta niha cildên wê ên 1, 2, 3, 9 û 10an hatine çapkirin.<sup>147</sup> Di malpera enstituyê da li ser mijarê metneke weha heye:

Tomarkirina zargotina kurda ya ênsîklopêdîk bingeha xwe ser berevoka pir mezin ji mîrata çanda gelê kurde bi zar digre. Xudanê vî karîne: Prof. Dr. Ordîxanê Celîl edebyetzan; Prof. Dr. Celîlê Celîl dîrokzan, êtnolog; Cemîla Celîl komponîst, mûzîkzan-êtnolog; Zîna Celîl werger, pispora edebyetê – yên şêstî salî zêdetir ji jîyana xwe veqetandine û dîyarî karê berevkirin û lêkolîna gencîna gelê kurd kirine. Zîncîra 25 bendan bi seredana li hemû parçeyên Kurdistanê (Turkya, Îran-Xorasan, Îraq û Sûrya); Pişkavkazyayê: Ermenistanê û Gurcistanê; her usa jî li Asya Navîn: Qazaxistanê û Kîrgîzstanê pêk hatye. Derskirina 25 bendan ser janrane: poêmên êpîk, dastan, stranên dîrokî, yên evîndarîyê, şînê, qewl û beytên êzdîyan, dewrêşok, rostemî, cengname, çîrok, çîvanok, qelîbotk, hûmor û anekdot, gotinên pêşîyan, biwêj û îdêom, nîfrîn û dirozge, têderxistinok, stranên kar û xebatê, yên dewatê û yên mayin<sup>148</sup>

Cemîla Celîl jî di konseretuarê da li ser muzîkê perwerdeya xwe temam dike û dikeve nava kar û barên kurdî. Ew li Radyoya Erîvanê 35 salan (1967-2002) weke redaktora muzîka kurdî dixebite. Wê stranên ku berhev kirine tevî nota di bi dehan pirtûkan da çap kirine. Wê ji pêncî salan zêdetir berhevkeriya stranên kirine. Pirtûkên wê li welatên cûda hatine çapkirin. Di arşîva muzîkê ya malbata Celîlan da ji hezar heban zêdetir stranên kurdî hatine qeydkirin. Cemîla Celîl ne tenê li gundên Ermenistanê herwea ew li gundên Qazaxistanê û Qirgîzistanê jî li dû şopa stranên kurdî çûye. Cemîla û Celîlê Celîl di sala 1988an da li ji nav kurdên Surîyeyê 1000 awaz û stranên kurdî berhev kirine û di pirtûkeka taybet da çap kirine. Di nav salên 1964-

<sup>145</sup> Boyik, h,b, r. 509-515.

<sup>146</sup> Adnan Çelik, “Kurd, Kafkasya û Kurdoloji: Hevpeyvîn Bi Metin Yüksel re” *Wêje û Rexne*, j. 09/10, 2017, r. 84.

<sup>147</sup> Metin Yüksel, “Celîl Ailesi’nin Devasa Kürtçe Sözlü Gelenek Arşivi” *Kürt Tarihi*, j. 26, r.20.

<sup>148</sup> <https://www.kurdologie-wien.at/temp20/ku/nachrichten-3/>

2001î da 13 pirtûkên wê ên li ser muzîka kurdî çap bûne.<sup>149</sup> Endama malbata Celîlan ya herî piçûk Zîna Celîl jî bi wergerên xwe alîkarîyeke mezin daye nasandina çanda kurdî li hemû cîhanê.<sup>150</sup>

## 1.5. Edebiyat/Wêje

Weke ku li jor jî hat dîyarkirin pêşketina kurdan ya çandî li Sovyetê heta salên 1920an diçe. Ji bo pêşketina edebî jî weke serdemên siyasî tesnîfeke hatiye kirin. Ev tesnîf paralelê bûyerên siyasî ne. Tosinê Reşîd, periyodên edebî li Sovyetê weha tesnîf dike:

1. 1931-1937: salên werger û telifê
2. 1938-1955: salên sirgûnê, zordestiya Sitalîn
3. 1955-1991: dema zêrîn û ronesansa piçûk a kurdan<sup>151</sup>

Ji bo ku mirov edebiyata kurdî ya Kafkasyayê baş fêhm bike divê mirov Teoriya Realîzma Sosyalîst binase. Realîzma Sosyalîst teoriyeke edebiyatê ye û ji aliyê Dewleta Sovyetê ve bi awayeke fermî hatîye qebûlkirin. Lunaçarskî, Jdanov û Gorkî pêşengên vê teorîyê ne. Li gor Stalîn jî divê nivîskar xwedîyê helwesteke siyasî be. Di sala 1934an de di kongreya yekem ya Yekîtiya Nivîskarên Sovyetê da realîzma sosyalîst weke edebiyateke fermî tê nasandin. Ev kongre ji bo realîzma sosyalîst pêngava yekem e. Lunaçarskî li kongreyê, di derbarê realîzma sosyalîst da axaftinek dike. Ew behsa temayên realîzma sosyalîst dike û tîne ziman ku ji bo avakirina jîyaneke sosyalîst realîzma sosyalîst pêwîst e. Di kongreyê da bi rêbaza realîzma sosyalîst çarçoveya giştî ya edebiyata Sovyetê tê destnîşankirin. Li gor vê yekê divê edebiyata Sovyetê li ser “geşbînî, şewq û qehremanîyê bê avakirin û lehengên xwe yê sereke jî ji karkerên jin û mêr, kolxozvanên jin û mêr, endamên Partîyê, rêvebir, endazyar û ji komunîstên ciwan (komsomol) hîlbijêre ku bi dil û can ji bo damezirandina “jîyana nû” û “damezirandina sosyalîst” kar dikin.<sup>152</sup>

“...Damezirînerên realîzma sosyalîst, hewl didin edebiyata Sovyetê bikin beşek ji bernameya damezirandinê ya îdeolojiya sosyalîst û herwekî cîhana

<sup>149</sup> Boyik, h,b, r. 538-540.

<sup>150</sup> Kürt Tarihi j. 26. r. 22.

<sup>151</sup> [https://prezi.com/ac4y\\_hom7b5n/edebiyata-kurdi-ya-kafkasyaye/](https://prezi.com/ac4y_hom7b5n/edebiyata-kurdi-ya-kafkasyaye/)

<sup>152</sup> Zülküf Ergün, “Ducemseriya Reazlîzma Sosyalîst Di Romanên Erebe Şemo û Hecciyê Cindî de” e-Şarkiyat, j. 2, 2017, r. 648-649.

derekî, di cîhana vêkxistî (fiktîf) de jî li hember feodalîzm û kapîtalîzmê ducemseriyekê pêk bînin. Di çarçoveya vê têgihîştinê de edebiyata Sovyetê di forma berawirdkirin û ducemseriyekê de ji bo rastdêrana cemsêra Sovyetê û pûçkirina cemsêra neyarên Sovyetê tê rêkxistin û li hember çand û edebiyata cîhana kapîtalîst a burjuvayî û bermayiyên civaka feodal, nûnertiya çand û edebiyata proleteriyayê dike û vêkxistina edebî dike qada mîlmilane û ducemseriyeke sîyasî, civakî û îdeolojîk.<sup>153</sup>

Di nav kurdên Sovyetê da çîna burjuvayê tunebû. Ji ber vê yekê di berhemên wan da dijberî di şûna çîna burjiva û karkeran da di nav sîstema sosyalîst û sîstema feodalîzmê da xwe nîşan dide. Di piraniya berheman da rûdana bûyeran li ser vê dijberiyê derdikeve pêşberî xwendevanan. Ewîl sîstema feodal weke sebeba hemû felaketên ku tîr serê mîletê tê nîşandan. Dûre Şoreşa Bolşevîk û Sosyalîzm weke rizgarker û destpêka jîyaneke baştir tê pesinandin.<sup>154</sup> Tema û dijberiyên sereke di berhemên edebî ên kurdên Sovyetê da ku derdikevin pêşberî xwendevanan ev in: Zordariya axa û began, zordestiya roma reş, rev, xêrxwazî û dostaniya ermeniyan, qenciya rûsan, rizgarkeriya Şoreşa Bolşevîk, astengiya edetên xirab ên berê û dijîtiya wan, bicihkirina bernameya damezirandinê ya sosyalîst, beşdariya Şerê Weteniyê û folklorhezî.<sup>155</sup>

Ji ber helwesta dewletê ya fermî realîzma sosyalîst di hemû berhemên nivîskarên sovyetê yê wê demê da kêr zêde hebû. Ev yek di berhemên kurdî da jî xwe bi awayek baş nîşan dide. Ev propaganda ne tenê di roman û helbestê da, di şano, sînema û çapemeniyê da jî bi awayek zelal tê dîtin. Di beşa radyoyê da dê li ser vê mijarê were rawestandî.

Piştî salên 1955an êdî kadroyeke ku karibe berhemên edebî bide çêbûbû. Bi saya xwendekarên kurd ku di serdema ewîl da perwerdehî dîtibûn hêdî hêdî bingeheke nivîskî/edebî çêbû. Bi rabûna zextan li dû hev berhemên edebî derketin. Di vê serdemê da cureyên weke roman, çîrokên modern û şanoyê ku hê ji bo wêjeya kurdî nû bûn mînakên yekem hatin dayîn. Herweha di helbestê da jî pêşketinek çêbû. Piştî Heciyê Cindi, Emînê Evdal, Ahmedê Mirazî û Casimê Celîl; kesên weke Qaçaxê Mirad, Ûsivê Beko, Eliyê Evdirehman, Nado Maxmudov, Mîroyê Esed,

<sup>153</sup> Ergün, h.g. r. 650.

<sup>154</sup> Ergün, h.g. r. 651.

<sup>155</sup> Zülküf Ergün, "Fonksiyonên Hevbeş û Zincîreya Rûdanê Di Vegêrana Edebiyata Kurdî Ya Sovyetê De", *e-Şarkiyat*, 2018, j. 3. r. 805.

Xelîl Mûradov ku di serdema duyem da karmendên dewletê bûn dest bi xebatên edebî kirin.

Erebê Şemo romanên xwe *Berbang*, *Jiyana Bextewar*, *Dimdim û Hopo* li dû hev çap kir. Erebe Şemo bi *Şivanê Kurmanca* (1935) di edebiyata kurdî da mînaka ewil ya romanê da. Berhemên wî li gelek zimanên din hatin wergerandin û bi kurdî jî gelek caran çap bûn. Heciyê Cindî xeynî jî berhemên edebî wergervanîyê jî kir û gelek berhemên biyanî bi kurdî çap kir. Casimê Celîl pirtûkên helbest û destanan çap kir, Ahmedê Mirazî ku jî salên destpêkê di nav kar û barên kurdî da bû bi berhema xwe ya *Bîranînên Min* nimûneyekê ji bo pexşanê da û serpehatîyên xwe nivîsî. Emînê Evdal, Xaçaxê Mirad, Usivê Beko, Eliyê Evdirehman, Miroyê Esed û Xelîl Mûradov jî pirtûkan çap kirine.<sup>156</sup>

Li ser vê govekê û bingehê dengê edebiyata esîl ji pey salê 60 î ra hate bihîstin. Bi serê silsileta Şikoyê Hesên, Fêrikê Usiv, Mîkayêlê Reşît, Sihîdê Îbo, Simoyê Şemo, Karlanê Çaçanî, Egîte Şemsî, Rizaliyê Reşît, Ordixanê Celîl, Baryê Bala di warê helbest da, wezîrê Eşo, Egîte Xudo, Emerîkê Serdar, Ahmedê Hepo, Sîma Semend, Ahmedê Gogê di warê nivîsara vekirî da, dinyake nû li nava edebiyata vê para gel da hate vekirin. Paşê ew cihan rengîntir û zengîntir kirin Tosinê Reşît, Çerkezê Reş, Elîxanê Memê, Babayê Keleş...<sup>157</sup>

## 1.6. Şano û Sînema

Weke warên din di şano û sînemayê da jî mînakên yekem hatin dayîn. Weke ku li jor jî hat behskirin di serdema duyem da di şanoyê da geşedanek berbiçav çêbû. Li hember ku di dewra duyem da karên çandî sekinîn di sala 1937an da li gundê Elegezê şanoya kurdan ya dewletê hate damezirandin. Şanogerên profesyonel tunebûn ji ber vê yekê jî ciwanên li derdorê di şanoyê da bûn lîstikvan. Şano ji aliyê dewletê ve dihate fînansekirin. Şanogerên ermenî alîkriyeke mezin kirin. Wan salan şanonivîsên ermenî li ser bingeha zargotin û jîyana gelê kurd gelek lîstikan ji bo vê şanoyê nivîsîn: Mem û Zîn (S.Taronsî), Ker û Kulik, Keça Mîrekê, Xecê û Siyabend, Gur Heso (S. Gênosyan) û yê din. Tiyatroyê gelek şanoyên klasîkên edebiyata

---

<sup>156</sup> Boyik, h.b. r. 19.

<sup>157</sup> Boyik, h.b. r. 19.

erمنيyan, gurciyan, azeriyan, rûsan derxistin li ser dika xwe.<sup>158</sup> Piştî demekê êdî şano ketibû jîyana gel û gelek hatibû hezkirin. “Ciwanên kurd ên ku li Rewan û Tilbîsê perwerdeya şanogerîyê dîtibûn hatin vexwendin. Celatê Koto, Mîroyê Esed, Eliyê Hacî, Qaçaxê Miho, Bekirê Miho, Xanim Ayvazyan û Rizganê Emo ji aktor û aktrîstên wê demê ên navdar çend kes in.”<sup>159</sup>

Şanoya Elegezê di sala 1947an da hate girtin. Vê şanoyê di deh salan da 30 lîstikên şanoyê derxistin ser dikê. Lîstikên vê şanoyê ev in : *Lur De Lur* a Celatê Koto; (serokê şanoyê yê yekem), *Mîraz* a Heciyê Cindî, *Xuşka Doxdiryê*, û *Bira* ya Cerdoyê Gêncî. Gêncî, di salên şer da serokatiya şanoyê jî kir. Gelek lîstikvan û xebatkarên şanoyê paşê ketin nav karê çandê û perwerdehîyê. Aktorê şanoyê Mîroyê Esed piştî karên siyasî bû berpirsiyarê rojnameya *Riya Teze*, Celatê Koto di karê dadmendîyê da xebitî. Gelekên din jî li dibistanan mamostetî kirin.<sup>160</sup> Şanoya kurdî ya dewletê careke din nehate vekirin lê di şûna wê da dîsa li gundê Elegezê şanoya kurdî ya gelerî hate vekirin.<sup>161</sup> Şanoya Elegezê (Camûşvana Mezin) weke şanoyeke gerok bû. Ew li hemû gundên Ermenistanê ên kurdan û li gundên Gurcistanê jî digeriyan û li seranserê komarê navdar bûbûn.<sup>162</sup>

Piştî van şanoyan nifşên nû jî gelek lîstikên şanoyê nivîsîn. Eskerê Boyik: *Sinco Keça Xwe dide Mêr* (1980), Tosinê Reşîd: *Siyabend û Xecê* (1988), Ezîzê Gerdenzerî: *Çiya* (1989), Ferîkê Usiv: *Bê Qelen* (1974), Tahirê Biro, *Memê û Eysê* (1967) ji van lîstikan çend mînak in.<sup>163</sup> Piştî ku Radyoya Erîvanê vebû 41 lîstikên şanoyê di wir da weke radyokompozîsyon hatin lîstin. *Dewletî û Xulam*, *Fêlbaziya Rûvî*, *Hikyata Berçemkê*, *Şenglo Menglo*, *Destebirak*, *Lenîn û Elî*, *Mîrze Mêhmûd*, *Dimdim*, *Gîkor*, *Zembîlfiroş*, *Bê Qelen*, *Gulîzer*, *Memê û Eysê*, *Elenewêrek*. Ji wan çend mînak in.<sup>164</sup> Xeynî ji yên li jor li Azerbaycanê li bajarê Laçînê bi navê Tîyatroya Gel şanoyeke kurdî hatibû avakirin. Vê şanoyê li gelek deveran hunera kurdî pêşkêşî niştecihên herêmê dikir.<sup>165</sup>

<sup>158</sup> Boyik, h.b. r. 16.

<sup>159</sup> [https://prezi.com/ac4y\\_hom7b5n/edebiyata-kurdi-ya-kafkasyaye/](https://prezi.com/ac4y_hom7b5n/edebiyata-kurdi-ya-kafkasyaye/)

<sup>160</sup> Boyik, h.b. r. 16-17.

<sup>161</sup> Eşo, h.b. r. 47.

<sup>162</sup> Eşo, h. b. r. 36.

<sup>163</sup> [https://prezi.com/ac4y\\_hom7b5n/edebiyata-kurdi-ya-kafkasyaye/](https://prezi.com/ac4y_hom7b5n/edebiyata-kurdi-ya-kafkasyaye/)

<sup>164</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelil ra.

<sup>165</sup> <http://www.zazaki.net/haber/li-azerbaycan-edebiyat-capemenya-kurd-2308.htm>

Di sînemayê da jî mînakên filmên yekem yên kurdî li Sovyetê bi alikarya Ermeniyî hatine dayîn.<sup>166</sup> Çavkanî di derbarê filmê yekem da agahîyên cuda didin. Di hin çavkaniya da filmê yekem *Namûs* e. Derhênerê vî filmî Hamo Bêknazaryan e. Film di sala 1925an<sup>167</sup> da li Ermenistanê hatiye kişandin. Mijara Filmê evîna Seyran û Sûsanê ye. Film, ji romana Aleksandir Şîrvanzade hatiye adaptekirin. Fîlm 69 deqîqe didome û reş-spî ye.<sup>168</sup> Pirîskê Mihoyî di gotara xwe da *Zerê* weke filmê yekem destnîşan dike. *Zerê*, di sala 1926an da hatiye kişandin, Derhênerê vî filmî jî Hamo Bêknazaryan e. Lehengên sereke *Zerê* û dergistîyê wê Seydo ne. Film li ser bingeha serpêhatîya Lazo (Hakob Xazaryan) hatiye kişandinê. Ev film jîyana êzîdîyên çîyayê Elegezê û erf û edetên wan ên berîya dewra Sovyetê nîşanê bîneran dide. Filmê *Zerê* dema ku hat kişandin reş-sipî û bê deng bû, lê dû ra bi zimanê ermenkî deng lê hat zêdekirin.<sup>169</sup> Fîlmê *Kurdên Êzîdî* di sala 1932an da ji aliyê A. Martîrosyaneyî ve hatiye kişandin. Film, li gundekî kurdan diqewime. Mijara filmê *Kurdên Êzîdî* damezirandina kolxozê ye. Senarîstên filmê P. Barxûdaryan û G. Balasanyane ne. Belgefîlmeke kurt *Li Kurdistanê*, di sala 1938an da li ser herêma Kurdistanê Sor hatiye kişandin. Ev belgefilm, li Azerbaycanê hatiye kişandin. Di belgefilmê da muzîk, reqs û hunera şanoya kuklayê ya kurdan jî cih digrin. Belgefîlmeke din jî *Kurdên Ermenistana Sovîyetê* ye ku di sala 1947an da li ser jîyana kurdan hatiye kişandin. Derhêneriya belgefilmê Y. Koçaryaneyî kiriye û senaryoya wê ji aliyê Heciyê Cindî û Y. Koçaryan ve hatiye nivîsîn. Ev film jî bêdeng û reş-spî ye. Belgefîlma *Kurdên Ermenistanê* li ser çand û jîyan kurdan e ku ji aliyê C. Jamharyane ve hatiye kişandin û senaryoya wê jî Erebe Şemo nivîsîye. Dîsa belgefilma ku li ser dostanîya kurdan û ermenîyan disekine *Dostê minî qedîmî/Dostanî*, di sala 1988an da hatiye kişandin û qala jîyana kurdan dike. Derhênerê filmê L. Grîgoryane ye û senaryoya wê jî ji aliyê L. Grîgoryan û K. Zakaryan ve hatiye nivîsîn.<sup>170</sup>

<sup>166</sup> Di gelek çavkaniyan da filmên ku li Sovyetê hatine kişandin weke mînakên yekem ên sinemaya kurdî tînin hesabandin lê derbarê mijarê da nêrînen cuda jî hene. Li ser mijarê agahîyên berfirehtir di vê xebatê da hene: Ekrem Yıldız, “Kurtefilm Wekî Cih û Amûrê Bikaranîna Zimanê Kurdî” Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî, 2019, r.65-66.

<sup>167</sup> Sala kişandina film di vê malperê da weke 1926 tê destnîşankirin:

<https://www.bernamegeh.org/2021/10/15/li-sovyetan-7-filmen-li-ser-jiyana-kurdan-rumet-med/>

<sup>168</sup> Ulugana, h.g. r. 50.

<sup>169</sup> [https://krd.riataza.com/2021/11/27/filmen-bi-mijara-kurdi-yen-dema-sovyete/?fbclid=IwAR0r0\\_UQon6BOs\\_rM-U3nYC6kL1HD3PqVgufvfkNZ396A7CIWZc51cBdjt24](https://krd.riataza.com/2021/11/27/filmen-bi-mijara-kurdi-yen-dema-sovyete/?fbclid=IwAR0r0_UQon6BOs_rM-U3nYC6kL1HD3PqVgufvfkNZ396A7CIWZc51cBdjt24)

<sup>170</sup> <https://www.bernamegeh.org/2021/10/15/li-sovyetan-7-filmen-li-ser-jiyana-kurdan-rumet-med/>

## 1.7. Çapemenî

Kurdan piştî şerê cîhanê yê yekem di bin banê dewletên cuda da derfeta weşana kurdî dît. Ev weşan bi rêya rojname û radyoyan pêk hatin. Di salên 1930yî da kurdî çawa bû zimanê perwerdeyê wisa bû zimanê weşangerîyê jî.<sup>171</sup>

Di destpêka salên 1930yî da rojnameya bi navê *Şûra Kurdistanii/Kurdistana Sovyetê* dest bi weşana xwe kir. Ev rojnameya bi alfabeya latînî ji çar rûpelan pêk dihat ku rûpeleke wê bi kurdî bû. Yekemîn berpirsyarê vê rojnameyê Îbrahîmê Allavêrdî bû. Allavêrdî ji Kurdên Kamalliya Laçînê bû. Rojname di sala 1938an da weşana kurdî rawestande lê heta sala 1961, bêyî zimanê kurdî, bi navê *Sovyet Kurdistani* weşana xwe domand. Keda rewşenbîrê bi navê Mûseyîb Axûndov jî di vê rojnameyê da heye. Axûndov, ji bo perwerdehiya zarokên kurdan pirtûkeke bi navê *Fêkiyêd Aprêlê* (1931) jî nivîsandîye.<sup>172</sup>

Piştî belavbûna Sovyetê, di 1992an da rojnameya *Dengê Kurd* wekî weşana komeleya Ronahî derdikeve. Rojname bi kurdî, azerkî û rûsî weşana xwe dike. Ehmedê Hepo yekemîn berpirsyarê sereke yê rojnameyê bû. Adil Cemal, Hejarê Şamil û Silêmanê Refo redaktorîya beşên kurdî, azerî û rûsî dikin. Piştî sala 1994 Şamil Esgerov dibe berpirsyarê sereke yê rojnameyê û heta dawîya jîyana xwe (2005) vê xebatê berdewam dike. Rojname niha jî bi awayekî demdemî weşana xwe didomîne. Rojnameya *Dîplomat* jî di 2003an da dest bi weşanê kir û niha li Bakuyê rojnamegeriya kurdî temsîl dike. Rojname bi zimanê kurdî, tirkî, azerkî û rûsî digihije ber destê xwendevanên xwe. Berpirsyarê sereke yê rojnameyê Tahîrê Silêman e.<sup>173</sup> Keremê Anqosî di sala 1999an da li Tilbîsê rojnameya *Gelawêj* derxistîye. Herweha wî bi mijarên weke êzdayetî, pîrsgirêkên rojhilatzanîyê û zanyarî tevli kongreyên navnetewî bûye.<sup>174</sup>

Di nava rojnameyên kurdî ên Sovyetê da *Rîya Teze* xwedîyê cihekî taybet e. Rojnameya ku herî dirêj weşana xwe domandiye û ya herî bibandor *Rîya Teze* ye. Hejmara yekem ya *Rîya Teze* di 25ê Adara 1930yî da li Erîvanê derket. Ev rojname weşana bi zimanê kurdî ya Partîya Komunîst a Ermenistanê ye. *Rîya Teze* bi armanca propagandaya sîstema komunîst hate damezirandin. Gelek rewşenbîrên kurd ên wê

<sup>171</sup> Adnan Çelik, “Kurd, Kafkasya û Kurdoloji: Hevpeyvîn Bi Metin Yüksel Re”, *Wêje û Rexne*, j. 9/10, 2017, r. 89.

<sup>172</sup> <http://www.zazaki.net/haber/li-azerbaycan-edebyat-capemenya-kurd-2308.htm>

<sup>173</sup> <http://www.zazaki.net/haber/li-azerbaycan-edebyat-capemenya-kurd-2308.htm>

<sup>174</sup> Boyik, h.b. r .408-409.

demê di vê rojnameyê da xebitîn. Di serî da jî Erebe Şemo, Heciyê Cindî û Emînê Evdal. Ji ber ku wan salan kadroyên kurd ên gihîştî tunebûn Ermenîyên kurdîzan weke perwerdehî, şano û sînemayê di warê rojnamegerîyê da jî alîkarîyê dan kurdan. Di salên ewil da berpirsiyarê *Rîya Teze* Herûtîyûn Mikirtçîyan, Hiraçya Koçar û Gevork Parîs in. Ew heta sala 1934an vî karî dimeşînin. Ji 1934an heta 1937an Cergoyê Gêncî dibe berpirsiyarê rojnameyê. Di van salan da weşanên *Rîya Teze* zêdetir bultenên Partiya Komunîst in. Tîraja rojnameyê du salên ewil 600 heb e. di 1932an da dibe 1300î û her diçe zêde dibe. *Rîya Teze* ne tenê li Ermenistanê li hemû welatên Sovyetê ên kurd lê dijîn tê belavkirin. Salên ku zextên Stalîn zêde dibin *Rîya Teze* jî para xwe ji van zextan distîne. Di sala 1938an da tevî rawestana hemû xebatên kurdî *Rîya Teze* jî tê girtin. Piştî mirina Stalîn, di sala 1955an da *Rîya Teze* dîsa dest bi weşanê dike lê vê carê bi alfabe ya kirîlî ye. Mîroyê Esed heta 1989an dibe berpirsiyarê rojnameyê. Qaçaxê Mirad û Emerîkê Serdar jî dibin cîgirê berpirsiyar. Şikrîyê Xido û Babayê Keleş jî alîkarî didin.

Eskerê Boyik Giringîya *Rîya Teze* bi van gotinan tîne ziman:

Sala 1961 ê, dema ez çûme bajarê Yêrêvanê xwendinê rêdaksya RÎYA TEZE ji min ra bû zanîngeha duda ya ziman, edebiyat, kûltûr û dîroka kurdî. Gerekî bi heqî bê şêkirandin ku ne tenê ji min ra, lê payê pirrê rewşenbîrên me yên wê demê ra bû navendeke hev girtinê, fêrbûnê û pêşdaçûyînê. Me, kesî dibistana da, ziman, dîrok edebiyata kurdî bi rêk-pêk nexwendibû, me pak erdnîgariya welatê xwe, dîrok û kûltûra wê ji nizanibû. Efrandarên meye gênc û ahil, di oda para edebiyat û kûltûrayê da li hev dicivayan, ji hev û efrandariyên hev ra dibûn nas, berhemên xweye nû dixwendin<sup>175</sup>

*Rîya Teze* bi weşanên xwe mohra xwe li çand û edebiyata kurdî xistiye. Rêya hemû rewşenbîrên wê demê di *Rîya Teze* da derbas bûye û gelek ji wan wê demê bi xebata *Rîya Teze* dest bi kar û barên kurdî kirine. Xeynî ji Şekiroyê Xudo, Prof. Şerefê Eşîr, Prof. Karlanê Çaçan, Xelîlê Çaçan Mûradov û Ahmedê Hepo ji Erebe Şemo heta Eskerê Boyik gelek kesên din jî ne bi awayeke resmî be jî tevli xebatên rojnameyê bûne. Belkî jî ji ber vê yekê Boyik *Rîya Teze* weke ansîklopediya jîyana kurdên Sovyetê pênase dike.<sup>176</sup>

<sup>175</sup> Boyik, h.b. r. 53.

<sup>176</sup> Boyik, h.b. r 65-66.

Navê gundekî kurdan jî guherandine û kirine Riya Teze. Navê gund ê berê Qundexsaz bû.<sup>177</sup> *Riya Teze*, di serdema nû da hefteyê du rojan û bi çar rûpelan tê weşandin. Sê rûpelên wê ji bo biryar û daxuyanîyên dewletê tînan veqetandin. Yek rûpela ku dimîne jî Emerîkê Serdar û Egîtê Xudo ji bo edebiyata kurdî bikar tînin. Di vê serdemê da Eliyê Evdîrehman, Mîkailê Reşîd, Wezîrê Eşo û Têmûrê Xelîl jî tev li kadroya rojnameyê dibin.

Di dema Sovyetê da *Riya Teze* ji aliyê dewletê ve dihate finanskirin ji ber vê yekê piştî belavbûna yekîtiya Sovyetê *Riya Teze* bi pirsgerêkên aborî re rûbirû dimîne. Gelek xebatkar mecbûr dimînin ku ji rojnameyê veqetin. Piştî belavbûna Sovyetê Tîtalê Efo dibe berpirsiyarê *Riya Teze* û rojname cardin vedigere alfabeya latînî. Di vê serdemê da derketina rojnameyê kêr dibe carinan hefteyê carekê carinan mehê an du sê mehan carek derdikeve. Xebtkarên weke Grîşayê Memê, Rizganê Cango û Mîrazê Cemal ji rojnameyê venaqetin û hewl didin ku wê li ser piyan bihêlin.<sup>178</sup> Di 1991ê da Emerîkê Serdar dibe berpirsiyar û heta sala 2006an vî karî dibe. Piştî wî Grîşayê Memê bû berpirsiyar. Piştî wî jî Tîtalê Kerem, Rizganê Cango, û Mîrazê Cemal berpirsiyariya *Riya Teze* kirin.<sup>179</sup> Niha li gor qanûnê rojname nehatîye girtin lê bi awayeke aktîf dernakeve. Malperek bi navê “Ria Taza” vebûye ku bi zimanê kurdî û rûsî weşan dibe. Navenda malperê li Moskovayê ye lê berpirsiyarê wê Têmûrê Xelîl dîyar dibe ku eleqeya malperê bi rojnameyê re tune ye. Navê “Ria Taza” bi awayeke sembolîk bikar anîne.<sup>180</sup>

---

<sup>177</sup> Reşîd, h.g. r. 14.

<sup>178</sup> Ulugana, h.g. r. 44-45.

<sup>179</sup> [https://tr.wikipedia.org/wiki/Riya\\_Teze](https://tr.wikipedia.org/wiki/Riya_Teze)

<sup>180</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

# BEŞA DUYEM

## RADYOYA ERÎVANÊ

### 2.1. Destpêka Weşana Radyoyên bi Kurdî

Weşanên radyoyên bi kurdî yên ewil, bi destê dewletên cuda pêk hatine. Piştî şerê cîhanê yê yekem gelek radyoyên bi kurdî hatin damezirandin. Ji Sovyetê heta dewletên ereban û Amerîka bi kurdî weşanên radyoyan kirine. Ev weşan bi giştî ji bo ku propaganda li ser kurdan were meşandin dihatin kirin<sup>181</sup> lê bê hemdê xwe bin jî ji bo muzîk û dengbêjîya kurdî arşîveke mezin pêk anîne.

Kurd, di nava gelên Rojhilata Navîn de girseyeke girîng in. Dewleta Sowyetistan û Emerîka ji bo berjewendiyên xwe yên li Rojhilata Navîn dabîn bikin, dixwestin ku Kurdan jî bikêşin aliyê xwe. Ev yek ji bo dewleta ku dixwest li herêmê hêza xwe bi pêşde bibe, pêwîstiyek bû. Ji ber vê sedema girîng di radyoyan de weşanên bi zimanê kurdî hatin lidarxistin. Divê ev jî bê gotin ku, di weşanên kurdî de du rêbazên ji hev cuda hatine şopandin. Di weşanên radyoyan de, Emerîka li ser mihafezekerbûna kurdan, Sowyetistan jî li ser netewebûna kurdan polîtîkayên xwe dane meşandin. Nemaze dewleta Sowyetistan ji bo van weşanan, avahiyên bingehîn yên birêkûpêk ava kirine û piştî ev weşan li gelemperiya herêmên kurdan belav kirine.<sup>182</sup>

Radyoyên ku bi kurdî weşan dikirin, di bin sê serenavan da tên komkirin: radyoyên di bin bandora Amerîkayê da, yên di bin bandora Sovyetê da û yên Îranê. Amerîkayê bi muttefikên xwe ra gelek radyoyan damezirandine. Pîrî ji wan di demeke kurt da hatine girtin lê yên Îranê demeke dirêj weşan kirine û bi bandor bûne. Mebesta radyoyên Îranê entegrasyona kurdan li Îranê û bişavtina (de-etnizasyon) wan bû. Li Îranê weşana kurdî ya yekemîn di sala 1945an da li Radyoya Tebrîzê bû. Ya duyemîn di sala 1946an da li Komara Mahabadê bû. Di weşanên Komara Mahabadê da bi zaravayê soranî weşan dihat kirin, bernameyên axaftin, nûçe û muzîkê dihatin weşandin. Amerîka ji bo ku pêşî li Sovyetê bigire car din ket nava hewldanan û bi Îranê re peymanek çêkir. Di encama vê peymanê da di sala

<sup>181</sup> Ağcakulu, h.g. r.50.

<sup>182</sup> Mustafa Öztürk, “Weşangeriya Radyoyên Kurdî, Radyoya Êrîwanê û Dengbêjî”, *Mulemma*, 2016, j. 3, Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê, 2019. r. 40.

1950yî da di navbera Radyoya Dengê Amerikayê (Voice Of America) û hikûmeta Îranê da weşanên herêmî hatin kirin. Îranê li gor vê peymanê li Senendecê îstasyonek damezirand û weşana kurdî bi destê artêşa Îranê hat kirin. Bernameyên radyoya Senendecê ji şîroveyên siyasî, nûçe, helbest û muzîkê pêk dihate.<sup>183</sup>

Radyoyên kurdî ên herî bibandor û domdirêj, ji aliyê Amerîka û Dewleta Sovyetê ve hatine damezirandin. Hin radyoyên kurdî jî hebûn ku rasterast ev her du dewlet ava nekiribin jî piştgirî didan wan. Di navbera salên 1923 û 1929an da ewilîn weşana radyoyê ya bi zimanê kurdî li Kurdistana Sor tê lidarxistin. Lê ji ber hilweşîna vê otonomiyê ev weşan bi dawî dibe. Mela Mistefa Barzanî di sala 1949an da di Radyoya Bakuyê da axaftinek dike. Ev axaftin rê li ber weşangeriya kurdî ya radyoyan vekir. Piştî vê axaftinê dewletên herêmê li ser kurdan dest bi propagandayên xwe kirin. Di vê çarçoveyê da, di sala 1957an da li Qahîreya Misirê di radyoya bi navê “Dengê Ereban” da li dijî Iraqê weşanên kurdî dest pê kirin. Radyoya Qahîreyê, weşanên dijberî monarşîya Iraqê û deşîfrekirina Pakta Bexdayê esas digirt. Ji bo vê armancê jî xîtabî neteweperwerîya kurdan dikir û sirûdên neteweya kurd ên weke “Ey Reqîb” û “Ey Kurdino” diweşand. Ji ber van weşanan Tirkîye, Îran û Iraqê Dewleta Sovyetê û Misirê protesto kirin. Misirê li ser vê anî ziman ku ev weşan ji bo kurdên Sûriyeyê ne.<sup>184</sup>

Radyoya Bexdayê Di nava salên 1936-1958an da Li Bexdayê bi piştgirîya Îngilistanê weşan kiriye. Helwesta Radyoya Bexdayê li gor şert û mercên siyasî diguherî. Rojê 2 saet û 45 deqîqe bi kurdîya soranî weşan dikir. Berpirsiyarê Radyoya Bexdayê Kamil Kakemîn bû.<sup>185</sup> Di bernameyên ewil da nûçe û muzîk hebû. Piştî ku dema weşanê zêde bû bernameyên dînî û nameyên guhdarvanan jî lê hat zêdekirin. Mebesta bernameyên dînî entegrekirina kurdan li Iraqê û pêşîlêgirtina propagandaya sosyalîzmê bû. Meyla polîtîkayên Radyoya Bexdayê li ser fikrên Amerîka û Îngilistanê bû lê di sala 1958an da li Iraqê monarşî hilweşiya. Iraq ji pakta Bexdayê derket û nêzîkî Sovyet û Misirê bû. Van rûdanan bandorê li weşanên radyoyê jî kir û piştî 1958an Radyoya Bexdayê ket bin bandora Sovyetê. Kurdan bi hesta neteweperwerîyê di weşana radyoyê da bi ereban re mafên wekhev dixwestin. Heta salên 1960î ji ber bûyerên siyasî êdî weşanên kurdî zêdetir weşana muzîkê dikir û bernameyên din kêmbûn. Piştî 1968an weşanên radyoyê bi giştî bûbû weke

---

<sup>183</sup> Ağcakulu, h.g. r. 49-50.

<sup>184</sup> Ağcakulu, h.g. r. 53.

<sup>185</sup> Elend, h.b. r. 82.

propagandaya rejîma Baasê. Li hember vê yekê bernameyên li ser şano, çîrok, rêzimana kurdî, bernameyên zarokan, bernameyên çandinîyê û yên ji bo jinan hatine weşandin. Xeynî ji vana li Iraqê di salên 1961-1975an da di dema şerê otonomîyê da kurdan bi xwe jî hin weşanên radyoyan ên nepen kirine.<sup>186</sup> Di sala 1993an da destûr tê dayîn ku di Radyoya Dewleta Azerbaycanê da hefteyê du caran û her carê 15 deqîqe weşana bi kurdî bê kirin. Ji roja destpêkê heta niha Ehmedê Hepo berpirsariya beşa kurdî ya radyoyê dike. Kesên wekî Kamîz Şeddadî, Tamara Refo, Kubara Refo û Fexredîn Paşayêv jî di radyoyê da bi salan ked dane.<sup>187</sup> Di sala 1978an da di radyoya Gurcistanê ya dewletê da beşa axaftinên kurdî vebû, hefteyê 10 deqe dema wan hebû.<sup>188</sup> Berpirsiyarê beşê Keremê Anqosî bû.<sup>189</sup> Weke ku li jor hat behskirin weşanên kurdî ên nepen jî hebûn. Lîsteya hin radyoyên ku bi kurdî weşan kirine ên nepen weha ye:

**Sadey-i Milliye-i Îran:** Di sala 1959an da bi soranî weşan kiriye.

**Radyoya Peyk-î Îran:** Ji Ewropayê di nava salên 1961-1976an da bi soranî rojê niv saet weşan kiriye.

**Radyoya Dengê Kurdistanê:** Di navbera salên 1961-1975an da ji alîyê tevgera Kurdistanê Iraqê ve hatiye damezrandin. Rojê saetek weşan dikir. Bernameyên nûçe û muzîkê pêşkêş dikirin.

**Radyoya Dengê Kurdistanê:** Di navbera salên 1963-1984an da ji Kurdistanê Îranê bi soranî û kurmancî weşanê dikir.

**Dengê Kurdistanê Îranê:** Di navbera salên 1973-1975an da ji Bexdayê bi soranî weşanê dikir.

**Radyoya Yekîtiya Niştimanperwerê Kurdistan:** Di sala 1983an da li Kurdistanê Îranê dest bi wişanê kir û niha jî weşana xwe didomîne.

**Radyoya Dengê Kurdistanê Îranê:** Di sala 1983an da li Kurdistanê Iraqê, bi zaravayê soranî dest bi wişanê kir û niha jî weşana xwe didomîne.<sup>190</sup>

---

<sup>186</sup> Ağcakulu, h. g. r. 53-54.

<sup>187</sup> <http://www.zazaki.net/haber/li-azerbaycan-edebyat-capemenya-kurd-2308.htm>

<sup>188</sup> Kamran Elend di pirtûka xwe ya bi navê *Kimliği Terennüm Etmek* da ku xwe sipartiyê Hassanpour vê demê weke 20 deqe destnîşan dike, (2021. r.57.) lê Eskerê Boyik di berhema navborî da di rûpela 29an û ya 408an da du caran tîne ziman ku dema vê weşanê 10 deqe ye.

<sup>189</sup> Boyik, h. b. r. 408.

<sup>190</sup> Ağcakulu, h.g. r. 55.

## **Lîsteya radyoyên ku li jorê hate behskirin û hin radyoyên din:**

**Lewant:** Di nava salên 1941-1946an da li Beyrûdê bi piştgirîya Fransayê weşan kiriye. Hefteyê du rojan bi zaravayê kurmançî nîv saet weşan dikir. Weşana nûçe û muzîkê dikir.

**Şerqu'l-Edna/Yafa:** Di nava salên 1935-1945an da Li Bexdayê bi piştgirîya Îngilistanê weşan kiriye. Rojê saetek bi kurdîya soranî weşan dikir.

**Radyoya Bexdayê:** Di nava salên 1936-1958an da li Bexdayê bi piştgirîya Îngilistanê weşan kiriye. Rojê 2 saet û 45 deqîqe bi kurdîya soranî weşan dikir. Piştî sala 1958 ket bin bandora Dewleta Sovyetê .

**Radyoya Tehranê:** Li Tehranê bi destê dewleta Îranê rojê saetek weşan dikir.

**Radyoya Senendecê:** Li Tehranê bi destê dewleta Îranê rojê 3 saetan weşan dikir.

**Radyoya Kirmanşahê:** Li Tehranê bi destê dewleta Îranê rojê 2 saetan weşan dikir.

**Radyoya Reza'îye:** Li Tehranê bi destê dewleta Îranê rojê saetek weşan dikir. (Niha bi navê Êrmiye weşana xwe didomîne.)

**Radyoya Meşhed:** Li Tehranê bi destê dewleta Îranê heftê 3 roj û her rojek nîv saet weşan dikir.

**Radyoya Kurdistana Sor:** Li Moskovayê bi piştgirîya Sovyetê di sala 1924an da dest bi weşanê kir.

**Radyoya Qahîreyê (dengê ereban):** Di nava salên 1957-1958an da li Qahîreyê bi piştgirîya Sovyetê weşan kiriye. Rojê 45 deqîqe weşan dikir.

**Radyoya Tiflîsê:** Li Tiflîsê bi piştgirîya Dewleta Sovyetê di sala 1946an da dest bi weşana xwe kiriye.<sup>191</sup>

**Voice of America (Dengê Amerîka):** Ajansa fermî ya Amerîkayê ye. Ji 40 zimanên wê yên weşanê yek jî kurdî ye. Beşa Kurdî ya Dengê Amerîka ji sala 1992yan da weşana kurdî dike.<sup>192</sup>

---

<sup>191</sup> M. Öztürk, h.g. r. 41.

## 2.2. Dîrokçeya Radyoya Erîvanê

Radyoya Erîvanê di sala 1955an da hate damezirandin. Weşana radyoyê bi 15 deqeyan dest pê kir. Ev weşan test bû û lokal bû. Berpirsiyarê radyoyê yê ewil Casimlê Celîl bû. Di serî da tenê du kes weke xebatkar hebûn. Ew jî berpirsiyar Casimlê Celîl û spîker Eznîva Reşîd bûn. Ji bo ku spîkera radyoyê were hilbijartin pêşbirkek hate lidarxistin. Eznîva Reşîd di vê pêşbirkê da bû yekem û weke spîker hate hilbijartin. Wê karê spîkerîyê heta sala 1982an, yanî 27 salan domande. Di demên ewil da rewşenbîrên weke Hacıyê Cindî, Eminê Evdal û Erebe Şemo ji bo weşanê dibûn alîkar.<sup>193</sup> Di serî da tenê nûçeyan didan û ji bo weşana muzîkê destûr tunebû lê radyoyê bi israra rewşenbîrên kurdan kilameke Şamilê Beko weşande.<sup>194</sup> Di sala 1957an da komîsyoneke ku ji rewşenbîrên kurd û ermenîyan pêk tê dicive. Di encama nirxandina komîsyonê da Xelîlê Çaçan dibe berpirsiyar.<sup>195</sup> Piştî ku Xelîlê Çaçan bû berpirsiyar êdî serdemeke nû desp pê kir. Xelîlê Çaçan Mûradov ji bo radyoyê karên gelek giring meşande. Ew bi alîkarîya rewşenbîrên wê demê di warê muzîk, şano û mijarên curbicur da bernameyan dide çêkirin. Ew bi xwe beşdarê hin berhevkirina stranên gelerî dibe. Dengbêjên weke Fatma Îsa û Şeroyê Biro bi saya wî dikevin nav klasîkên kurdî. Xelîlê Çaçan Mûradov hin şanoyan jî ji bo radyoyê bi xwe dinivîsîne. Di radyoyê da karên herî giring di serdema berpirsiyarîya Xelîl Mûradov da hatin kirin.

Beşa muzîkê bi navê Fonda Zêrîn di nav beşa kurdî ya radyoyê da vedibe. Peywira fonda zêrîn jî ew e ku kilam û meqamên kurdî tomar bike û biweşîne.<sup>196</sup> Xelîlê Çaçan heta sala 1981ê berpirsiyarîya radyoyê kir. Casimê Celîl jî bû berpirsiyarê beşa muzîkê. Dema radyoyê jî hate zêdekirin û weşan êdî her roj bû. Di zêdekirina dema radyoyê da bandora serdana Mele Mistafa Barzani roleke giring digire. Dema ku Barzani diçe serdana radyoyê dibêje; “Hûn ji bo kurda xizmet dikin, ez dikarim ji bo we çi bikim?” Li ser vê pirsê Xelîl Mûradov û Erebe Şemo

---

<sup>192</sup> <https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/04/25/ji-radyoya-erivane-heya-podcast-kurdiye-panoramayeke-gisti-ya-podcasten-kurdi>

<sup>193</sup> Ağcakulu h.g. r. 57.

<sup>194</sup> Ömer Orhan, vê agahîyê ji Hejarê Şamil girtiye (r. 24) lê Eskerê Boyik di berhema navborî da (r. 77-78) tîne ziman ku strana yekem ku hatiye weşandin ya Efoyê Esed e. Navê stranê jî Bêrîvanê ye. Dema ku em her du çavkaniyan didin ber hev em dibînin ku Hejarê Şamil behsa weşana testê dike lê Eskerê Boyik behsa piştî testê dike.

<sup>195</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>196</sup> Polat Can, *Qulungên Rewanê*, Sîtav, 2021, r. 29.

daxuyanîyekê (nameyek) amade dikin û didin Mele Mistafa Barzanî. Ew jî vê daxuyanîyê dide rêvebirên dewleta Sovyêtê. Sê meh şûnda agahîyek tê û weşana radyoyê derdikeve 90 deqeyan. Heta sala 1989an weşana radyoyê 90 deqe bû.<sup>197</sup> Bi antêneke (satelayt) nû weşana Radyoyê êdî digihîşte hemû kurdan. Ji Bexdayê heta Asyaya navîn (Xorasan) û Bakûr hemû kurdan êdî dikaribû guhdar bikirana. Piştî Casimê Celîl; Dewrêşê Efo 2 sal, Nûra Cewarî 2 sal, dûre jî Cemîla Celîl ji 1967an heta 2003an bûn berpirsiyarê beşa muzîkê ya Radyoya Erîvanê.<sup>198</sup>

Di sala 1981ê da dewleta Sovyêtê ber bi hilweşînê ve diçû û pirsgerêkên aborî dest pê kiribûn. Ev pirsgerêk li weşana radyoyê jî bandorê kir û ji ber ku piştgirîya aborî kêmtir bû weşanên radyoyê jî kêmtir bûn. Ev kêmbûna aborîyê di sazîyên kurdan ên din da jî hate dîtîn. Ne tenê radyo, rojname û enstîtuyên kurdan jî ji ber van pirsgerêkan êdî weke berê ne çalak bûn. Ahmedê Gogê di nav salên 1981-1992an da berpirsiyarîya radyoyê kir. Têmûrê Xelîl jî di nava salên 1981-1984an da di beşa çandê da edîtorîyê kir. Di vê serdemê da weşan daketibû 45 deqeyan. Piştî wî Keremê Seyad bû serokê radyoyê û niha jî rojê 30 deqe weşan dikin. Piştî hilweşîna Sovyêtê antêna radyoyê jî hate hilanîn û weşan êdî nagihîje her derî.<sup>199</sup> Radyo niha ji bo ku neyê girtin berxwe dide. Ev radyoya ku salên dirêj weke dibistaneke çandî û hunerî xizmeta gelê kurd kir niha bi saya Keremê Seyad û malbata wî vekirî ye. Keça wî Leyla Kerem û kurê wî Tîtalê Kerem jî hewl dane ku radyoyê li ser piya bihêlin.<sup>200</sup> Ermenistanê niha jî radyoyê negirtîye lê piştgirîya aborî nade lewre radyo bi îmkânên xwe hewl dide ku weşana xwe bidomîne.<sup>201</sup>

Spîkera ewil weke ku li jor jî hate behskirin Eznîva Reşîd e. Piştî wê kesên weke Nûrê Polatova, Keremê Sayed, Sêvaza Evdo, Sîdarê Emîn, Ordîxanê Celîl, Maksîmê Xemo, Lûsîka Huseyn û Gulîzera Casim di radyoyê da spîkerîyê kirine. Niha jî kurê Keremê Seyad Tîtalê Kerem spîker e.

Kesên ku di dema serokatiya Xelîl Mûradov da demên cuda di radyoyê da xebitî ne ev in: Mirazê Evdo, Şikoyê Hesên, Fêrikê Ûsiv, Emerîkê Serdar, Qaçaxê Mirad, Wezîrê Eşo, Mîkaêlê Reşîd, Têmûrê Xelîl, Tosinê Reşîd, Îşxanê Eslan, Sîma

<sup>197</sup> Ji arşîva Têmûrê Xelîl. Dosya 1.

<sup>198</sup> Zerî Înanç, *Di Radyoya Erîvanê De Dengê Kurdî*, ÎBV, 2016, r. 36.

<sup>199</sup> Ji arşîva Têmûrê Xelîl. Dosya 1.

<sup>200</sup> Nîhat Gultekîn, “Qonaxa Rewşenbîriya Zimanê Kurdî: Radyoya Yêrêvanê” *Nûbihar*, j. 126, Stenbol, 2014, r. 34.

<sup>201</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=kJe1Snt2Hn0>

Semend, Nûra Cewarî, Barîyê Mehmûd, Cemîla Celîl, Titalê Efo, Cemalê Ûsiv, Ahmedê Gogê, Barîyê Mehmûd û Memê Eylaz.<sup>202</sup>

Bi zêdebûna dema radyoyê bernamêyên curbicur hatin çêkirin. Di nava bernamêyan da hefteyê rojekî ji bo wêjeyê dihate veqetandin. Nivîskarên kurd dihatin radyoyê û berhemên xwe bi xwe dixwendin. Behsa pêşketina edebîyat û çanda kurdan a li Ermenistanê dihate kirin. Derbarê nivîskar û kurdzanên bi nav û deng da agahî dihate dayîn. Bi taybetî di salên dawî da nimûneyên ji edebiyata kurdî ya klasîk dihatin xwendin.<sup>203</sup> Di arşîva radyoyê da xeynî ji kilaman nameyên guhdarvanan û qeydên telefonan jî hene. Ev bernamêyên ku Keremê Seyad amade dikir li ser jîyan, çand, ziman û dîroka kurdan bûn. Navên van bernamêyan li jêr e:

Serhildanên Kurdan,

Rojnîşa Çandê,

Zimanê Te Yê Dê

Pênçşema Edebiyatê

Xerîbên Xwe Digerim

Rasthatin û Bîranîn

Fikra Guhdarên Me.<sup>204</sup>

Ji bilî van bernamêyan Sîma Semend bi Aslîka Qadir re bernamêyên wêjeyê amade dikir.<sup>205</sup> Cemîla Celîl jî bernamêyeke bi navê “Posta Sazbendîyê” amade dikir.<sup>206</sup>

Radyoya Erîvanê ji bo civaka kurd ne tenê navenda nûçe û mûzikê bû. Di heman demê da berhemên folklorê kurdî yê weke çîrok, çîvanok û destan jî dihatin weşandin. Gel, atmosfera wê demê ya siyasî û civakî ji radyoyê dikir. Xeynî ji vana di Radyoyê da roman û helbestên Kurdî jî dihatin neqilîkirinê. Yek ji van romanên ya Erebe Şemo ye. Ji helbestan jî yê Cigerxwîn û gelekên din dihatin weşandin. Yek ji dewlemendîya radyoyê jî ew e ku xebatên wê yê şanoyê ne ku weke

<sup>202</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>203</sup> Eşo, h.b. r. 77.

<sup>204</sup> Hasan Akboğa, “Yasak Bir Dilin Çılgılığı Veya Kürt Aydınlanmasının Kalesi: Radyoya Rewanê”, *Kürt Tarihi*. j. 4, 2012-2013, r. 18.

<sup>205</sup> Hevpeyvîna me ya bi Aslîka Qadir ra.

<sup>206</sup> Înanç, h.b. r. 95.

radyokompozîsyon dihatin binavkirin. Ev şano piştî kar êvaran dihatin qeydkirin. Navê hin şanoyên radyoyê tevî nivîskarên wan li jêr in:

Elenewêrek: Xelîlê Çaçan Mûradov

Gîkor: Hovannes Tumanyan

Hisret (Bêrî): Hraçya Koçar

Bê Qelen: Fêrikê Ûsiv

Merî Gerekê Pêşekê Bizanibe: Xelîlê Çaçan Mûradov

Xecê û Sîyabend: Semend Sîabendov

Sîsê: Mîroyê Esed

Remo, Şemo û Temo: Wezîrê Eşo

Zembîlfiroş: Xelîlê Çaçan Mûradov

Şengilo Mengilo Qalinçenglo: Şikoyê Hesên

Kumsor: çîrokeke rûsan

Mêmê û Eysê: Xelîlê Çaçan Mûradov

Gulîzer: Emînê Evdal

Dimdim û Xanê Çengzêrîn: Erebe Şemo

Mahar, Zahar, Tahar û Gulbahar: Şikoyê Hesên

Mem û Zîn û hin xebatên din.<sup>207</sup>

### **2.3. Bandora Radyoya Erîvanê**

Radyoya Erîvanê bi weşanên xwe bandoreke mezin li ser kurdan dikir. Ji ber qedexeya kurdî ya li bakûr kurdên li wir eleqeyek mezin nîşan didan. Cûdahîya Radyoya Erîvanê ji radyoyên kurdî ên din jî ew bû ku bi kurmancî weşan dikir. Weşana radyoyên din jî digihîşte bakûr lê ji ber ku bi piranî bi zaravayê soranî bû kêr dihat fêmkirin. Kurdên bakûr bi hêsanî Radyoya Erîvanê fêmkirin. Niha li

---

<sup>207</sup> Gultekîn, h.g. r. 29.

bakûr bîranînên gelek kesan li ser van weşanan hene. Mahmut Evdila (Beğik) weha behsa Radyoya Erîvanê dike:

Di dema Radyoya Erîvanê da dewleta sovyet Sosyalist weke perdeyekî di navbera wan û welatên din da hebû. Çûn û hatin wê çaxê ne mumkun bû. Min bi xwe jî guhê xwe di dengbêjîyê da bi Radyoya Erîvanê vekir. Sala 1963 bû. Wê çaxê ez zarok bûm. Her piştî nîvro saet çarê êvarê Radyoya Erîvanê dest bi weşana xwe dikir. Em xwuşk û bira tev eger mêvanên me yên nêz hebûna û bavê min ne li malê bûya (ku bavê min li malê bûya radyo jê ra bû) em li dora radyoyê dicivyan me li Radyoya Erîvanê guhdar dikir. Dengê wan ê balkêş pirî cara bi *Welatê Me Kurdistanê* vedikirin. Aslîka Qadir digote.<sup>208</sup>

Celîlê Celîl jî derbarê mijarê da bîranînek xwe weha tîne ziman:

Nava gera mi ya pîr caran li herêmên Kurdistanê, çî li Îranê, çî li Iraqê, çî li Tirkîyê û Sûriyê, Ji bona lêkolîn û civandina materyalên êtnolîngûstîk, ez rastî gelek kurdên dilovan dihatim. Wan hema navê Yêrêvanê dibihîst, beşera wan xweş dibû û bi dilxwazî xebirdanê ser radyoya kurdî dest pê dikir.<sup>209</sup>

Hemû kurdan ji bo ku li Radyoya Erîvanê guhdarî bikin radyoyan distendin. Li Amedê dema ku kesek radyoyek bistenda di saeta weşana Radyoya Erîvanê da diçûn distendin. Ewil kontrol dikirin. Ku ew cîhaz Radyoya Erîvanê bikşanda ew bawerî çêdibû ku ev cîhazeke baş e.<sup>210</sup> Eleqeya gel bi taybetî li ser stranan bû. Radyokompozîsyonên Radyoya Erîvanê jî eleqeyek mezn didîtin. Di van lîstikan da hem xebatkarên radyoyê hem jî lîstikvanên amator dilîstin.

Navê ên ku ji gundan dihatin di bîra min da nemane lê ez zanim ku ji ronakbîrên me hema hemû ketine şanoyê û di wan şanoyan da lîstine. Egîdê Abasî, Emerîkê Serdar, Keremê Seyad, Eznîva Reşîd, vana yên li Riya Teze kar dikirin, yên li radyoyê kar dikirin, kesên ku helbestkar û nivîskar bûn ew şûreta wan a lîstiknavîyê jî hebû. Gazî wan dikirin, kurdîya wan jî xweş bû. Hinekan zarokên xwe jî dianîn. Xwişk û birayên min jî di hinekan da lîstine, tenê min nelîstîye têda. Wan salan teknîk jî awqas xwurt nînbû, heta teyib jî tune bu ku meriv wana hinek tiştan qeyid bikira. Ew dengnivîsok/teyibên mezin yên radyoyê hebûn ku nedifirotin, yên dewletê bûn, tenê ji bo radyoyê

<sup>208</sup> Hevpeyvîna me ya bi Mahmud Evdila ra.

<sup>209</sup> Înanç, h.b. r. 17.

<sup>210</sup> Ji arşîva Têmrê Xelîl, Dosye 2. (Civat û Kilam, beşa 59an.)

çêdikirin û ew li wan deran tenê hebû. Teknik jî awqas xwurt nînbû lê arşîvek dewlemend hate qeydkirin û ji gelê me re hate hêştin. Ya here sereke ew e.<sup>211</sup>

Bandora radyoyê tenê bi şano û stranan nedima. Bi saya Radyoya Erîvanê dengê kurdî gihîşte hemû deverên kurdan û kurdên perçeyên din ji hebûna kurdên Sovyetê haydar bûn. Di wê serdemê da ji bo vê yekê jî Radyoya Erîvanê yekane rê bû.<sup>212</sup> Radyoya Erîvanê weke netewekê jî bandorê li kurdên bakûr dikir. Weke ku tê zanîn di wan salan da qedexa û zextên tund li ser kurdan hebûn. Ne tenê li ser ziman, peyva kurd bi xwe jî sûceke mezin bu.<sup>213</sup> Di van şert û mercan da weşana radyoyek ku bi kurdî digihîşte wan heyecanek mezin bi wan ra çêkir.

Li Iraq û Îranê îstîkrarek siyasî tunebû. Vê yekê li weşana radyoyan jî bandorê dikir û weşanên wan ne domdirêj û yekgirtî bûn. Li hember vê yekê Radyoya Erîvanê bi alîkarîya dewleta Sovyetê bêyî pirsgirêk û bi îstîkrar weşana xwe didomand. Bi saya vê yekê jî xebatkarên Radyoya Erîvanê arşîvek mezin ya muzîka kurdî ava kirin.<sup>214</sup> Di vî karî da motîvasyona xebatkarên radyoyê ya herî mezin hesta neteweperwerîyê bû. Haya wan jê hebû ku ji bo parastina çand û zimanê miletekê berhevkirina stran, destan û hwd çiqas giring e. Wan qeydkirina stranan weke xizmeteke mezin didîtin. Xebatkarên radyoyê karmendên dewletê bûn lê piştî mesaiyê bi dilxwazî dîsa xebata xwe didomandin. Têmûrê Xelîl vê helwestê weha tîne ziman:

“Wan salan karê radyoyê 24 saet bû. Bi dil û can dikirin û ermenîyan hinek caran şikyat dikirin digotin heyra sibê heta êvarê li van odayên redaksîyona kurdî dengê def û zirnê tê, nahêlin em kar bikin.”<sup>215</sup> Qeydkirina stranan gelek zehmet bû, me dengbêjan ji gundan dianî. Dengbêjek serê çiyê ye tu wî tîni bajêr. Camêr hiç cara nehatiye bajêr û dikeve studyoyê, xwe şaş dike. Di wir da dibê ez nizanim bistrêm. Tedî ketiye odayek qafîkek (berguhkê qeydê) wê rojê me nedinivîsande (tomar nedikir). Du sê rojan li erîvanê mêvan diman. Wan salan otêl motêl jî tunebûn. Yanî welatparêzî wisa kiribû ku van kesan ji dest xwe bernedin. Dengê wan bèn qeydkirin.<sup>216</sup>

<sup>211</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>212</sup> Elend, h. b. r. 86.

<sup>213</sup> <https://www.bernamegeh.com/sark-islamhat-plani-ve-raporu/>

<sup>214</sup> Elend, h. b. r.89.

<sup>215</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>216</sup> Ji arşîva Têmûrê Xelîl, Dosye 1.

Wan vî karî weke peywireke neteweyî didîtin û karê xwe bi cidiyeteke mezin dikirin. Em vê helwesta wan di hemû pirtûk, nivîs û bîranînên rewşenbîrên wê demê ên Sovyetê da dibînin.

Radyoya Yêrêvanê navê xwe ne tenê dîroka gelê kurd, lê dilê her kurdekî herçar perçên Kurdistanêda hîşt. Dengê wê hidûdên dewletêya pola qewl û qanûnên desthilatdarên dagîrkar yê şovînîst nas nedikir û bê astengî dikete her maleke kurdan. Wê demê, gava ziman çand, edet, nav-nasname, her tiştê kurdewarî li welatê kurdan, mala Kurdan da qedexe bûn, nîrê asîmlasyona giran û teng xelkê kurd difetisand, wek ronkayê, nûra gumanê, aparatên radyoyê bêroh malên kurdada deng didan, digotin: “yêrêvan xeber dide!”. Wî dengî ruhê kurmançî, axaftina kurmançî, kilam, reqas, ewaz, ken û henek keser û jiyana kurmançî tije malên kurdan dikir. Xelkê kurd li xwe dihesiya ... gelek nizanbûn, ku piş wî dengî, li avaykîkî kolanê Yêrêvanê, komek kurdên welatparêz, bi rêveberiya Xelîl Mûradov sekinîne, şev û roj dixebitin, ku ruhê kurdewarî belayî welatê xwe yî dagîrkirî bikin, nehêlin neyarên kurdan meremê xwe bînine cî.<sup>217</sup>

#### **2.4. Ji Alîyê Dengbêjîyê ve Radyoya Erîvanê**

Weke damezirandina radyoyên din ên kurdî mebesta damezirandina Radyoya Erîvanê jî meşandina propagandaya îdeolojîk bû lê radyo, ji bo folklor û muzîka kurdî bû çavkaniyek sereke. Sebeba vê yekê ya herî mezin jî ew e ku kadroya radyoyê ji welatparêzên kurd pêk dihat. Van kadroyan radyoyê weke amûreke muhafezekirin û tomarkirina çand û muzîka kurdî bikar anîn. Xebatkarên radyoyê derfetên ku bi dest xistin kirin xizmeta kuzîka kurdî û vî karî bi profesyonelî meşandin.<sup>218</sup> Xizmeteke wan a girîng jî ew e ku dengbêjîyê bi enstrumanên weke bilûr, mey û fiqê di formeke nû da pêşkêş kirin. Ev yek tiştêk nû bû ji bo muzîka kurdî lewre berîya Radyoya Erîvanê yekane enstrumana dengbêjan dengê wan bû.<sup>219</sup> Beriya xebatên Radyoya Erîvanê di sala 1914an de kompoziterek ermenî stranên kurdî berhev kirin û çap kirin. Ji bo sazbandîyê jî ji salên 1930î virda xebat hene. Dîsa, ermeniyekî din di salên 1930î da notayên muzîka kurdî çap kir. Di destpêka

---

<sup>217</sup> Boyik. h.b. r. 346.

<sup>218</sup> Boyik. h.b. r. 33-33.

<sup>219</sup> Ji arşîva Têmûrê Xelîl, Dosye 1.

salên 1960î da kurdan bi xwe dest bi xebatên muzîkê kirin. Pêşîyê Nûra Cewerî, piştîre jî Cemîla Celîl pirtûkên li ser muzîka kurdî çap kirin.<sup>220</sup>

Radyoya Erîvanê jî bo ku xebatên akademîk li ser stranên kurdî werin kirin jî derfetek pêk anîbû. Kurdologên ku li ser dengbêjîyê xebat dikirin jî stranên ku Radyoyê tomar dikir sûd werdigirtin. Van Kurdolagan li ser dîrok û naveroka stran û kilaman lêkolîn dikirin. Xebatkarên radyoyê jî van agahîyan di bernameyan da bi guhdaran re parve dikrin. Wekî mînak, straneka bi navê “Şerê Gilîdaxê” jî alîyê dîrok û wateya stranê ve hatîye şirovekirin. Akademîya Kurdolojîyê lêkolînan weke pirtûk jî çap kirine.<sup>221</sup>

Xebatkarên Radyoya Erîvanê jî ji bo ku dengbêjan bînin radyoyê û dengê wan qeyd bikin gund bi gund digeriyan. Ji bo birin û anîna dengbêjan dewletê pere nedida. Mesrefa wan, cîyê ku dê lê diman hemû xebarkarên radyoyê peyde dikirin heta wan li mala xwe jî dikirin mêvan. Di serî da tenê ji gundên kurdan ên li Ermenistanê berhevkarî dihate kirin. Piştî ku radyo di nav gel da belav bû û hate hezkirin jî kurdên Gurcistan, Qazaxistan û Qirxizistanê jî stran hatin berhevkirin. Li gor agahîyên ku ji alîyê xebatkarên radyoyê ve hatine dayîn, ji 1800î zêdetir stranên Kurdî niha di arşîva radyoyê da qeydkirî ne.<sup>222</sup> Em ji bîranînên berpîrsiyarê beşa muzîkê ya radyoyê Casimê Celîl hîn dibin ku hejmara dengbêjên ku dengê wan hatine qeydkirin ji 170yî zêdetir e.<sup>223</sup> Bîranînek Xelîlê Çaçan jî derbarê qeydkirina stranên Şeroyê Biro ku li Gurcistanê bû weha ye:

Bavê min dibê were Ermenistanê ez ê dengê te binivîsim (qeyd bikim), ew dibê ez ê bêm lê nay. Carek din bahs (xeber) dişîne dibê ka Şeroyê Biro nehat? Dibê ez ê îro bêm sibê bêm lê nay. Dûre bavê min mecbûrî diçe Gurcistanê Tîblîsê, bi rêya Keremê Anqosî studyoya Radyoya Gurcistanê kirê dike. Şeroyê Biro tîne wir, hemû stranên wî qeyd dike. Paşê dibêje yekser ez hatime vira çend dengbêjên din jî bibînim. Jêra dibêjin dengbêjên baş li Têlavê hene ne li Tîblîsê. Diçîne wir Cemîla Çawîş û Şebabê Egît hebûne li wira.<sup>224</sup>

---

<sup>220</sup> Receb Dildar, “Tosinê Reşîd: Li Welatekî Azad Rûmeta Meriv Heye”, *Bîr*, j. 2, Stenbol, 2005, r. 103.

<sup>221</sup> Gultekîn, h.g. r. 34.

<sup>222</sup> Ji arşîva Têmûrê Xelîl, dosye 1. (Nivîsa Ezîz Tekîn)

<sup>223</sup> Elend, h. b. r. 93-94.

<sup>224</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

Di encama van xebatan da gelek dengbêj bi stranên xwe, xwe gihandin girseyên berfireh û çanda kurdan ya dengbêjîyê bi hemû cîhanê dan naskirin. Bi saya van qeydan dengê gelek dengbêjan, gelek awazên kurdî, gelek berhemên folklorîk hatin parastin û gihîştin roja me.<sup>225</sup> Ev arşîva stranan ku hatîye amadekirin weke “Fonda Zêrîn” hatîye binavkirin. Muzîka ku radyoyên weke Urmîyê û Bexdayê diweşandin di bin bandora muzîka ereb û farisan da bûn lê enstrumanên ku di Radyoya Erîvanê da dihatin bikaranîn yê kurdewar bûn. Mey, bilûr û fiq hin ji wan in. Ev yek jî giringîya Radyoya Erîvanê ji bo mûzîka kurdî mezintir dike.

Radyoya Erîvanê jî weke sazîyên Sovyetê ên din di bin sansûreke mezin da bû. Ji naveroka stranan heta hîlbijartina hunermendan kontrol li ser radyoyê hebû. Di Radyoyê da komisyonek taybet ji bo tespîtîkirina naveroka stranan hebû. Ew kilam divê bi resmî bihatana qeydkirin û qebûlkirin. Mijarên weke çêr, heqaret, mêrkuştin, talan, şer û serhildan, qedexa bûn lê pîrsgirêk ew bû ku stranên kurdî bi piranî ji van mijaran pêk dihatin. Mînak dema ku Karapêtê Xaço ji bo qeydê tê ku stranên xwe bêje, dibînin ku hemû van mijaran têda hene û stranên wî qeyd nakin. Paşê bi hewldanên berpirsiyarê radyoyê Xelîlê Çaçan rêvebiriya radyoyê tê qanîkirin û ev pîrsgirêk jî tê çareserkirin.<sup>226</sup> Serokatiya Radyoya Moskovayê ji serokatiya Radyoya Erîvanê ra gotibû ku tiştên ku ne li dijî siyaseta Sovyetê be hûn dikarin hemû bidin. Xebatkare radyoyê jî bi helwesteke weha tevgeriyan ku di stranan da ya sereke muzîk e, ne gotin e. Lewma gerekî ew hemû stran jî bêne qeydkirin û hatine qeydkirin. Ji bo van stranên ku mijarên qedexa têda hebûn argumaneke xebatkare radyoyê jî ew bû ku van bûyerên ku tên behskirin ne li Sovyetê lê li Dewleta Osmanî pêk hatine û ev folklor me ye. Digotin ku em derxin wê kêmasiyek mezin çêbibe û bi awayî komîsyona sansûrê qanî dikirin.<sup>227</sup>

Lê di van şertan da jî stranek nema ku nehate qeyd kirin. ew jî hin bi cesaretê va girêdayî bû hinek jî bi nas û dostanîyê bû. Serokê Radyoya Moskov û serokê Radyoya Erîvanê hevalê hev bûn jî, yanî danûsitendinên wan xwurt bû. Şansê me ew bû ku hemû stranên me jî hatie qeydkirinê.<sup>228</sup>

Komîsyeneke din ya taybet jî ji ronakbîrên kurd û ermenî pêk dihat. Stran ne tenê ji alîyê mijarê ve ji alîyê muzîkê ve jî dihatin nirxandin. Mînak di hin stranan da,

---

<sup>225</sup> Akboğa. h.g. r. 18.

<sup>226</sup> Ji arşîva Têmûrê Xelîl, Dosye 2.

<sup>227</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=8AA1a5JEBKU>

<sup>228</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

hevsengî di nav rîtmê û gotinan da tunebû. Kilam bi rîtma xwe ya govendê bû lê gotin ên şîne bûn, dema ku wisa bû stran bihata qeydkirin jî nedihate weşandin. Carna jî stranek ji çend dengbêjan qeyd dikirin û li serê nîqaş dikirin gelo herî baş kî gotiye. Piştî vê nîrxandinê biryar dihate dayîn. Carna ji bo stranek hefteyekê amadehî dihate kirin lê stranên ku hatibûn qeydkirin nehatina weşandin jî ew stran dîsa di arşîva radyoyê da dihatin parastin.<sup>229</sup> Di nav berhemên ku dihatin berhevkirin da destan û çîrok jî hebûn. Radyoya Erîvanê bi awayeke resmî têkilîyê bi Radyoya Bexdayê re danîbû. Li ser navê Radyoya Ermenistanê stranên kurdî ji wan dihatin xwestin. Radyoya Erîvanê jî stranan ji Bexdayê ra dişande. Ev danûsitendin ji ber ku resmî bû di gumrikê da bi rehetî diçû û dihate. Yanî kurdan bi derfetên dewletên cuda têkilîyê bi hev ra danîbûn.<sup>230</sup> Herweha heman danûsitendin bi Tehranê ra jî hebû lê xeynî ji van têkiliyên fermî bi awayek nepen jî stranên Radyoya Erîvanê digihîştin kurdên derveyê Sovyetê. Têmûrê Xelîl di bernameya *Rû Bi Rû* da weha tîne ziman: “Esntituta kurdî Parîsê hatin û komkarê ewana hatine Erîvanê. Me gelek stran da wan, me gelek paşê jî şande. Me rê dît ku xwe bigihînin wan. Me dixwest ku bi destê me bigihîje tevaya Kurdistanê. Ne tenê 20 hezarên Sovyetê, 20 milyonên Kurdistanê.”<sup>231</sup>

## 2.5. Dengbêjên Radyoya Erîvanê

Gelek dengbêj û muzîkjen bi saya Radyoya Erîvanê di nava gel da hatin nasîn. Radyo ji bo gelekane weke dibistanek bû lewre ew li wir hînê stranbêjiya profesyonel dibûn. Hin ji wan jî ji xwe xwedîyê nav û deng bûn û xebatkarên radyoyê bi wan ra têkilî danîn û kilamên wan qeyd kirin.

Gava dest bi weşanên Kurdî bûn di fonda radyoyê de tu stranên Kurdan tune bû. divîyabû ew nû bihatana dengnivîsarê [tomarkirin], û ji bo vê yekê stranbêj û sazbandên Kurd teklîfî radyoyê kirin û stran û leylanên wan li ser qeytanê nivîsîn. Di vî warî de keda Casimê Celîl mezin e. Piştî wî zemanekî dirêj Xelîl Mûradov bû serok û berpirsiyarê redaksîyona aftina Kurdî û wî fonda stranên Kurdî pir dewlemend kir. Bi saya radyoyê pir stranên Kurdî, xasma ên folklorî ji wendabûnê xelas bûn, çimkî niha stranbêj û sazbandên Kurd ên hosta û zane hema hema nemane. Bi xêra radyoyê, îro

<sup>229</sup> Ji arşîva Têmûrê Xelîl, Dosye 2.

<sup>230</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>231</sup> Ji arşîva Têmûrê Xelîl, Dosye 1.

deng û sedaya van stranbêjên hêja ji gelê me re wekî milkê kultura wî a zengîn û bilind maye.<sup>232</sup>

Em dikarin dengbêjên ku di Radyoya Erîvanê da cih girtine weha tesnîf bikin:

1. Dengbêjên ku berîya radyoyê jî di nav gel da bi nav û deng bûn.
2. Dengbêjên ku li gundan ne weke pîşeyek tenê ji derdora xwe ra distrêyan
3. Dengbêjên ermenî ku bi kurdî zanibûn
4. Dengbêjên ku di radyoyên din da li derveyê Sovyetê dihatin nasîn.

Dengbêjên ku berê jî navdar bûn bi kêfxweşî dihatin stranên xwe tomar dikirin. Heta ji wan hinekan dema ku stranên wan bihata weşandin qurbanan şerjê dikirin.<sup>233</sup> Dengbêjên ku ji gundan dihatin lazim bû ewil ew hînî studyoyê û sazbandan bibûna. Berîya qeydê ji bo ku hînî van tiştan bibin demek di hate veqetandin. Hinekan şerm dikirin, hinek jî ji têkberên elektronîk ditirsîyan û digotin “ev hesin wê dengê me bidize.”<sup>234</sup> Ev pîrsgirêk hemû dihatin çareserkirin lê derbarê dengbêjên ku ji derveyê Sovyetê bûn da pîrsgirêkên mezintir derdiketin. Ji ber ku ew ne ji welatê Sovyetê bûn bi çavekî gumanbar li wan dihat nihêrtin. Mînak ji ber ku pîrsgirêkên Şivan Perwer û Eyşe Şan bi dewleta tirk ra hebûn gazin dihatin kirin. Heta hin kesan radyoyê şikayetê dewleta Sovyetê dikirin û digotin hem naveroka stranên wan li dij qanûnên Sovyetê ne hem jî wê ev yek nava Sovyetê û Tirkîyeyê xerab bike. Li hember van pîrsgirêkan jî dengê Şivan Perwer cara yekem ji Radyoya Erîvanê gihîşte gelê kurd. Xelîl Mûradov ji bo ku navê Eyşe Şan kurdewar bike jî navê wê di radyoyê da Weke Eyşa Kurd derbas kir.<sup>235</sup> Herweha navê dengbêjên ermenî jî li gor qaydeyên kurdî dihatin nivîsîn.

Dengbêjên û stranbêjên ku stranên wan di Radyoya Erîvanê hatine qeydkirin û weşandin li gor rêza alfabetîk ev in:<sup>236</sup>

Abrahamê Karapêt, Ahmedê Îsrafil, Ahmedê Mirazî, Aram Tîgran, Aramê Zeker, Aşiq Kamil, Bagîyê Memê, Batalîkê Şîrîn, Becoyê Hesên, Bêmalê Keko, Biroyê Tîto, Casimê Cerdo, Casimê Şemo, Cemalê Etem, Cemalê Îsko, Cemalê Paşe,

---

<sup>232</sup> Eşo, h.b. r. 76-77.

<sup>233</sup> Can, h.b. r. 179.

<sup>234</sup> Gultekîn, h.g. r. 30-31.

<sup>235</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmurê Xelîl ra.

<sup>236</sup> Ji ber ku em ê di beşa dawî da bi berfirehî behsa jinan bikin me di vê listeyê da cih neda dengbêjên jin.

Cemalê Ûsiv, Cemîlê Cefo, Çoloê Silo, Dawitê Xilo, Dawetiyê Reşît, Efoyê Esed, Egîdê Têcir, Elîxanê Ûsiv, Elîyê Hemed, Elîyê Ozmîn, Esker Demîrbaş, Eslanê Memed, Ezîzê Sebrî, Ezîzê Tihar, Fêkoyê Miraz, Ferhatê Kinyaz, Fetoyê Hodik, Fetoyê Ûso, Fezoyê Rizo, Gevorge Ferac, Razmîkê Çiko, Hakob Kirakosyan, Hakobê Esmer, Hemîdê Elî, Hemzoyê Ozman, Hesenê Epo, Hesenê Gogo, Hesenê Qaso, Hovhannes Badalyan, Hovhannes Gapo, Hovsepyan Hohannes, Huseynê Eylaz, Îskoyê Lezgî, Îsraîl Ohanyan, Kamilê Temûr, Karapetê Mêlkon, Karapetê Xaço, Keremê Erefat, Kinyazê Hemîd, Koma Gundê Nehîa & Abovyanê Ciraberê, Koma Sorikê, Lezgînê Dûko, Mehmet Arifê Cizrawî, Mecîdê Fariz, Mecîdê Fariz & Seydayê Rizo, Mecîdê Silêman(Tevî Komê), Mecîdê Xalit, Mehmedê Mûsa, Mehmedê Ûsiv, Mehmûd Soro (Qizil), Memê Xido, Memedê Evdo, Memedê Zurbe, Memliyê Xemo, Memoyê Hemîd, Memoyê Îsrafil-Tevî Koma Sazbendîye, Memoyê Silo, Memûdê Elî, Mirazê Egît, Misretê Elîlito, Mişayê Reşîd, Nadirê Efo, Nadirê Eslan, Nevîyê Îsmâîl, Ordîyê Qado, Paşayê Efo, Piranî, Reşîdê Baso, Reşîdê Emo, Reşîdê Memilî, Reşîdê Sîyabend, Rizayê Elî, Rizayê Reşîd, Samvel Krakosyan, Sehîdê Ûso, Sergisê Nersês, Sêrob Xacikyan, Seyadê Şamedîn, Sihîdê Silo, Sirazê Temûr, Siloyê Evdal, Sasikê Sevav, Şemoyê Hesen, Şeroyê Biro, Şeroyê Xacikyan, Şevavê Ahmed, Şevavê Egît, Şibliyê Çaçan, Şivan Perwer, Têmûrê Xelîl, Torinê Paşa, Ûsivê Elîyê Mihikê, Ûsivê Etar, Ûsivê Mihemmed, Ûsivê Sêbira, Wezîrê Ahmed, Xalitê Bego, Xatoyê Hemo, Xatoyê Sinco, Xemoyê Hamid, Xemoyê Hesen, Xidirê Biro.<sup>237</sup>

## 2.6. Di Radyoya Erîvanê da Rola Jinan

Di koçberî û şeran da her tim jin û zarok zirara herî mezin dibînin. Koçberîyên kurdan ên ber bi Kafkasyayê ve jî weha bû. Jinan ev zehmetîyên ku gelê kurd kişandine bi stranan anîne ziman. Ev stran weke delîlên dîroka devkî mane heta roja me. Çûndina welateke nû, di civakê da guherînên mezin jî bi xwe re anî. Piştî hilweşîna Împeratorîya Rûsan, Dewlata Sovyetê ava bû. Ev dewlet li ser hîmê wekhevî û biratîyê ava bûbû û giringîyê dida mafê jinan jî. Di rol modela welatîyên Sovyetê da jin û mêr bi hev ra ji bo jîyaneke nû ked didan. Jin li welatê rûsan hem di serdema Împeratorîyê da hem jî di serdema Sovyetê da rastî pîrsgirêkên mezin hatine

<sup>237</sup> [Erivan Radyosu'nun 900 Şarkılık Kürtçe Arşivi Dijital Platformlarda - Ferid Demirel - bianet](#)

û li wir ji bo mafên xwe tekoşîn dane. Di serdema Sovyetê da bi awayeke resmî jinan gelek mafan wergirtin. Piştî Şoreşa Bolşevîkê bi gelek qanûnan mafên nû ji bo jinan hatin bidestxistin. Mafên weke di hilbijartinê da bikaranîna dengan, mîras, hevberdan, di kar da meaşê bi mêran ra wekhev hatin dayîn. Herweha di perwerdehiyê da jî ji bo jinan gavên nû hatin avêtin.<sup>238</sup>

Jinên kurd ên li Sovyetê jî li gor van mafan perwerdehi dîtin û hin mafan bi dest xistin. Sîstema Sovyetê ji bo hemû çînen civakê weke rizgarker dihate qebûlkirin û gel li ser vê hizrê dihate perwerdekirin. Ronesansa kurdan a ku di beşên çûyî da hate behskirin ji bo jinan jî pêk hat. Jinên kurd di warên weke perwerdehi, edebiyat, akademî û hwd. da xwe bi pêş da xistin û ketin xizmeta gelê kurd. Jinên kurd di warê huner û dengbêjiyê da jî xwe weke hemû gelê kurd pêşketî bûn lê ji ber zextên civakî bi rehetî di nav gel da nikaribûn hunera xwe pêşkêş bikin. Yê ku di van waran da derketina pêş jî gelek dihatin rexnekirin. Gelek jin hebûn ku li hember ku xwendine û di nava gel da bûne xwediyê rêzdariyek jî bi rehetî nikaribûn dengbêjiyê bikin. Di vê mijarê da mînaka herî berbiçav Aslıka Qadir e. Li gel ku wê zanîngeh xwendibû û jineke modern bû jî piştî ku zewicî hevjinê wê nehêste ku biçe radyoyê û stranên bêje. Di vî warî da mînakek berbiçav jî Belga Qado ye ku em ê li jêr behs bikin.<sup>239</sup> Rewşa dengbêjên ku li gundan bûn jî heman bû. Serokê radyoyê Xelîlê Çaçan hewl dida ku dengê hemû dengbêjên baş tomar bike. Dema ku xebatkarên radyoyê ji bo tomarkirina stranên diçûn gundan û stranên jinan qeyd dikirin ji bo ku mêr, bav an jî birayên wan, wan nas nekin navên wan dihatin guhertin.<sup>240</sup> Li hember van pirsgirêkan hem bi hewldanên xebatkarên Radyoya Erîvanê hem bi keda jinan gelek stranên kurdî bi dengê jinan hatin tomarkirin û hatin parastin.

Dema ku radyoyê dest bi weşana muzîkê kir tenê stranên mêran dihatin weşandin lê di gelek stranên kurdî da pêdivî bi dengê jinan jî hebû. Hin stran hebûn ku jin û mêran li gel hev digotin lê ji ber zextên civakî jinên kurd nedihatî radyoyê. Ji ber vê yekê di radyoyê da cara ewil jineke ermenî ya bi navê Anûş Sahakyan stranên kurdî got. Anûş Sahakyan muzîka kurdî û ziman û çanda kurdî baş nas dikir û di koma “Elegezê Ya Kulturê” da dixebitî. Anûş Sahakyan ewil du stranên dibêje

---

<sup>238</sup> Milyausha Rizvanova, “Sovyet Sonrası Orta Asya’da Kadın: İmaj ve Gerçeklik”, Zanîngeha Stenbolê, Enstituya Zanîstên Civakî, 2012, r. 8.

<sup>239</sup> Hevpeyvîna me ya bi Aslıka Qadir ra.

<sup>240</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

û pêra di radyoyê de dest bi gotina stranan dike.<sup>241</sup> Helbet hemû gel li hember strandina jinan ewqas tund nînbûn bi taybetî kesên ku bi xwe dengbêj bûn hin ji wan piştgirîyê didan jinên di malbata xwe da jî. Mînak Etarê Şero qîza xwe Gulîzerê bi xwe tîne radyoyê. Gulîzer bi piştgirîya bavê xwe di radyoyê da gelek stranan qeyd dike û di arşîva Radyoya Erîvanê da cihê xwe digire.<sup>242</sup>

### **Lîsteya Dengbêj û stranbêjan:**

Anûş Sahakyan

Asa Evdal

Aslika Qadir

Belga Qado

Cemîla Çawiş

Dîlbera Wekîl & Semam Temam

Eyşa Miho

Eyşe Şan

Fatma Îsa

Gozela Xato

Guhara Avas

Gulcera Çerkez

Gulîzera Etar

Gulîzera Mûsa

Gulîzera Qaso

Hizreta Heso

Kezîzera Xelo

Kubara Xido

Lîlixana Miraz

---

<sup>241</sup> Ji arşîva Têmûrê Xelîl, dosye 1.

<sup>242</sup> Gultekîn, h.g. r. 31.

Naza Kokil  
Nîgara Hepo  
Seyrana Musa  
Sîsa Egît  
Sîsa Mecît  
Sûsika Simo  
Tukasa Xemo  
Xana Êso  
Xana Zazê  
Xanima Nadir  
Xelîfa Evdilê  
Zadîna Şekir  
Zîna Şemo<sup>243</sup>

Li gor lîsteya li jorê nêzî sî û sê jin weke dengbêj li Radyoya Erîvanê stran gotine lê mixabin hejmara yên ku em derbarê wan da xwedîyê agahiyan in gelek kêman. Weke ku li jor jî hate behskirin taybet yên ku ji gundan stranên wan hatin berhevkerin bi navê xwe yê rastîn jî di vê lîsteyê da nînin.

Li hember ku kurdên Kafkasyayê peyva dengbêjî û stranbêjîyê di heman maneyê da bikar tînin li gor tesnîfa dengbêjîyê kesên ku di vê lîsteyê da ne hemû weke dengbêj nayên qebûlkerin. Me di teza xwe da kesên ku stranên dengbêjîyê ên klasîk gotine weke dengbêj,<sup>244</sup> kesên ku stranên dawetan gotine jî weke stranbêj qebûl kir. Mînak Sûsika Simo û Dîlbera Wekîl ji ber ku stranên dengbêjîyê ên klasîk negotine weke stranbêj/hunermend werin qebûlkerin baştir e lê belê jiber ku Sûsika Simo bi xebatên xwe ji bo jinên kurd ên Kafkasyayê bûye pêşeng me nikaribû behsa wê nekira. Dîlbera Wekîl jî jineke gelek çalak e û ji bo perwerdeya muzîka kurdî xebatên girig dike. Ew bi van xebatên xwe hewl dide ku muzîka kurdî bigihîje nivşên nû. Nîha em ê dengbêj û stranbêjên Radyoya Erîvanê bidin nasîn. Ji ber ku Aslîka Qadir, Fatma Îsa û Sûsika Simo yên herî navdar û bibandor in herî zêde agahî di

---

<sup>243</sup> Erivan Radyosu'nun 900 Şarkılık Kürtçe Arşivi Dijital Platformlarda - Ferid Demirel - bianet

<sup>244</sup> Me di vir da tesnîfa Mahmut Beğik esas girt.

derbarê wan da hebûn. Me jî li gor agahîyên heyî herî zêde li ser van sê navan nîrxandinan kir. Stranên “Welatê Me Kurdistan e” û “Miho” di muzîka kurdî da gelek girîng in lewre em ê bi berfirehî li ser wan jî bisekinin.

### 2.6.1. Sûsika Simo<sup>245</sup>

Sûsika Simo, di sala 1925an da li herêma Elegezê, li gundê Mîrekê yê navçeya Axbaranê ji dayik bû. Ew ji malbateke Êzîdî ye. Malbata wê di zaroktîya wê da koçî Gumrîyê kir. Ew li wir çû dibistanê û perwerdeya bilind jî li Zanîngeha Erîvanê di beşa bijîşkîyê da tamam kir.<sup>246</sup> Sûsika Simo piştî ku çar salan li nexweşxaneyan xebitî dest bi karê reqas û stranbêjîyê kir.<sup>247</sup>

Sûsika Simo di salên zanîngehê da sosyalîzmê nas dike û derbarê mijarê da gelek dixwîne. Dûre jî li gor sosyalîzmê ji bo pêşketina jinan dikeve nava hewildanan.<sup>248</sup> Dewleta Sovyetê wê demê mafên girîng dida jinan belkî jî ji ber vê yekê wê xwe bi sosyalîzmê ve girê dabû. Li gor şert û mercên wê demê ev helwesta wê ya sosyalîst bû derfet ku hunera xwe bipêş da bixe û were naskirin. Sûsika Simo li gel fikra sosyalîzmê weke hemû hunermend û rewşenbîrên wê serdemê gelek kurdperwer bû jî. Wê di hemû konserên xwe da cil û bergên kurdî ên gelerî li xwe dikir.<sup>249</sup> Wê kilamên gelerî ên sivik (ên govendê) digote. Di hin stranên wê da jî pesnê jîyana Sovyetê, xebat, xwendin, partîya komunîst, Lenîn, Stalin, kolxoz, sosyalîzm û pismamtî/biratîya gelan dihate dayin. Gelek stranên bi vî rengî Mecîdê Silêman dinivîsî, bi meqam dikir û bi Sûsika Simo ra digote.<sup>250</sup>

Sûsika Simo, di sala 1946an da cara pêşî derketîye ser sehneyên Ermenî û bi kurdî straye. Ev yek ji bo dengbêjîya kurdî gaveke yekemîn bû lewre heta wê demê cara pêşîn bû ku dengbêjeka kurd li ser sehneyên dewletê bi awayeke fermî dihate naskirin. Ew ne tenê bi muzîkê ra bi şaxên hunerê ên weke reqas û şanoyê ra jî mijûl bûye. Wê komên reqasê saz kirine ku bi terza opera û baleyê hunera xwe nîşan dane.

<sup>245</sup> Li gor tasnîfa dengbêjîyê ji ber ku Sûsika Simo stranên mêranî negotiye wek dengbêj nayê hesibandin lê ji ber ku wê bi xebatên xwe di radyoyê da rêyek li ber jinan vekirîye û bûye pêşenga dengbêjên jin ên hemdemê xwe me cih dayê.

<sup>246</sup> Zeyneb Yaş, “Berî Radyoya Êrîvanê Sûsika Simo Hebû” *Dilop*, j. 9, 2019, r. 6.

<sup>247</sup> [Dengbêja dengzêrîn: Sûsika Simo - RiaTaza](#)

<sup>248</sup> Yıldırım, h.b. r.133.

<sup>249</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>250</sup> Boyik, h.b. r. 80.

Herweha ew bi şanoyên Elegezî re derketîye turneyan. Sûsika Simo yan berîya lîstika şanoyê an jî piştî lîstikê derdikete ser depê û stranên kurdî yên geleri distra. Her weha wê mamostetîya gelek komên govendê yên dîlana kurdan jî kiriye. Jê re “Gula Govenda” dihate gotin.<sup>251</sup> Wê demê, cara pêşîn ji alîyê dewletê ve tenê navê wê hatibû qebûl kirin û di sahnayên dewletê da tenê wê stranên kurdî distra. Sûsika Simo ne tenê li Ermenistanê, li Gurcistanê û hemû welatên Sovyêtê derdikete ser sehneyê û kilamên kurdî û ermenkî distra. Piştî vekirina Radyoya Erêvanê Sûsika Simo di radyoyê da jî stranên got. Ew û Gulîzera Etar bûn jinên yekem ên kurd ku di Radyoya Erîvanê da strane.”<sup>252</sup>

Sûsika Simo bi sazbandên weke Şamilê Beko û Egîdê Cimo ra di koma folklorê da jî xebatan dimeşande. Nîvê koma wê ermenî bûn lê bi kurdî distiran û govenda kurdî digirtin. *Îca qîz hebûn, ji wan qîzan çend heb Ermenî bûn, Kurd nedihatîn. Dê û bavê van nedihîştin.*<sup>253</sup> Hevjînê wê Kolya Naftalyan sporvanek navdar bû. Wî di xebatên wê yên hunerî da jî gelek alîkarîya wê dikir. Naftalyan, di turneyan û konseran da jê ra dibû alîkar.<sup>254</sup>

Zewaca wê ya bi Kolya Naftalyan re bibû cîyê nerazîbûna derûdora wê. Ew jinek ji kurdên Êzîdî bû û li gor bawerî û kevneşopiya êzîdîyan nedibû ku ew bi mirovek ji millet û oleke din re bizewice. Herweha ew pîrek êzîdî bû jî. Di êzdayetîyê da pîrek tenê dikaribû bi pîrek ra bizewice lê hejmara pîran li Sovyetê kêmbû.<sup>255</sup> Sûsika Simo li hember van bertekan bi xwendin, şarezayî û dengê xwe, xwe di nav kurdan da dabû qebûlkirin û vê zewaca ku li dij dîne êzdayetîyê ye jî dabû qebûlkirin. Wê bi Kolya Naftalyan ra bernameyan jî pêk dianî û gelek caran li ser dikê bi hev ra jî distran, stranên duqolî digotin. Naftalyan, werzîşvan bû, lê dengê wî xweş bû û bi kêfxweşî bi Sûsika Simo ra distra.<sup>256</sup>

Sûsika Simo, daxbara (dîlşewat) dengbêjê bi nav û deng Seyadê Şamê bû Seyadê Şamê, li radyoyê Sûsikê nas dîke û bi hev re stranên xwe yên duqolî dibêjin. Li Ermenistanê, Orkestraya Flarmonî jî piştgirî da hunera Sûsika Simo û rê li berê vekirin. Wê, tevî hemû zehmetî û tengasiyan di warê hunerî da xwe weke jineke kurd da qebûlkirin. Sala 1965an lûtkeya jîyana wê ya hunerî bû û wê li Meydana sor gelek

<sup>251</sup> Yaş, h.b. (c1), r. 337-338.

<sup>252</sup> Gultekîn, h.g. r. 31.

<sup>253</sup> Arşîva Têmurê Xelîl Dosye 2. (civat û kilam)

<sup>254</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmurê xelîl ra.

<sup>255</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmurê xelîl ra.

<sup>256</sup> Yaş, h.b. r. 337.

caran konserên mezin didan. Di van konserên wê da nav û dengê wê li seranserê Sovyetê belav bûbû.<sup>257</sup> Ew bi piranî bi konserên xwe bi nav û deng bû û pir welatparêz bû.<sup>258</sup>

Di van konseran da ‘Egîdê Cimo bi bilûra xwe û Karapetê Xaço jî bi stranên xwe gelek caran beşdar dibûn. Dema ku Sûsika Simo cara pêşî li Meydana Sor kosera xwe ya mezin dide, Wezîrê Eşo, di rojnameya *Riya Teze* da gotareke bi navê “Sûsika Me” dinivîse û wê weha pênase dike:

Sûsika me wek jineke kevneşop xeyal nekin. Performansa ku li ser dikê raber dike û sekna wê bi xwe ra heyrantiyek mezin dide avakirin. Bi taybetî jî ji hêla muzîkê da pirr baş e û dema ku perçeyên bijare hildibijêre û bi performanseke semyan ra digihîne hev. Sûsik ne tenê li Rewanê, di demek kin da li Qefqasan jî bi nav û deng bû. Ji xwe Sûsika Simo beriya Radyoya Rewanê jî hebû<sup>259</sup>

Bilêtên konserên wê berî çendîn rojan dihatin firotin û xilas dibûn. Gel, ji dengê wê pir hez dikir. Wê stranên gelerî ên kurdî, govend û dîlanên kurdewarî bi gelê Kafkasyayê da naskirin. Ew bi van xebatan bû pêşenga danasîna çanda kurdî. Ev yek xizmeteke mezin bû ji bo çand û folklorê kurdî.<sup>260</sup> Herweha Sûsika Simo, bi serkeftin û cesareta xwe ji bo dengbêj û hunermendên kurd ên Sovyetê bi taybetî jî ji bo jinan bû mînak. Wê qet kaset dernexistîye. Hinek sebaba vê yekê bi pirsgerêkên aborî ve girê didin hinek jî bi şert û mercên Sovyetê ve girê didin lê sebaba vê yekê zelal nîne.<sup>261</sup>

Sûsika Simo di sala 1977an da li Erîvanê wefat kir. Zarokên wê tunebûn û li gor çavkanîyan ew di salên xwe yê dawî da bi tenê û di rewşeke aborî ya xerab da mir. Wê li Gumrîyê sipartin axê. Ew her tim bi cil û bergên xwe yê bi motîf û xemla kurdewarî, stran û kilamên xwe yê bi kêf û coş tê bîranîn. Sûsika Simo karakterek jina kurd ya serhildêr û pêşeng ji gencîneya çanda kurdan re hêşt.<sup>262</sup>

---

<sup>257</sup> Yaş, h.b. r. 337-338.

<sup>258</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê xelîl ra.

<sup>259</sup> [Dengbêja dengzêrîn: Sûsika Simo - RiaTaza](#)

<sup>260</sup> Yaş, h.b. r. 338.

<sup>261</sup> Can, h.b. r. 225.

<sup>262</sup> Yaş, h.b. r. 338.

### Stranên wê:

Ax Lê Yeman  
Ez Sivderê (Delîl Delîl)  
Hey Berî  
Hey Canê  
Lawkê Min Çû Bixwîne  
Lê Dînê  
Lê Edlê  
Lenîn Rabû Em Xilas Bûn  
Memê Alan  
Vî Peyayî  
Xerîb Bilbil  
Zilfanê<sup>263</sup>

Wê ev stran xistin nav klasîkên kurdan. Susika Simo berîya vebûna Radyoya Erîvanê jî li Sovyetê yekem stranbêja kurd ya profesyonel e. Şamilê Beko di koma wê da bû. Heta salên 1980î jî kilamên wê di radyoyê da ji hemû stranên din zêdetir dihatin weşandin.<sup>264</sup>

Stranên wê yên duqolî: bi Seyadê Şamê ra: Digerim nagerim, bi Mecîdê Silêman ra: Lê Edlê

Me li jêr ji stranên wê çar mînak dan. Ya yekem “Lenîn Rabû Em Xilas Bûn” e ku bi bandora Sozyalîzmê pesnê Lenîn û komunîzmê daye. Ya duyem “Evdalê Zeynê” ye. Ew di vê stranê da bi hesta kurdperwerîyê pesnê Evdalê Zeynikê dide û wî weke pêşeng û aqilmendê kurdan destnîşan dike. Sûsika Simo di vê stranê da ji bo yekîtî û azadîyê banga kurdan dike. Ji alîyê muzîkê ve tişteki balkêş jî ew e ku meqama strana li ser Lenîn û ya li ser Evdalê Zeynikê hema bêje yek e. Ye sêyem “Zilfanê” ye ku Sûsika Simo herî zêde bi stranên bi vî tarzê tê nasîn. Ya çarem jî “Hey Canê” ye. Ev stran jî li Ser xortekî xwendekar hatiye derxistin. Di vê stranê da pesnê xwendinê tê dayîn. Heman stranê Aslıka Qadir jî straye. Ev her çar stran weke kurteya muzîk û jîyana wê ya hunerî ne lewre ew bi çar hêmanên di van stranên tê nasîn.

<sup>263</sup> <https://www.youtube.com/c/DeutschKurdischesKulturinstitut/search?query=susika%20simo>

<sup>264</sup> Boyik, h.b. r. 80.

## **Lenîn Rabû Em Xilas Bûn**

1870 sal e şîrîn Lenîn hate dinê  
Dilê bê xem kul ketinê millet çok da xewa dine  
Dewra berê belengaz bûn Lenîn rabû em xilas bûn  
Navê lenîn şîrîn şa bû ilmê Marx xanedan bû<sup>265</sup>

## **Evdalê Zeynê**

Wexta kurê Seyda pîr bû  
Bi kilama ew eyan bû  
Ez ne xwert bûm bejna xwa da  
Hiba watan derdê wî da

Ka ka ka ka dengê Evdal

Mîna çemê gur î zelal

Estêrkê sar û temerî

Pê geş dibûn heweskarî

Bende pê ra gulgeş dibûn

Eşqa delal tev hev dibûn

Şare bulbul guhdar dima

Der û dora gul vedida

Şerkarîyê ‘eşîrê pir

Êzdanşêrî mêrxasî merd

Wexta rabû mîna Zalê

Zalima ra kete qalê

Evdal defa hewarê xist

Boy azayê hewar daxist

---

<sup>265</sup> Heman stranê Şivan Perwer jî gotiye. Ji ber ku gotinên ya ku Sûsika Simo digot kêma dihatin fêmkirin me stranê ji ya ku Şivan gotiye deşifre kir û cudahiyên di nav her duyan da li gor ya Sûsika Simo nivîsî:

ji deve Şivan: <https://www.youtube.com/watch?v=G7XEEpoCoQI>

Ji deve Sûsika Simo: <https://www.youtube.com/watch?v=ySKmje0hGvY>

Gelî êla rabin rabin  
Mîna bera can tev pak bin

Bes e hêsir bes e girî  
Bêtifaqî û koçerî  
Bes e qûtî bes e ceza  
Li nav wetan li hereza

Mil bidine hev mîna bera  
Lêxin lêxin mîna şêra  
Textê zalim bînine xwarê  
Hûrkin qeyda bavne kûrê

Boy namûsê boy nisretê  
Boy tifaqê boy xîretê  
Boy azaya cimûmetê  
Xwa ra daynin hikûmatê

Erê wê bê dewra teze  
Kurd wê rabin bi şareze  
Wê bibînin li rû dinê  
Dewra teze bextê xemê<sup>266</sup>

### **Zilfanî**

Zilfanî em yek in zilfanî zilfanî  
Bax û bostan çiçek e  
Tu gula van xortan î  
Zilfanî em cot in zilfanî zilfanî  
Bax û bostan kevok in  
Tu gula van xortan î  
Zilfanî em sê ne zilfanî zilfanî

---

<sup>266</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=C8bY7D2i9PQ>

Bax û bostan hirmê ne  
Tu gula van xortan î  
Zilfanî em çar in zilfanî zilfanî  
Bax û bostan hinar e  
Tu gula van xortan î<sup>267</sup>

### Hey Canê

Hey canê, canê, canê, hey canê  
Lawikê min çû Rewanê, hey canê  
Lawikê min çû bixwîne, hey canê  
Kitêb dostê wî bûne, hey canê

Hey canê, canê, canê, hey canê  
Ji şherê Rewanê, hey canê  
Hezar cahil dixwînin, hey canê  
Nava wan da lawikê min, hey canê

Hey canê, canê, canê, hey canê  
Ji şherê Rewanê, hey canê  
Lawikê min î çavşîn e, hey canê  
Mi ra nema(nameyan) dişîne, hey canê

Hey canê, canê, canê, hey canê  
Lawikê min çû Rewanê, hey canê  
Lawikê min çû bixwîne, hey canê  
Kitêb dostê wî bûne, hey canê<sup>268</sup>

---

<sup>267</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=entMxwh2-oM>

<sup>268</sup> [Dengbêja dengzêrîn: Sûsika Simo - RiaTaza](#)

## 2.6.2. Fatma Îsa

Fatma Îsa di sala 1934an da, li Ermenistanê, li navçeya Vêdîyê li gundê Erezdeyanê ji dayik bûye.<sup>269</sup> Ev gund nêzî Erîvanê ye.<sup>270</sup> Navê bavê wê Îsayê Ûsivê Elo, navê dêya wê jî Başa Lelo ye. Ew ji eşîra Brûkîyan ji binemala Qerka ne. Xwişkêk wê bi navê Gurçek, xwişk û birayek wê jî ji dêya wê lê ji bavek din hebûne. Navê wan jî Fadil û Bacxanim e. Fadil li malêva li Platnîrovskê dimine, ku Fatima Îsa di salên xwe yê dawî da li wir dima. Lê Bacxanim niha li bajarê Almaatayê li Qazaxstanê dijî.<sup>271</sup>

Malbata Fatma Îsa hê di sê salîya wê da bi nefîkirina Stalîn ya 1937an rûbirû dimînin. Zaroktîya wê gelek dijwar derbas dibe. Di pênc salîya wê da şerê cîhanê yê duyemîn dest pê dike. Fatma Îsa di şeş salîya xwe da bavê xwe, du sal şûnda jî dêya xwe wenda dike û bê dê û bav dimîne. Ew bi xwişka xwe Gurçek(Rindê) ra li ber destê apê xwe Mehmedê Ûsivê Elo mezin dibe. Di sala 1943an da apê wê ji Erezdeyanê mala xwe bar dike û li gundê Hemzelûyê (Marmaraşên) ku li navçeya Masîsê ye bi cih dibe. Fatma Îsa jî li Hemzelûyê dest bi xwendina dibistanê dike. Lê belê xwendina xwe naqedîne. Di sala 1959an da Fatma Îsa tevî malbata xwe dîsa bar dikin gundekî Masîsê bi navê Nêjirlûya Jêrîn.<sup>272</sup>

Fatma Îsa di sala 1947an da di 14 saliya xwe da<sup>273</sup> bi kurê Xalê xwe Hemzê Sincê Bava ra tê zewicandin. Mala xalê wê ji ‘eşîra Celaliyan e. Xesûya wê Xatûna Mehmedê Eto jê re gelek baş e û jê hez dike lê zarokên wê çênabin. Di nava civata kurdan da edetek heye. Ku zarok ji jinekê re çênebe, divê destûra zewaca mêrê xwe bide. Fatma Îsa jî nikare li hember vê kevneşopîyê bisekine û destûra zewaca mêrê xwe dide. Şeş zarokên mêrê wê ji jina duyem çêdibin. Çar qîz û du kur çêdibin. Navê kuran Resûl û Torin e lê di çavkanîyan da navê keçikan derbas nabe. Li gor çavkanîyan Fatma Îsa Weke zarokên xwe ji wan hez kiriye û zarokan jî weke dêya xwe ya heq jê hez kirine û heta mirina wê lê nihêrtine. Ev hezkirina wan piştî wefata wê tê dîtin. Bi taybetî di merasima cenazeyê wê da Resûl û Torin xwe Weke kurên wê yê helal dibînin û şîna wê dikin.<sup>274</sup>

<sup>269</sup> Niha navê gund guhertine kirine Yêrasxavan, navê navçeyê jî niha Ararat e.

<sup>270</sup> <https://www.facebook.com/profile.php?id=100066840974615>

<sup>271</sup> [Dengbeja gelêrî û xwediya strana ‘‘Miho‘‘ Fatima Îsa | www.avestakurd.net](http://Dengbeja.gelêrî.û.xwediya.strana.‘‘Miho‘‘.Fatima.Îsa|www.avestakurd.net)

<sup>272</sup> Yaş, h.b. (c.2) r. 75.

<sup>273</sup> <https://krd.riataza.com/2021/12/16/fatma-isa/>

<sup>274</sup> [FATMA ISA: Dengbeja Kurd ya Geleri – Kurdist.ru](http://FATMA.ISA:Dengbeja.Kurd.ya.Geleri-Kurdist.ru)

Piştî hilweşîna Sovyetê di salên 1990î da rewşa aborî, siyasî û civakî ya herêmên Kafkasyayê xera bû. Ji ber vê yekê jî kurdên misilman û êzîdî ji Ermenistanê û Gurcistanê derketin çûn cihên weke Rûsya, Ukrayna, Qazaxistan û welatên Ewropayê. Malbata Fatima Îsa jî tevî mirovên xwe yên ji ‘êla Birûka û Celalîya di sala 1989an da koçber bûn, çûn Rûsyayê. Ew li herêma Krasnodarê, li navçeya Korênovskê, li bajarokê Platnîrovskê bicih bûn. Îro di vî bajrokî da 200 malên kurda hene. (Nêzî 1000 kesî). Fatma Îsa li maleke sade tevî malbata xwe li wir dima. Li vir jî çûyîn-hatina mêvana ji mala wê xalî nedibû.

Nexweşîna dil bi Fatma Îsa ra hebû. Xwuşka wê Gurcek, dixwest wê bibe mala xwe ya li Almaataya ku payîtexta Qazaxistanê ye. Xwuşka wê û zarokên xwe wê dibirin bijîşk, lê xwedîtî dikirin û dixwestin ku Fatma Îsa li cem wan bimîne. Lê wê nedixwest û ji wan ra digot: “Dev ji min berdin. Ez dixwazim herim mala xwe. Keda min û emeka min e ew mal. Dixwazim herim cem zarokên xwe.” Fatima Îsa di 15ê çîleya sala 2010an da ji ber nexweşîya dil di 76 salîya xwe da çû ser dilovanîya xwe. Tirba wê li vê derê, li nav goristana kurdan hatîye çêkirin û peykerê wê li ser tîrbê hatîye danîn.<sup>275</sup> Di merasima cenaza wê da jin kilama Miho li ser wê dibêjin. Di dema defna cenazê de zarokên ji hêwiya wê li serê digirîn. Mahmut Beğik di derbarê rojên wê ên dawî da agahîyek wed dide:

Heta, di daweteka eqrebayek wan de, ku ketibû heyama rojên dawîyê yên jiyana Fatma Îsa de, hevala mina hêja Tamara Îbrahîmova, ji min re vîdeoyek dawetê şandibû. Tê de xuya dikir ku Fatma Îsa nikare rabe ser lingan û li ser erebeya xwe ya destî de, car din kilama Miho digot û herkesê ku çav bi Fatma Îsa diket, diçûn destên wê maçî dikirin. Heya saniya wefata xwe, ew cil û bergên Kurdî ji ber xwe nekirin û wêneyeka wisa pêşkêşî me dikir ku weka mînakeke jina Kurd bû li hemberî me û hemû Kurdan.<sup>276</sup>

Weke gelek dengbêjan meyla Fatimê Îsa ji zaroktîyê da li ser dengbêjîyê hebû. Dema ku zarokên gund digihîştin hev govend digirtin û distran. Fatma Îsa ji wê demê da qabiliyeta xwe ya di vî warî da nîşan dida. Ew bi dengê xwe yê zîz û zelal ji teva cuda dibû. Bîra wê jî gelekî baş bû. Wê bi yek guhdarîkirinekê stranan jiber dikirin. Herdem gava di gund da dewatek dibû, ew di nava koma qîz û bûka da bû.

<sup>275</sup> [Dengbêja gelêrî û xwedîya strana “Miho“ Fatima Îsa | www.avestakurd.net](http://www.avestakurd.net)

<sup>276</sup> [FATMA ISA: Dengbeja Kurd ya Geleri – Kurdist.ru](http://www.kurdistan.net)

Wan li odeyek cuda distran û direqisîn. Fatma Îsa stranên xwe yên pêşin li şahîyan, li civînên qîz û xortan fêr kir.<sup>277</sup>

Xebatkarên Radyoyê Erîvanê bi rêya Kinyazê Îbrahîm xwe digihînin Fatma Îsa.<sup>278</sup> Li gundê Nêcirlûya Jêrin gelek malbatên kurd diman. Di bihara sala 1964an rojekê berpîrsyarê radyoya kurdî ya Erîvanê Xelîlê Çaçan Mûradov tê dibe mêvanê Mehmedê Silo yê berpîrsê malhebûnê (kolxoz) gund. Bi pêşniyara tîyê wê gazî Fatma Îsa dikin ku li dengê wê guhdar bikin. Xelîlê Çaçan li mala Mehmedê Silo cara pêşin bi Fatma Îsa û dengê wê dihese. Xelîlê Çaçan hema wê çaxê pêşniyar dike ku ew di radyoyê da bêje. Wan salan di radyoyê de êdî stranên Sûsîka Simo û Belga Qado, paşê jî dengê Zadîna Şekir, Tukasa Xemo û yên din hebûn. Lê heta wê rojê qet jinek ji kurdên misilman li radyoyê nestirabû.<sup>279</sup> Ji bo ku Fatma Îsa di radyoyê da bêje destûr ji mêrê wê dixwazin.<sup>280</sup> Gava Fatma Îsa tê radyoyê û distrê, dengê wê bi her kesî xweş tê. Xebatkarên radyoyê xasma ji strana wê ya Miho ra hijmetkar dimînin. Şêwra radyoyê ya sazbandîyê biryar dide ku dengê Fatma Îsa qeyd bikin. Wê demê 5 stranên Fatma Îsa tên tomarkirin. Ew jî evin: Miho, Êrê Dîne, Şero Dîno Lewendo (Li Ser Rîya Bajêr), Lo Lo Gede û Her Deme Deme.<sup>281</sup> Xelîlê Evdile jî ji bo van stranên li bilûrê dixê û miqama stranên digre. Fatma Îsa gelek stranên mayîn jî dizanibû lê car din neçû li radyoyê nestra û kilamên nû qeyd nekir. Îro di arşîva Radyoya Erîvanê da tenê pênc stranên wê yên navborî hene.<sup>282</sup> Pîsporên zargotina Kurdî Celîlê Celîl, Nûra Cewarî û Tosinê Reşîd ji ser zarê wê gelek kilam, meqam û teqalîdên kurdewarî qeyd kirine.<sup>283</sup> Tosinê Reşîd di derbarê vê serdanê da weha dibêje:

Payîza sala 1968-an ez û Nûra Cewarî ji bo nivîsara stranên Fatma Îsa çûne navçeya Masîsê, gundê Nêcirlûya Jêrin. Ji ber ku em ne bawer bûn, ka Fatma Îsa wê ji mer re bistirê, yanê na, em çûne mêvaniya Mehmedê Silo Babayêv. Kurdperwarekî dilsoz û jêhatî bû, seranser Kurdê Yekîtiya Sovîyêt Mehmedê Silo nas dikirin û rûmeta wî digrtin. Me dizanibû, wekî ji bo xatrê Mehmedê Silo be jî, Fatmê ji me re bistirê. Mala têr û tijî, mala bermêvanan, qedrekî baş ji me re kirin û heta me nanê xwe xwar, Fatme bi

<sup>277</sup> [Dengbêja gelêrî û xwedîya strana "Miho" Fatima Îsa | www.avestakurd.net](http://www.avestakurd.net)

<sup>278</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>279</sup> Yaş, h.b. (c2) r. 76.

<sup>280</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>281</sup> Yaş, h.b. (c2) r. 76.

<sup>282</sup> <http://kurdist.ru/2012/09/13/fatma-isa-dengbeja-kurd-ya-geleri/>

<sup>283</sup> Yaş, h.b. r. 76.

xwîşka xwe ve hatin. Bejn û bala wê, xeml û xêza Kurdî, bedewîya jineke bê qusûr. Di peyvandin û tevgera xwe de jî gelek maqûl bû. Van gişkan bi hev re usan hev dikir, wekî mirov ji wê şerm dikir. Û ji me re stira, stranek, du, sê, çar... û te texmîn dikir, wekî nikare nestrê, stran beşekî jîyana wê ne. Di peyvandinê de gelekî şermoke bû, lê bi merdane distira. Qey bêjî stran bûbû teherê jîyana wê Paşê wê û xwîşka xwe stranên govendê gotin: wê digot, xwîşkê jî lê vedigerand...<sup>284</sup>

Tosinê Reşîd di heman çavkanîyê da tîne ziman ku xizmên Fatma Îsa ji wan ra gotine çend kilamên wê ên ne dîyar hene û van stranan di salên dawî da hatine tomarkirin. Li gor agahîyên ku tên dayîn ev qeyd li ba zarokên wê ne.

Fatma Îsa li hember israrên carek din naçe radyoyê dengê xwe qeyd nake lê ew dengbêjî û stranbêjîya xwe weke yê berê di dawet û şahîyan îcra dike yanî ew dengbêjîyê weke karek profesyonel nake. Ew bi vê taybetîya xwe dengbêjîyê bi halê herî resen temsîl dike. Kesên li derdora wê hem bi dengbêjîya wê hem jî bi şexsîyeta wê jêra gelek rêzê digrin û qedr û qîmet didinê. Ev yek di dîmenên hin şahîyên ku beşdar bûye da xwe bi zelalî nîşan dide.<sup>285</sup>

## Çîroka Strana “Miho”

Strana Fatma Îsa ya herî navdar Miho ye. Dema ku navê Fatma Îsa tê gotin berîya her tiştî ev stran tê bîra mirovan. Wê vê stranê bi dengê xwe kiriye nav klasîkên kurdî. Li ser vê stranê Mahmut Beğik lêkolînek berfireh kiriye û serpêhatîya evîna Têlîya Rihanê û Miho derxistîye holê. Li gor Mahmût Beğik nêzî şeş heft versiyonên stranê ên ku nehatine dîtîn jî hene û stranek ji devê Miho ji bo Têlîya Rihanê jî heye lê hê nehatîye tespîtîkirin. Fatma Îsa vê stranê ji xesûya xwe Xatûna Mehmedê Eto guhdar kiriye û serpêhatîya stranê jî ji wê bihîstîye. Xesûya wê Zarokên Miho û Têlîyê jî dîtîne.<sup>286</sup>

Malbavanên Xatûnê ji hêla Mekuyê ne. Li vê herêmê keçeke gelekî bedew hebûye, navê wê Têlî bûye. Ji ber ku di biçûktîya xwe da herdem li rex dêya xwe bûye û terka wê nekîrye ji wê re digotin Têlîya Rihanê. Dêya wê jî bi kuda çûye Têlîyê bi xwe ra gerandîye. Têlî hem pir bedew bûye hem jî dengbêjeke baş bûye.

<sup>284</sup> [Dengbêja gelêrî û xwediya strana “Miho“ Fatima Îsa | www.avestakurd.net](http://www.avestakurd.net)

<sup>285</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=Yc4iA9rIRWA>  
[https://www.youtube.com/watch?v=OiR\\_86HQO5Q](https://www.youtube.com/watch?v=OiR_86HQO5Q)

<sup>286</sup> hevpeyvîna me ya bi Mahmut Beğik ra.

Bavê wê serokeşîr bûye. Gelek caran dengbêjên ji der û dorên wan û heta yên ji dûtên mala bavê Têliya Rihanê û bavê wê ji wan re konek mezin vedigire da ku dengbêj bidin ber hev. Di her konvekirina ji bo dengbêjan da Têlî jî di serê civatê da rûdinê. Ew jî herdem dengbêja binê konê mala bavê xwe ye. Rojek dîsa kon vegirtî ye û di nava mêvanan da xortekî bi navê Mihemed hebûye. Ew xortek lihevhatî û gelek bedew bûye.<sup>287</sup> Têliya Rihanê dema wî dibîne dilê wê dikevê lê Miho tu car nay wê ji bavê wê naxwaze. Gelek xort evîndarê Têlîyê bûne. Diçûn wê ji bavê wê dixwestin lê Têlîyê ji tu kesî hez nedikir. Ew evîndarê Têlîyê bûn lê Têlî jî evîndarê Miho bû. Têlî ji ber evîna xwe kilamek davêje ser Miho. Ji stranê tê fêmkirin ku Miho û Têliya Rihanê gelek caran hev dibînin û evîna dilê xwe ji hev re dibêjin. Di mijara ku malbata Miho çûye û Têlîyê ji bavê wê xwestiye an nexwestiye da û eger nexwestibin, çima nexwestine du rîwayet hene:

**1-** Hinek kes dibêjin ku Miho kesek feqîr bûye. Ji ber ku Têliya Rihanê keça mezinê ‘şîrê bûye cesaret nekiriye ku biçe wê biwaze.

**2-** Dibe ku di navbera her du malbatan da xwîndarî hebe. Lewra Miho, Têlîyê ji bavê wê nexwestibe. Di nava kilamê da jî behsa du xwûna tê kirin lê eseyîya meseleyê nay zanîn.

Di evîna wan da sal derbas dibin û Miho dizewice. Çar zarokên wî çêdibin. Têlî, ji ber evîna xwe gelek diqehire. Navê evîna wê li der û dora wan belav dibe. Êdî herkes dizane ku Têlî evîndarê Miho ye. Herkes dizane ku Têliya Rihanê vê stranê ji bo Miho gotiye. Stran di nava miletê da belav dibe. Maqûlên der û dora malbata Miho û bavê Têliya Rihanê qîma xwe bi vê bûyerê naynin. Rojekî ji mirovên der dora wan çend jin û mêr ji bo helkirina meseleyê diçin mala bavê Têliya Rihanê. Bavê wê qebûl dike û her du hezkirî digihîjin mirazê xwe. Piştî zewaca wan evîna wan ji ser zar û zimanê xelkê dikeve

Serpêhatîya Miho û Têliya Rihanê di edebiyata kurdî ya devkî da çîroka duyem e ku di dawiyê da evîndar digihîjin hev û dizewicin. Ya din din “Binevşa Narîn û Cembelî yê Kurê Mîrê Hekarîya” ye. Li ser dîroka qewimandina vê bûyerê em dikarin ji ser temenê Xatûna xesûwa Fatma Îsa texmînek teqrîbî bikin. Wê di qîzantîya xwe da dema ku zarokên Têlî û Miho bûne mêvanê kurapê wê wan dîtine. Fatma Îsa di 1934an da ji dayik bûye yanî di vê dîrokê da bi ihtimalek mezin Xatûnê

<sup>287</sup> [Dengbêja gelêrî û xwediya strana “Miho“ Fatima Îsa | www.avestakurd.net](http://www.avestakurd.net)

zewicandî bûye. Ku em temenê zewicandina keçên wê demê jî têkin hesabê ev tê wê maneyê ku Xatûnê li derdora dawîya sedsala 19an an jî di destpêka sedsala 20an da wan dîtiye. Ev jî tê wê maneyê ku evîna Miho û Têliya Rihanê di nava salên 1800-1920an da qewimîye. Tara Îbrahîmova di derbarê hevdîtina Xatûnê ya zarokên Miho û Têliya Rihanê da ji Mahmut Beğik ra nameyek şandîye û li ser mijarê van agahîyan daye:

... Xatûn rojekê ji Fatma re behsa kurê apê xwe Hemê Heftrih dike. Dibêje Hemê mirovekî hêja, jêhatî û xweş bû ye. Rojek mêvan tên mala Hemê. Hemê ji bo mêvana gazi dotmama xwe Xatûnê dike. Xatûn tê nêzikî konê Hemê dibe û derê kon vedike. Dibîne ku çend keç û xortên ciwan rûniştine. Xatûn dixwaze wan binase. Ew ji Xatûnê re dibêjin ku ew zarokên Têliya Rihanê ne. Xatûn bi qisekirina wan kesan, serpêhatiya Têliya Rihanê û Miho hîn dibe...<sup>288</sup>

Li gor gelek kesan vê stranê di şûna Fatma Îsa da kesek din bigota dê ewqas bi nav û deng nebûya. Kesên Weke Mahmut Beğik, Prîskê Miho, Tosinê Reşîd û Têmûrê Xelîl di wê bawerîyê da ne ku Fatma Îsa vê kilamê nestira wê ew çend deng nedaya. Ev yek jî hêza dengbêjîya Fatma Îsa nîşan dide. Strana Miho bala derhêneran jî kişandîye. Gelekan stranê di filmên xwe da bikar anîne. Sergey Parancanov di filmê *Rengê Hinarê* (1968) da, Yılmaz Güney di filmê *Sürü/Kerî* (1978) da û Frûntze Dovlatyan jî di filmê *Hisret* (1990) da bikar anîye. Strana Miho xeynî ji van filman di bernameya Dengên Axê û gelekên din da weke jenerîk hatîye bikaranîn.

Weke ku li jor hate behskirin Fatma Îsa li Radyoya Erîvanê tenê pênc stranan qeyd kirine. Me li jorê bi hûrgilî behsa “Miho” kir. Yê din jî bi kurtasî weha ne:

**Lo Lo Gede:** Di vê stranê da jinek evîna xwe vedibêje. Ew bi gazin bangî evîndarê xwe dike û wî di derheqê vê evînê da bi newêrebûnê tawanbar dike.

**Erê Dînê:** Ev stran ji yê din cudatir e lewre ji devê mêrekî tê gotin. Evîndar bi gotinên qalibgirtî ên weke “erê dînê” û “Gelî malî gundîno” gotinên xwe li hev tîne. Dûre xwe dişibîne çivîkekê ku nikare derdê dilê xwe bêje. Di stranê da gazin tê kirin ku jina baş dibe para mêrê xerab, mêrê baş jî dibe yê jina xerab. Di vir da em fêm dikin ku du evîndar negihîştine hev. Wan kesên ne bi dilê xwe û ne layiqê xwe sitendine. Vebêjer tîne ziman ku li hember firqetê wê qet evîna xwe jibîr neke û dê ji wê pêştir tu kesek din di dilê xwe da nehebîne.

<sup>288</sup> <http://kurdist.ru/2012/09/13/fatma-isa-dengbeja-kurd-ya-geleri/>

“Şêro Dîno Lewendo” û “Her Deme Deme” jî stranên govendê ne. Ev her du stran jî bi gotinên xwe ên zelal û qalibgirtî bi dengê Fatma Îsa ketine arşîva muzîka kurdî.<sup>289</sup>

### **Miho**

ware Miho li me daye Stêrka Xûl e

Stêrkê li me daye, Stêrka Xûl e

Hê Miho şewqê daye Guhera Şêx Resûl e

Hê Miho were heftê xwûnê mala bavê min e

Li ser mala bavê te ne

Hê kuro gede were, ramûsaneke mi keremke

Min pêşva qebûle Miho wî wî wî wî ...

Hê Miho vê bilûrê guv e guv e

Mehmedo vê bilûrê guve guve

Li ber simbêla Mihokê minê zer e, zer dilive

Hê eger hunê Mihokê min nas bikin wê nas bikin

Hun nas nekin, gustîla destê Mihokê min e al yeşim e Miho wî wî wî...

Hê Miho dilê min sêleke dihesinî

Der dizeke havê min î

Hê de binê dasekê dabû destê xwe,

Şîvhespa hespê Mihokê xwe giha jê diçinî

Were kuro gede were hîva sor .....(nehat fêmkirin)?

War nemîne tu yî bê jin î Miho wî wî wî wî...

Were Miho (w)ez ê çûme goma jorîn , goma miyan e

Ez ê di vê rî me (ez li vir im) goma jorîn , goma miyan e

Hê Miho morî minciqê zenda zer qetiyane

Morî minciqê zenda zer qetiyane

Hê şevêkê di êvar da ez qîzmetê lê geriyane

---

<sup>289</sup>[https://www.youtube.com/watch?v=h7D4M5OHPfQ&list=OLAK5uy\\_m6hTWIOKH1OQ1AaJSATONW6N3qFdwY0lo](https://www.youtube.com/watch?v=h7D4M5OHPfQ&list=OLAK5uy_m6hTWIOKH1OQ1AaJSATONW6N3qFdwY0lo)

Li guhera şax û kenda di salixa di sûlix  
cêba Mihemedê min da salix dane  
Miho hey wî wî wî wî...  
Miho wî wî wî...

### **Erê Dînê**

Herê dînê canê te çî gotiye ha li wê ma ha li wê ma  
Herê dînê belekîyê berfê heliya li kêmê man  
Gelî malî gundîno ya min, kawa mi ser milê mêrê çê ma

Herê dînê (w) ez ê çivîk im, çivîka serê xeta li benda  
Erê sebrê xwezila min zar zimanê te bi xwenda  
Erê dînê, tê jina mêrê çê bî, ketî ber mêrê kotî pintî  
Kotîkî mêra, ne tu kuştî ne tu berda

Erê dînê çiya bilinde, rê di ber ra  
Erê sebrê sorgulê baxa sor bûne heme ser ra  
Erê kawa kubarê were (w)ez ê du dila nahebînim serê dilê xwe bi te ra

### **Şêro Dîno Lewendo (Li ser Riya Bajêr)**

Serya bajêr hizhizî, bi lê canê lê canê  
Binya bajêr bi hizhizî Şêro dîno lewendo

Şûşa dilê'm derizî bi lê canê lê canê  
Şûşa dilê'min derizî Şêro dîno lewendo

Derdê'm keçika bi kezî lê canê lê canê  
Derdê'm keçika bi kezî Şêro dîno lewendo

Serya pacê genime lê canê lê canê

Binya pacê bi genime Şêro dîno lewendo

Sê siyara bi him e him e lê canê lê canê  
Van siyara him e him e Şêro dîno lewendo

Derdê'm keçika hakim e lê canê lê canê  
Derdê'm keçika hakim e Şêro dîno lewendo

Serya bajêr bi sûs e bi lê canê lê canê  
Serya bajêr bi sûs e Şêro dîno lewendo

Sê siyar têne casûs e lê canê lê canê  
Sê siyar têne casûs e Şêro dîno lewendo

Derdê'm keçika nêmiş e lê canê lê canê  
Derdê'm keçika nêmiş e Şêro dîno lewendo.

### 2.6.3. Aslîka Qadir

Aslîka Qadir di 1ê Adara sala 1945an da li Ermenistanê li navçeya Axbaranê (Aragasotin) hatiye dinyayê. Malbata wê bi eslê xwe ji 'eşîra Sipkan in. Ew 'eşîreke Êzîdî ne ku li herêma Mûsilê diman. Di salên 1800î da wan nefiyê Serhedê û Kafkasyayê kirin. Malbata wê li gundekî nêzîkî çiyayê Elegezê ku navê wî gundî ji Elegez e diman. Navê dêya wê Geveza Celîl, navê bavê wê Qadirê Emer e. Ew keça malbatê ya şeşemîn e. Tevî Aslîkê heşt zarokên wan hene: Nîgar, Rexbet(keç), Eslan (1 salî dimire), Aslîk, Kazbêk (kur), Jênîk (keç), Wekîl û Emirxan.

Roja ku Aslîka Qadir jidayik dibe bûyerek weha li mala wan diqewime: Berîya ku Aslîkê çêdibe malbata wê hêvî dikin ku kur be lê dîsa keçek ji wan ra çêdibe. Ev yek wan gelek xemgîn dike. Dêya wê neanîna kurekî din ji xwe re weke şermeke mezin dibîne. Ji şeş zarokên wê çar jê qîz bûn lewre ew ji çêbûna Aslîkê qet kêfxweş nebûn û vê yekê Weke rûreşîyek didîtin. Dêya wê ji bavê wê ra dibêje em

navika wê jênekin bila bimre. Bav ewil qebûl dike lê paşê poşman dibe û navika wê jêdikin. Aslîkê piştî ku mezin dibe vê bûyerê ji ber şereke dê û bavê xwe hîn dibe. Rojek dê û bavê wê dikevin niqaşekê. Aslîk li hember bavê xwe piştgirî dide dêya xwe. Bavê wê li ser vê helwesta wê bi hêrs dibêje: “Tu alîyê wê dikî lê ne ji min bûya wê dê te bikuştayê” û vê bûyera roja jidayikbûna wê jê ra dibêjin. Navê Aslîk jî bi daxwaza cînarê wan Egîtê Şamil lê datînin. Li gor agahîyan ev navê evîndara Egîtê Şamil ya zaroktîyê bûye. Ji ber ku ew negihîştîye mirazê xwe xwestîye ku navê wê jîndar bike.<sup>290</sup>

Sala ku Aslîka Qadir çêbû bi bandora şerê cîhanê yê duyem şert û mercên jîyanê gelek zor bûn. Bavê wê di midurîyeta nufûsê da karmend bû. Dêya wê û xwişk û birayên wê jî di kolxoza gund da dixebitîn. Zaroktîya Aslîka Qadir li gund derbas dibe. Ew dibistana gund ya deh sale li wir diqedîne. Piştî perwerdeya lîseyê<sup>291</sup> di sala 1962an da kete ezmûna zanîngehê û li Zanîngeha Erîvanê fakulteya Rojhilatzanîyê di Beşa Zimanê Farisî û Ermenkî da dest bi xwendina bilind kir.<sup>292</sup> Hevjînê wê Canîkê Têmûr li heman zanîngehê di beşa felsefeyê da dixwend. Wan li zanîngehê hev nas kirin û zewicîn. Du zarokên wan bi navê Armanc û Stêlla(Stêrk) çêbûn.<sup>293</sup>

Aslîka Qadir ji ber ku li gund mezin bûbû çanda kurdî ya devkî pir baş hîn bûye. Ew dengbêjîyê ji bavê xwe hîn bûye. Qadirê Emer bi xwe jî dengbêjek baş bû û keça xwe Aslîkê bi xwe ra dibir dawet û şahîyan. Wê li van şahîyan bi bavê xwe re stran digotin.

Apekî wê di dema Stalîn da nefîyê Sîbîryayê kiribûn. Bavê wê ji bo wî stranên şînê digot. Wî heta mirina xwe di xewnan da jî ji bo wî stranên digot. Di vê atmosferê da bi Aslîkê re ji bo dengbêjîyê eleqe û sempatîyek mezin çêdibe. Di dibistanê da meyla wê pêşîyê li ser stranên ermenkî bû. Ew di dibistanê da jî aktîf bû û distira. Herweha wê li zanîngehê jî distra. Qabiliyeta wê ya muzîkê û dengê wê yê xweş di radyoyê da jê ra bû derfetek û ew di dengbêjîyê da bi pêş ket.

<sup>290</sup> <https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/05/17/erivan-radyosunun-yasayan-son-kadin-dengbeji-aslika-qadir>

<sup>291</sup> <https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/05/17/erivan-radyosunun-yasayan-son-kadin-dengbeji-aslika-qadir>

<sup>292</sup> Nihad Gültekin, “Rojhilatzen, Hunermend Aslîka Qadir: Asûrîyan Jî Ermenîyan Jî Şayî û Şînen Xwe Bi Stranên Kurdî Kirine” *Nûbihar*, j. 141, Stenbol, 2017. r. 166-173.

<sup>293</sup> <https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/05/17/erivan-radyosunun-yasayan-son-kadin-dengbeji-aslika-qadir>

Aslîka Qadir keçeke kurdperwer bû. Serhildana Mele Mistefa Barzanî ya li hember rejîma Baasê kelecaneke mezin bi kurdên Sovyetê re çêkiribû. Aslîkê wê demê 19 salî bû. Wê jî weke qîzeke welatparêz û milethez van bûyeran bi meraq dişopand. Radyoya Erîvanê bi qasî 100-200 metreyî nêzî zanîngeha wê bû. Ew ji bo ku nûçeyên herî rast hîn bike diçû radyoyê. Wê li wir tu kesî nas nedikir lê xebatkarên radyoyê gelek kêfa xwe jêra anîn û wê bi kêfxweşî pêşwazî kirin. Wê agahiyên ku di derbarê serhildana Barzanî da hîn dikir li zanîngehê bi hevalên xwe re parve dikir. Ew pirî caran li ser mijarê bi hevalên xwe ên ermenî ra dikete nîqaşan. Di nav wan hevalên wê ên zanîngehê da Levon Terpetrosyan jî hebû û ew piştî hilweşîna Sovyetê bû Serokwezîrê Ermenistanê.<sup>294</sup>

Strangotina Aslîka Qadir li radyoyê weha dest pê dîke: Li radyoyê dê ji bo 250 salîya şairê ermenî Sayat Nova çalakiyek bihata amadekirin. Egîdê Cimo ji Aslîka Qadir dipirse dibê tu dikarî stranên Sayat Nova bêjî? Stranên wî jî gelek zehmet bûne, Herkes nikaribûye bistirê. Ji ber ku meyla wê pêşî li ser stranên ermenî bû wê bi awayeke ji xwe bawer vî karî girt ser xwe. Pirtûka Sayat Nova ku Heciyê Cindî û Fêrîkê Ûsiv ji ermenî tercumeyê kurdî kiribûn danê. Egîdê Cimo ji wê û Sûsika Simo ra dibê her yek ji we du heb stranên wî hildin û bixwînin. Ji wan ra dibêjin xwe amade bikin em ê ji bo pîrozkirina salvagera rojbûna Sayat Nova dengê we qeyd bikin. Aslîka Qadir du hebsetên wî ji xwe ra hilbijart. Yek “Hetanî Hebim” ya din jî “Kemençe” bû. Egîdê Cimo wê dişîne ba berpîrsîyarê beşa muzîkê Aram Mîrangulav. Mîrangulav jî mûzisyenekî ermenîyan ê navdar e. Ew çawa dengê Aslîkê dibihîze jibêje “here studyoyê, bila qeyd bikin.” Lê dengê wê bêprova bi carek qeyd dîkin. Vê yekê gelek wê aciz dîke. Ew vê yekê weha bibîr tîne:

Pêşiyê ew her du stranên Sayat Nova bûn. Ew bûne dergûşên min... Got herin û binivîsin (qeyd bikin). Em çûne xwarê ketine studyoyê û tu zanî çî bû? Wekî ecêb qet bi min ra prova nekirin, yekser nivîsîn. Ez gelek xeyidîm, dilê min gelek êşîya. Ez hatim min serokê beşa muzîkê Tîtalê Efo bû wê demê. Min ji Tîtalê Efo ra got em di dewsa kurda da ne. Bi min ra qet prova nekirin. Runiştin lîxistin û yekser nivîsîn. Wisa jî min bi xwe nebawer, tirs bi min heye. Min got çawa tiştê wisa dîkin? Ermenî bi mehan prova dîkin û li ser straneke xwe dixebitin. Vana ez piştguh kirim. Wek keçe

<sup>294</sup> <https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/05/17/erivan-radyosunun-yasayan-son-kadin-dengbeji-aslika-qadir>

kurda ye... Min jî got na wisa çênabe...Ew niha jî di fonda radyoyê da hene û têne weşandin.<sup>295</sup>

Li hember vê pirsgirêkê qeyda stranan gelek baş derket li dû wan stranan, dor hat ser “Welatê Me Kurdistan e”. Egîdê Cimo teksta gotinên stranê û muzîka wê jê ra dibêje û du caran pêre distrê. Aslîkê gotinên wê jî ezber kir û bi daxwaza wî bi grûba wî ya muzîkê ra ket studyoyê û prova kir. Wê demê ji ber zextên Sovyetê bikaranîna peyva Kurdistan pirsgirêk bû lewre Sovyet welatê kurdên wir dihate qebûlkirin. Ya din jî ew bû ku nedixwestin di nav wan û Tirkîyeyê da pirsgirêk derkevin. Ji ber van sedeman bername û stran beriya ku werin weşandin bi ermenkî dihatin wergerandin û ji aliyê mijarên qedexê ve dihatin kontrolkirin. Piştî kontrolê hê destûra weşanê dihate dayîn.

Aslîka Qadir ji bo radyoyê ji bavê xwe gelek piştgirî didît. Ji bo qeydê lazim bû li benda valabûna studyoyê bisekinîna lewre ewil ermeniyên stranên xwe qeyd dikirin. Heta ku karê wan diqediya dibû derengê şevê. Wê çaxê Aslîkê ji Egîdê Cimo ra dibê bûye dereng wê bavê min nebêje heta wê saetê çi dikî? Egîdê Cimo ku bavê wê baş nas dike û di daweta birayê wê da jî li bilûrê xistiyê diçe cem bavê wê Qadirê Emer û ji bo tomarkirina stranan jê destûr dixwaze. Aslîkê pir nedixwest lewre dersên wê pir bûn lê bavê wê karê radyoyê û gotina stranan weke xizmetek ji gelê kurd ra dibîne û dibê “Here bi xebera Egît bike. Ez zanim tu li kuyî.” Li ser vê yekê ew diçin û heta berbangê sibê stranan tomar dikin. Wê çaxê 10-11 stranan qeyd kirin. Di nav wan stranan da “Welatê Me Kurdistan e” jî hebû. Vê stranê di nav gel da pir deng da û Aslîka Qadir bi vê stranê hate naskirin. Wê vê stranê bi hesteke dilsozî û evîneke mezin got. Egîdê Cimo mehekê seranser bi şev û roj li ser meqamê stranê rawestiya. “her ji bo ku gelê kurd bindest e, ku Kurdistan digirî, diêşe, diperçiqe, dianî bîra xwe û dixwest hesta neteweyî berz û hêz bike.”<sup>296</sup>

Çîroka weşandina stranê jî bi qasî stranê balkêş e. Weke hemû stranên din vê stranê jî peşiyê dişînin Moskovayê lê li vir destûr nadin. Di stranên evînî û yên govendê da pirsgirêk dernediket lê ji ber peyva Kurditanê ev stran ji sansurê derbas nebû. Rêveberiya radyoyê jî strana “Welatê Me Kurdistan e” xistin nav stranên gelerî û bi vî awayî weşandin. Gel jî vê stranê bi tirs guhdarî dikir. Aslîka Qadir tîne ziman

<sup>295</sup> Hevpeyvîna me ya bi Aslîka Qadir ra.

<sup>296</sup> Gültekin, h.g. r. 71-72.

ku wan vê stranê ji ermeniyên jî veşartine û dema ku lê guhdar dikirin yekî li ber derî nobetê digirt da ku kes pê nehise.<sup>297</sup>

Xebatkarên radyoyê tenê karek nedikirin. Xeynî ji karê wan ê sereke çî ji destê wan bihata dikirin. Aslîka Qadir jî ji bilî strangotinê beşdarî bernameyan dibû û di şanoyên radyoyê da jî weke lîstikvan cih girte. Sîma Semend bernameyek edebiyatê amade dikir û Aslîka Qadir vedixwend bernameya xwe. Ji ber ku Aslîka Qadir filolog bû dikaribû helbestan xweş û bi awayeke rast bixwîne.

Min sirra helbestan dizanibû. Ez diketim nava kurahîya helbestan. Meriv hene hema teq req dixwûnin lê ne rast e. Gerekî tu naveroka wê fam bikî, gerekî bikevî kurahîya helbestê. Xwedanê helbestê, aktorê wê çî dixwaze bêje wî bigihînin guhdaran. Tu gerekî wisa bixwîni wekî her herfeke te, her gotineke te di cî da be. Ku radyoguhdar te bibhîzin nebêjin wî ev çî zehlê min bir, wê radyoyê vêsînin (bigirin). Tu wan herfan, wan gotinan rast nexwîni dêmek tu wan peyvên dikujî. Tu gerekî vî tiştî gelekî cidî hildî. Min jî helbet dixebitim ku her tişt baş bibe.<sup>298</sup>

Ew di lîstikên şanoyê yê bi navê Gîkor û Kumsor jî weke lîstikvan cih digire. Ew di lîstika Kumsor da bi Wêzîrê Eşo ra lîste. Aslîka Qadir keçika kumsor Wezîrê Eşo jî rola gur lîste. Rejîsorê ermenî Nigiyakosyan perwerdeya lîstikvanîyê dida wan.

Aslîka Qadir li radyoyê gelek dihate hezkirin û ji gelek kesên navdar ên wê demê alîkarî digirte. Wê jî di radyoyê da çî jê bihata dikir. Aslîka Qadir bi Casimê Celîl re bîranînek xwe weha bibîr tîne:

Wê demê rehmetî Casimê Celîl jî li wê derê bû. Nizanim min çî jê re got, min re got: qîza min tu kar çîçeğî ye. Te teze serê xwe di nav berfê derxistiye, tu min re çî dibêjî wan tiştan. Tiştêk gotin min jî got aha be, bila aha nebe. Lê gelek min hez dikir, rehme lê be.<sup>299</sup>

Mîkayêlê Reşîd û Fêrîkê Ûsiv jî ji ber welatparêzîya wê pê serbilind dibûn û helbestên xwe ên nû nîşanê wê didan û derbarê wan da fikra wê dipirsîn.<sup>300</sup>

---

<sup>297</sup> Gültekin, h.g. r. 7172.

<sup>298</sup> Hevpeyvîna me ya bi Aslîka Qadir ra.

<sup>299</sup> Gültekin, h.g. r. 72.

<sup>300</sup> Hevpeyvîna me ya bi Aslîka Qadir ra.

Rewşa jinan li nav kurdên Sovyetê jî nexweş bû. Pêşketina rewşenbîrî nêrîna li hember jinan pir neguhertibû. Dema ku jinek biçûya radyoyê bistira bertek didît. Malbata wan astengî derdixist lê ji bo Aslîkê ne wisa bû ew heta ku zewicî bi azadî diçû radyoyê. Heta bavê wê bi xwe piştgirî didayê. Dîsa jî li derdora wan kesên ku bi çavek nebaş nêzîkê wê dibûn jî hebûn. Aslîka Qadir mînakek weha dide:

Dorberê min digot, aha binêrin qîza Qadir çû, denge xwe kirîye radyoyê, nizam tiştên usa. Carna jî kurê wan min bixwasta, digotin na, ewa diçe radyoyê. Min got ya ji bo min bavê min tiştek nekir, lê ji bo Zadin, ji bo Susik gelek zehmet bû... Niha ew tişt hatiye guhartin. Teybetmendiya hunermendên jin ew bu, ku nenihêrî teli-tengasyan, dîsa jî ew ne dişkestin, ewana derba ewil hildan ser xwe û di karê xwe da bûn şoreşgar, edetên kevnepereşt bînpê kirin, ji civaka paşdamayî pêştir ketin û rê li ber yê du xwe ra bîn, vekirin. Bo jina kurd ne hêsan bû li wan salan da dengê xwe bikin radyoyê. Loma jî kar û xebata wan, ya pir bi weta û pir bi êş û azar hêjayî qedir û qîmeteke giran e.<sup>301</sup>

Aslîka Qadir beriya ku bizewice karê radyoyê bêpirsgirêk dimeşande lê zewaca wê li ber karê wê yê hunerî bû astengîyek mezin. Ji ber ku ew diçû radyoyê pirsgirêkên mezin di nav wê û hevjinê wê da derdiketin. Li hember ku hevjinê wê nedixweste jî ew diçû radyoyê. Kesên derdora wan bi taybetî tîyê wê ji bo xebatên wê yê radyoyê ji hevjinê wê gazinan dikir.

piştî ku zewicîm min bîst sal stranan negot. Piştî ku çûm Ewropayê min dîsa dest bi hunerê kir û niha jî di wî îşî da me. Dengê min û Radyoya Rewanê hem bûne bextewarîya min hem jî bûne bextreşîya min... Tîyê min mêrê min dineqand û ji bo çûndina min a radyoyê astengî derdixiste, hesûdî dikir şer derdixiste.<sup>302</sup>

Şerên wan ên bi sedema dengbêjîyê û çûndina radyoyê bêhizûriyek mezin di nav wan da pêk dianî. Heta ev yek digihîşte asta şideta fîzîkî jî. Ji ber vê yekê Aslîka Qadir biryar dide ku jê biqete û bi awayek resmî du caran serî li mehmekê jî dide. Hevjinê wê pê re soz dide ku dê ev pirsgirêk biqedin lê heman pirsgirêk didomîyan. Mêrê wê strangotina wê û çûndina wê ya radyoyê tu car qebûl nekir. Ew jî mecbûr ma ku di nav hunera xwe û malbata xwe da tercîhek bike. Ev tercîh jî bu sebeb ku demeke dirêj ji hunerê dûr bikeve.

<sup>301</sup> Gültekin, h.g. r. 72-73.

<sup>302</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=xCkm0-4\\_1vI](https://www.youtube.com/watch?v=xCkm0-4_1vI)

Hevjînê Aslîka Qadir Canîkê Têmûr di 5ê gulana 1982an da vefat kir.<sup>303</sup> Ew tevî du zarokan tenê ma. Aslîka Qadir wê demê mamostetîya ziman û edebiyata ermenkî dikir. Ji ber ku pîspora farisî bû jî Dewleta Sovyetê xweste wê weke tercumana zimanê rûsî-farisî bişîne Afxanistanê. Wê jî çûndinê qebûl kir lê lazim bû ku ji bo farisî bikeve ezmûnê. Wê piştî zanîngehê farisî qet bikar neanîbû lewre ji bo ku cardin farisîya xwe bîne asta berê dixebitî. Di vê navberê da tîyê wê carna tê serdana wan. Aslîka Qadir fikra çûndina Afxanistanê jê diveşêre. Dema ku sebaba xebata wê ya farisî dipirse dibêje ez tez amade dikim.<sup>304</sup> Aslîka Qadir diçe Moskovayê dikeve ezmûna farisî û biser dikeve. Êdî ji bo çûndika Afxanistanê amade bû. Dewleta Sovyetê ji bo zarokên dîplomat û karmendên xwe wargeh û dibistanan vekiribû. Kesên ku li derveyê Sovyetê dixebitîn zarokên wan li wir diman. Dê zarokên Aslîka Qadir jî li wir bimana. Ew di sala 1985an da çû Afxanistanê û du sal li wir xebitî. Dewletê xwest ku kontrata wê dirêj bike lê ew ji bo zarokên xwe zêdetir nema. Aslîka Qadir piştî ku vejeriya Ermenistanê li wezaretê perwerdeyê weke metodîsta ziman û edebiyata ermenkî dest bikar kir û dereceya wê ya karmendîyê bilind bû. Wê karê mamostetîyê tu cara bernedaye û heta ku li Ermenistanê bûye muzîk karê wê yê duyem bûye.<sup>305</sup>

Piştî hilweşîna Sovyetê weke gelek kurdên li wir Aslîka Qadir jî mecûr ma ku ji Ermenistanê koç bike. Nijadperestên Ermenistanê bi gef û zextan gelek kurdan mecbûrê koçê kirin. Aslîka Qadir wan rojan weha tîne ziman:

Gava Yekîtiya Sovyêtê hilweşya û nijadperestên Ermeniyên hatin ser hukim, ewana pêşiyê azerî, paşê Kurdên Musilman bi hovane ji welatê xwe derxistin, dura vejeriyên ser kurdên êzdî. Çend ronekbîrên me kuştin, belê kuştin, lê bi ji navbirina doktor-pirofêsorê kurd Sehîdê Îbo, derbeke psîkolojîk û tirseke mezin kirne dilê me. Wana Sehîdê Îbo kuştibûn. Heta niha jî nabêjin kê kuştîye. Dîyar nebû ke kuşt. Sehîdê Îbo jî welatparezekî, kurdekî bi dilê te, ah ez bimrim. Xazila min bikuştina, bila Sehîdê Îbo nekuştina. Profesor bû, doktorê zaran[zarokan] bû. Kitebên ilmî nivisîbûn. Wana Sehîdê Îbo kuşt ku ewa ji me re bibe sînyal û em ji Ermenistanê derkevin. Eger em derneketibûna wê me navê me yekoyek ji ortê rakirana. Nijetperestên ermeniya jî diqîryan ‘Ermenistan bo Ermenyan’ Gelek

<sup>303</sup> <https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/05/17/erivan-radyosunun-yasayan-son-kadin-dengbeji-aslika-qadir>

<sup>304</sup> Gültekin, h.g. r. 69.

<sup>305</sup> Hevpeyvîna me ya bi Aslîka Qadir ra.

ronakbîrên kurd, di nav da ez jî , mecbur man dîsa gorên kal û bavên xwe bi cî bihêlin û berê xwe bidin xerîbiyê... Tê bîra min wê çaxê konferansek çêbû li Moskovayê. Ez jî çûm, konferansa kurdan giştî bû. Ji Başûrê Kurdistanê jî hinek kes hatibûn. Kendal Nezan seroke Enstîtûya Parise, Celîl bû, Ordîxan bû, Zadîna Şekîr, me grub çêkiribûn tev Dilovan, piştî konferansê em strana bêjin di restourantê da. Min wê derê jinek dît, Kurdekî misilman bû, ji Ermenistanê revîbû. Ez dîtîm, min hemez kir...<sup>306</sup>

Aslîka Qadir weke rewşenbîreke kurd her dem xwedîyê helwesteke kurdperwer bûye. Piştî hilweşîna Sovyetê li Ermenistanê polîtîkayên ji hev cudakirina kurdan hate meşandin û kurd weke misilman û êzîdî hatin dabeşkirin. Gelek rewşenbîrên kurd li hember vê yekê sekinîn. Aslîka Qadir jî yek ji wan e. Wê rê neda ku li ser pirtûkên dersa kurdî “zimanê êzdîkî” were nivîsîn.<sup>307</sup> Her weha wê weke rewşenbîrek di nav komîsyona çareserkirina vê pirsgerêkê da cih girt. Dema ku komîsyonê bi serokwezîrê Ermenistanê re hevdîtn pêk anî wê jî di wê hevdîtinê da cih girte. Serokwezîrê Ermenistanê yê wê demê hevalê wê yê zanîngehê Levon Terpetrosyan bû

Li gor Aslîka Qadir divê hunermend li ser siyasetê fikrê xwe bi gel ve parve bike:

Siyaset huner e, huner jî siyaset e. Merîv nikare wan ji hev biqetîne, ji ber ku kul û derdê millet wisa jî şahî jî tenê bi zimanê hunerê tê şirovekirin. Nexweşiya milletê me ya giştî, ji ber ku em hemî ewladên hevpar yên milletê xwe ne û dilê me giştîk ser dayîka me diêşe. Ew fikirê şaş ku hunermend heqê wî tune nêrîna xwe li ser siyasetê bêje, ez vî tiştî wek kifîreke mezin dibînim. Ev sivkayatîkirine bi hunermendan. Hunermend bi xwe ne robot e ku tu wî bo 20 deqan, saetekê damezirînî ku ew bistirê û gava ku wextê wî qediya, wî bibî û biavêjî qulçekî heta ku carek din bi kar bînî<sup>308</sup>

Ew strana “Welatê me Kurdistan e” weke şoreşek dibîne û tîne ziman ku her hunermendek bi berhemên xwe teswîra rewşa gelê xwe dike. Yanî hunermend bixwaze jî nexwaze jî bi siyasetê ve girêdayî ye.

---

<sup>306</sup> Gültekin, h.g. r.73.

<sup>307</sup> Eşo, h.b. r. 290.

<sup>308</sup> <https://www.basnews.com/kr/babat/425023>

Gelek hunermend hene ku hunera xwe ji bo fikrên xwe ên polîtîk feda dikin û estetîka hunerî piştguh dikin. Weke ku di beşên din da hate behskirin mînakên wê yekê bi taybetî di edebiyata kurdên Kafkasyayê da gelek pir in. Li gel wan Aslîka Qadir ji destpêkê heta niha tim xwestiye bi muzîkeke herî baş derkeve pêşberî guhdaran. Her çiqas wê jî li gor konjoktura wê demê stranan li ser Lenîn jî gotiye û hesta xwe ya neteweperwerîyê jî bi muzîkê daye der lê wê tim giringiyek mezin daye kalîteya muzîkê jî. Ev hesasiyeta wê hê ji qeyda wê ya yekem da dîyar dibe. Dema ku dengê wê bêprova bi carek qeyd dikin ew gelek aciz dibe. Ew hêza hunermendîyê bi pîrbûna berheman ve girê nade û dibêje “bira yek be bira beg be.” Tenê sê albumên wê hene. Yek Qasimo ye, Yek jî daye Enstituya Kurdî ya Parîsê. Ya din jî amade ye lê hem dema wê tune ye hem jî hewesa wê ji bo van xebatan tune ku derxe. Aslîka Qadir bi kurê Reşîdê Baso hunermend Dilovan ra li Erîvanê û Ewropayê konseran daye. Xeynî ji muzîkê kêfa wê gelek ji govenda kurdî ra jî tê. Bi taybetî ji temaşekirina govendê hez dike lê bi xemgînî tîne ziman ku nizane govend bigire.<sup>309</sup> Hunermendên weke Eyşe Şan, Mihemed Arifê Cizrawî û Şakiro gelek bandorê li Aslîka Qadir kirine lê di nav hunermendên kurd da cihê Mihemed Şêxo jê re cuda ye.<sup>310</sup>

Aslîka Qadir di sala 1995an da tevî du zarokên xwe ewil diçe Polonyayê ji wir jî diçe Almanayê û îltîcayê dewleta Almanan dike.<sup>311</sup> Ew niha li Almanayê dijî. Kur û qîza wê zewicî ne. Sê neviyên wê hene. Carna beşdarê çalakîyên hunerî û çandî dibe. Pîrozbahîya serxwebûna Kurdistanê û ya “100 Saliya Sykes-Pîcot” hin ji wan in.<sup>312</sup> Aslîka Qadir bi ermenkî, rusî, farisî almanî û darî (zimanek herêmî yê Afxanistanê) dizane.<sup>313</sup> Her weha Aslîka Qadir di malperên weke riataza û Rojeva Kurd da nivîsan jî li ser kurdan dinivîse.<sup>314</sup> Ji ber ku ew di heman demê da zimanzan û rojhilatzan e jî dixwaze li ser van mijaran û folklorê jî semîneran bide lê gazine xwe dike dibêje: “herkes merivên xwe ji bo çalakîyên bi vî rengî vedixwîne. Yê me kesên zana naxwazin.”<sup>315</sup>

---

<sup>309</sup> Hevpeyvîna me ya bi Aslîka Qadir ra.

<sup>310</sup> <https://buyerpess.com/kurdi/?p=11205>

<sup>311</sup> <https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/05/17/erivan-radyosunun-yasayan-son-kadin-dengbeji-aslika-qadir>

<sup>312</sup> Gültekin, h.g. r.73.

<sup>313</sup> <https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/05/17/erivan-radyosunun-yasayan-son-kadin-dengbeji-aslika-qadir>

<sup>314</sup> <https://krd.riataza.com/2018/01/19/milete-ezidi-li-ermenistane-ce-bu/>  
<https://rojevakurd.com/li-ba-xusk-u-biren-xwe-yen-li-xeribiye/>

<sup>315</sup> Gültekin, h.g. r.73.

## Strana “Welatê Me Kurdistan e” û Aslîka Qadir

Çîroka weşandina vê stranê jî bi qasî stranê balkêş e. Wek hemû stranên din vê stranê jî peşîyê dişînin Moskovayê lê li vir destûr nadin. Di stranên evînî û yên govendê da pirsgirêk dernediket lê ji ber peyva Kurditanê ev stran ji sansurê derbas nebû. Rêveberiya radyoyê jî strana “Welatê Me Kurdistan e” xistin nav stranên gelerî û bi vî awayî weşandin. Dema ku gel vê stranê guhdar dikir jî bi tirs guhdar dikir. Aslîka Qadir tîne ziman ku wan vê stranê ji ermeniyên jî weşartine û dema ku lê guhdar dikirin yekî li ber derî nobet digirt da ku kes pê nehise.<sup>316</sup>

Ev stran di hafizaya gelê kurd da xwedîyê cihek taybet e. Belkî jî ji ber vê yekê nîqaşên dûvedirêj li serê hatine kirin. Heta em dikarin bêjin ku “Welatê Me Kurdistan e” di dîroka muzîka kurdî da strana herî binîqaş e. Çavkanî derbarê stranê da agahîyên curbicur ên dijberî hev didin. Di derbarê nivîskarê gotinên wê û avakarê meqama wê da gelek agahî hene lê tu kesek bi awayek piştrast navek misoger nade. Ev yek jî giringîya stranê nîşan dide. Tiştê ku tê zanîn ev stran cara ewil di Radyoya Bexdayê da bi dengê kesek din hatiye weşandin lê pir bala kesî nekişandiye. Memê Eylaz di sala 1963an da gotinên wê li gor qanûnên Sovyetê guhertîye. Di orjînalê stranê da dibêje “kurd û ereb bira ne.” Memê Elyaz vê hevokê derxistîye û hevoka “milet hemû bira ne.” lê zêde kiriye. Di arşîva radyoyê da bi vê hevokê hatiye tomarkirin lê Aslîka Qadir piştî çend salan bi xwe vê hevokê guhertîye û kiriye “kurd hemû bira ne”. Ew dibêje ji ber ku kurd dijminîya hev dikin min vê hevokê bikar anî.<sup>317</sup> Li hember guhertinan jî ji ber peyva “Kurdistan” Radyoya Erîvanê beşa kurdî gelek hatiye şikayetkirin.

Stran çawa gihîştîye Radyoya Erîvanê nay zanîn lê em ji agahîyên ku Têmûrê Xelîl dide zanin ku xebatkarên Radyoya Erîvanê û ya Bexdayê di têkilîyê da bûne û stranan ji hev ra şandine.<sup>318</sup> Bi îhtîmaleke mezin ev stran jî di vê danûsitandinê da gihîştîye ber destê Memê Elyaz û Egîdê Cimo.

Aslîka Qadir tîne ziman ku di versiyona Radyoya Bexdayê da melodiya wê bi şêweya ereban gotine lê “ev ne ya ereban ne ya tirkan e. Ev straneke welatparêzîyê ye. Gerekî rîtmîk be. Çawa min straye wisa.” Dîsa Aslîka Qadir derbarê avakarê

<sup>316</sup> Gültekin, h.g. r. 7172.

<sup>317</sup> Hevpeyvîna me ya bi Aslîka Qadir ra.

<sup>318</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

meqam û gotina stranê da di hevpeyvîneke xwe ya kevn da du navan dide û dibêje gotinên wê Enwer Mayî meqama wê jî Feqî Bemarnî amade kiriye<sup>319</sup> lê di hevpeyvîna me da weha dibêje:

Ez nizanîm. Ez dibêim gerekî li serê lêkolîn bê kirin. Çunkî gelek meriv li vê stranê xwedî derdikevin. Mecîd dibê ez im, Egit digot ez im. Yekî soran hebû navê wî Celal/Cemal wî digot min nivîsiye. Ez naxwazim heqê kesekî bixwim. Ez dibêjim di dawîyê da gerekî lêkolîn bê kirin. Wexta ku Kurdistan ava be lêkolîn bê kirin û rastî derkeve holê.<sup>320</sup>

Zeyneb Yaş jî li ser mijarê van agahîyan bidest xistine: Gotinan Enwer Mayî nivîsiye. Fexrî Bamernî jî hem awaza wê amade kiriye hem jî cara ewil wî straye. Yaş, vê agahîyê bixwe ji Ehmed Zero, Xalid Amêdî, Sefkan Evdilhekîm û Semîr Zaxoyî berhev kiriye.<sup>321</sup>

Tosinê Reşîd li ser hesabê xwe yê facebookê di 8ê mijdara 2021ê da li ser stranê ev agahî dane:

Îro kurê Mecîdê Silêman ji min re têtêfon kir û dîlmayîna xwe dîyar kir, wekî min gotiye stirana "Welatê me Kurdistan e" ya radîoya Bexdayê, beşê kurdê ye. Bi rastî ew stran ya radîoya Bexdayê beşê kurdîye. Hilbet têtêst gişk nayê bira min, lê peyvên wa hebîn "Kurd, ermenî, asorîne, Şêr û plingê şerqêne, Kurd û ereb birane". Me xwest ew stran bi radîoya kurdî, ya Yêrevanê bê belavkirin. Lê seroketîya radîoyê têtêksta orîgînal qebûl nekir û em neçar man hinek guhastina bikne têtêksta wê. Dewsa xeta Kurd û ereb birane, me nivîsî "Milet hhemû birane". Di amade kirina têtêksta nû de Memê Eylaz, ku hingê li radîoyê kar dikir, alî min kir. Ê Mecîdê Silêman ew stran bi radîoya Yêrêvan, beşa kurdî stira.<sup>322</sup>

Şehrîbana Kurdî jî heman stranê gotiye lê Aslîka Qadir dibêje wê bi şêweya ereban gotiye. Cudahîyeka ya Şehrîbana Kurdî jî ew e ku gotina "welatê me Kurdistan e" hatiye guhertin û peyva "Kurdistan" bûye "Gulistan" Şehrîbana Kurdî vê stranê di sala 1991ê da gotiye.<sup>323</sup> Ji ber ku di wan salan da li Bakûr peyva Kurdistan qedexe bû ev yek hatiye kirin lê di gotinên stranê ên din da jî guhertin

<sup>319</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=t8ybNrJ4yQA>

<sup>320</sup> Hevpeyvîna me ya bi Aslîka Qadir ra.

<sup>321</sup> Hevpeyvîna me ya bi Zeyneb Yaş ra.

<sup>322</sup> <https://www.facebook.com/tosn.ozmanian>

<sup>323</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=maa8K\\_e\\_vDY](https://www.youtube.com/watch?v=maa8K_e_vDY)

hatine kirin. Her weha Rêncber Ezîz jî vê stranê gotiye û metna ya Aslîka Qadir bikar anîye.<sup>324</sup>

Aslîka Qadir dibêje: “Bi vê stranê cara ewil min straneke siyasî got.”<sup>325</sup> Ev stran di demeke wisa da derket ku kurd weke miletek di rewşeke xerab da bûn. Peyva kurd û Kurdistan li her deverê Kurditanê dibû sebaba pirsgirêkên mezin. Ev stran di vê atmosfêrê da moralek mezin da gel. Aslîka Qadir li ser karîgeriya stranê weha dibêje:

Di van qewil u şertên wehşî de, ji nişka ve stiraneke bi navê "Welatê me Kurdistan e" bi dengê stirenbêjeke kurd, ku runiştvana Yekîtiya Sowyetê bu, ji radyoya Yerîwanê dikeve guhê wan. Belê, ew ê eşkere got,- "Welatê me Kurdistan e, cih û meskenê me Kurdan e".... Bi van du hevokan û xetan ne tenê daxwazeke me hemu kurdan, ya hundirî dihate eşkerekirin. Lê di ser de jî kurdên Sowyetê bi zar û dengê ewledeke xwe mijda xêrê li xwîşk û birayên xwe yên li Kurdistanê û derveyî wê daxist.<sup>326</sup>

Stranên Aslîka Qadir ên ku li Radyoya Erîvanê hatine tomarkirin xeynî ên ku li jor hate behskirin bi piranî kilamên govendê û şahîyê ne. Di hinan da jî pesnê pergala Sovyetê tê dayin. Li hember vê yekê di albuma *Qasimo* da zêdetir stranên mêranî û welatperwerîyê hene. Dema ku albuma *Qasimo* derket êdî zexta dewleta Sovyetê tunebû lewra wê di vê albumê da stranên kurdperwerîyê bêyî sansur gotine. Me li jêr lîsteya stranên wê ên radyoya Erîvanê û stranên albuma *Qasimo* da.<sup>327</sup> Li jêr sê mînakên stranên wê hene. Yek jê “Welatê Me Kurdistan e” Ji bo ku em guherînen di vê stranê da bibînin me li gel metna ya Aslîka Qadir metna stranê ya ku Şehrîbana Kurdî gotiye jî da. Piştî wan me mînakek din ji straneke ku wê di Radyoya Erîvanê da gotiye da. Meqama strana “Hevalno Werne Civatê” gelerî ye lê naveroka metna wê pesnê civata kurdan û dewleta Sovyetê dide û xweşî û başiya gelê kurd û pergala Sovyetê vedibêje. Mînaka me ya dawî jî “Qasimo” ye. Qasimo straneke şînê ye. Gelek dengbêj û stranbêj vê stranê gotine lê herî zêde bi dengê Aslîka Qadir hatiye guhdarkirin û hezkirin.

<sup>324</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=Ve82Qhjgrog>

<sup>325</sup> Gültekin, h.g. r. 71-72.

<sup>326</sup> <https://www.basnews.com/kr/babat/425023>

<sup>327</sup> Ji vê lîsteyê “Tu Min Ra Tava Jor” û “Bedew û Qeşenda Te Me” helbêtên Mîkayilê Reşîd in. (Eşo r. 289.)

### **Stranên Radyoya Erîvanê:**

Bedew û Qeşenda Te Me

Bihar û Yar

Hetanî Hebim

Hevalno Werne Civatê

Hey Canê

Kemençe

Kewên Gozel

Lê Bejnê

Lê Gidiyê

Nînik Nînarê Te Me

Tu Dizanî

Tu Mîn Ra Tava Jor

Welatê Me Kurdistan e

Yar Gulê

Yar Were Keçikê<sup>328</sup>

### **Albuma Qasimo:**

Bejnê

Lê Lê Dayikê

Dolavê

Hey Delal

Keçikê Canê

Loy Li Mîn

Qasimo

Xezalê

Zêr Zeynebê

Tu Dizanî

Neçe Avê

---

<sup>328</sup>[https://www.youtube.com/watch?v=WGvFgC\\_dyxU&list=PLAXCuqYJmH1LJ\\_4e6c7nOxVQy4BQq9v-Z](https://www.youtube.com/watch?v=WGvFgC_dyxU&list=PLAXCuqYJmH1LJ_4e6c7nOxVQy4BQq9v-Z)

Gulîzer (Nexşê Mîrzo)  
Em Tenê Mane  
Rom Xayim e (Elîyo Bira)<sup>329</sup>

### **Welatê Me Kurdistan e**

Welatê me Kurdistan e  
Cî û meskenê me kurdan e  
Wetan me ra rih û can e  
Milet hemû bira ne

Cî û meskenê me kurdan e  
Temam bax e û bostan e  
Wetan gul e gulistan e  
Milet hemû bira ne

Welatê me pir şîrîn e  
Mêrg û çîman û zevî ne  
Qîz bûkê wê tev cindî ne  
Eslê xwe da horî ne

Kurdistana me zeynet e  
Cimaeta wê pir hurmet e  
Temam qedr e û qîmet e  
Welatê me cinet e

Welatê me Kurdistan e  
Cî û meskenê me kurdan e

---

<sup>329</sup>[https://www.youtube.com/results?search\\_query=aslika+qadir+qas%C4%B1mo+alb%C3%BCm%C3%BC](https://www.youtube.com/results?search_query=aslika+qadir+qas%C4%B1mo+alb%C3%BCm%C3%BC)

Wetan me ra rih û can e  
Milet hemû bira ne<sup>330</sup>

### **Welatê Me Gulistan e ( Şehrîvan)<sup>331</sup>**

Welatê me gulistan e  
Cî û meskenê me Kurdane  
Welat ji me re rih û cane  
Kurd hemû biran e

Cî û meskenê me Kurdan e  
Temam baxe û bistan e  
Wetan gulî gulistan e  
Kurd hemû biran e

Welatê me pîrr şîrîn e  
Merg û çîmen û zewî ne  
Qîz bûkun wê tev cevî ne  
Eslê xwe de Arî ne

Gulistana me zeynet e  
Civatê wê pîr hîrmet e  
Temam qeder û qîmet e  
Welatê me cennet e

### **Hevalno Werne Civatê**

Hevalno werine civatê  
Jê hildin merîfetê  
Şêrînê nolî şerbetê  
Hevalno werine civatê

Civata me şêrîn e

---

<sup>330</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=FnHBwGOTB1I>

<sup>331</sup> Di vê lînkê Youtubê da wek şîrove li ser metna stranê ya Aslîka Qadir û ya Şehrîvana Kurdî berawirdek berfireh hatiye kirin: [https://www.youtube.com/watch?v=maa8K\\_e\\_vDY](https://www.youtube.com/watch?v=maa8K_e_vDY)

Haha hana bibîne  
Ew boy eşqa wetîne  
Hevalno werne civatê

Civata me li jor e  
Bistêlî dor bi dor e  
Bûy eşqa ordûya sor e  
Hevalno werine civatê

Civata me mezin e  
Bi dev derve xwendin e  
Xwendin bûy mêr û jin e  
Hevalno werine civatê

Hevalno werine civatê  
Jê hildin merîfetê  
Şîrîne lo lo şerbetê  
Hevalno werine civatê<sup>332</sup>

### **Qasimo**

Qasimo ho o o ho o o, hey lo lo lawo  
Dilê dayika te hewar e wî gazî ye  
Dêran im lawo dilê dayika te hewar e vê gazîyê  
Cêrda Mala Şêko giran e bira xêrê wayê nevîne  
Şivêta gurê sibatê xwe dane ser çol û çiyaya  
Gulekê hê nava meydanê berî bedena Qasimê layê Meyro serekê siyara gula  
nêçîrvana dane  
Dêran im lawo me kuştine ser karê sexîrîyê  
Qasimo menal berxê mino menal  
Çavê reşbelek tek neke kendal  
Şevêk şevê payîza wez ê ber serê birîndarê mala bavê  
Dêranim lawo bûme cî û balgî berpâl

Qasimo ho o o ho o ho o

<sup>332</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=7GeLYDT9Efi>

Hey lo lo lawo bihara vî welatî çîqa zû tê  
Dêran im lawo bihara vî welatî çîqa zû tê  
Erdî kose ye erdî pasox e hey lo lo lawo binavî hûr tê  
Cêrda Mala Şêko bira xêrê wayê nevine  
Hey lo lawo şivêta gurê sibatê zo zo bûne  
Seranserî dêran im lawo gaziya wana dû tê  
Qasimo menal bexê mino menal  
Çavê reşbelek tek neke kendal  
Şevêk şevê payîza wez ê ber serê birîndarê mala bavê  
Dêran im lawo bûme cî û balgî berpâl

Qasimo ho o ho o ho o ho o  
Hey lo lo lawo dilê dayika te hewara vê berwarê  
Dêran im lawo dilê dayika te hewar e vê bêwarê  
Gerî bergelê Qasimê layê Meyro giran e  
Dêran im lo girtîyê devê çîya ye  
Gerî bergerê Qasimê layê Meyro serekê siyara gula nêçîrvan e  
Dêran im lawo girtîyê devê çîya ye  
De şevêk şevê payîza wez ê ber serê birîndarê mala bavê rûniştîme  
Dikim nakim dêran im lawo birîn e kûr e kew lê nayê  
Qasimo menal bexê mino menal  
Çavê reşbelek tek neke kendal  
Şevêk şevê payîza wez ê ber serê birîndarê mala bavê  
Dêran im lawo bûme cî û balgî berpâl<sup>333</sup>

#### 2.6.4. Belga Qado

Derbarê Belga Qado da agahî gelek kê m in. Di hemû çavkaniyan da li ser malbat û jîyana wê tenê bi çend hevokan behsa wê tê kirin û hin şaşî têda hene. Agahîyên herî rast Prîskê Mihoyî ji keça wê Nazika Miraz hîn bûye. Belga Qado di sala 1934an da li herêma Têlînê li gundê beroj (dûzkend) jidayik bûye. Malbata wê ji Qersê koçî Kafkasyayê kiriye. Bavê wê Qadoyê Mecîd, dêya wê Naza Beyro ye.

<sup>333</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=rR8E2Cruu6I&list=OLAK5uy\\_mBSrgZt\\_21xdn-cjz6KEzR2ID-dl6aSZs](https://www.youtube.com/watch?v=rR8E2Cruu6I&list=OLAK5uy_mBSrgZt_21xdn-cjz6KEzR2ID-dl6aSZs)

Navê wê yê rastîn Belgîzer e lê di Şadenameyê (nifûsê) da Porsor dinivîse. Mêrê wê Mirazê Nadir ji ‘eşîra Kaşaxa bû û 10 sal jê mezintir bû. Beriya ku wê nas bike zewicandî bû. Jina wî ji Tilbîsê bû û terka wî kiribû. Di sala 1950î da Belga Qado bi dergistî bûye. Mirazê Nadir roja daweta wê, wê direvîne. Ew di 1954an da koçî Erîvanê dikan. Çar qîz û pênc kurên wan çêdibin lê sê kur û keçek dimirin. Mirazê Nadir kesekî gelek bihêrs bûye û gelek zextan li jina xwe û zarokên xwe kirine. Kurekî wî bi navê Grîşa ji jina wî ya din hebûye.<sup>334</sup>

Belga Qado xwedîyê dengê xweş bû. Wê ji zaroktiya xwe da stranên digote. Ew bi stranên evînê ên klasîk û yên mêranî navdar bûye. Di arşîva Radyoya Erîvanê da ji dehan zêdetir stranên wê hene. Strana wê ya “Kura Çiyayê Topê Qersê” gelek navdar bûye. Wê gelek stranên duqolî bi dengbêjên weke Karabête Xaço û Efoyê Esed ra gotiye.<sup>335</sup> Hevjînê wê di sala 1980ê da mir. Piştî salên 1990î Belga Qado tevî malbata xwe ji ber şert û mercên civakî û aborî koçî Rûsyayê bajarê Yaroslavê kir. Belga Qado di sala 2004an da wefat kir. Wê li goristana Êzdîyan ya li bajarê Tûtayêve veşartin.<sup>336</sup>

Aslîka Qadir di bernameyek da behsa Belga Qado dike û zehmetiyên ku wê kişandine vedibêje. Wê ji ber hevjinê xwe pir tengasiyê kişandiye. Ew ji ber dizîya pez û dewaran ketibû girtîgehê. Birayê wê Têmûr di koma Sûsika Simo da bû. Sûsika Simo û birayê wê ji bo ku ew biçê di radyoyê da stranên bêje piştgirî didinê. Belga Qado hem ji tirsê mêrê xwe hem jî ji ber zextên gel newêre. Dibêje: “wê xel bêje mêrê wê girtî ye ew jî çûye radyoyê.” Sûsika Simo û birayê wê cesaretê didinê û wê qanî dikan. Belga Qado tê û li radyoyê çend stran qeyd dikan. Dema ku hevjinê wê dibihîze ku ew çûye radyoyê ji girtîgehê jê re nameyek dişîne û gefa kuştinê lê dike. Dibêje: “an tê terka radyoyê bikî an jî ez ê te bikujim.” Lê Belga Qado bi piştgirîya birayê xwe û Sûsika Simo dengbêjiya xwe domand û dev ji Radyoya Erîvanê berneda. Aslîka Qadir van agahiyan ji qîza Belga Qado bihîstiye.<sup>337</sup> Belga Qado konseran nedaye û tenê di radyoyê da stran gotine. Di radyoyê da təkiliya wê bi Sûsika Simo û Zadîna Şekir re baş bû. Belga Qado bi orkestraya radyoyê ya ermenîyan ra jî çend stran gotine.<sup>338</sup> Aslîka Qadir Belga Qado weha bibîr tîne:

<sup>334</sup> <https://www.bernamegeh.org/2021/09/09/dengbeja-nemir-belga-qado-piriske-mihoyi/>

<sup>335</sup> Yaş, h.b. (c2) r.329.

<sup>336</sup> <https://www.bernamegeh.org/2021/09/09/dengbeja-nemir-belga-qado-piriske-mihoyi/>

<sup>337</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=xCkm0-4\\_1vI](https://www.youtube.com/watch?v=xCkm0-4_1vI)

<sup>338</sup> Hevpeyvîna me ya bi Aslîka Qadir ra.

Mala Belga Qado li Rewanê cînarê mala bavê min bû. Ez 14 salî bûm, diçûme dibistanê û dihatim. Herdem min ew li berî didît. Min zanibû, ku stranên wê bi radyoyê didin. Lê tu cara ewê nedigot, ku me dengê wê bihistîye yanê na? Kulfeteke bedew û merîfet bû, cil û bergên wê kurmancî bûn, notila xanima radibû û rûdinişt. Gava ez dersê dihatim, ewê li ber derê avayî ez didame sekinandinê û ji min dipirsî: “Lela min, çavê min, te îro çi stendiye?”... carinan ez diçûma mala wê. kulfeteke gelekî pêşverû bû, dilê wê paqij bû. Ewê wê hênê li ber tiştên kevneşopî serê xwe danexist, mîna Sûsika Simo rabû û stra... tesîra dengê wê heyani niha jî li ser min heye.<sup>339</sup>

Ku em dengbêjîya jinan jî weke ya modern û ya klasîk têkin du beş divê em dengbêjîya Belga Qado jî weke ya Fatma Îsa bi halê dengbêjîyê yê resen qebûl bikin lewre wê jî xeynî ji stranên ku li Redyoya Erîvanê hatine qeydkirin xebatên muzîkê nekirine. Wê weke Aslıka Qadir û Zadîna Şekir kasetan dernexistine.

### **Stranên Belga Qado**

Gozê

Meyremê

Her Berî

Wey Lûr

Her Bêriyê

Gulşêna Min

Lê Xerîbê

Gede Lawik

Kew Hêlûn

Lîlanê

Te Çav Reş e

Kûra Çiyê (Kura Çiyayê Topê Qersê)

---

<sup>339</sup> <https://www.bernamegeh.org/2021/09/09/dengbeja-nemir-belga-qado-piriske-mihoyi/>

Stranên wê ên duqolî yên bi Karapêtê Xaço ra: Hindî Were Paytextê, Sarê Rabe Sibe Ye, Lê Bi Holê. Ya bi Efoyê Esed ra: Bêrîyê Te Ha Bêriye.<sup>340</sup>

Li jêr ji stranên Belga Qado sê mînak hene: “Kûra Çiya” ku strana wê ya herî navdar e weke straneke şînê ye. “Hey Bêrî” jî teswîra jîyana gund û zozanan dîke û bi rîtmeke giran hatiye gotin. “Te Çavreşê” jî straneke evînîyê ye û ji devê mêrekî ve tê gotin.

### **Kûra Çayê**

Erê Kûra Çayê wê Topê Qersê we  
Wey malîno Kûra Çayê wê Topê Qersê wê  
De bira Xwedê xirav bike dewata kurê Elê Besê wê eman şarê.

Wey malîno şara serê me girtine dane wey ber meqesê bi wê  
Ê eman şara way mi bavêjin eman şarê  
Lo gundîno win (hûn) deng nakin  
Wey malîno win (hûn) deng nakin  
Şara serê min mehrûma Xwedê birine bawer nakin wî eman şarê

Kûra Çayê wê ber zinara  
Wey malîno Kûra Çayê wê ber zinara  
Şara serê min mehrûma Xwedê ketiye destê wey van neyara wey eman şarê

Eman şara min bavêjin  
Wey malîno şara serê min bavêjin  
Ergî şara serê min navêjin ezê kerbê şarê wê ker û gêjim wê eman şarê

### **Her Bêrîyê**

Ser bêrîyê bûye mêj e  
Her bêrî bêrîvanê

---

<sup>340</sup> <https://www.youtube.com/c/DeutschKurdischesKulturinstitut/search?query=belga%20qado>

Şêrê wê sor bû mêrkuj e  
Her bêrî bêrîvanê

Berê wê bêrîyê hevraz e  
Her bêrî bêrîvanê

Mexelê pezî di maz e  
Her bêrî bêrîvanê

Berê wê bêrîyê berjêr e  
Her bêrî bêrîvanê

Mexelê pezî di nêr e  
Her bêrî bêrîvanê

Berê wê bêrîyê berwar e  
Her bêrî bêrîvanê

Mexelê pezî di jar e  
Her bêrî bêrîvanê

### **Te Çavreşê**

Ê lo te çavreşê wê wê lê kaniya kila

Ê lo sî sê gulî wî wî lo nava mila

Ê lo de wer were lo yar xezalê

Ê lo te çavreşê wê wê lo birûgirê

Sing û berê te wisane mîna mêrg çîmanê wê wê lo dor çadirê

Ê lo de wer were lo yar xezalê

Ê lo te çavreşê wê wê lo heba tirî

Kawa kubar te çavreşê wê wê lo heba tirî

Mîn ê heft sala nefsa canê xwe ra wa wa lo xweyî kirî

Ê lo de wer were we we yar xezalê

### 2.6.5. Zadîna Şekir

Zadîna Şekir di sala 1943an da li navçeya Axbaranê li gundê Poştê jidayik bûye. Malbata wê êzîdî û welatparêz bû. Ew ji eşîra rojkîyan in ku ji Dîgora navçeya Qersê koçî Ermenistanê kirine. Zadîna Şekir li Erîvanê çû dibistana navîn.

Zadîna Şekir di temenekî gelek piçûk da dest bi stranbêjîyê dike. Ew stranên xwe zêdetir ji yên şahî û dawetan hildibijêre û bi wan navdar dibe.<sup>341</sup> Wê di sala 1955an da di Radyoya Erîvanê da dest bi dengbêjîyê kir. Ew keça birayê Xelîlê Çanan e. Apê wê ji bavê wê destûr dixwaze ku di radyoyê da bistre. Zadîna Şekir yek ji jinên ewil e ku di radyoyê da dengbêjîyê kiriye. Strana wê ya navdar “Dêre Sorê Piçûkê” di belgefilmê Kurdên Ermenistanê da weke fon hatiye bikaranîn.<sup>342</sup>

Zadîna Şekir di warê hunerê da gelek çalak bû. Wê bi Egîdê Cimo ra di sala 1970î da orkestrayek damezirand. Ew bi vê orkestrayê konseran didin û beşdarê şahîyan dibin. Herweha Zadîna Şekir di komeke reqasê ya ermenî da jî cih digire. Wê bi Mecîdê Silêman û gelek hunermendên navdar re stranên duqolî gotine. Zadîna Şekir di radyoyê da bi Aslîka Qadir re di têkiliyê xurt da bûye. Ew bi hev ra beşdarê konseran dibûn. Egîdê Cimo û Eskerê Boyik li Qazaxistanê konser li dar dixin. Zadîna Şekir jî bi Aslîka Qadir ra beşdarê van konseran dibe. Dema ku konferansa kurdî ya neteweyî li Moskovayê tê lidarxistin Zadîna Şekir û Aslîka Qadir jî beşdarê şahîya wir dibin. Li vir tevî gelek navdar û siyasetmedarên kurd serokê Enstituya Kurdî Ya Parîsê Kendal Nezan jî nas dikin. Ev hevnasîn jê re rêyek nû vedike. Nezan wan vedixwîne Parîsê. Ew diçin Fransayê û li wir beşdarê şahîyan dibin.<sup>343</sup> Zadîna Şekir li wir plakek derdixe. Kendal Nezan ji bo wê dibêje “Bilbila Kurdistanê.” Enstituya Kurdî Ya Parîsê hem li ser plaka wê hem jî li ser afîşên konserên wê navê “Bilbila Kurdistanê” bikar tîne.

Zadîna Şekir li hemû erdnîgarîya kurdan navdar bûbû û dihate hezkirin. Çêkirina peykerê wê yê li Hewlerê<sup>344</sup> vê yekê nîşan dide. Zadîna Şekir di sala 1998an da bi Hemîdê Mecîd ra albumeke hevpar derxistîye. Di vê albumê da zêdetir stranên rîtmîk ên govendê hene.<sup>345</sup>

---

<sup>341</sup> Yaş, (c2) h.b. r. 293-294.

<sup>342</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>343</sup> Yaş, (c2) h.b. r. 293-294.

<sup>344</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>345</sup> <https://music.youtube.com/channel/UCLShxeZZ-vrLRVpt-IISyvQ>

Di malbata Zadîna Şekir da xeynî ji wê birayên wê jî bi hunerê re eleqedar dibûn. Birayê wê yê mezin Omerê Şekir, di koma Sûsika Simo ya folklorî da govendgerê sereke bû. Her weha birayê wê yê din Şaîsmaîl jî di piyesa Gîkor da rola sereke dilîste.

Zadîna Şekir jineke modern û gelek bedew bû. Ew li hember kevneşopiya êzdayetîyê derket û bi ermeniyek re zewicî. Hevjînê wê Kamo di xebatên wê ên hunerî da her tim piştgirî didayê. Malbata wê û xizmên wê vê zewacê qebûl nekirin. Wê ji ber vê yekê gelek zehmetîyan kişande. Li hember zehmetîyan ew pir ji hevjinê xwe hez dike. Keçek û kurek wan çêdibin. Li gor agahiyan zarokên wan di nav çanda ermenî û kurdî da diçin û tînan ji ber vê yekê tengasiyan dikşînin. Zadîna û hevjinê xwe ligel hemû pirsgerêkan heta dawîya jîyana xwe bi hev re dimînin. Zadîna Şekir di sala 2008an da li Erîvanê wefat dike û wê li wir dispêrin axê.<sup>346</sup>

Zadîna Şekir di Radyoya Erîvanê da herî zêde bi Mecîdê Silêman re stranên duqolî gotiye. Me li jêr ji stranên wê ên Radyoya Erîvanê û ji albuma wê ya bi Hemîdê Mecîd ra çend mînakên da û gotinên “Dêre Sorê Biçûkê” “Hoy Oy Zeynê” û “Derwêşê Evdî” jî weke mînak da.

### **Stranên wê:**

Al Do La Ona (bi erebî)

Çil Heyranê

Dêre Sorê Biçûkê

Derwêşê Evdî

Dînê

Emer Axa (Kerr û Kûlik)

Ha Gul Gulî

Hey Lê Dînê

Hey lê lê lê

Hoy Hoy Zeynê

Kewa Gozel

Lê Gidiyê

Malka Şemo

---

<sup>346</sup> Yaş, (c2) h.b. r. 293-294.

Narê Can  
Qencolê  
Tenzere  
Wêlî Ha Bi Wêlî  
Were Odê  
Yar Were Keçikê  
Zerîyê<sup>347</sup>

### **Dêre Sorê Biçûkê**

Dêre sorê biçûkê lê lê lê lê û lê lê  
Dêre sorê biçûkê dest bi hine neynûkê  
Par qîz bû îsal bûkê lêy lê lê lê û lê lê lê  
Par qîz bû îsal bûkê berxê sebra mala minê lê lê

Dêre sorê mezinê lê lê lê û lê lê lê  
Dêre sorê mezinê dest bi hine bazinê  
Par qîz bû îsal jinê lêy lê lê lê û lê lê lê  
Par qîz bû îsal jinê berxê sebra mala minê lê lê

Endî werê paytext e lê lê lê û lê lê lê  
Endî werê paytext e îznê bide bêm rex te  
Temam bû soz û bext e lê lê lê û lê lê lê  
Temam bû soz û bext e berxê sebra mala minê lê lê

Dêresorê biçûkê lê lê lê lê û lê lê  
Dêresorê biçûkê dest bi hine neynûkê  
Par qîz bû îsal bûkê leylê lê lê lê û lê lê lê  
Par qîz bû îsal bûkê berxê sebra mala minê lê lê

---

<sup>347</sup><https://www.youtube.com/c/DeutschKurdischesKulturinstitut/search?query=zadina%20%C5%9Fekir>

### **Hoy Oy Zeynê**

Hevika penîrê spî me hoy oy oy Zeynê Zeynê

Hevika penêrê spî me kulîlka Evdil Eynê

Hemayla dor cindî me hoy oy oy Zeynê Zeynê

Hemayla dor cindî me kulîlka Evdil Eynê

Xwestiya lawikê rûspî me hoy oy oy Zeynê Zeynê

Xwestiya lawikê rûspî me kulîlka Evdil Eynê

Hevika penîrê sor im hoy oy oy Zeynê Zeynê

Hevika penîrê sor im kulîlka Evdil Eynê

Hemayla dor bi mor im hoy oy oy Zeynê Zeynê

Hemayla dor bi mor im kulîlka Evdil Eynê

### **Derwêşê Evdî**

Delal way delal delal ay delal delalo

Delalo tiliko biçûko

Ma mi digo berdilê xelqê ne tiyo ne tişteko

Berdilê mi evdala Xwedê hinarek hinarê Şoreşîne vê Urfayê bêdendiko

Oy nemînim oy nemînim nemînim delalo

De wey delal, xwezila dilê mi bixwesta

Way delal xwezila dilê mi bixwesta

Derwêşê Evdî delalê malê

Xwezila tasa ava sar mi bixwesta

Mîn ê destê rastê bida têt da

Destê çepê jê ra têtira kemberbesta

Oy nemînim oy nemînim nemînim delalo<sup>348</sup>

### **2.6.6. Dîlbera Wekîl**

Dîlbera Wekîl di 14ê cotmeha 1957an da li Ermenistanê hatiye dinê. Gundê wan Deva Xerabe li herêma Abovyanê ye. Hemû gund kurdên misilman bûn û welatparêz bûn. Malbata wê ji Wanê koçî wir kiribûn. Di sala 1968an da gundê wan

---

<sup>348</sup><https://www.youtube.com/c/DeutschKurdischesKulturinstitut/search?query=zad%C3%A9na%20%C5%9Fekir%20>

xera dikin û ew koçî gundê Cirabîrê dikin. Dîlbera Wekîl di sala 1973an da bi kurê xaltiya xwe Hesênê Îsrafil re zewicîye. Sê keç û kurek wan hene. Navê keçên wê Guhar, Têlî û Tamîla ne.<sup>349</sup>

Bavê Dîlbera Wekîl zarokên xwe bi azadî mezin kir û her tim piştgirî da wan. Li gundê wan çanda dengêjîyê gelek xwurt bû. Di malbata wê da gelek dengbêj hene. Wê weke dengbêj herî zêde ji xalê xwe yê ku di temenê ciwan da mir û ji Hozan Şemdîn bandorê girte. Xalê wê Tîmûrê Fetê dengbêjekî mezin bû. Dilberê bi guhdarkirina wî ji stranan hez dike û meyla wê li ser dengbêjîyê çêdibe. Herweha pîra wê Çîla Hûto jî dengbêj bû. Dîlbera Wekîl gelek stranan ji pîra xwe û xalê xwe hîn bû.

Dîlbera Wekîl di warê hunerî da ji malbata xwe û derdora xwe rasti tu astengiyek nehatiye. Ew ji kêma jinan yek e ku bi azadî hunera xwe meşandîye. Dîlbera Wekîl di 14 saliya xwe da li Radyoya Erîvanê dest bi dengbêjî/stranbêjîyê kir. Wê bi kurê xaltiya xwe Memê Îrafil, xwişka xwe Temam û kurê xalê xwe Tîmur re di radyoyê da stranan gotine. Memê Îrafil jî dengbêjek bi nav û deng bû û di radyoyê da distira. Dilbera Wekîl bi xwe jî stranan tevî gotin û awaz afirandine. Ew tevî pîsanên xwe û xwişka xwe weke komek bi hev re karê hunerê dimeşandin.

Sazbendê navdar Xelîlê Evdile jî ji gundê Dîlbera Wekîl bû. Wî di sala 1977an da “Koma Kurdistan” saz kiribû û serwertîya komê dikir. Dîlbera Wekîl bi xwişk û birayên xwe û pîsanên xwe re di vê komê da cih girtin. Ev komeke fermî ya muzîk û folklorê bû. Endamên komê ji hevjinê wê Hesênê Îrafil, birayê wê Kinyasê Wekîl, Mecîdê Xulamî, pîsamê wê Hemîdê Kinyas, Teyforê Mecîd, Ehmedê Îsrafil, xwişkên wê Semam (Şemam) û Temam, keçên xalê wê Felek, Xanim û Gulistana Mecîd pêk dihat.

Koma wan di demek kurt da gelek navdar bû û gelek serkeftinan bidest xistin. Bavê wê Wekîl komê fêrî dîlan û folklorê dikir. Ev cara yekem bû ku kurdan li herêma Abovyanê komek bi vî rengî damezirandibû. Koma Kurdistanê beşdarê festîvala Abovyanê bûn. Ew di wê festîvalê da yekane koma kurdan bûn û di encama festîvalê da bûn yekemîn. Koma wan di sala 1978an da bi vexwendina Prof. Qanatê Kurdo ji bo pîrozkirina Newrozê çûn Lenîngardê (Saint-Petersbourg). Komê

---

<sup>349</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=AOqFAaMEXa0>

bêhejmar stranan di radyoyê da tomar kir. Herweha ew beşdarê gelek şahî, konser û festivalan bûn.

Koma Kurdistan di destpêka salên 1980î da belav bû. Hin endamên komê zewicîn û dev ji dengbêjîyê berdan. Hinek derketin derveyê Ermenistanê, hinekan jî wefat kirin. Piştî belavbûna komê Dîlbera Wekîl çend salan ji hunerê dûr ket. Dema ku xweste car din dest bi karê hunerê bike ew kesên serdema berê pirî ji wan nemabûn. Di sala 1993an da Hozan Şemdîn diçe Ermenistanê û ji bo komeke nû alîkarî dîke. Dîlbera Wekîl vê komê jî bi endamên malbata xwe re ava kir. Dîsa ew û hevjinê xwe, du keçên xwe, zarokên xalê wê û hin keçên din hatin cem hev. Navê koma nû jî “Rewşen” bû. Ev kom jî hem komeke folklorîk hem jî komeke dengbêjîyê bû. Ferqa Koma Rewşen ew bû ku êdî di şûna kilamên klasîk da zêdetir stranên neteweyî digotin û di şahî û rojên neteweyî da derdiketin ser dikê. Piştî hilweşîna Sovyetê hejmara kurdan li herêmê gelek kêr bû û êdî gelek kêr kesan karê dengbêjîyê dikir. Koma Rewşen jî piştî pênc salan ji ber koçberî, zewaca hin endaman û rewşa aborî belav bû.

Dîlbera Wekîl di bêimkanîyê da be jî dev ji karê hunerê bernedida lê êdî derfeta avakirina komeke nû nemabû. Dîlbera Wekîl bi tenê be jî karê muzîkê didomand û ji keça xwe Tamîla û dotmama xwe Gûzel alîkarîyê distend. Keça wê Tamîle jî bi muzîkê re mijûl dibe û ligel strangotnê li amûrên muzîkê jî dixê. Ew pêre beşdarî pîrozbahîyan û şahîyên neteweyî dibûn lê bi sê kesan ev kar nedimeşîya. Wê di sala 2000î bi alîkarîya Mala Kurdan dîsa komeke bi navê Berçem ava kir. Vê carê mebesta wê perwerdekirina ciwanan bû. Bi taybetî keçên ciwan beşdarê vê komê bûn. Nêzîkî 12 keçên ji derdora Abovyanê di vir da cih girtin. Wan hem stranan digot hem jî lîstikên folklorî dilistin. Piştî avakirina vê komê Dîlbera wekîl zêdetir bi perwerdekirina wan re mijûl bû û kêr daran derdiket sehnê.

Dîlbera Wekîl berî van koman jî di radyoyê da stran digotin. Stranên wê yê duqolî jî gelek in. Kilamên wê û komê ên herî navdar ev in: Nînim Nînim, Axa Hatîn, Eysanê. Ev kilamên kevin ên folklorîk in û ên wê yê ewil in. Piştî Holê, Fatimê, Her Çemo, Xecê, Bêrîvan, Têriya Mamo, Sûnê, Kezîzerê, Xesîyê û gelekên din hatin. Dîlbera Wekîl derfet nedîtiye ku stranên xwe di kasetekî da biweşîne lê niha hemû di arşîva Radyoya Erîvanê da parastî ne.<sup>350</sup>

---

<sup>350</sup> Can, h.b. r. 187-197.

Di nav stranên Dîlbera Wekîl da herî zêde strana “Xesîyê” balê kişande ser xwe. Dîlbera Wekîl vê stranê bi xwe nivîsiye.<sup>351</sup> Ev stran behsa têkiliya xesî û bûkekê dike. “dema ku ev stran derket gelek kêfa bûkan bi taybetî jî yên ji xesiya xwe bêzar in dihat. Di alîyê din de hemû xesî jî ji vê stranê bêzar dibûn.” Dema ku ew cara ewil çû radyoyê û vê stranê tomar kir rejîsorê ermenî jê pirsî got mijara vê strana te çi ye. Dîlbera Wekîl dibêje li ser xesîyên xerab e û gotinên stranê jê re tercume dike. Rejîsor dibê: “Xwedê te neke destê xesiyeke xerab. Ji xwe ku ji niha da weha bî tu di heyata xwe da mêr nakî û tê di mala bavê xwe da bimînî.”<sup>352</sup>

Dîlbera Wekîl piştî salên 1990î gelek helbestan li ser neteweperwerîyê nivîsiye û hinekan ji wan jî kiriye stran. Ew di warê ziman da gelek hesas e û tîne ziman ku eger bi kurdî xwendibaya dê zêdetir helbestan binivsand. Ji ber ku wê di dibistanê da bi ermenkî xwendiyê xwe di warê kurdî da şareza nabîne.<sup>353</sup>

Li gor wê huner divê gel hişyar bike. Wê hestên xwe yên neteweyî û kesera koçberîyê bi dengbêjîyê daye der. Dîlbera Wekîl welatparêzîyê weke peywira hunermendan dibîne. Ew jineke gelek çalak e. Wê herî dawî komîteyek bi navê Komîteya Dayikên Aştîyê ava kir. Di vir da ji 25an zêdetir kes ji bo hişyarkirina civakê kar û barên xwe didomînin. Ew ji keçên ciwan ên koma Berçem gelek bi hêvî ye lê belkî jî ji ber ku êdî li Ermenistanê hejmara kurdan gelek kêmbûye hêviya wê nemaye. Ew ji bo vê rewşê jî weha dibêje: “Di nav şert û mercên Ermenistanê da ew nikarin pir tiştek bikin, ew dê ancax li welat dikaribin pêşda bikevin.”

Dîlbera Wekîl niha bi malbata xwe re li Abovyanê dijî. Ew hêviya rojên azad ji bo kurdan dike û dixwaze bi azadî karibe biçê welat. Ev gotina wê kedera wê ya koçberîyê nîşan dide: “Em di surguntiyeke bêdawî de dijîn.” Dîlbera Wekîl niha hem perwerdeya koma Berçem dide hem jî di Komîteya Dayikên Aştîyê da û di Komeleya Kurdistanê ya li Erîvanê da cih digire. Ew ji ber tendursitiya xwe weke berê stranên nabêje.<sup>354</sup>

## **Stranên Dîlbera Wekîl**

Nînim Nînim

Axa Hatî

---

<sup>351</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=AOqFAaMEXa0>

<sup>352</sup> Can, h.b. r. 187-197.

<sup>353</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=AOqFAaMEXa0>

<sup>354</sup> Can, h.b. r. 187-197.

Eyşanê  
Holê  
Fatimê  
Her Çemo  
Xecê  
Bêrîvan  
Têriya Mamo  
Sûnê  
Kezîzerê  
Xesîyê

### **Xesî**

Wî cimaetno bextê we me  
Rê bidine min ez gune me  
Eva serê sê salan e  
Destê xesiya xerab da me

Wî cimaetno serwext dikim  
Serwext nabe  
Bê serwextî gura har e  
Eva serê sê salan e  
Destê xesiya xerab da me

Wî cimaetno çiyayê hanê  
Hûn binêrin mij dûman e  
Çiyayê hanê mij dûman e  
Xesiya mine bê îman e

Wî cimaetno bextê we me  
Rê bidine min ez derbas bim  
Rê bidine min ez derbas bim  
Destê xwesiya xwe xelas bim<sup>355</sup>

---

<sup>355</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=ep9Y4EBCBmw>

### 2.6.7. Xana Zazê

Xana Zazê di sala 1955 an jî 1956an da jidayik bûye<sup>356</sup> Ew li Gurcistanê mezin bû. Xana Zazê şêxeke êzîdiyan e. Ew li Belçîkayê li bajarê Liège (Liyej) dimîne.<sup>357</sup> Xelîl Mûradov di sala 1972an da dema ku diçe Gurcistanê stranên wê jî bi yên Şeroyê Biro, Cemîla Çawiş û Tukasa Xemo re tomar dike. Wê çaxê Xana Zazê 16-17 salî bû. Malbata Xana Zazê şêx bû. Dengbêjê navdar Şeroyê Biro jî mirîdê wan bû. Xana Zazê li Gurcistanê di xebatên hunerî û çandî da gelek çalak bû. Ew bi pêşniyara Keremê Anqosî dibe serokê komeleya ku wî ava kiribû. Tukasa Xemo jî li vir dixebitî. Hunermendên weke Sûsika Simo û Şeroyê Biro di muzîka wê da bandorê lê kirine. Xana Zazê hem stranên govendê hem jî kilamên klasik ên gelerî gotiye û piştî çûye Ewropayê jî xebatên xwe ên muzîkê domandiye.<sup>358</sup> Stranên Xana Zazê ên ku di arşîva Radyoya Erîvanê da ne ev in: Çaçanê, Şerê, Lê Lê Weso, Lê Lê Xezalê, Dayikê, Leyla, Dibêjin Gul bedew e, Kezîzer, Hob Leylê.<sup>359</sup>

#### Dibêjin Gul Bedew in

Dibêjin gul bedew in

Te gula ra nakim heval

Ba lê dixê deng tê xwarê

Te gula ra nakim heval

Ba lê dixê deng tê xwarê

Te ji gula ra nakim heval

Behra belek zef bedew e

Lê cew û çem jê dikişin

Wez dixwazim li çevê tê

Tu canê zirnê nebarin

Wez dixwazim li çevê te

Tu canê zirnê nebarim

<sup>356</sup> Di çavkaniyan da di derbarê jidayikbûna wê da agahî tunene lê di bernameyek da ew bi xwe dibêje di sala 1972an da dema ku Xelîl Mûradov hatibû Gurcistanê û cara yekem denge min qeyd kir ez 16 an jî 17 salî bûm. Li gor vê agahiyê diroka jidayikbûna wê 1955 an jî 1956 e.

<sup>357</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>358</sup> [https://www.youtube.com/watch?v=3\\_VA0Lr9ipc](https://www.youtube.com/watch?v=3_VA0Lr9ipc)

<sup>359</sup> <https://www.youtube.com/c/DeutschKurdischesKulturinstitut/search?query=xana%20zaz%C3%AA>

### 2.6.8. Kubara Xido

Derbarê Kubara Xido da agahî gelek kê m in. Li gor çavkanîyan ew di sala 1935an da li Elegezê jidayik bûye. Wê dibistana seretayî li Elegezê xwediye. Piştî li Enstîtuya Pedagojîyê beşa Ziman û Wêjaye Ermenkî xwediye.<sup>360</sup> Kubara Xido xwişka akademîsyenê navdar Şekirê Xudo ye. Ew mamosteya zimanê kurdî bû. Wê li dibistaneke Elegezê dursa kurdî dida. Kubara Xido li Elegezê mezin bû û li wê derê jî çû ser dilovaniya xwe.<sup>361</sup> Stranên wê ên di arşiva Radyoya Erîvanê da ev in: Lawiko Mîrzo, Lo Dîno, Hesûkê, Qemerê, Îro Roja Rihetê, Lê Bi Holê, Ha Berde, Ha Bi Dar e, Lê Bi Xanê, Hayko Can, Gazî Dikim Bi desmalê, Kew Hêlûn, Gulê Ha Gulê, Delalê, Mimir, Xanimê Lûrke, Yar Govendê, Gulê Ha Nabe, Çavbelek.<sup>362</sup>

#### **Mimir**

Hespê Mimir sor e hay Mimir hay Mimir

Hespê Mimir sor e kur xalo xulamo

Meydanê dor bi dor e hay Mimir hay Mimir

Meydanê dor bi dor e kur xalo xulamo

Hespê Mimir şîn e hay Mimir hay Mimir

Hespê Mimir şîn e kur xalo xulamo

Meydanê dive tîne hay Mimir hay Mimir

Meydanê dive tîne pismamo xulamo

Hespê Mimir reş e hay Mimir hay Mimir

Hespê Mimir reş e kur xalo xulamo

---

<sup>360</sup> Yıldırım, h.b. (c2) r. 142.

<sup>361</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmurê Xelîl ra.

<sup>362</sup> <https://www.youtube.com/c/DeutschKurdischesKulturinstitut/search?query=kubara%20xido>

Meydanê hûr dimeşe hay Mamir hay Mamir  
Meydanê hûr dimeşe kur xalo xulamo

Hespê Mamir boz e hay Mamir hay Mamir  
Meydanê radîke dîke toz e pismamo xulamo

### 2.6.9. Cemîla Çawiş

Cemîla Çawiş ji kurdên Gurcistanê ye. Ew li bajarê Tilbîsê dima. Wê zanîngêhê xwendîye. Di Radyoya Erîvanê da gelek kilamên wê hatine qeydkirin. Cemîla Çawiş, piraniya kilamên xwe bi Efoyê Esed re gotine. Dema ku Xelîl Mûradov ji bo qeydkirina stranên Şeroyê Biro diçe Gurcistanê Cemîla Çawiş, Xana Zazê û Tûkasa Xemo jî nas dîke. Ew ji bo qeydkirina dengê wan studyoyek kirê dîke û stranên wan ji bo Radyoya Erîvanê tomar dîke.<sup>363</sup> Piraniya stranên Cemîla Çawiş bi Efoyê Esed re duqolî ne. Stranên wê ên qeydkirî ev in: Eyšanê, Ha Gula Zer, Bejnê, Dolabê, Zozan Ber Zozan, Bêrîyê Tê, Lo Li Mîn, Ha Mîn Dî Li Bana, Wêlî Ha, Li Ba Dînê, Lê Lê Dînê, Leylo.<sup>364</sup> Me li jêr mîna keke ji stranên wê da. Ev stran ji devê mêrek tê gotin û derdê evîne vedibêje.

#### Eyšanê

Eyšanê dilê mi dîwarê kole we vê komir e  
Bejn û bala Eyšana min şîn dîke mîna stûna wî nav çadirê  
Bejn û bala delaliya min şîn dîke mîna stûna wî nav çadirê  
Qeweta min nagîje qelenê Eyšana min zixe bidne zar û malê dinyê  
Ez ê Eyšana xwe birevînim gundo  
Çar malê pismamê bidime gere wê axirê  
De yar wer were wî Eyšanê  
Serê min gorî siheta mi qurbanê  
Ez ê bejn û bala Eyšanê dinêrim bilind e we mînanî kela  
Eyšana min dimeşe we nav hevala

<sup>363</sup> Hevpeyvîna me ya bi Têmûrê Xelîl ra.

<sup>364</sup> <https://www.youtube.com/c/DeutschKurdischesKulturinstitut/search?query=cem%C3%AEla%20%C3%A7awi%C5%9F>

Wî Eyşana min dimeşe taxa jêrê wî nav hevala  
Wez ê çavê pêşî minê go mala bavê lê şewitiye  
Par vî çaxî soz û qirara mi tev ra hebû  
Wele salê îsal dilê mi ra bireve  
Va dergûşa save serê we bûye bela  
De yar wer were wî lê Eyşanê  
Derdê min xemirê nav nîşan e



## ENCAM

Me di mînaka Radyoya Erîvanê da dît ku jin di warê muzîk û dengbêjîyê da gelekî çalak in. Wan ji bo ku hunera dengbêjîyê îcra bikin tekoşîneke mezin dane û biser ketine. Jinên weke Sûsika Simo, Fatma Îsa, Aslîka Qadir, Zadîna Şekir, Belga Qado û gelekên din di nav çandeke kurdewar da mezin bûne û hunera xwe li ser vê hîmê ava kirine. Xaleke hevpar ya van kesan jî ew e ku hemû jî xwedîyê hesteke kurdperwer ya xurt bûne. Wan ji bo hunera xwe bi civaka kurd re tekoşîn kirine lê ji bo mafê kurdan jî her tim bi hesteke neteweperwer tevgerîyane. Sûsika Simo her tim bi cil û bergên kurdî derketîye sehnê, Fatma Îsa bi stranên xwe û hemû jîyana dengbêjîya kurdî ya herî resen temsîl kiriye. Aslîka Qadir bi stranên xwê û hemû tevgerên xwe helwesta xwe ya neteweperwer nîşan daye. Dîlbera Wekîl ji bo ku çand û muzîka kurdî wenda nebe ciwanên kurd perwerde dike.

Jinan dengbêjîyê hem îcra kirine hem jî berhemên dengbêjîyê afrirandine. Ji ber ku jinan di dîwanan da cih negirtine îcrakirina dengbêjîyê weke karekî mêranî hatiye qebûlkirin lê di nav gel da gelek jin jî vî karî kirine. Jinan ne di dîwanan da be jî di şîn û şahîyan da berheman afirandine û li kelepura dengbêjîyê zêde kirine.

Di sedsala 20an da du faktor hebûne ku di dengbêjîyê da guherînên mezin pêk anîne. Yek jê hilweşîna pergala patronajê ye, ya din jî derketina amûrên qeydkirinê yên weke plak û radyoyê ne. Bi van du faktorên muzîka kurdî û dengbêjî ketîye qonaxeke nû. Di vê qonaxa nû da êdî jin zêdetir derdiketin pêş. Dengbêjên weke Eyşe Şan, Meyrem Xan, Nesrîn Şêrwan, Îran Xan, Aslîka Qadir, Fatma Îsa, Belga Qado di radyoyan da ji xwe re cih dîtin.

Di serdema nû da jin ji ber dengbêjî û stranbêjîyê rastî gelek zextan hatin. Ev zext ji du alîyan ve dihatin meşandin. Yek jê zextên civakî bûn ku gel bi çavekî nebaş li çûndina wan a radyoyê dinihêrt. Ya din zextên malbatî bûn. Gelek jin dema ku biçûna radyoyê ji alîyê mêrek ji malbata xwe ve dihate astengkirin. Li hember vê yekê hin kes jî bi piştgirîya mêrek ji malbata xwe dikaribû vî karî bimeşanda. Di vir da Belga Qado û Aslîka Qadir mînakên herî berbiçav in. Aslîka Qadir ji bavê xwe piştgirîyeke mezin girtîye û bi hêsanî dengbêjîyê kiriye lê piştî ku zewicîye mêrê wê û tîye wê jê re bûne asteng. Ew ji ber van zextan 20 salan ji hunerê dûr ketîye. Mînakeke din jî Belga Qado ye. Ligel ku mêrê wê bûye asteng birayê wê jî piştgirî

dayê û Belga Qado bi piştgiriya birayê xwe dengbêjîyê kiriye. Di vir da tişteki berbiçav heye ku berîya radyoyan jinan ji bo dengbêjîyê astengî nedidîtin lewre wan tenê di nav civakên biçûk da digotin û ev nedibû pirsgirêk.

Jin di serdemên din da li derveyê dîwanê diman. Ku bistrana jî li pişt perdeyekê digotin lê bi radyo û plakan dengê wan ji pişt perdeyê derket û gihîşte girseyên mezin. Yanî belavbûna radyoyan derfetek da jinan lê di civakeke feodal da ev yek nedihate pejirandin. Ji ber vê yekê jinan tekoşîneke mezin da. Wan bi vê tekoşînê ne tenê di hunerê da di warên din da jî mafan wergirtin û ji civakê re bûn mînak.



## ÇAVKANÎ

AĞCAKULU Alî, “**Ortadoğu’da Kürtçe Radyo Yayınları: Erivan Radyosu Örneği (1955-1990)**”, (Teza neçapkirî, Zanîngeha Marmarayê, Enstituya lêkolînên Rojhilata Navîn), 2012.

AKBOĞA, Hasan, **Kürt Tarihi**, “Yasak Bir Dilin Çılgılığı Veya Kürt Aydınlanmasının Kalesi: Radyoya Rewanê”, (4), 18.

AKTAŞ, Ahmet, “Toplumsal Hafızanın Aktarıcısı Olarak Dengbêjler”, **Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler**, Şirnex, Zanîngeha Şirnexê, (19.04.2019) r. 73-85.

AKYOL, Hilmi, **Dengbêj û Çîrokbêjên Amedê** (Cilt 1). Do. Stenbol, 2014.

ALAKOM, Rohat, **Folklor û Jinên Kurd**, Nefel, Stockholm, 2002.

ARAS, Ahmet, **Evdalê Zeynike**, Nûbihar, Stenbol, 2018.

ARAS, Ahmet, **Evdalê Zeynikê - Şairê Kurdan Yê Efsanewî**, Nûbihar, Stenbol, 2018.

ASLAN, Mustafa, “Taybetmendîyên Hunera Dengbêjîya Kurdî” **Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler**, Şirnex, Zanîngeha Şirnexê, (19.04.2019) r. 329-349.

AVA, Mihemed, **Dengbêj, Çîrokên Kilaman, Radyoya Erîvanê**, Ar, Stenbol, 2016.

BALIKÇI, Şakire, “Kadın Dengbêj ve Âşıkların Eserlerine Mukayeseli Bir Yaklaşım”, **Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler**, Şirnex, Zanîngeha Şirnexê, (19.04.2019) r. 955-970.

BAZİDÎ, Mela Mehmûd. **Adat û Rusumatnameyê Ekradiye**, Lîs, Amed, 2010.

BEDÎRXAN Celadet Alî, **Hawar** “Rîya Teze”, (8), 108.

BEĞİK, Mahmut, “**Dengbêj Resoyê Gopala**” Zanîngeha Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013.

BOYİK, Eskerê **Çanda Kurdên Sovêtê**, Deng, Stenbol, 2012.

BOYİK, Eskerê, **Nûra Elegezê**, Herausgeber, Oldenburg, Almanya. 2004.

CAN, Polat, **Qulungên Rewanê**, Sîtav, Wan, 2021.

CELİL, Celilê, Ordîxanê, **Zargotina Kurda** (êpîk,dastan), c.3, Înstîtûta Kurdzanîyê, Wien, 2016.

ÇAĞLAYAN, Erhan, **Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi**

“Rusya’da Kürdolojinin Gelişim”, (13), 324-325.

ÇİFTÇİ, Tekin, “Di Çarçoveya Çanda Devkî De Di Nav Civaka Kurdan De Dengbêj û Saziya Dengbêjîyê” **Kurdish Studies** (1), 110-125, 2015.

ÇİFTÇİ, Tekin, **e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi** “Motîfa Şertdanîne Di Kilamên Dengêjan De”, (23), 383-394.

ÇİFTÇİ, Tekin, **Kilam û Jin**. Nûbihar, Stenbol, 2017.

DEĞİRMİ, Reşîde “**Hêmanên Folklorîk Di Romana Hewarî Ya Heciyê Cindî De**”, (Teza Neçapkirî, Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstituya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê), 2019.

DİLDAR, Receb, **Bîr**, “Tosinê Reşîd: Li Welatekî Azad Rûmeta Meriv Heye” (2), 101.

ELÇİ D. Özcan, Gazal Cengiz, “Literatürde Kadın Dengbêjlerin Yeri ve Tartışılma Biçimleri” **Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler**, Şirnex, Zanîngeha Şirnexê, (19.04.2019) r. 971-984.

ELEND, Kamran **Kimliği Terennüm Etmek, Erivan Radyosu Kürtçe Yayını**, İletişim, Stenbol, 2021.

ERGÜN, Zülküf, **e-Şarkiyat** “Ducemseriya Reazlîzma Sosyalîst Di Romanên Erebe Şemo û Heciyê Cindî de”, (2), 644-664.

- ERGÜN, Zülküf, **e-Şarkiyat** “Fonksiyonên Hevbeş û Zincîreya Rûdanê Di Vegêrana Edebiyata Kurdî Ya Sovyetê De”, (3), 805-818.
- ERGÜN, Zülküf, **Mukaddime** “Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê”, (9), 133-150.
- EŞO, Wezîrê, **Kilam û Pênus, Kurdên Kafkasyaya Başûr**, Lîs, Amed, 2018.
- GEMÎ, Ahmet, “Di Nava Ekolên Dengbêjîyê da Cîyê Huseynê Farê” **Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler**, Şirnex, Zanîngeha Şirnexê, (19.04.2019) r. 889-905.
- GOYAN, Seyda, “Dengbêj û Dengbêjî”, **Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler**, Şirnex, Zanîngeha Şirnexê, (19.04.2019) r. 295-305.
- GÜLTEKİN, Nihad, **Nûbihar** “Rojhilatzan, Hunermend Aslîka Qadir: Asûrîyan Jî Ermenîyan Jî Şayî û Şînên Xwe Bi Stranên Kurdî Kirine”, (141), 166-173.
- GÜLTEKİN, Nihad, **Nûbihar**, “Eskerê Boyik: Bavê Min Temî dida: Lawo bi vê nivîsa kurmancî nagihîjî tu tiştî” (142) 26-34.
- GÜNEY, Cihat, Kemal EROL, “Di Zargotina Kurdan De Erka Saziya Dengbêjîyê: Kürt Halk Edebiyatında Dengbêjlik Kurumunun İşlevi”, **Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler**, Şirnex, Zanîngeha Şirnexê, (19.04.2019) r. 121-139.
- GÜRÜR, Zeki, “**Dengbêjî Di Peywenda Patronajê De**” Teza Neçapkiri, Zanîngeha Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2014.
- HÊJA, **Zarema**, “Mîkro-Têkoşîn û Mîkro-Şoreşa dengbêja jin,” (4), 39-49.
- ÎNANÇ, Zerî, **Di Radyoya Erîvanê De Dengê Kurdî**, İBV, Stenbol, 2016.
- KARDAŞ, Canser, “Aşıklık ve Dengbêjlik Geleneklerinde Mahlas Kullanımlarının Karşılaştırılması”, **3. Uluslararası Ahlat -Avrasya Bilim, Kültür ve Sanat Sempozyumu Bildirileri**, Exlat- Bedlîs, (22.09.2014), r. 336-339.

- KARDAŞ, Canser, “Denbêjlikte Tür ve Şekil Tasnifleri Üzerine Bir Değerlendirme”, **Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler**, Şirnex, Zanîngeha Şirnexê, (19.04.2019) r. 39-51.
- KARDAŞ, Canser, **Yaşam Bilimleri Dergisi**, “Tarihsel Olayların Dengbêjler Aracılığıyla Sözlü Kültüre Aktarılması”, 1(1), 199-206.
- KARDAŞ, Canser. **Aşığın Sazı Dengbêjîn Sesi**, Eğiten Kitap, Enqere, 2017.
- KELEŞ, Bahattin, “Dengbêjliğin Tarihi Süreç İçerisinde Ortaya Çıkışı ve Değişimi” **Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler**, Şirnex, Zanîngeha Şirnexê, (19.04.2019) r. 383-395.
- KONAK, İsmet, **Kürt Tarihi**, “Sovyet Kürtlerinin 1937-1938 Sürgünü” (4), 22-23.
- MOJAB, Şahrazad (Ed.), **Devletsiz Ulusun Kadınları**, (Wer. Kılıç, S. Ekin Uşaklı, Fahriye Adsay,) Avesta, Stenbol, 2013.
- OMERXALÎ, Xanna **wêje û rexne**, “Li dewletên Sovyeta Berê Kurd Bi Perspektîfa Dîrokî û Çandî”, (9/10), 23-35.
- ONG, Walter, **Sözlü ve Yazılı Kültür**, Metis, Stenbol, 2013.
- ORHAN, Ömer “**Temayên Bingehîn Ên Poetîkaya Şikoyê Hesên**”, (Teza Neçapkirî, Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstituya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê), 2020.
- ÖZDEMİR, Burcu, Ayna ASKEROĞLU ARSLAN, **İnsan&İnsan** “Rusya’nın Kürdoloji Çalışmaları (1787-1947)”, ( 17), 204.
- ÖZTÜRK, Mustafa, **Mulemma**, “Weşangeriya Radyoyên Kurdî, Radyoya Êrîwanê û Dengbêjî”, (3), 40-44.
- ÖZTÜRK, Selda, “**Kadın Kimliği Bağlamında Kültürel Bellek Ve Van Merkezdeki Kadın Dengbêjliği Yansımaları**”, (Teza Neçapkiri, Zanîngeha İstanbul Teknikê, Enstituya Zanistên Civakî), Stenbol, 2012.
- PARILTI, Abidin, **Debgêjler- Sözüün Yazgısı**. İthaki, Stenbol, 2006.

REŞÎD, Tosinê, **Bîrnebûn**, “Kurdên Yekîtîya Sovyetê: Berê û Niha”, (42), 12-31.

REŞÎD, Tosinê, **Em Bi Zimanê Xwe Kurd In**, Do, Stenbol, 2011.

RÎZVANOVA, Milyausha, “**Sovyet Sonrası Orta Asya’da Kadın: İmaj ve Gerçeklik**”, (Teza Neçapkirî, Zanîngeha Stenbolê, Enstituya Zanistên Civakî), 2012.

SAGŊIÇ, F. Huseyin, **Dîroka Wêjeya Kurdî**, Enstituya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2014.

SCHAFERS, Marlene, SİBEL YÜCEL, Ergun, **Ez Gazin im**, Aram, Amed, 2021.

SHİRİNOV, Nofal, “**folkloru kurdên Azerbaycanê**”, (Teza Neçapkirî, Zanîngeha Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê), Mêrdîn, 2017.

SUVAĞCI, İlyas, **Anemon** “Zayenda Civakî di Lorîyên Kurdî da”, j. 9(3) 2021, r. 763-770.

ŞAMİL, Hejarê, **Diyaspora Kürtleri**, Peri Yayınları, Stenbol, 2005.

ULUÇ, Melahat, “**Meryem Xan û Temaya Hizinê Di Kilamên Wê De**”, (Teza Neçapkirî, Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê), Mêrdîn, 2021.

ULUGANA, Sedat, **Wêje û Rexne**, “Kurdolojîya Sovyetê û Kronolojîya Edebiyata Wê Ya Kurdî(1922-1991)” (9/10), 36-56.

UYGAR, Yusuf, “**Kültürel Bellek Ve Dengbejlik: Doğu Anadoludaki “Dengbejlik” Geleneğinde Bellek Üretimi**”, (Teza Neçapkirî, Zanîngeha Mîmar Sinanê, Enstituya Zanistên Civakî), Stenbol, 2009.

UZUN, Mehmed, **Dengbêjlerim**, İthaki, Stenbol, 2006.

UZUN, Mehmed, **Destpêka Edebiyata Kurdî**, İthaki, Stenbol, 2007.

UZUN, Mehmed, **Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê**, İthaki, Stenbol, 2006.

XELÎL, Têmûrê, “**Xelîlê Çaçan Xizmeta Malbatekê a 100 salan**”, Lîs, Amed, 2021.

- YAŞ, Zeyneb, **Dilop** “Berî Radyoya Êrîvanê Sûsika Simo Hebû” , (9), 6.
- YAŞ, Zeyneb, **Dilop** “Bi Zarê Jinekê Cara Ewil Stranên Bi Soranî Li Ser Pîlaqan: Dayîkî Cemal”, (7), 46-48.
- YAŞ, Zeyneb, **Dilop** “Dengbêjîya Serhedê Ji Ser Zarê Jinekê: Îran Xan (Mucered)”, (14), 49-49.
- YAŞ, Zeynep, **Şakarên Muzîka Kurdî**, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, Amed, 2015.
- YILDIRIMÇAKAR, Mehmet, **Kurdîname** “Dengbêjîya Jinê Ji Hêla Patronaj, Perwerdehî, Rol û Nêrîna Civakî û Îcrakirina Hunerê Ve” (2), 87-96.
- YILDIZ, Ekrem, “**Kurtefilm Wekî Cih û Amûrê Bikaranîna Zimanê Kurdî**”, (Teza Neçapkirî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê), 2019.
- YILDIZ, Mustafa, “Farklı Kavramlar Perspektifinden Sözlü Kültür”, **Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler**, Şirnex, Zanîngeha Şirnexê, (19.04.2019) r. 225-237.
- ZAMAN, Rojda, “**Bir Direniş Hikâyesi: Dengbêj ve Stranbêj Olarak Eyşe Şan**”, (Teza Neçapkirî, Zanîngeha Bilgiyê, Enstituya Zanistên Civakî), Stenbol, 2019.

### **Çavkanîyên Dijital**

“Belgefilma Reso”, Dîroka Gihandinê: 16.12.2020.

**Url-1**<<https://www.youtube.com/watch?v=AiR84j5L-mU>>

“Belgefilma Gazin”, Pel Tv yê, Dîroka Gihandinê: 08.02.2021.

**Url-2** <[https://www.youtube.com/watch?v=agN\\_SLmsTHY](https://www.youtube.com/watch?v=agN_SLmsTHY)>

“Salek Ceza Li Gazin Hate Birîn” , Dîroka Gihandinê: 15.02.2021.

**Url-3** <<https://bianet.org/english/ifade-ozgurlugu/133320-kurtce-sarkidan-bir-yil-hapis>>

“Van’lı Kadın Dengbêjler Toplumsal Hafızayı Kuşaktan Kuşağa Taşıyor”, Dîroka Gihandinê: 13.02.2021

**Url-4** <<http://www.art-izan.org/artizan-arsivi/vanli-kadin-dengbejler-toplumsal-hafizayi-kusaktan-kusaga-tasiyor/>>

“Armenian-Turkey From Van To Yerevan”, Dîroka Gihandinê: 09.02.2021.

**Url-5** <<https://armenia-turkey.net/tk/from-van-to-yerevan-concert-in-yerevan>>

Çeliker Rewşan, “Dengên Bakûr”, Dîroka Gihandinê: 12.02.2021.

**Url-6** <<https://www.youtube.com/watch?v=sUTMaBaB4Yw>>

Kaşgar Oremar, “Hevpeyvînek Taybetî Bi Mamosta Cemîla Celîl Ra, Dîroka Gihandinê: 12, 11. 2021.

**Url-7** <<https://pirtukweje.wordpress.com/2017/05/24/hevpeyvinek-taybeti-bi-mamosta-cemila-celil-ra/>>

Mahmut Beğik, “FATMA ISA: Dengbeja Kurd ya Geleri”, Dîroka Gihandinê: 16.12.2021.

**Url-8** <<http://kurdist.ru/2012/09/13/fatma-isa-dengbeja-kurd-ya-geleri/>>

“Listeya Dengbêjên Radyoya Erîvanê” Dîroka Gihandinê: 21, 10. 2021.

**Url-9** <<https://m.bianet.org/bianet/sanat/223461-erivan-radyosu-nun-900-sarkilik-kurtce-arsivi-dijital-platformlarda>>

Ömer Delikaya, “Edebiyata Kurdên Qafqasyayê” Dîroka Gihandinê: 01.11.2021.

**Url-10** <[https://prezi.com/ac4y\\_hom7b5n/edebiyata-kurdi-ya-kafkasyaye/](https://prezi.com/ac4y_hom7b5n/edebiyata-kurdi-ya-kafkasyaye/)>

Tosinê Reşîd, “Wêjeya Kurdî Li Yekîtiya Sovyetê” Dîroka Gihandinê: 08.01.2022.

**Url-11** <<https://www.bernamegeh.org/2021/08/27/tosine-resid-wejeya-kurdi-li-yekitiya-sovyete/>>

Abdulselem Akıncı, “Erivan Radyosu’nun yaşayan son kadın dengbêji: Aslıka Qadir” Dîroka Gihandinê: 21.11.2021.

**Url-12** <<https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/05/17/erivan-radyosunun-yasayan-son-kadin-dengbeji-aslika-qadir#>>

Malpera Celîlê Celîl, Dîroka Gihandinê: 25.11.2021.

**Url-13** <<https://www.kurdologie-wien.at/temp20/ku/nachrichten-3/>>

Hasan Akboğa, “Qêrîna zimanekî qedexekirî an jî dengê Kurdên jihevçuda: Radyoya Rewanê” Dîroka Gihandinê: 19.11.2021.

**Url-14** <<https://www.nubihar.com/behter/40-qerina-zimaneki-qedexekiri-an-ji-denge-kurden-jihevçuda-r>>

Abdurrahman Benek, “Berbanga Kurdên Qazaxistanê”, Dîroka Gihandinê: 19.12.2021.

**Url-15** <<https://www.nubihar.com/behter/67-berbanga-kurden-qazaxistane>>

Hevpeyvîna Salihê Kevirbirî Bi Hejarê Şamil Ra, Dîroka Gihandinê: 12.12.2021.

**Url-16** <<https://www.nubihar.com/behter/68-serkare-wesanxaneyazengezure-hejare-samil-we-xebata-zeng>>

“Di Şopa Dengan De” Nar Photos-Kurtefilm, Dîroka Gihandinê: 16.09.2021.

**Url-17** <<https://www.youtube.com/watch?v=Bt7R9RCUNhU>>

"Welatê me Kurdistan e " Aslîka Qadir - Temurê Xelîl, Dîroka Gihandinê: 25.10.2021.

**Url-18** <[https://www.youtube.com/watch?v=xCkm0-4\\_1vI](https://www.youtube.com/watch?v=xCkm0-4_1vI)>

“Kızıl Meydan’ın sosyalist dengbêjî Sûsika Simo” Dîroka Gihandinê: 18.09.2021.

**Url-19**

<<https://web.archive.org/web/20170819145456/http://www.yeniozgurpolitika.com/index.php?rupel=nuce&id=74414> >

“riya teze”, Dîroka Gihandinê: 18.11.2021.

**Url-20** <[https://tr.wikipedia.org/wiki/Riya\\_Teze](https://tr.wikipedia.org/wiki/Riya_Teze)>

Pirîskê Mihoyî, “Dengbêja Nemir Belga Qado”, Dîroka Gihandinê: 12.03.2022.

**Url-20** <<https://www.bernamegeh.org/2021/09/09/dengbeja-nemir-belga-qado-piriske-mihoyi/>>

Albama Zadina Şekir û Hemîdê Mecîd.(Hekimo) 1998. Kom mûzik, Dîroka Gihandinê: 09.03.2022.

**Url-20** <<https://music.youtube.com/channel/UCLShxeZZ-vrLRVpt-llSyvQ>>

Ocoo Mahabad, “Dibera Wekîl Kimdir?” Dîroka Gihandinê: 05.03.2022.

**Url-21** <<https://occomahabad.wordpress.com/2020/02/03/dilbera-wekil-kimdir/>>

Pirîskê Mihoyî, “Filmên Bi Mijara Kurdî Yên Sovyêtê”, Dîroka Gihandinê: 18.12.2021.

**Url-22** <[https://krd.riataza.com/2021/11/27/filmen-bi-mijara-kurdi-yen-dema-sovyete/?fbclid=IwAR0r0\\_UQon6BQs\\_rM-53nYc6kL1HD3PqVgufkNZ396A7ClWZc51cBdjt24](https://krd.riataza.com/2021/11/27/filmen-bi-mijara-kurdi-yen-dema-sovyete/?fbclid=IwAR0r0_UQon6BQs_rM-53nYc6kL1HD3PqVgufkNZ396A7ClWZc51cBdjt24)>

Rûmet Med, “Li Sovyetan 7 Filmên Li Ser Jîyana Kurdan” Dîroka Gihandinê: 16.12.2021.

**Url-23** <<https://www.bernamegeh.org/2021/10/15/li-sovyetan-7-filmen-li-ser-jiyana-kurdan-rumet-med/>>

Salihê Kevirbirî, “Li Azerbaycanê Edebîyat û Çapemenîya Kurdî” Dîroka Gihandinê: 13.12.2021.

**Url-24** <<http://www.zazaki.net/haber/li-azerbaycan-edebiyat-capemeniya-kurd-2308.htm>>

Salihê Kevirbirî, “Gürcistan Kürtlerinin kahramanı: Keremê Anqosî” Dîroka Gihandinê: 02.12.2021.

**Url-26** <<https://www.gazeteduvar.com.tr/forum/2019/10/12/gurcistan-kurtlerinin-kahramani-kereme-anqosi>>

Cesim İlhan, “Kazakistan'da iz bırakan iki Kürt profesör: Nadir Nadirov ve Kinyaz İbrahim” Dîroka Gihandinê: 16.11.2021.

**Url-27** <<https://www.kurdistan24.net/tr/story/70793-DOSYA---Kazakistan%27da-iz-b%C4%B1rakan-iki-K%C3%BCrt-profes%C3%B6r:-Nadir-Nadirov-ve-Kinyaz-%C4%B0brahim>>

“Selîqe 5: Radyoyên Kurdî û Peywendîya wan ligel Mûzîka Kurdî, Serdar Canan û Ekrem Yıldız” Dîroka Gihandinê: 19.01.2022.

**Url-28** <<https://www.youtube.com/watch?v=4Drh9Eses0w>>

Mevlut Oğuz, Dîroka Gihandinê: 20.01.2022.

**Url-29** <<https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/04/25/ji-radyoya-erivane-heya-podcast-kurdiye-panoramayeke-gisti-ya-podcasten-kurdi>>

Şark îslahat planı, Dîroka Gihandinê: 10.01.2022.

**Url-30** <<https://www.bernamegeh.com/sark-islahat-plani-ve-raporu/>>

Elvan Başkala, “Lenin'e yazdığı kamlarla Sovyetler'e sesini duyuran Kürt dengbej Sûsika Simo” Dîroka Gihandinê: 10.02.2022.

**Url-31** <<https://www.gazeteduvar.com.tr/hayat/2018/08/06/lenine-yazdigi-klamlarla-sovyetlere-sesini-duyuran-kurt-dengbej-susika-simo>>

Dengên Nemir: “Belgefilmê Susika Simo”, pel-film, Dîroka Gihandinê: 15.02.2022.

**Url-32** <<https://www.youtube.com/watch?v=EWHCJzPMiw8>>

Fatma Îsa Bi Dengbêj Şêx Mehmet Ra, Dîroka Gihandinê: 15.02.2022.

**Url-33** <<https://www.youtube.com/watch?v=Yc4iA9rIRWA>>  
<[https://www.youtube.com/watch?v=OiR\\_86HQO5Q](https://www.youtube.com/watch?v=OiR_86HQO5Q)>

Aslîka Qadir, “Li ba xuşk u birên xwe, yên li xerîbiyê”

**Url-34** <<https://rojevakurd.com/li-ba-xusk-u-biren-xwe-yen-li-xeribiye/>>

Aslîka Qadir, ”Miletê Êzidî” Li Ermenistanê Çê Bû, Dîroka Gihandinê: 16.02.2022.

**Url-35** <<https://krd.riataza.com/2018/01/19/milete-ezidi-li-ermenistane-ce-bu/>>

Sevda Kaplan, “Dengbêj Aslîka Qadir: Miletê Kurd hêjayî serxwebûnê ye”, Dîroka Gihandinê: 16.02.2022.

**Url-36** <<https://www.basnews.com/kr/babat/425023> >

Ferîd Mîtan, “Hunermenda Kurd Aslîka Qadir” Miletê ku hurmet û siyanetê nede hunermendên xwe, ew tu carî nabe milet” Dîroka Gihandinê: 16.02.2022.

**Url-37** <<https://buyerpess.com/kurdi/?p=11205>>

Yekta Uzunoğlu, “Milyaketên parêzkar ên muzîka kurdî” Dîroka Gihandinê: 16.12.2021.

**Url-38** <<https://krd.riataza.com/2018/05/16/milyaketen-parezkar-en-muzika-kurdi/>>

Îkram Oğuz, “Îro roja salvegera koça dawîyê ya Fatma Îsa ye” Dîroka Gihandinê: 16.03.2022.

**Url-39** <<https://krd.riataza.com/2021/12/16/fatma-isa/>>

Îkram Oğuz, “Dengbêja dengzêrîn: Sûsîka Simo” Dîroka Gihandinê: 10.01.2022.

**Url-40** <<https://krd.riataza.com/2021/11/22/dengbeja-dengzerin-susika-simo/>>

Serhat Temel, “Zeyneb Yaş: Min xwest piçek be jî mîrasa gelê xwe ji talanê xilas bikim” Dîroka Gihandinê: 10.03.2022.

**Url-41** <<http://www.semakurd.net/kurdish/article/li-ser-serbor%C3%A2Eya-plak%C3%A2An-kurd%C3%A2E-hevpeyv%C3%A2En-bi-l%C3%A2Akol%C3%A2Ener-%C3%BB-berhevkar-zeynep-ya%C5%9F-re>>

Dîroka Gihandinê: 01.03.2022.

*Url-42*<*MUZIKZANA KURD – Dr. NURA CEWARI – Kurdist.ru*>

“Klam u stranê me” (rûpela facebookê) Abdullah Cangulec, Eşîra Bruka (GAGÛRÂ), Dîroka Gihandinê: 01.03.2022.

*Url-43*<*https://www.facebook.com/profile.php?id=100066840974615* >

Bername Dengê Xerîbîyê – “Dengbêj Dîlbera Wekîl”, Dîroka Gihandinê: 19.03.2022.

*Url-44*<*https://www.youtube.com/watch?v=AOqFAaMEXa0*>

Bernameya Hîveron, Dîroka Gihandinê: 19.10.2021.

*Url-45*<*https://www.youtube.com/watch?v=kJe1Snt2Hn0*>

Eyşe Şan, Wele Te Nastînim, Dîroka Gihandinê: 30.05.2021.

*Url-46**https://www.youtube.com/watch?v=MWKn7TuQYvE*>

Banû Şîrwanî, Lorîk, Dîroka Gihandinê: 30.05.2021.

*Url-46*<*https://www.youtube.com/watch?v=DcxMOAyhRec*>

## **Arşiva Temurê Xelîl<sup>365</sup>**

Wezirê Eşo, Berpirsyarê radyoya Kurdî ya Rewanê Xelîlê Çaçan

Eskerê, Boyik Xelîlê Çaçan Mûradov

Têmûrê Xelîl, Radyoya Kurdî ya Rewanê bi mîlyonan Kurd hişyar kir Bîranîna Mehmet Gûltekin, Xelîlê Çaçan Mûradov û Çîroka çîrokeke wî.

Nihat Gûltekin, Xelîlê Çaçan Mûradov.

Salih Kevirbirî, Ewî bi mîlyonan Kurd şîyar kirin: Xelîlê Çaçan Mûradov.

Redaksiyona kovara "Roja Nu", Eznîva Reşîd.

Kemal Burkay, Radyoya Rewanê û Eznîva Reşîd.

Nura Şane, Xanima kurmançî Eznîva Reşîd.

Ezîz Tekin, Radyoya Êrîwanê mêjîyên Kurdan hênik kir.

---

<sup>365</sup> Ev dosye weke pirtûk jî hatine çapkirin lê ji ber ku hemû nivîsên vê dosyayê di pirtûkê da tunebûn me vê dosyayê jî weke çavkanî bikar anî.

Nihad Gûltekin, Qonaxa Rewşenbirîya Zimanê Kurdî: Radyoya Rewanê.

Salih Kevirbirî, “Ez Têmûrê Xelîl, kurê Xelîlê Çaçan Mûradov û Eznîva Reşîd”

Frîda Hecî Cewarî, Name-bîranîn.

Têmûrê Xelîl, Rewşa zimanê Kurdî li komarên Sovyeta berê: duh û îro.

Têmûrê Xelîl, Bira şewqa vê ciwanîyê bikeve ser welatê me.

### **Hevpeyvînên Têmûrê Xelîl kirine**

Hevpeyvîna Têmûrê Xelîl bi Qanatê Kurdo re

Mîna çawa Cegerxwînê dît û me hevdu hez kir

Cegerxwîn derheqa êzîdîyan û dîne êzîdîtiyê da

### **Bernameyên bi Têmûrê Xelîl re yên televîzyonan**

Bername Ezmûn li gel Têmûrê Xelîl

Bername Bêhna Hibrê li gel Têmûrê Xelîl

Bername Rûbirû li gel Têmûrê Xelîl

Bernameyên Civat û Kilam li gel Têmûrê Xelîl

Bername Êvar Baş Kurdistan li gel Têmûrê Xelîl

### **Hevpeyvînên bi Têmûrê Xelîl re hatine kirinê**

Sîpan Norşînî- Hevpeyvîn bi Têmûrê Xelîl re

Ali Gurdilî- Hevpeyvîn bi Têmûrê Xelîl re

## PÊVEK

### **Hevpeyvîna bi Aslîka Qadir ra**

**28.01.2022**

**Ji ber ku agahîyên li ser kurtejiyana we li ber destê min hene ez naxwazim bi wan pirsan dema we bigirim lewre ez rasterast dest bi pîsrên li ser dengbêjiyê dikim: Perwerdeya we li ser çi ye?**

Min li ser beşa farisî xwende. Ez pispora farisî û ermenkî me. Yanî ez filolog im. Lê berê navê fakultê filologî bû paşê guherandin kirin beşa rojhilatzanîyê.

**Eleqeya we bi muzîk û dengbêjiyê ra çawa dest pê kir?**

Bavê min di mal da ji me ra distira. Meyla min pêşî li ser stranên ermenkî bû. Ez di mektebê da aktîf bûm min distira, ez ketim unîversîtê jî min distra lê min reqas nikaribû. Reqas ji bo min tiştê ecêb bû, min nikaribû. Ez gelek hez dikim li govendên kurdî binêrim, gelek kêfa min pê ra tê lê min tu caran nereqisî me, ez nikarim, nakeve nava rihê min. Ez hez dikim lê binêrim. Meyla min zêde li ser strana hebûye. Bavê min distira ji wî gihîşte min jî. Dêya min nedistira. Wexta ez bûm telebe ez diçûm Radyoya Erîvanê ji bo ku nûçeyên li ser bakurê Kurdistanê malumatan hîn bikim. Wê çaxê şoreşa Mele Mistefa Barzanî dest pê bûbû. Ez jî wek qîzeke welatparêz, milethez min gelek hez dikir dixwest çi diqewime û nûçeyên rast bigirim. Ew jî min dikaribû tenê ji radyoyê hîn bibim ji ber ku radyo nûçeyên rast belav dike.

**Gelo têkiliya we bi Radyoya Erîvanê ra çawa çêbû?**

Wisa çêbû: Şoreşa Mele Mistefa Barzanî bû sebeb, ev yek. Ya duduwa jî radyo nêzîkî unîversîta me bû, nêzîkî zankoyê bû. Navbera wan da belkî 200 metre jî tunebû. Ez diçûm wê derê. Paşê gerekî 250 salîya şairê ermenî Sayat Nova bikirana. Min got ez dikarim stranên wî bistirê. Stranên wî jî gelek zehmet in, kes nikarê

bistirê. Mêla min pêşî li ser stranên ermenkî bû. Got dayikê tu karî bistirî ava kitêba Sayat Nova. Ev kitêba Sayat Nova jî Heciyê Cindî û Fêrîkê Ûsiv ji ermenkî tercumeyê kurdî kiribûn. Min du stran xwu ra hilbijart. Yek “Hetanî Hebim” ya din jî “Kemençe”

### **Dema ku hûn çûn radyoyê têkiliya we ewil bi kî ra çêbû?**

Tu zanî li wê derê gelek meriv dixebitîn. Mesela Fêrîkê Ûsiv wek tercuman dixebitî, Mîkayîlê Reşîd. Rehme li wana be. Mîkayîlê Reşîd şairekî gelek mezin û biazil bû. kurdîya wî hinek kêr bû çunkî li Rusyayê mezin bûbû lê kurdperwerekî gelek baş bû. Ew gihîşte wê astê bi kurdî jî helbest dinivîsîn. Sîma Semend wê derê bû, Casimê Celîl, Keremê Seyad, min Kerem awqas nedidît. Ew êvarê dihat. Dihat weşanê xwe dikir û diçû. Wana merivên ji min mezintir bûn, ez ji wana tişt fêr dibûm. Ez ji bo wan wek zarok bûm, 18 salî bûm. Ewana mêrên gihîştî bûn. Ew bi min gelek kêfxweş dibûn wek qîzeke kurd, wekî wan salan, ketiye zankoyê. Wek zarokekî mi ra dilxweş dibûn, mi ra şad dibûn. Şanazî bi min dikirin ku ketibûm zankoyê.

### **We çend stranan di radyoyê da qeyd kir?**

Çend stran ez te ra bêjim, 11 heta 13 stran hebûn.

### **Navê wan stranan tê bîra we?**

Pêşîyê ew her du stranên Sayat Nova bûn. Ew bûne dergûşên min. Dîtin dengê min xweş e. Pêşîya ku wan stranên Sayat Nova bistirêm min şandin cem serokê orkestraya Ermenistanê ya dewletê ya Radyoyê. Navê wî Aram Mêrangûlyan bû. Wî dengê min bihîst, begem kir. Got herin û binivîsin (qeyd bikin). Em çûne xwarê ketine studyoyê û tu zanî çî bû? Wekî ecêb qet bi min ra prova nekirin, yekser nivîsîn. Ez gelek xeyidîm, dilê min gelek êşîya. Ez hatim min serokê beşa muzîkê Tîtalê Efo bû wê demê. Min ji Tîtalê Efo ra got em di dewsa kurda da ne. Bi min ra qet prova nekirin. Runiştin lêxistin û yekser nivîsîn. Wisa jî min bi xwe nebawer, tirs bi min heye. Min got çawa tişteke wisa dikin? Ermenî bi mehan prova dikin û li ser straneke xwe dixebitin. Vana ez piştguh kirim. Wek keçe kurda ye. niha jî wisa ne (li gor wan) mezintir millet ew in, di ser wan da kes tune. Tîtalê Efo ji min ra got qet ber xwe nekeve ev ji bo carekî me qeyd kiriye. Emê roja bûyîna Sayat Nova biweşînin, wê xilas be here. Qet nefikire. Nêzîkî dilê xwe hilnede. Min jî got na, wisa

çênabe. Min nedixwest wisa be lê stran gelekê xweş derketibûn. Nenêrî ku qet prova nekirin. Ew niha jî di fonda radyoyê da hene û têne weşandin.

### **Ew her du stran bi kurdî ne an ermenkî?**

Bi kurdî ne. Tercume ne. Sayat Nova aşiqê ermenîyan e. Wek ku min got Heciyê Cindî û Fêrikê Êsiv wergerandine kurdî.

### **Lê stranên we ên din ku di radyoyê da hatine weşandin çi ne?**

“Welatê Me Kurdistan e” yên din niha nay bîra min. Heta 12-13 heban min di radyoyê da straye.

### **Qasimo?**

Min Qasimo paşê gotiye.

**Em werin ser “Welatê Me Kurdistan e”, Kadri Yıldırım di pirtûka xwe ya bi navê *Kürt Kadını* da behs dike û navê stranê weha derbas dibe: “Welatê Me Gulistan e” Min ji Têmûrê Xelîl jî pirsî lê wî got di stranê da “Kurdistan” qet nebûye “Gulistan”. Kadri Yıldırım jî vê agahîyê ji malperek bi tirkî<sup>366</sup> girtiye. Min ji malperê ra mail şande çavkaniya vê agahîyê pirsî lê hê bersiv nehatîye. Gelo we qet stranê bi wî awayî bihîstîye?**

Ez texmîn dikim pêşîya min yekî li Başûrê Kurdistanê straye. Di Radyoya Bexdayê da lê ew aktuêl nebûye. Ev stran bi dengê min û bi navê min ketiye nav miletê.

### **Lê navê kesê/a ku gotîye tê zanîn gelo?**

Ez nizamim. Ez dibêm gerekî li serê lêkolîn bê kirin. Çunkî gelek meriv li vê stranê xwedî derdikevin. Mecîd dibê ez im, Egit digot ez im. Yekî soran hebû navê wî Celal/Cemal wî digot min nivîsîye. Ez naxwazim heqê kesekî bixwim. Ez dibêjim di dawîyê da gerekî lêkolîn bê kirin. Wexta ku Kurdistan ava be lêkolîn bê kirin û rastî derkeve holê. Lê di orjinala wê da dewsa “milet hemî bira ne” da gotine “kurd û ereb bira ne.” Îja Memê Eylaz, li ser vê ev stran li gor qanûnên Sovyetê guhertîye û gotîye “Milet hemû bira ne.” Sovyetê digot em giş birayê hev in. 15 komar giş di nava Rûsyayê da bûn û digotin em giş birê hev in. Yekî newêribû bigota tu kurd î, tu

---

<sup>366</sup> <https://ekmekvegul.net/sektiklerimiz/gunun-onerisi-tarihe-adini-kaziyan-4-dengbej-kadin-ile-tanisin>

tirk î, tu rûs î wê cezayên mezin bixwarana. Ji ber vê jî Memê Eylaz li ser vê stranê dixebite, gotinên wê diguhere.

### **Lê Memê Eylaz melodîya stranê jî guhertîye?**

Na, melodîya wê ji xwe hebû. Lê tu zanî wana wek ereban distiran. “welatêê me Kurdistaneeee (di vir da weke mînak melodîyê dibêje) Şehrîbana Kurdî carna distirê, ew dike mînanî ereban lê ev straneke wisa ne wekî motîfên eraban gerekî nekevinê. Ev ne ya ereban ne ya tirkan e. Ev straneke welatparêzî ye. Gerekî rîtmîk be. Çawa min straye wisa.

### **Gelo kîngê û çawa hevoka “milet hemû bira ne” guherî û bû “kurd hemû bira ne”?**

Originalê da, ango radyoyê da min stiraye “milet hemû birane” Berî 3, 4 sala min bi xwe stira “kurd hemû bira ne”. Ji ber ku kurda dijminatîya hevdu dikir loma.

### **Gelek kes vê stranê bi navê we zanin. Heta hinek navê we nizanibin jî dema ku stranê dibihîzin nas dikin.**

Gelek in. Wexta ez yekî dibînim (kesek nû nas dikim). Dibêjin ev Aqlîka Qadir e. nizanin kî ye. Paşê ez yekser dibêjim “Rojbaş Welatê Me Kurdistan e.” wê çaxê fêhm dikin.

### **Di dema Radyoya Erîvanê da we konseran dida?**

Belê, me konsert jî dida lê ne wisa berfireh bûn. Wê çaxê dema Sovyetê bû. Bê îzin me nikaribû tiştek bikira. Wextê ez hîn dibûm min tiştek nedikir. Di dawîyê da me dest konsertan kirin. Paşê ez zewicîm, du zarê min çêbûn û di 36 salîya xwe da mêrê min çû rehmê. Dû wî ra paşê min dîsa dest pê kir. Wî nedihêşt ez bistirê.

### **Piştî Radyoya Erîvanê xebatên we yê muzîkê çawa dewam kirin, albûm, konser û her wekî din?**

Albûm hene. Sê albûmên min hene. Yek Qasimo ye. Yek jî heye li cem min e lê qet wextê min tune ye ku derxim, qet hewesa min tune derxim. Yek jî hebû min da Enstituya Kurda Ya Parîsê. Albûmên min zêde tunene. Mesela Canê digire dibê 12-13 albûmên min hene, ya min tune. Ez dibêjim bira yek be bira beg be.

### **Gelo stranên ku we bixwe afirandine hene?**

Na, min neafrandiyê lê min stranên helbestên şairên me strane. Min helbestek Fêrikê Ûsiv straye. Yek jî min straye ser helbesta Mîkaîlê Reşîd, min stranek jî gotiye ser helbestvan Eskerê Boyik. Yanî sê helbestvan di jîyana min da hene. Navê yekê “Bihar û Yar” e ya din “Bedew û Qeşengê Te Me” (Fêrikê Ûsiv)

### **Heta niha di dengbêjî û hunermendîyê da astengîyên çawa derketine pêşberî we (malbatî, civakî û hêzên serdest)?**

Hunermendî bi xwe astengî ye. Di her dema da astegî hebûye. Ji bo ku huner pêşkeve divê piştgirî bê kirin. Gerekî mecal hebe meriv bistirê. Înstrûmenta hunermend gewrî ye, qirik e. Wexta tu zêde nestirî li ser qirika xwe nexebitî, cî tunebe tu têda prova bikî, yek tune be rê nîşanê te de, finans tune be ev giş astengî ne. Min çî kiriye bi ser piştî xwe û wext û enerjîya xwe kiriye.

### **Hûn demek li Afganistanê xebitîne. Hûn bi çî peywirê çûn, çend sal li wir man, kîngê vegehrîyan. Hûn dikarin behsa wê serdemê bikin?**

Wexta mêrê min çû rehmetê sala 1982an bû. Di 1985an da ez çûm Afxanistanê. Di mektebê da min beşa perwerdeyê xwendibû, di mekteba ermenîyan da. Min darsa ziman û edebiyata ermenî dida lê ez pispora farisî bûm jî. Min got ez tevî du zarokan im, zehmete wan rakim ser nîga. Min got ez van zanebûnê xwe yê farisî jî bidime xebatê. Wê çaxê eskerê Sovyet ketibû Afxanistanê. Ji wan ra jî tercuman lazim bû. Wergera rûsî-farisî, farisî-rûsî. Wana min dîtibûn, min ra gotin tu dixwazî herî? Min got erê lê min got pirsgerêk zarên min in. Kî zarên min xweyî ke? Her neyse min ra gotin were Moskovayê, ez çûm. Zimanê farisî carîka din ji min kontrol kirin ji ber ku zêde sal bû min zimanê farisî bikar neanibû. Min zanîgehê di 1969an da xilas kiribû. Di 1985an da çûm Afxanistanê. 12 sal bû min farisî bikar nedianî. Min radyo kirî. Di Radoya Erîvanê da para farisî jî hebû. Çawa weşana kurdî hebû, weşana tirkî, erebî û farisî jî hebû. Îja min di radyoyê da bernameyên farisî guh didayê. Ji xwe ferhengên min ê rûsî-farisî, farisî-rûsî hebûn. Min wan dida ser masa xwe dixwend û min xwe pêşdixist. Yanî min çî jibîr kiribe bikira bîra xwe. Ez çûme Moskovayê îmtîhana ziman. Gotin xwe hazir ke tê filan rojê herî Afxanistanê

### **Zarokên we li ku man?**

Min ji wan ra got. Gotin em ê zarê te xwedî kin. Li wir înternet hebû. Înterneta wezareta derveyê welat yê Sovyetê giştî. Ev ne înterneteke wisa bû. Înternet zarê ku dê û bavên wan diçûne derveyê welat ji bo kar. Ne tenê bêjim wergêr hebûn, dîplomat, wezîr. Ne tenê Afxanistanê diçûne welatên dinyayê giştî. Zarên wan kî ku mecelê wan tunebû di wê înternetê da xweyî dikirin lê xerca înternetê dê û bavan dida. Min xerca zarên xwe dida. Dema ku li wir bûm Moskovayê zarên min xwedî kir.

**Xabatên we yên derveyê muzîkê çi ne, gelo we derbarê mamostetî û zimannasîyê da jî tiştê kir?**

Ez daha pêşda çûm. Ez li Afxanistanê du salan xebitîm. Kontrata min hebû. Wan xwestin salkî, nîv salê din jî zêde bikin. min got zarê min mektebê xilas dîkin ez gerekî bigihîjim zarê xwe. Ez hatim û ketim wezareta perwerdeyê ya Ermenistanê. Ez ketim wir wek metodîsta ziman û edebiyata ermenkî. Min karê mamostetîyê tu cara bernedaye. Ez du salan çûm Afxanistanê wek wergêr piştî veqeriyam ez şandim mînîstîryûmê xayeta min hê bilind kirin.

**Wisa be muzîk ji we re weke karê duyem bûye.**

Erê muzîk min ra wek hobî bû. Ez ne hunermendeke resmî bûm. Ka kîjan hunermendê me dikarî bêjî resmî ye? Ya min amator bû li cem min.

**Resmî na yanî muzîk weke karê we yê yekem nînbûye.**

Na, karê min ê yekem hunermendî nînbû. Karê min ê yekem ez rojhilatzan bûm.

**Lê radyokompozîsyonên(şanoya radyoyê) ku hûn têda lîstine hene? Ez rastî agahîyek wisa jî hatibûm.**

Erê, heye. Tu zanî tu gerekê vê yekê bidî ber çava. Kurdên me yê ku bi radyoyê ra eleqedar dibûn, çi wergêr, çi hunermend, çi bêjer bûna me tenê karek nedikir. Me her tişt dikir wekî em pêra bigihînin tiştêkî bikin. Mesela ez ne şanoger bûm. Ez di şanoya bideng da jî lîstim.

**Navê lîstika ku hûn têda lîstin çi bû gelo?**

Kumsor. Ev hîkayeteke navdar ya cîhanê ye. Ya birayên Grimm e. Keçik wexta diçe daristanê gur rastê wê tê û dixwaze wê bixwe. Pîrika wê dixwe. (Keçika Kumsor)

### **Di radyoyê da xeynî ji dengbêjîyê û şanoyê karekî din ku we dikir hebû?**

Erê min bernameya edebîyatê jî tevî Sîma Semend çêdikir.

### **We bernameyê pêşkêş dikir?**

Na, ez beşdar dibûm. Pêşkêşvan Sîma Semend bû. Min helbest dixwendin. Ne ku nûçe, pareke edebîyatê hebû.

### **Gelo navê bernameyê tê bîra we?**

Na, nay bîra min. Sîma Semend gazî min dikir digot Aslîk divê tu di bernama min da derkevî. Ez jî diçûm, min gelek ew hez dikir. Herkes nikare helbestê bixwîne. Ji ber ku ez filolog bûm min sîrra helbestan dizanibû. Ez diketim nava kurahîya helbestan. Meriv hene hema teq req dixwûnin lê ne rast e. Gerekî tu naveroka wê fam bikî, gerekî bikevî kurahîya helbestê. Xwedanê helbestê, aktorê wê çi dixwaze bêje wî bigihînin guhdaran. Min xwe dixemiland, guhar dikire guhê xwe. Ez wê çaxê telebe bûm. Sîma rehmêtî min ra digot Asê tu wisa jî bedew î. Ev guhar jî gelek li te tîn lê tu bizanibe wekî guhdar te nabînin, guharê te nabînin. Tu dikarî bi cilên malê jî werî vê derê lê ya giring tu çawa dixwînî? Tu gerekî wisa bixwînî wekî her herfeke te, her gotineke te di cî da be. Ku radyoguhdar te bibhîzin nebêjin wî ev çi zehlê min bir, wê radyoyê vêsînin (bigirin). Tu wan herfan, wan gotinan rast nexwînî dêmek tu wan peyvan dikujî. Tu gerekî vî tiştî gelekî cidî hildî. Min jî helbet dixebitim ku her tişt baş bibe.

### **Weke dengbêjek tişteki ku xwestibe bikin û nikaribe bikin heye gelo, weke gotina stranekî an konserekî, tişteki ku di dilê we da mabe?**

Belê heye. mesela min dixwest wekî welatê me tune em nikarin nigê xwe dirêj bavêjin. Nikarin gavên xwe mezin bavêjin. Lê min diwaste ku ez konsêrtê bo pêşmerga bidim li cihê ku lê şer dikirin. Ez gelek caran dibêjim wextê wan tune, di şer da ne. Di şer da bin jî hunermend ji wan ra lazim in. Vana fehm nakin. Hebîbî tu zanî wexta ez li Afxanistanê bûm, em di şer da bûn. Ez li Kabûlê bûm. Talîban li pêşiya wan şer dikir, mêrkuj û xwûnxwur bûn. Eskerên Sovyetê Kabûlê bi du gustîla dorpêç kiribûn. Nedihêştin dijmin bikeve wê derê. Gelek pisporên Sovyetê li wir bûn. Hunermendên rûsan yek ji wan navê wî Kabzon bû yekî din jî hebû. Dihatin wir ji me ra konsêrt çêdikirin. Moral didane me. Ez carna li filmên ku şerê almanan û

Sovyetê didin dinêrim. Ew şerê di 1941ê heta 1945an, hunermendên wan jî dihatin bo eskerê almanan konsêrt didan. Moralê didane wan wekî ew neşkên, bikaribin biserkevin. Çira em nekin?

### **Di Radyoya Erîvanê da têkiliya we bi dengbêjên jin kîjan ra hebû?**

Têkiliya min gelek bi Zadîna Şekir ra çêbûye. Ew bi Ermeniyekî bi navê Kamo ra zewicîbû.

### **Ew xwende bû?**

Na, ne xwende bû.

### **Wê çawa di radyoyê da dest bi dengbêjîyê kir, xebatên wê ên muzîkê çî bûn?**

Ez wî nikarim bêjim. (nizanim) Çawa dest pê kir lê ew merîya (meriva-xizma) serokê radyoyê Xelîlê Çaçan bû. Tu zanî Hebîbî têkilî çawa çêdibû, Casimê Celîl jî di radyoyê da dixebitî. Diçûn gund dereke pê dihesiyan dengê kê xweş e ji gundan dianîne malên xwe. Wan dihewandin, nan av dikirin dibirine radyoyê. Dengê wan qeyd dikirin û çarka din dişandine gundê wan. Me bi vî cûreyî fonda stranbêjîya kurd çêkir. Ya min jî tesaduf bû. ez telebe bûm, çûm hatim û min li wir cî girt. Yê din mesele Şeroyê Biro, Egîtê Mecîd, Karapêtê Xaço, Reşîdê Baso, xebatkarên radyoyê diçûn wan dianîn. Bi vî cûreyî çêdibû. Zadîna jî wisa. Bavê Têmûr got were dengê xwe bike radyoyê. Wê gelek stran tev Mecîdê Silêman straye.

### **Ji xwe em dikarin dengbêjên radyoyê têkin du cure yên profesyonel û yên ku çûne wan ji gundan top kirne.**

Yên profesyonel li ku hebûne? Tu zanî şairekî ermenîyan heye, nivîskarekî ermenîyan dibêje: “Miletê kurd bi xwe folklorî ye û her kurdek jineke kurd an mêrekî kurd wek dengbêj, wek helbestvan ji dayik dibin.” Ermenî dibêjin Komîtas Komîtas. Te bihîstiyê navê wî?

### **Min bihîstiyê belê.**

Kompozîtorek wan e. Ew jî bi saya serê stranên kurdî bû Komîtas. Fehm dikî tu? Ermenî wî mezin dikin dibin esmanan. Em 60 milyon in. Em 60 milyon jî, bira 50 milyon be. Em 50 milyon dengbêj û hunermend in. Ev tebîyeta gelê kurd e. Wekî

dengbêj, wek helbestvan û şair ji dayik dibin. Gelek heyf wek miletek welatê mileta kurd tune. Ne eger me yê dinya şên kira.

**Belê.**

Ez tera tiştekek bêjim Zafîna Şekir xeynî ji stranan direqisî jî. Ew di komên ermenîyan da direqisî. Komên ermenîyan ên reqasê hebûn. Zafîna Şekir û Sûsika Simo têda cih digirtin.

**Min agahiyek şaş li ser Sûsika Simo dît. Tê gotin ku strana “Miho” Sûsika Simo gotiye. Ez fikirîm ku şaşîtiyek kirine. Paşê min vê agahîyê di çend cihên din da jî dît. Ev agahî di çend çavkanîyan da hatîye dîbarekirin. Ez fikirîm gelo ez şaş zanim?**

Na, qet negotîye. Ev agahî şaş e çunkî Sûsikê stranên mêranî qet negotîye. Yê wê tenê ên dawetan (ên govendê) bûn û du stran jî ên Sayat Nova. Dema ku min helbestên Sayat Nova hilbijart wê jî du heban hilbijart. Wê jî stranên Sayat Nova bi kurdî straye.

**Belê çend stranên wê ên navdar jî hene. Evdalê Zeynike û yê din.**

Evdalê Zeynike ew kîjan stran e Sûsikê gotiye?

**Belkî şaş jî were bîra min. Strana wê ya li ser Lenîn jî hebû**

Ya ser Lenîn ew çira Evdalê Zeynike ye?

**Ez bi we bidim guhdar kirin. (min di youTubê da ew stran vekir) Tiştekek balkêş heye ku melodîya strana Lenîn û ya bi navê “Evdalê Zeynikê” pir dişibe hev. Hema bêje hem e.**

(Piştî ku hinkî guhdar kir) vêsîne (bigire). (melodiya strana Lenîn dibêje) *Sala 1700 salê heval Lênîn hate dinê* ew tiştekek weha distirê. Ew Evdalê Zeynê ji serê xwe derxe. Ne rast e. Wê li ser Lênîn straye. Wê çaxê li ser kolxozan nivîsîye. “*kolxozê me kanîne lê lê lê nananay nanay*” eva jî cana min Hebîbî Sûsikê li ser Lênîn gotine, li ser kolxozan gotine, rast e. kolxoz tu zanî çî ne?

**Belê, ew li gundan bi hevkarî dixebitîn.**

Erê û giş dikirine xezîneyekê û giş beraber fayde lê digirtin. Ev qanûneke sovyêtê bû. Lê Sûsikê Evdalê Zeynê nestraye. Te mi ra got ez ecêbmayî mam.

**Di derbarê van mijaran da gelek agahîyen şaş hene. Dema min dest bi lêkolînê kir dît. Ez texmîn dikim kesek ev şaşî kiriye û yên din jî li dû wî/wê vê şaşîyê dubare kirine. Bi vî awayî ev şaşî belav bûye.**

**Em werin ser rola radyoyê ji bo dengbêjên jin. Ez vîya ji ber vê yekê dipirsim: dema ku min li ser Gazin lêkolîn kir min dît ku mêran gelek acisiyan ji Gazin û jinên din kirine. Heta çûne wê şikayetê mêrê wê kirine gotine ji ber Gazin em nikarin dengbêjîyê bikin. Gelo ev hesûdî di wê demê da jî hebû?**

Helbet di nav hunermendan da hesûdî tim hebûye û heye lê welatê me tune em hesûdîya kê bikin? Me pere nedistend, wekî me distira me belaş kiriye li wê derê. Ya duduwa jî helbet hesûdî tim di nava hunermendan da heye, naxwazim navan jî bidim lê hesûdî, kê nabe.

**Jin dema ku dengbêjîyê kirine rastî gelek astengîyan hatine; ji alîyê civakî, malbatî û hêzên serdest ve. Ev yek wê demê li radyoyê jî çêdibû?**

Çawa çênebû? Wê demê Sovyet bû. Rast e azadîya me hebû lê dîsa jî heqê me tunebû me biçûyana dengê xwe bida radyoyê. Sûsika Simo jî yekem jin e ku dengê xwe daye radyoyê. Digotin hûn tev xortên filehan digerin, stranan çêdikin, bi grûpên wan ra digerin, muzîsyen virda wirda. Ev xebirdan tim hebûne. Ez dixwazm tu seva Belga Qado binivîsî. Eva jî hunermendeke dengxweş, dengzelal e. Eva bi dizî çû radyoyê. Ji mêrê xwe vedişart. Hebûn jin jî diçûne radyoyê navê xwe diguhartin paşê dengê xwe qeyd dikirin. Wekî mêrê wan pê nehise. Mêrên wan dengê wan dibihîstin digotin ev qîza kerê çî xweş straye! Nizanibû wekî jina wî ye. (dikene)

**Gelo Belga Qado profesyonel bû an tenê di radyoyê da straye?**

Tenê di radyoyê da straye.

**Lê çend stranên wê hebûn di radyoyê da, kîjan ji wan navdar bûn?**

Texmîn dikim 9 stranên wê hene.

**Ew derdiket konseran?**

Na, dernediket lê eleqa wê tev Sûsikê, tev Zadîne gelek hebû. Belkî jî derdiket reqasa ez nizanim lê bawer nakim. Mêrê wê girtî bû. Ew ji mêrê xwe bi dizî tev birê xwe çû radyoyê. Birê wê, wê bir radyoyê. Wê tev orkestra fila ya radyoyê ya ermenîyan çend stran gotin. Tev Karapête Xaço stran got. Keda wê jî gelek e.

### **Di nav van dengbêjan da herî zêde têkiliya we bi kîjan ra çêbû?**

Bi Zadîna ra bû. Min Sûsik nas dikir. Min carek wê dît lê me carek bi hev ra xeber jî nedaye. Ez telebe bûm tu zanî. Ewana ji min mezintir bûn.

### **Di nav wan da yê ku niha sax in hene?**

Ka kê maye sax! Ez dibêm ez ya dawîyê me. Ka ez bînim bîra xwe kê maye. Kubara Xido bû çû, zadîne çû, Sûsik çûye, Belga Qado ji xwe zûda çûye.

### **Lê Xana Zazê?**

Xana Zazê heye lê ew ne ya Radyoya Erîvanê ye.

### **Lê li wir dengê wê jî hatîye qeydkirin.**

Kengî dengê wê hatîye qeydkirin?

### **Ew neçûye Erîvanê lê dema Xelîl Mûradov ji bo qeydkirina dengê Şeroyê Biro diçe dengê wê û Tûkasa Xemo jî qeyd dike û dibe Radyoya Erîvanê.**

Dengê Tukasê jî xweş e. Nizanim Tukasê heye yan ya. Lîla Çildergûşî di radyoya Gurcistanê da dixebitî. Bêlla Stûrkî têdaye niha. Wana yê Gurcistanê ne.

### **Kesên ku di koma Sûsika Simo da bûn gelo agahîya we di derbarê wan da heye?**

Wê bi Egîde Cimo, Xelîlê Evdile wan ra lêdixist. Xortên ermenî jî hebûn bi wan ra lêdixistin. Di koma reqasê da kurê apê Guhar Mamo bûye. Navê wî nay bîra min.

### **Di orkestraya Egîde Cimo ku ew û Zadîna Şekir bi hev ra amade kiribûn da kî hebûn, derbarê kar û barê wan da agahîyên we hene gelo?**

Ez grûpek nas dikim Egîde Cimo çêkiribû. Muzîsyenên wî giş ermenî bûn. Ew li zanîngeheka muzîkê ya ser navê Romanûs Mêlikyan. Di wira da Egîde Cimo hîn dibû. Perwerde dibû. Ne xwendina bilind bû lê nîvçe bû, di bin konservatuarê da bû. Egîd li wir Fêrî sîr û teknîka muzîkê dibû û ji telebên wê grûpek amade kir. Keçek

hebû Sonya bû navê wê, wê kanûn lê dixist, Egît bi xwe mey lêdixist, yê din kemeñçe lêdixist. Ew 13 stranên ku min kir radyoyê me bi wê grûpê ra qeyd kir. Ew grûpa ermenî bû.

**Di pirtûka Polat Can da tê gotin ku we bi kesek bi navê Hemîd ra di sala 1993an da kaset derxistîye. Gelo ev rast e?**

Na, ev ne rast e.

**Gelo we bi hunermend Dilovan ra album an xebatên muzîkê kiriye, ku we kiribe kîngê di kîjan salê da û li ku derê we xebat kiriye?**

Me bi hev ra album çênekiriye. Em bi hev ra konserta da beşdar bûne, li Yêrêvanê û li Avropayê

**Pirsa dawî, gelo rêya we nakeve bakûrê Kurdistanê?**

Na, niha vê zivistanê, nexweşîna koronayê jî. Ez jî mezin dibim, mecalê min tune, taqet nakim. Te seva Kubara Xido qet tiştek nivîsîye?

**Na, min hê nenivîsîye lê ez ê di xabata xwe da behsa wê jî bikim. Ji xwe navê wê jî pir derbas dibe.**

Zanî ew jî ji gundê Elegezê ye. Stranên wê jî di radyoyê da hene. Ew xwuşka profesor Şekiroyê Xido ye. Xwuşka wê Lûsîka Xido, jina Eskerê Boyik xwendina wê heye lê ya Kubar hebe nizanim, texmîn nakim xwendina wê hebe.

**Spas dikim.**

Eger ez karibûm alîkar bim te ra şad bûm.

## Hevpeyvîna bi Têmûrê Xelîl ra

20.11.2021.

**Di medyayê da nûçeyek belav bûye.<sup>367</sup> Tê gotin ku hin kesan li Berlînê telîfa arşîva Radyoya Erîvanê bidest xistine û nahêlin ew stran bêyî destûra wan werin weşandin. Gelo encama vê meselê çawa bû?**

Wan sextekarî kirine. Bi zanebûn nînbûye. Bi nezanî bûye. Hemû mesele ew e ku Radyoya Erîvanê ne xwedîyê wan kilaman e. Wana jî destûr ji Radyoya Erîvanê xwestine. Xwedîyê wan kilaman ya Fonda Zêrîn pêşî Moskova bû. Gelek salan heta ku Sovyet hilweşiya xwedîyê wê radyoyê Moskova bû. Piştî ku Sovyet hilweşiya ew radyo bêxwedî ma. Rusyayê bi resmî ew radyo nekîr Radyoya Erîvanê. Moskovayê bi resmî Fonda Zêrîn teslîmê Radyoya Ermenistanê kirin (piştî hilweşînê). Ev ne fermî ye, wexta ku ne fermî be tu nikarî destûrê ji kesên ne fermî bistînin. Heger bistînin jî ev ne qanûnî ye. Niha hin kesan şikyat kirine gotine wê çawa be û hatine ser fikrekê ku wextê ku Sovyet hilweşiya ew radyo bi resmî teslîmê Ermenistanê nekiribin wê demê ew radyo dibe milkê kolektîva wê radyoyê (xebatkarên wê radyoyê bi xwe). Ên ku têda dixebitîn jî kes ji wan nemaye. Yanê yek ji wan ez im. Hîç kes jî danûsitendin bi min re nekiriye. Wextê ku xwedîyê malê dimire mal û milkê wî didin jin û zarokên wî. Yanî kolektîva radyoyê jî em bêjin mesele hinek kes mirine. Em bêjin jina wî miribe gerekî bidin zaroyan, zaroyên wî jî tune bin didine meriyan ne? Niha xwedîyê wê radyoyê ew kes in ku di Radyoya Erîvanê da xebitîne û îro sax in. Gerekî destûr ji wana bê xwestin. Ji wan sê kes sax mane lê kesî bi me re pêwendî danenîye. Ew kesên ku şikyat dikin avoqat girtine. Wê mesele dûr û dirêj bikşîne ka em ê bibînin wê encam çî be?

**Ku şaş ney bîra min 12 xebatkarên Radyoya Erîvanê hebûn navê van kesan tê bîra we?**

Serokê wê bavê min bû: Xelîlê Çaçan. Mirazê Evdo, cîgir bû. Şikoyê Hesên, Fêrîkê Ûsiv, Mîkaîlê Reşîd, Emerîkê Serdar, Qaçaxê Mirad, Hamoyê Rizgo, Sîma Semend,

---

<sup>367</sup> Di derbarê mijarê da di van bernameyan da jî agahî hene:

<https://www.youtube.com/watch?v=kJe1Snt2Hn0>

<https://www.youtube.com/watch?v=8AA1a5JEBKU>

Îşxanê Aslan, û ez. Eznîva Reşîd, Keremê Seyad û Sêvaza Evdo jî spîker bûn. Dîsa Niha jî kurê Keremê Seyad Tîtalê Kerem.

### **Kadroyên Ewil kî bûn?**

Bavê min, Qaçaxê Mirad û ew kesên ku min navên wan got ew in.

Hinek ciyan şaş fêh dikin. Radyo wextê vebû ji 1955an heta 1957an test bû. Têst kirin. Wê çaxê du kes dixebitîn: Casimê Celîl û diya min (Eznîva Reşîd). Ew weşan lokal bû ne gihîşte Kurdistanê ne jî digihîşte gundên Ermenistanê. Piştî du salan wextê komîsyonek ji radyoya moskovayê hat ku radyoyê bike fermî dîtî ku karek nehatiye kirin Casimê Celîl ji kar derxistin. Bavê min ji sala 1957an bû serok û ji bo ku Casimê Celîl bê kar nemîne bavê min beşa muzîkê da wî ji ber ku li wir çend beş hebûn. Beşa edebiyatê, beşa mûzîkê, beşa partîyê, beşa malhebûna gund. Ji ber ku wî nikaribû beşên din bibira. Beşê mûzîkê danê ji ber ku bi qelemê va grêday nînbû. Ne ji bo ku ji muzîkê fêh dikir ji bo ku dengbêjan peyde bike û studyoyê kirê bike û dengê wan qeyd bike. Dûra wextê dengê wan dihate qeydkirin komîsyonek taybet hebû ku ew kilam gerekî bi resmî bihatana qeydkirin û qebûlkirin. Ji bo bibînin gotinê wan çî ne, li ser çî ne bibînin çêr, heqaret tişt miştên wisa. Ew hemû kilam jî wisa dihatine qebûlkirin. Di komîsyeneke din ya taybet ya ji ronakbîrên kurd û ermenî pêk dihat. Lewma jî ew stranên Eyşe Şanê û Şivan perwer wana bi zehmetîke mezin hatine qeydkirin ji ber ne hemwelatîyê Sovyet bûn û hinek kesan jî digot dewleta tirk li dû wan digere û sovyet jî bi Radyoya Erîvanê wana propaganda dike. Di stranên wan da jî helan heye ku kurdino rabin şerê roma reş bikin virda wêda lê gerekî bê gotin ku ev tesîreke mezin nekir ji ber ku serokatiya Moskov ji serokatiya Radyoya Erîvanê ra gotibû ku çî ji wan ra dest dide û ne li dijî siyaseta Sovyet be hûn dikarin hemû bidin. Kirine qalibekî wisa ku stran da ya sereke muzîk e ne gotin e. Lewma gerekî ew hemû stran jî bêne qeydkirin û hatine qeydkirin. Hinek tişt bi cesaretê va girêdayî ye, li welatê me mêrkuştin, talan, jinberdan, şer serhildan şoreş wana yanî ev propagandakirin qedexe bû. Kilamên me jî hemû şer û jinberdan û kuro lêxe ev in. Lê di van şertan da jî stranek nema ku nehate qeyd kirin. ew jî hin bi cesaretê va girêdayî bû hinek jî bi nas û dostanîyê bû. Serokê Radyoya Moskov û serokê Radyoya Erîvanê hevalê hev bûn jî. Yanî danûsitendinên wan xwurt bû. Şansê me ew bû ku hemû stranên me jî hatine qeydkirinê

**Li hember qedexeyan û şert û mercên naveroka strana ew cesareta qeydkirina hemû stranan kî nîşan da, herî zêde keda kî di vir da heye?**

Li welatê me wextê Sovyetê dîktatorî hebû. Dîktator jî ji Moskov sipartibû serokê radyoyê yanî tu xelkê me yî, tu kesê me yî. Em çî bêjin tê wêya bikî û tu azad î. Mesela Moskov digot gerekî tu weha bikî êdî serokê Radyoya Erîvanê nedîçû ji xebatkarên xwe nedipirsî em çawa bikin çawa nekin. Ji Moskov ferman hatiye gerekî tu weha bikî yanî serokê radyoyê bi xwe biryar dida bêyî ku xebatkarên xwe re bişêwire ji ber ku Moskov ferman dabû nikaribû bişêwiriya jî. Serokê radyoyê jî wek ku min got 24 salan bavê min bû. Tu zanî ez dixwazim hin tiştan bêjim ew piştî hilweşîna Sovyetê heta niha ew radyo qaşo heye lê ew radyo di rastîyê da hatiye girtin, mohra girtinê lê neketiye. Yanî îmze nekirine ku vê radyoyê bigirin. Ermenistanjî ji bo xwe propaganda bike ji cîhanê re bêje em mafê gelên kêmjimar didin, va Radyoya Erîvanê ba me heye. Ez nimûneyek bêjim ew radyoya ku berê 12-13 kes bûn paşê ma du kes. Ew radyoya ku sê odeyên wan hebûn niha odeyek tenê heye. Ya herî sereke radyoya ku antêna wê heye ku hemû Kurdistan heta li Kanadayê jî guhdarî dikirin ew antêna rakirin ji ber ku tu gerekî pera bidî ku ew antên kar bike. Îja di van şertan da ew radyoya ku piştî hilweşîna Sovyetê yek stran jî qeyd nekiriye yanî em nikarin bêjin ew radyo heye. Piştî hilweşîna Sovyetê di sala 1991ê da hema bêje hatiye girtin lê mohra girtinê lê nexistine û xelas tiştekî din tune lema hinek caran dibên yan dixwînin dibê eva ez 30 sale li vê radyoyê kar dikim lê ev 30 sal e ew radyo di eslê xwe da tune ye. Yanî nabe ku wana hemberî wan kesan bikin ku heta sala 1990î wek gulleyê kar dikirin. Ji sibê hetanî êvarê ew pîyes û radyokompozîsyon heta şevê diman ew artîstên kurdan têda dilîstin. Ew dewran dewraneke xweş bû û hemû kar jî berî hilweşîna Sovyetê hatiye kirin. Piştî hilweşîna Sovyetê yek kar jî nehatiye kirin.

**Di pirtûka Kamran Elend ya bi navê “Kimliği Terennüm” da tê gotin ku arşîveke Casimê Celîl ku ji 300 stranan pêk dihat lê ji ber zextên Moskovayê hatiye şewitandin. Gelo we li ser vê arîvê tiştek bihîstiye an na?**

Ew ne ku min bihîstiye, min bihîstiye ku ew ji serî heta binî derew e. Tiştekî wisa tune ye. Casimê Celîl ne serokê radyoyê ye ku arşîva wî hebe. Belkî arşîva qîza wî ya Cemîla Celîl diçû li çola, li gundan ji dengbêjan bi cureyê amator dengê wan qeyd

dikir bi teyibê/dengnivîsokê belkî behsa wê arşivê dike. Yanê çima bişewitîne? Zor û zext tune ye li ser kilaman.

**Weke ku we jî got stranên ku mêrkuştin, şer filan hene qedexe bûn ji ber wê.**

Arşiva Casimê Celîl tunebûye. Arşiv ya dewletê bûye, ya Radyoya Moskov bûye û rêvebirê wê arşivê jî ne ew kesê ku tu behs dikî ye.

**Lê nîqaşa li ser pirtûka Zerî Înanç? min axaftina we li ser wê pirtûkê dît loma dipirsim**

Yanî hinek kitêb hene meriv rexne dike. Ji bo çî rexne dike kitêb bi temamî baş e lê kêmasî têde hene meriv li ser wan kêmasiyan dibêje. Ez li ser vê kitêbê nikarim rexnekî bêjim ji ber ku kitêb ji serî hetanî binî derew e, yanî hemû rexne ye. Tu zanî ya herî xerab jî çî ye kesa ku nivîsîye yeka navdar e, Zerî Înanç. Kesên ku çap kirine jî weşanxana Îsmail Beşikçi ye yanî ew jî navdar e. Informatorê Zerî Înanç kesekî profesor e, Celîlê Celîl e. Yanî ev hemû kesên bîna te dixapînin. Kitêbek 400 rûpel malbata Casimê Celîl û zarokên wî û Radyoya Erîvanê tu eleqeya malbata wan bi qeydkirina wan stranan tune ye. Radyoya Erîvanê çî ye, stran û piyesên wê hene. keda wî kesî (Casimê Celîl) di yek ji wana da jî tune ye. Îja eleqeya wê malbatê bi Radyoya Erîvanê va çî ye? yek Casimê Celîl du salên pêşîn ne perpirsiyar bûye, ne redaktor bûye. Dane wî ku weşana testê du salan bi rê va bibe û dûra komîsyonê wî bi resmî ji kar derxist û Xelîlê Çaçan kirine serok. Casimê Celîl jî heft salan li ber destê wî kar kir. Ya duyem di wê kitêbê da jî dibêje Ordîxanê Celîl di wir da spîker bû rast e. Piştî dêya min Ordîxanê Celîl wek spîkerê mêr anîn, spîkerîya wî sê roj bû. Çima nikaribû? Ji ber ku wê bigota “guhdarên ezîz” lê digot “gûdarên ezîz” biryar hat girtin nabe ku ev radyo haşa bi gû dest pê bike. Yanî wî ji kar avêtin. Dûra wextê Casimê Celîl derket ji radyoyê êdî ew beşa muzîkê jî nikaribû birêva bibira. Qîza wî Cemîla Celîl hat ji ber ku mekteba muzîkê xwendibû û ew jî çend salan xebitî lê wek ku min got li welatê me dîktatorî bû, biryar ne di destê wê da bû biryar ne di destê kesên din da bû jî. Biryar di destê serokê radyoyê da bû ji ber ku Moskov ji serokê radyoyê dipirsî ka we çî kir hûnê çî bikin? Cemîla Celîl jî çend salan redaktorîya beşa muzîkê kiriye. Ew jî ne ji bo biryara filan qeydê filan kilamê bide. Karê ew bû here gundan dengbêjan peyde bike wan bîne li bajêr bicih bike, li studyoyê bi wext qeyd bike, muzîsyenên bîna Egîdê Cimo, Xelîlê Evdile ji bo ku muzîsyen û dengbêj bi hev re bixebitin ku karibin kilaman qeyd bikin. Yanî karê wê ev bû. Ew kitêb ji

serî heta binî derew e. Ez bi kurtî bêjim ji te re. Niha wek ku min got Radyoya Erîvanê çi ye? Stran û piyesên wê nînin? Stran û piyesên wê kî qeyd kiriye? Mirovek qeyd kiriye ku serokê wê radyoyê ye û navê wî mirovî di wê kitêbê da tune ye, te fêm kir meselê? Kesek ku ew xanima xwe zêdeyê pêncî salan di radyoyê da xebitî ne yek jê spîkera yekemîn bûye, yê din jî 24 salan serokê radyoyê bûye, heta 1981ê. Ku navê van her du kesan di kitêbek da tune be ev ji dijminatîyê zêdetir tiştek nîne. Ji sextekarîyê zêdetir tiştek nîne. Ez dikarim tenê Zerî Înanç efû bikim ku haya wê tunebûye. Profesorekî (Celîlê Celîl) navdar înfomatorê wê bûye. Wê jî bawerî pê aniye. Çima bawerî pê neyne? Ew profesor e, kurdzan e, gelek berhemên wî hene, nav û dengê wî heye. Îja li pişt perdê sextekarî heye ew nabînin, yanê kes nabîne. Lê em dibînin, bila haya te jî jê hebe û tu jî bibîne.

### **Di Radyoya Erîvanê da şanoyên ku hatin lîstin kîjan bûn, lîstikvanên wan kî bûn û bi rêveberiya kî hatin amadekirin?**

Ez ê navê çend heban bêjim. *Dewletî û Xulam, Fêlbaziya Rûvî, Hikyata Berçemkê, Şenglo Menglo, Destebirak, Lenîn û Elî, Mîrze Mehmûd, Dimdim, Gîkor, Zembîlfiroş, Bê Qelen, Gulîzer, Memê û Eysê, Elenewêrek*. Hemû ev nînin, beşek ji wan in. Bi temamî 41 heb in. Ew kesên ku têda dilîstin gundî bûn feqîra. Rejîsor Ermenî bû lê rind fêm dikir ew piyesên me. Rejîsor rojkî ji bavê min ra got baştir e ku vana xwezayî dilîzin. Yê ku li ûnîversîtê hînî lîstikvanîyê bûne ew hînî qalîbek dibin lê ev artîstên gundan tînin bi xwezayî dilîzin wek ku bi rastî di jîyanê da be. Ew jî bi hostatiya rejîsor va girêdayî bû. Wisa dikir ku ev kesên hatî bikaribin bilîzin. Helbet ceribandînin dikirin yek ne baş bûya yê din dianîn. Zehmetîyên herî mezin ew artîst jî wextê dihatin hinek caran kesên wan li Erîvanê tune bû. Otêl motêl jî tune bûn dê li ku bimana? Dewletê heqê otêlê jî nedida. Li malên me diman, rêyek me didît heta saet 12an, li wan deran di odeyan da radizan. Wan salan karê radyoyê 24 saet bû. Bi dil û can dikirin û ermenîyan hinek caran şikyat dikirin digotin heyra sibê heta êvarê li van odeyên redaksîyona kurdî dengê def û zirnê tê, nahêlin em kar bikin.

### **Di nav van lîstikan da yên ku herî zêde hatine hezkirin kîjan in?**

Yek *Memê û Eysê* ye û *Destebirak* ev her du jî yê bavê min in. Yek ya Fêrîkê Ûsiv *Bê Qelen*, ew gelek hat hezkirin, û paşê jî yê folklorê *Memê û Eysê, Xecê û Siyabend, Mem û Zîn, Zembîlfiroş, Kerr û Kulik*. Vana gelek dihatin ecibandînin di

hêla xelkê da. Tu zanî dengbêjên me yên wisa hebûn xwezayî mesela Memoyê Silo belkî te kilama wî “Sîsile Cînar” wana bihîstiyê. Memoyê Silo çû tevî festîvaleke bi nav û deng bû ya muzîkê. Profesorên Amerîkayê dengê wî bihîstin û ji ermeniyên re gotin “we digot dengbêjê me yê operayê tune ye. Va ev dengbêjê operayê ye.” jêra gotibûn heyra ev şivan e. Le Profesor dibê qet bawerîya min pê nay ku ew şivan be. Dengê wî wisa ku çûye Îtalyayê çend salan degê xwe hel kiriye, çêkiriye. Dengbêjiya me serketina me ya herî sereke bû. Heta ew muzîka me mey û zirne heye ermeniyên dibirin ba xwe lêdixistin ku ji wan ra lêxin, ji ber ku rind lêdixistin. Paşê kompozîtorên wan ên bi nav û deng hatine wê baweriyê ku qirika wana qirika kurdî ye, ji bo ermeniyên nabe. Te dî ew deng ji gewrîyê dertê ew mey, zirnê wana. Ermeniyên dît çare tune gotin mey û zirneyên kurdan cuda ne. Ew ji darên zerdelê çêdikin, hinek jî ji darê çamê çêdikin wirda wêda. Hatin mey û zirna me ya ku em çêdikin birin dîsa jî bi ser neketin. Hate îspatkirin ku ya me ji ya wan xwurttir e.

#### **Navê lîstikvanên şanoyê çi bû?**

Navê ên ku ji gundan dihatin di bîra min da nemane lê ez zanim ku ji ronakbîrên me hema hemû ketine şanoyê û wan şanoyan lîstine. Egîdê Abasî, Emerîkê Serdar, Keremê Seyad, Eznîva Reşîd. Vana yên li Riya Teze kar dikirin, yên li radyoyê kar dikirin, kesên ku helbestkar û nivîskar bûn ew şûreta wan a lîstikvanîyê jî hebû. Gazî wan dikirin, kurdîya wan jî xweş bû. Hinekan zarokên xwe jî dianîn. Xwişk û birayên min jî di hinekan da lîstine. Tenê min nelîstiyê têda. Wan salan teknîk jî awqas xwurt nînbû, heta teyîb jî tune bu ku meriv wana hinek tiştan qeyd bikira. Ew dengnivîsok/teybên mezin yên radyoyê hebûn ku nedifrotin, yên dewletê bûn. Tenê ji bo radyoyê çêdikirin û ew li wan deran tenê hebû. Teknîk jî awqas xwurt nînbû lê arşîvek dewlemend hate qeydkirin û ji gelê me re hate hêştin. Ya here sereke ew e.

#### **Tiştê ku min fêhm kir di Radyoya Erîvanê da dengbêjên jin ên profesyonel û yên xwezayî hebûn. Yên profesyonel û yên ne profesyonel kîjan bûn?**

Ên profesyonel tunebûn. Ên xwende hebûn. Kubara Xwudo, Aslîka Qadir û Cemîla Çawiş vana ûniversîtê xelas kiribûn. Ji bo wan asteng tunebû ku bîr dengê xwe qeyd bikin lê ew ên dinê mîrê wan, bavê wan, birayên wan nedihêştin. Digotin eyb e wê herkes dengê te bibîze. Wana bi rêya hinek nas û dostan dihatin. Mesela Zadîna Şekir qîzapa min e. Bavê min destûr jî apê min dixwest û dibir radyo hemû stranên qeyd dikirin. Hinek jî bi nas û dostan me wan dianî, hinek jî qîz bûn 14-15 salî bûn tu

asteng li ber wan tune bû. Destûra wan didan, dihatin distiran lê ez dixwazim bêjim li ser jinan tiştê here muhîm ew e: hinek jin ne li Ermenistanê diman ne li Erîvanê diman. Li Gurcistanê diman. Bavê min wextekî ji Şeroyê Biro ra dibêje were strana bêje. Şeroyê Biro, li mala meta min tê ji bo kilaman bêje, mêvan ji Ermenistanê hatiye wek dengbêj tîne. Bavê min dibê were Ermenistanê ez ê dengê te binivîsim (qeyd bikim). Ew dibê ez ê bêm lê nay. Carek din bahs (xeber) dişîne dibê ka Şeroyê Biro nehat? Dibê ez ê îro bêm sibê bêm lê nay. Dûre bavê min mecbûrî diçe Gurcistanê Tîblîsê, bi rêya Keremê Anqosî studyoya Radyoya Gurcistanê kirê dike. Şeroyê Biro tîne wir, hemû stranên wî qeyd dike. Paşê dibêje yekser ez hatime vira çend dengbêjên din jî bibînim. Jêra dibêjin dengbêjên baş li Têlavê hene ne li Tîblîsê. Diçine wir Cemîla Çawiş û Şebabê Egît hebûne li wira. Wan tînin Tîblîsê û dengên wan qeyd dikin. Li Tîblîsê du jinên din rastî wan tên, yek Xana Zazê yek jî Tukasa Xemo ye. Ev her sê jin ji Gurcistanê bûn. Dengê wan hemû qeyd kirin, anîn Erîvanê. Hinek dengbêjên me hebûn grûbên wan ên folklorî hebûn. Mesela Sûsika Simo rêvebira grûpa folklorî bû. Kesên mîna Şamilê Beko têda li zirnê û bilûrê dixistin. Egîdê Cimo jî di wê grûbê da bû. Sûsika Simo dengbêja kurd a pêşin e. Hinek grûpên folklorîk hebûn li Ermenistanê bi serokatîya Xelîlê Evdila li gundê Cirabêlê. Li wê derê jî dengbêj hebûn, keç hebûn hatin dengnivîsan. Ji xwe qîza Mecîdê Silêman navdar e. Gulîzera Mecîd digotin. Dengbêjên bi nav û deng Aslîka Qadir, Sûsika Simo, Belga Qado, Zadîna Şekir, Kubara Xido, Cemîla Çawiş, Fatma Îsa... Fatma Îsa li gundekî dora Erîvanê dima. Ew jî bi rêya Kinyazê Îbrahîm me xwe gihande wê. Destûr ji mêrê wê xwestin ku hat bisitrê. Ew kilama wê (Miho)di filmek Ermenistanê bi wê dest pê dike.

**Navê Zadîna Şekir di hin cihan da welke “Şekir” di cihan da jî weke “Şakir” hatiye nivîsîn. Gelo halê rast kîjan e.**

Hûn bakûrî dengê “e”yan dikin “a”. Şekir dikin Şakir, Malbet dikine malbat, hûn hewarê dikine hawar, Gulîzerê dikine Gulîzar. Vana kurmancî navê wan heye heyran, çima Celadet hewara me kiriye hawar? Hûn ji Şekiro ra dibên Şakiro

Nûra Cewerî (qîza Heciyê Cindî) yekem kes e ku konserewatuarê xwendiyê. Wê beriya Cemîla Celîl di radyoyê da di beşa muzîkê da kar kiriye. Ew redaktora muzîkê bû. Ew muzîsyen e. Gelek xebatên wê hene li ser van dengbêjan. Ew niha li Awusturalya dimîne.

Ew pirtûka Zerî Înanç informatorê wê Celîlê Celîl e lê ew rêya radyoyê jî nizane. Tu eleqeya wî bi radyoyê re tune ku informator be. Min li wir çar salan kar kiriye. Piştî bavê min mir ez çûm wira. Ez rîsk nakim ku bêjim her tiştî zanim.

**Çend meh berê ez bi Celîlê Celîl re jî axivîm ji bo hevpeyvînê. Wî got ji ber ku min di radyoyê da kar nekiriye nikarim bibim alîkar. Got xwuşka min li wir xebitiye û navê wê da min. Paşê derfet çênebû ku ez rasterast bi wê ra bikevim têkilîyê**

**Em ji Sûsika Simo dest pê bikin. Ew li ku ji dayik bûye, li ku jîyaye, perwerdeya wê çi ye?**

Sûsika Simo ji gundê Mîrekê ye, Mîrek li Elegezê ye. Li dora çiyayê Elegezê çend gundên kurdan hene yek jê jî Mîrek e. Mîrek gundê axalera, began bû. Sûsika Simo pîr e. Di êzdayetiyê da pîr û şêx hene, em mirîd in. Sûsika Simo mêr nekir ji ber ku pîr gerekî bi pîran ra mêr ke. Wî çaxî jî kes tunebû ku bê wê bistîne. Ji xwe em hindik in. Wisa ma bê mêr lê mêrê wê ermenî bû. Kolya Naftalyan ew gelek diçûn dihatin, gelek caran dihatin mala me. Kolya gelek alîkarîya wê dikir, ew şampiyon bû û bi sporvanek navdar bû. Wextê konsertan ew pêra diçû, xerç xerec, erebe, otêl motêl giş wî dikir. Sûsika Simo grûpeke wê hebû ya kilam û reqasê. Nîvê grûpa wê ermenî bû lê bi kurdî distiran, bi kurdî direqisîn.

**Navê grûpa wê hebû?**

Navê grûpa wê tunebû lê Şamilê Beko li zirnê dixist. Ew gelekî bi nav û deng e. Berî Xelîlê Evdile û Egîdê Cimo ew hebû. Şamilê Beko ewqas xwurt bû ku yekem kes bû li Sovyetê ku du zirne bi hev re lêdixist. Di grûpa wê da hem kilam hebû hem reqas. Li gundan, navçeyan, li komarên din digeriya konsêrt dide û hemû jî bi cilên kurdî. Ew ermenîyên wir jî kurdî hîn bûbûn. Sûsika Simo, bi pîranî bi konsertên xwe va bi nav û deng e. Sala 1972an jî komeleyek me hebû ya xwendekarên kurd, ez endamekî wan bûm. Min ew bir cejna newrozê li Moskovayê. Li wê derê jî konsêrt da. Zarokên wê jî tunebûn. Sûsika Simo pîr welatparêz bû, dengbêj bû, wek ku tu zanî di radyoyê da çend kilamên wê hene.

**Gelo stranên ku Sûsika Simo bi xwe çêkirine hene, mesela strana Lenîn heye, xeynî ji wê kîjan stran hene?**

Lenîn siyaset bû. Jê ra helbest nivîsandibû, paşê kire stran. Ji propaganda siyaseta Sovyet bigihîje Kurdistanê *sala 1870 şîrîn Lenîn hate dinê, deng bela bû dine...* ew yekî din nivîsibû lê wê straye. Piraniya sitrên wê yên gelerî ne. Mesela *zilfanê zilfanê* heye. Hinek stranên jî bi kesên din re gotiye, mêr û jin li hev vedigerînin(duqolî).

### **Sûsika Simo di Radyoya Erîvanê da çawa dest bi dengbêjîyê kir, çawa têkilî bi radyoyê ra danî?**

Bira haya we jê hebe hîç dengbêjek di Radyoya Erîvanê da kar nekiriye. Wana dengbêj bûn. Ji mala xwe dihatin, digotin û diçûn. Ew pîrsa meaş carekê bona straneke xwe pere distendin û xilas. Ew ne xebatkarên radyoyê bûn. Dengê wan xweş bû, dihatin, stranên xwe digotin û diçûn.

### **Derbarê Kubara Xido da hûn dikarin çi bêjin?**

Kubara Xido mamosta bû. Li Elegezê dersên kurdî dida zarokan. Ew li Elegezê mezin bû û li wê derê jî mir. Ew xwişka Şekirê Xudo ye, ew akademîsyenê mezin. Yanî malbeteke xwende ne.

### **Stranên ku wê bi xwe çêkiribûn hebûn?**

Na, piraniya wan (dengbêjan) ji sedî not û pênc gelerî digotin. Stranên ku di govend û dawetan da bihîstine wana digotin. Stranek dikaribû deh dengbêj bisitirana. Hilbijartinek dikirin. Ji van dengbêjan kîjan baş e bo radyo, kîjan baştir distirê. Paşê taybetmendiyek hebû ku gerek ew aparatora radyoyê dengê te qebûl bike. Dengê te dikare xweş be lê aparator zane dengê te ji bo radyoyê bê qeydkirinê yan na.

### **Zadîna Şekira qîza apê we xwende ye an na?**

Na, ew mekteb xilas kiribû. Ji gundê kervansarayê. Ew gundê bavê min e. Gundê me dengbêjekî din jî daye, ew mêr e belkî ji ter ne lazim e lê Memê Xido. Belkî te kilama wî bihîstiye. Ew kilama *Mem û Zîn, Dewrêşê Evdî* distirê. Ew jî navdar e. du dengbêjên navdar ji gundê me derketine.

### **Zadîna Şekir jî van stranên gelerî digote?**

Erê, Zadîna Şekir dengê wê ewqasê baş bû Esntîtûta Parîsê wextê Kendal (Kendal Nezan) hatibû Erîvanê wê nas kir û plakek derxist binda Bilbila Kurdistanê nivîsîbû û belav kir. Navê Bilbila Kurdistanê him li ser plakê heye, him jî li ser afîşekê.

### **Strana Zadîna Şekir ya herî navdar kîjan e?**

*Dêre Sorê Piçûkê* strana ku wê digot ya herî navdar e

Tu zanî dêre çi ye?

### **Dêr? Nizanim.**

Dêre fistan e. Yanî “fistan sorê piçûkê, par qîz bû îsal bûk e.” Ya herî navdar ew e lê wê stranên mêranîyê jî gotine. Ew dengbêjên wisa bûn ku heke pênc-şêş kilamên wan di radyoyê da hene nay wê manê ku tenê pênc-şêş in. 20 kilaman zane, 5 heb hatine qebûlkin. Yan jî ew kilamên din berê hinek kesên din strane loma qeyd nekirine.

### **Navê dê û bavê Zadîna Şekir çi ye?**

Navê dêya wê Ferzê, navê bavê wê Şekir e.

### **navê zarokên wê çi ne?**

Nay bîra min.

### **Di malperek tirkî da tê gotin ku peykerê wê li Hewlerê heye. Gelo we tiştek weha bihîstîye?**

Rast e. heykel min bi xwe jî dîtîye, lê nayê bîra min li ku. Çend peyker hebûn, yek ya Zadînê bû. Ezê bigerim, hema min dît, ezê bişînim. Mêrê wê ermenî bû, keç û kurek wan hebû. Navê mêrê wê jî nayê bîra min, lê ezê bizanibim

### **Tê gotin ku ji ber zextan ji hevjinê xwe qetiyaye gelo rast e?**

Ji hevjinê xwe qetiyaye nizanim, lê kurê wî yekî pîs bû, li diya xwe dixist û jê hez nedikir. Mêrê wê ermenî bû. Navê wî Kamo bû.

### **Strana Aslîka Qadir ya “Welatê Me Kurdistan e” di hinek cihan da dibê “Welatê Me Kurdistan e” di hin cihan da jî dibê “Welatê Me Gulistan e” ew guherîn di stranê da çawa çêbû?**

Hîç kilamek da navê wê stranê nebûye “welatê me gulistan e” navê kilamê “Welatê Me Kurdistan e”. Di textê da tê gotin “gul û gulistan e” navê kilamê her dem jî “Welatê Me Kurdistan e” bûye. Ez wê jî bêjim ku gelek şikyat hatin ser wê stranê ji ber ku li welatê Sovyetê welatê her kesî yekîtiya Sovyetê bû. Yanî nedibû ku tu bêjî welatê me Kurdistan e. Bavê min dost mostên wî hebûn . Yanî wî kire qalibê eva strana geleri ye, em gerekî bi radyoyê bidin û dan. Hat qeydkirin. Lê hîç cara navê wê nebûye “Welatê Me Gulistan e”. Belkî hinek kes wisa belav dikin lê ne rast e, şaş e. Ew gotin di teksta stranê da heye.

### **Gelo bera jî cara yekem Şivan Perwer di Radyoya Erîvanê da stranên wî hatiye weşandin?**

Erê rast e, Şivan cara pêşin, li Bajarekî Almanyayê Heidelbergê dima. Wî kasetên xwe bi destê Dr. Omer Haso ji min ra şande. Cara pêşin kasetê Şivan kete destê min. Min jî dîyarî da radyoyê. Nameyên Şivan jî hene li Erîvanê ne, ne li cem min in. Ez niha li Awropa dimînim. Me kasetê Şivan bela kir. Beriya wî jî Eyşe Şan wê çaxê plak hebûn ew jî Omer Haso anî ji Almanyayê anî hediye da min. Min jî hediye da Radyoya Erîvanê. Ya Eyşe Şanê ez nikarim bêjim cara ewil bi radyoya me ji ber ku bi Radyoya Bexdayê cara pêşin dane. Meyrem Xan û wana hebûn distiran. Me dengê wê zûda bihîstibû. Eyşe Şan bi Mihemed Arif ra sitraye, bi Îsa Berwarî re. Eyşe Şan çûbû Radyoya Bexdayê li wira kasetek derxistibû.

### **We stranên dengbêjên radyoyên kurdî ên din weşandiye. Têkiliya we bi wan radyoyan ra çawa bû, an têkiliya we bi wan ra hebû, bi xebatkaran wan ra an bi rêveberiya wan ra?**

Na, bi xebatkaran ra tune bû lê rind tê bîra min, bavê min bi rêya resmî. Radyoya Ermenistanê bi resmî daxwaz dikir ku ji Radyoya Bexdadê ji me re kilamên kurdî bişînin. Wana ji me ra dişand. Radyoya Bexdadê jî bi resmî ji Radyoya Ermenistanê kilaman dixwestin. Ev danû sitendin bi rêya fermî dihate kirin. Li welatê me (Sovyet) te stranên bişanda ciyekî gumrik hebû nedihêşt lê wexta ew mohra Radyoyê lêketa êdî gumrik destûr dida ku dersbas bibe.

### **Hûn dikarin behsa Xana Zazê jî bikin?**

Xana Zazê li Corciyayê (Gurcistan) mezin bû. Ew jî şêx e, niha li Belçîka li bajarê Liège (Liyej) dimîne. Ew jî dengbêjek bû. Wextê bavê min ji bo dengê Şeroyê

Biro çû Gurcistanê. Wextê studyo kirê kiribûn yekser gotibû çî dengbêj henin bînin. Min te re got yek Cemîla Çawiş ew li Gurcistanê li bajarê Têlavê dima. Têlav jî dûrê paytext e. Şebabê Egît jî li Têlavê dima. Xana Zazê û Tûkasa Xemo

### **Çend stranên we di arşîva radyoyê da hene?**

Sê heb kilamên min hene di radyoyê da.

### **Yek jê ya li ser Barzanî ye, lê yê din?**

Wextê ew stran yekî çêkir. Dan Aramê Tîgran wî got ez naxwînim. Got wê bêjin tu ermenî yî lê pesnê rêberê kurdan didî. Stranê dane min, wê çaxê ez 17-18 salî bûm. Komela xwendekarên kurd hebû. Li wê derê grûbek me hebû. Ez dengbêjê grûbê bûm. Stranê dan min vê carê bavê min nehêşt got wê bêjin ew jina xwe li radyoyê ne niha jî kurê xwe anîn. Yê ku kilamê çêkiribû ji bavê min ra got apo ez ê te şikyat bikim ku tu nahêlî Têmûr bistirê. Bavê min jî got here şikyat bike. Ew camêr diçe ba serokê Radyoya Erîvanê şikyat dike, dibêje me kilamek nivîsiye hevalekî me heye em dixwazin ew bistirê lê serokê radyoya kurdî nahêle ji ber ku kurê wî ye. Serokê Radyoya Ermenistanê giş ji bavê min ra telefon kir got Têmûrê Xelîl qey sûcê wî ye ku kurê te ye? Wisa destûr da, min sitra.

### **Kurdan li ser mezinên xelkên din gotine. Sûsika Simo li ser Lenîn gotiye. Aram çima li ser me nego gelo?**

Erê, Lenîn Lenînê me ye îja ew ermenî bû. Aram keda wî gelek e, ew dostekî me ye. her sal dihate mala me jî. Heta mir jî digot eva nanê bavê te ye ez dixwim. Bavê min jî perekî baş dida wî ji ber ku wî sê kar dikir. Yek, distira, yek li cumbuşê dixist yek jî nivî stranên wî helbestên bavê wî bûn. Wî sê pere distandin lê Aram wextê ji Ermenistanê derket êdî azad bû. Çû, Apoçî dest danîne ser wî. Wî li sel Apo çend kilam gotin, pesnê Apo dide. Ez dîroka çûndina wî jî bêjim. Aram Tîgran çara pêşîn bi rêya min çû Awrûpayê. Rêxistinek komkar hebû ya Kemal Burkay wana. Komkar rêxistina herî xwirt bû li Awrûpayê, wana xwest ku Aram here Newrozê îja danûsitandin bi min ra çêkirin. Min kaxiz û vîzeyaya wî çêkir, wextê Aram diçe heqê rêya wî û otela wî didin û xilas. Perekî din nadin. Apoçî têne konserta komkarê, dibên heyran komkar belengazê xwedê ne perê wan tune ye tu were cem me em ê pera bidine te. Aram çû bû dostê wan rastî jî xanî jê ra kirin li Yunanistanê wan deran. Tedî li Diyarbekir jî konservatuar kirine ser navê Aramê Tîgran.

## **Tê gotin ku li Radyoya Erîvanê yekane dengbêja jin ku misilman e Fatma Îsa ye, gelo ev rast e?**

Erê, çend dengbêjên misilman ên din jî hebûn ew zarok bûn. Yek jê qîza Mecîdê Silêman bû Gulîzare Mecîd. Paşê ew grûpek Xelîlê Evdîle hebû. Ew jî zirneçî bû. Wî di daweta min da lêxist. Ew jî misilman e. Êzdiyan digot kuro zirneçîyê wan misilman e, ne êzîdî ye. Rexne dikirin. Gundê Cirabêlê hemû misilman bûn. Li ser mesela misilman û êzdiyan ji te re bêjim. Hin kes dibêjin we rê nedida wan, di radyoyê da hemû xebatkar êzdî bûn yek xebatkar tenê misilman bû. Di *Riya Teze* da yek tenê misilman bû hemû êzîdî bûn. Ez dixwazim vê ji te re zelal bikim. Belkî tema te nîbe lê tu bizanbe. Ya pêşin ji kurdên Ermenistanê ji sedî 80 êzdî bûn, ji sedî 20 misilman bûn, ev yek. Yanî jimara wan hindik bû. Ya dinê ew kesê ku di radyo ya jî rojnama *Riya Teze* da kar bikira gerekî ûniversîtê xelas kiribe û zimanê dewletê bizanibe (bi Ermenîkî). Kurdên misilman li gundên azeriyan diman xwendina wan azerî bû wextê ûniversîtê dixwendin jî yê azeriyan dixwendin li azerbeycanê wan deran. Lewma jî ew nikaribûn di radyo û rojnameyê da bixebitin ji ber ku zimanê dewletê nizanibûn. Yanî zanin jî lê ne bi lîteraturê. Mesela ezdî û misilmanan ev e.

## **Navbera misilmanên kurd û êzdiyan çawa bû?**

Baş bû, Em bira bûn em yek bûn wan salan. Dema ku min di *Riya Teze* da kar dikir dostê min ê herî nêzîk Elîyê Evdirehman bû. Ji bo ku tu bizanibî bo min ferq tune her du keçên min jî misilman sitendin.

## **Di nava kurdên misilman û êzîdî da zewac çêdibû gelo?**

Bi qanûnên êzîdîyan çênabe lê me çêkir. Êzîdî dibên heyran wextê tu misilman î dikare yek ji kalikê te yê heftan, yan ji pîrka pîrka pîrka te mesele dikare ne kurd be. Misilman be bes e. dikare pîrka te 'ecem be ne? kalikê te jî dikare tirk be (durî te). Êzîdî dibêjin wextê kalikê kalikê kalikê te an pîrka pîrka pîrka te ne kurd be tê wê maneyê ku xwûna ereban an tirkan ketiye nav te. Em naxwazin xwûna xwe ya paqij tevlihev bikin. Eger ev qanûn tunebûya me nikaribû xwe weha biparasta. Niha mesele li welatê we tirk ji we re dibên hûn birayê me ne. Em misilman in lê ermenî ji me ra nabêjn dîne me yek e, ferqa me heye ne? Tu yek ermenî nabînî ku bêje were bibe ermenî. Hemû tirk dibêjin were bibe tirk. Dîne me ji wî alî da bêhemdê xwe be

jî em parastine. Dema ku yek ji miletek din ji kurdek re bêje em bira ne tê wê manê ku dibê tu jî tirk î.

### **Gelo Eyşe Şan jî weke dengbêja Radyoya Erîvanê tê qebûlkirin an na?**

Erê tê qebûlkirin. Hemû dengbêjên ku radyoyê qeyd kiriye kilamên wê/wî hatibe qebûlkirin ew dibine dengbêjên Radyoya Erîvanê. Dikare ne milkê me be lê dengbêjên me ne. Bavê min navê wê kir Eyşe Şana Kurd. Ji ber ku me Eyşe Şan wek nav qebûl kir, gotin Kurd jî wek navê bavê wê. Bavê min navê Aramê Tîgran û Krapête Xaço jî kir qalibê kurdî. Navên wan bi fermî Aram Mêlikyan û Karapête Xaçûryan e.

### **Kadrî Yıldırım di pirtûka xwe ya bi navê *Kürt Kadını* da Tara Mamedova jî weke dengbêj qebûl kiriye. Gelo meriv dikare wê jî wek dengbêj qebûl bike?**

Erê, kilamên wê di Radyoya Erîvanê tune ne lê ew dengbêjeke me ya bi nav û deng e. Di van demên dawî da dengbêjeke me ya bi nav û deng Zarra/Zara ye. Te navê wê bihîstiye?

**Na.**

Zara dengbêja Rûsya ya emekdar e. Pûtin navek da wê navê artîsta navdar da wê. Tara Mamedova bi Zara re kar dike. Serketineke malpera me ye ku pê re hevpeyvînekî çêkir. Du malperên me hene malperek bi du zimanî ye. Yek rûsî ye yek jî kurdî ye. Malpera me ya rûsî (ez jî di nav da me) pêra hevpeyvîn kiriye. Eva serketineke pir mezin e ji ber ku artîstên wisa mezin zû zû înterwiew (hevpeyvîn) nakin bi xelkê ra. Îja behsa jîyana xwe, Şivan, Tara Mamedova dike. Tara Mamedova muzîsyen e jî, konservatuar xwendîye.

### **Navê we çima Hamlet e, ev nav ji ku tê?**

Diya min wextê di min da hemle bûye jineke ermenî di kêlekê de derbas dibe bibêje wê kurek te çêbibe, wê zerîn be. Navî deyne Hamlet ku tu daneynî wê bimire. Diya min jî gotiye ev jinik dîn e. Du zarokên min hene reş in. Ez reş im û mêrê min jî reş e. Çima gerekî yekî zerîn be? Wextê ez bûme, zerîn bûme. Diya min tirsiyaye û vî navî danîye.

### **Kengî dawî li çapkirina *Riya Teze* hat?**

Gorî qanûnê, rojnameya *Riya Teze* heta îro jî heye. Ji ber ku biryara girtina *Riya Teze* tune. Lê gorî rastîyê rojnameyeke wisa tune.

**Em dikarin malpera “riya teze” weke berdewama rojnameya *Riya Teze* qebûl bikin?**

Tu eleqê malpera RIATAZA bi rojnameya RYA TEZE ra tune. Wek tu jî dibînî navên wan jî wek erd-esman ji hev dûr in.

**Berpirsiyarên malpera *Riya Teze* kî ne?**

Berpirsiyarê versyona rûsî ya malperê Yurayê Şamil Nabîyev bû, ku berî çend meha wefat bû. Dewsa wî heta niha kes tune. Berpirsiyarê versyona kurdî ya malperê Têmûrê xelîl e. Çiqas zanim, ew heta niha jî sax e

## **Hevpeyvîna Bi Mahmut Beğik Ra**

**08.10.2021**

**Hûn dikarin di derbarê Gula Fileh da agahiyên bidin?**

Di nava dengbêjên jin da ya (ya ku em dizanin) herî kevn Gula fileh e. Gula fileh hemdemê Evdalê Zeynikê ye. Xelkên me yên Serhedê dibêjin ew û Evdalê Zeynikê gelek caran bi hev re ketine lacê. Her yek kilamek dibêje kî kî westande. Gula fileh piştî wefata Evdalê Zeynikê jî dewam dike û dengbêjîya xwe dike. Axir bi qasî ku ez zanim kesê ku paşê Gula Fileh dîtîye Dengbêj Reso ye. Dengbêj Reso wê çaxê neh deh salî ye û ji ber ku di malbata wî da Dengbêjî heye, bi taybetî Apê wî Evdo wana dengbêj in. Reso ji wan hînî Dengbêjîyê bûye. Di cemaeta Gula Fileh da li gundekî Îdirê, navê gund nay bîra min. Gula Fileh li wê derê rûdinê. Reso li wê derê ji Gula Fileh ra kilaman dibêje. Gula Fileh jî dibêje dewam bike. Dibê “ku tu dewam bikî tê bibî dengbêjekî baş.” Xeynî ji wî fileh du qism in: qismekî jê filehên kurd hene, kurdên xirîstiyân û qismekî jî ermenî, xelkên ewropayê, rûs, suryanî, asûrî, kildanî hema ez nizanim Gula Fileh kurmanç e an jî ji miletek din e. Piştî Evdal jî ew demek dewam dike. Qabiliyeteke wê ya zêde heye, bîra wê geleh fireh e. Dikare di cîda ji

ber xwe ve kilaman çêbike, dikare kilaman bêje. Yek lihember wê dema ku kilam digot dikare bavêje berê û lihember hev kilman bêjin. Jê ra dibêjin lac.

### **Kilamên Gula Fileh ên wê bi xwe ku gihîştine roja me hene?**

Kilamê wê hene. Ger hûn li arşîvê binihêrin (arşîva dengbêjîyê) wê û Evdalê Zeynikê çawa avêtine berhev. Mesela yek ew dibêje yek yê din. Tu dikarî ji Ahmet Aras jî feyde bibînî. Ahmet Aras kesên ku Evdalê Zeynikê dîtine dîtiye û lêkolînek baş jî kiriye.

### **Hûn dikarin di derbarê dengbêjên jin da agahiyan bidin?**

Em dikarin jinên dengbêj bikin sê qisim: qismekî jê yên Radyoya Erîvanê ne, qismekî jê yên Radyoya Bexdayê ne û hene ên ku li Bakûrê Kurdistanê dengbêjîyê kirine û paşê çûne li Bexdayê jî kilaman gotine. Di nava dengbêjên jin ên vê derê da mesela yek jê Nesrîn Şêrwan e ku bi xwe ji şîrnexê ye. Xelka şîrnexê ye. Malbata wê paşê koç dike û diçe Bexdayê li wê derê bi cih dibin. Nesrîn Şêrwan jî dibe dengbêjeka Radyoya Bexdayê. Dengê wê yê gelek xweş heye. Ew dikare dengê xwe bikar bîne. Bi taybetî ew xulxulandina dengê wê tiştêkî din e. Nefesa wê (oktav) heta tu bêjî dirêj e. Wê li Radyoya Bexdayê bi gelek kesan ra kilaman gotiye. Mesela bêtir dikarim bêjim bi Îsa Berwarî ra. Ew dibêje û Îsa dibêje. Ne tenê li cihekî ye. Li Başûrê Kurdistanê ew cihên ku lê digerin li gelek cihan evana kilaman gotine. Bigre heta aliyê balekatî, aliyê eşîra biradostan, aliyê Xelîfan û Qendîlê wan deran kilam gotine.

Ji bilî Nesrîn Şêrwan Meryem Xan heye. Ew û Nesrîn Şêrwan eqrabayên hev in. Meryem Xan jî koçî Bexdayê kiriye. Berê li otêlekê dişixwulî. Belkî tu ji Zeyneb (Zeyneb Yaş) bipirsi ew dikaribe zêdetir agahiyan di derheqê jîyana wê da bide. Bes ez tiştêkê zanim. Sekreterê Şêx Seîdê Pîran rehmetî Fehmî Bîlal hebû jê ra digotin Fehmî Fîrat. Min bi xwe wî dît wextê ku min wî dît ez zarok bûm. Rojekî bi awayekî ew diçe Bexdayê li wê derê Nesrîn Şêrwan dibîne, wê dibe diçe radyoya Bexdayê û li wê derê wê bicih dike. (Meryem Xan bi cih dike) Meryem Xan di temenekî gênc da dimire. Dengê wê yê gelek baş heye. Ez zanim gelek caran li Şamê kilaman gotiye. Ew giregirên şamê wextê kurekî Mîr Celadet Bedirxan çêdibe (navê wî Cemşîd e.) sal 1939 e. Di bûyîna wî da mala Elî Zilfo wana, zaroyên beraziyan mala Mistefa Şahîn wana dibêjin em ê pîrozbahîkî li vir li dar bixin û gazî dengbêjan

bikin. Di wê rojê da Meryem Xan ji ber ku li şamê ye ew jî diçe civata wan li wê derê Meryem Xan ji wan ra kilaman dibêje. Ewil kurek ji Mîr Celadet ra çêdibe ew dimire paşê keça wî Sînemxan dûre jî Dr. Cemşîd çêdibe.

Rola Elmas Xan, Ew bi xwe li Bexdayê ye. dibêjin ku li wê derê bi dewlemendekî Îngilîz ra zawicandî bûye û îmkanên wê yê maddî jî gelek baş bûne. Kîjan dengbêj wê çaxê çûbe Bexdayê mitleq li mala Elmas Xan maye. Elmas Xan bi xwe dengbêj e. kilamên wê yê diqolî hene. Mesela ew dibêje û nesrîn dibêje, ew dibêje Meryem Xan dibêje. Carna meriv dengan ji hev dernaxe (tevlîhev dike, bi hev re an jî li dû hev dibêjin). Ku tu ji Zeyneb bipirsî wê ji te re meseleyê bibêje. Ji ber ku ew baş li serê şixwuliye.

Di nava kurmancan da Elmas Xan û di nava kurdên me yê jêrîn yanî ên soran ku em dibêjin, Elî Merdan van însanan du kes in ku pir in di navbera dengbêjên kurmanc û soran da. Behsa Radyoya Bexdayê dikim. Ji bilî wî Eyşe Şan dengbêja Diyarbekir e. paşê çûye Entabê li wê derê jî dengbêjî kiriye. Wê li her cihê ku çûye dengbêjî kiriye. Min bi xwe jî wê dît. Salekî hatibû Farqînê wê çaxê me li Farqînê dixwende. Hatibû konser dida. Wê çaxê ez zarok bûm, Eyşe Şan jineka bedew bû, dengê wê jî xweş bû.

### **Malbata Eyşe Şan nedihêste ku were welêt. Ew çawa karibûye ku were Farqînê û konser bide?**

Malbata wê, wê red kiribû. Ji ber ku wê dengbêjîyê kiriye gotine têkiliya me bi hev re tune ye. Ji xwe ji ber wî ye ew zewaca xwe diqedîne. Keçekî wê heye. Bi yekî dêrikî re, navê wî Şewket Turan e. Ew zewaca wan naçe serî û ji hev diqetin. Eger ji ber dengbêjîyê be eger ji ber sedemên din be ne dîyar e. Hinek dibêjin gotiye tê dengbêjîyê nekî. Ez di vê meselê da ne emîn im. Rast e an na nizamim. Bes li hev nakin û Eyşe Şan diçe Entabê. Wê çaxê di radyoya Entabê da bernameyan çêdike lê di nav kurdên wê derê da (Bakûr) ê ku cara ewel plak çêkiriye Mehmed Qizil e. Wî bi xwe ji min ra got min bi kurmancî plak dagirt. Got wê çaxê Eyşe Şan ji min ra got “ji ber ku te bi kurmanî plak dagirt vana tiştêkî neynin serê te, te wenda nekin tu bi kurmancî dibêjî? Got “min got, çi dibe bila bibe ez ê bi kurmancî bêjim.” Mehmed Qizil digot “Eyşe Şan ji min cesaretê sitende û wê jî di pey min da dest pê kir plakên kurmancî tijî kir.” Bilaxare çûndina Eyşe Şan ya Radyoya Bexdayê heye. Çûye li wê kilaman gotiye. Li wir pêşwazîkî baş lê kirine, wê li Kurdistanê gerandine.

Wê li gelek cihan konseran daye. Ew jinên ku li wê têne bîra min, min wê dît yek jê Dengbêj Gulbihar hebû lê wê çaxê extiyar bû. Kilama Kewa Gozel ew dibêje. Ez dibêm qey beste ya wê ye, gotin ne ên wê ne. Dengbêjên jin ên Radyoya Bexdayê têne bîra min ev in.

### **Mamoste hûn dikarin behsa dengbêjên Radyoya Erîvanê bikin?**

Di dema Radyoya Erîvanê da dewleta Sowyet Sosyalist weke perdeyekî di navbera wan û welatên din da hebû. Çûn û hatin wê çaxê ne mumkun bû. Min bi xwe jî guhê xwe di dengbêjîyê da bi Radyoya Erîvanê vekir. Sala 1963 bû. Wê çaxê ez zarok bûm. Her piştî nivro saet çarê êvarê Radyoya Erîvanê dest bi weşana xwe dikir. Em xwuşk û bira tev eger mêvanên me yê nêz hebûna û bavê min ne li malê bûya (ku bavê min li malê bûya radyo jê ra bû) em li dora radyoyê dicivyan me li Radyoya Erîvanê guhdar dikir. Dengê wan ê balkêş pirî cara bi “Welatê Me Kurdistan e” vedikirin. Aslîka Qadir digote. Ew niha jî li heyatê ye. Gênc bû. Hê jî ew sekna wê rabûn û rûniştandina wê bi kurdewarî ye. Mêjîyê wê jî bi kurdewarî ye. Gelek kilamên wê hene. Yek jê “Şerê Newala Qeremûsê” dibêje. Qeremûsa Farqînê, bes ne şerê pismamên mala Elîyê Ênis e. Zadîna Şakir ez dibêm qey li heyatê ye tu karî pêra têkilî deynî. Ez wê pir nas nakim. Sûsika Simo ji dengbêjên ewilî ye. Ji ber ku emrê wê jî ji temaman mezintir e. Wek 1927 bûyîna wê tu qebûl bikî. Bêtir ew li alîyê Gumrîyê wana dima lê dihat Radyoya Erîvanê li wê derê kilaman digot. Di nav dengbêjên Radyoya Erîvanê jina herî bi nav û deng Fatma Îsa ye. Xesûwa wê ji der û dora Makûyê ye. Kurdistana Îranê (Rojhilat). Ew ji xesûwa xwe hînî kilama “Miho” dibê û bi wê kilamê bi nav û deng bû. Wextê ku ez li televizyona Kurd 1ê bûm min û Zeyneb Yaş bi hev ra me şazdeh bername çêkir. Heşt bernameyan min û Mêdî (Mêdî Mutlu) me bi hev ra meşand û paşê ên din kî hat min bi xwe bi wan ra meşand. Xesowa Fatma Îsa, teqrîben sala 1910 wan dera da hê qîz e, li mala bavê xwe ye. Vana li zozana ne. Mêvanên kurê apê wê tèn. Kurê apê xesowa Fatma Îsa dişîne pey wê dibên bira were xizmeta wan bike. Xesowa wê dibê ez ketim hundirê kon, min dît keç û xort hene. Ez dageriyam. Navê kurapê wê jî ne şaş bim Mihemed e. Dibê were kesekî xerîb tune. Were ez mêvanên xwe bi te bidim nasandin. Dibê mêvanên min zarokên Miho ne. Zarokên wî û jina wî Têliya Rihanê ne. Di nava kurdan da destan hene ku du însan evîndarên hev in lê negihîştine hev ama du destanên mezin hene ku evîndar gihîştine hev. Yek jê *Cembelî Kurê Mîrê Hekariyan û Binevşa Narîn* e ku aşiqê hev bûne û gihîştine hev. Yek jê jî *Miho û Têliyê* ne. Têliya Rihanê.

### **Strana Miho û Têlîyê di nava gel da weke destan jî navdar e?**

Erê, navdar e. Wextê ku aniha tu behsa Fatma Îsa dikî tenê strana *Miho* tê bîra meriv. Wan stranên din yek hebki jî nayên bîra meriv.

### **Lê weke çîrok jî hatiye gotin?**

Na, nehatiye gotin ji ber ku lêkolînerên me li serê lêkolînê nakin. Bes min û kurkedî me yê Îranî ku ji Makuyê ye min vê pirsra ha jê kir. Got ez nizanim paşê kete pey meselê dibê çûme heta goma jorîn, goma miyanê. Çû heta cîyê ku Miho lê dima û heywanên xwe derdixist zozanan. Heta fotografê wan jî jim ra kişande û şande. Bes di kompîtura min çûn. Li vê derê em tenê yek versiyonekî Miho dizanin. Ew jî ya ku Fatma Îsa dibêje ye. Bes Memoyê Silo dibêje bi navê Were Têlîyê versiyonekî dinê jî dibêje

### **Strana Têlî ya ku navdar e ev ne ew e?**

Na, ew Têliya piyasê “Were Têlî” na. Ev jî “*Were Têlî*” ye, bes “Were Têliya Rihanê” ye. Ya Têliya jina Miho bûye. Di stranê da nabê Têliya Rihanê, bes dibê were Têlî lê kes nizane ku Têliya Rihanê ye. Min hin gotinên di kilamê da fêhm nekir û ji hevalê xwe Pirîskê Mihoyî ra şande. Min got ev kurmanciya alîyê we ye, tu dikarî ji hev derxî? Wî ji hev derxist û pirsî ku ev çi ye. Min got ev versiyona strana Miho ye. Ew termên di nava strana Miho û strana “Were Têlîyê” eynî term in. Yanî “çûme goma jorîn” ew behsa wê derê heye. Behsa Guhera Şêx Resûl dike li wê derê. Ev strana “Were Têlî” ji devê Miho hatiye gotin û strana “Miho” jî ji devê Têlîyê hatiye gotin. Ev du stranên ayri ayri ne. Balkêş e bavê Têliya Rihanê însanekî xweşhal bûye. Têliya Rihanê bi xwe dengbêj e. Têliya Rihanê her roja îne ji der û dorê wan ra, ji dora Makuyê çiyayê alîyê Rojhilatê Kurdistanê. Dengbêj tên guhdarvan tên li wê derê, li bin konê mala bavê Têliya Rihanê dicivin û kilaman dibêjin. Têlî jî yek ji wan e ku kilaman li serê cemeetê dibêje. Ew bi xwe jî dengbêj e. Tabî dengê wê (yê tomarkirî) tune ye. Ev kilam (Miho) ji dengê wê ye. Xesowa Fatma Îsa kilamê ji dengê wê (Têliya Rihanê) guhdarî kiriye. Rojekî lê dinêre di nav xortên binê kon da çavê wê bi Miho dikeve. Ew û Miho li wê derê aşiqê hev dibin. Evîya hanê dewam dike, belav dibe. Bes tiştêkî heye tu rojekî Miho yan jî malbata Miho naçe Têliya Rihanê ji bavê wê naxwaze. Miho dizewice, sê çar heb zarokên wî ji jina wî ya ewel çêdibin, Têlî hê li mala bavê xwe ye. Di nava kurdan da ehlaqekî

weha heye, kurdên ku xwe zana ne, mesela ji jin û mêran çend kes digîjine hev û radibin diçine ba bavê Têliya Rihanê. Dibêjin her kes dizane ku ew aşiqê hev in û tu çima qîzê nadiyê. Bavê wê dibê nehatiye ji min nexwestiye heta ku ez bidimêkê. Li wê derê Têliya Rihanê dixwazin. Ew xesowa Fatma Îsa bû ku li wê derê, li mala kurê apê xwe wan zarokên ku dîtiye zaroyên Têliya Rihanê bûne. Leqabek wî heye, jêra dibêjin Mihemedê heft gurçik an tiştêk wisa. Li derdora Makuyê li Kurdistana Îranê nêzî şeş heft versiyonên strana Miho hene. Ew hê negihîştîye cem min. Karê me çi ye? Karê me lêkolîn e. Lêkolîn û derxistina wan e tevî çîroka wan. Wê kurdên Îranê derxin. Mesela ku ew hevalê me ye wê derê ji min ra bişînin ez ê wan çavkanî nîşan bidim lê belkî ew jî dixwaze ji xwe re xebatekî bike. Ez nikarim bêjim tu çima nadî. Ez bawer im wê bi awayekî derxin. Min ji wan ra got li vê derê çi alîkarî ji destê min were ez ê bikim. Di çapa pirtûkê da û li ser kovarên çapikrî û yên dijital ku hûn bixwazin ez dikarim alîkariya we bikim lê hê dengêkî ji wan derneketiye.

Îja Radyoya Erîvanê di sala 1955an da testa wan dest pê dike. Di 1957an da dest bi weşanê dikin. Weşana wan li dora 15 deqeyan e. Sal 1957 Mele Mistefa Barzanî wê çaxê li Moskovayê ye. Barzanî tê li Ermenistanê di nava kurdan da li gundê Heko dibe mêvan. Temamî giregirên kurdên me yên wê derê ên misilman û êzîdî li wê derê ne. Mele Mistefa ji wan dipirise dibê daxwaziya we çi ye? Mele Mistefa bi Birejnev ra, bi Kruşçev ra yani bi mezinên Rusyayê ra dayîn û siteninên wî çêbûne. Vana yek daxwazeke wan ew e: dibên radyoya me 15 deqe ye. Ev têra me nake û tenê kurdên der û dora Erîvanê dikarin lê gohdarî bikin. Dibên dikarî wextê wê zêde bikî û bikî satelayt ji bo ku her der karibe lê gohdarî bike. Mele Mistefa diçe ba mezinên Ermenistanê, ba serokê dewleta wan. Li wê derê tev nav û dengê wî dizanin. Wî di wextê da, di salên 1920-1930an da jî ermeniyên pir parastîye, keldanîyan pir parastîye, asûrîyan pir parastîye. Mele Mistefa jî Şêx Ahmedê birayê wî jî wan pir parastine. Mele Mistefa Barzanî genelkurmayê Mahabadê ye. Li wê derê pêşmerge ye. Jê ra dibêjin tê çi vexwî, tu qehweyek venaxwî? Ew dibê “ez qehweya we venaxwum” dibêjin “çima?” Dibê “ez ê soz ji we bistînim tiştê ku ez ji we bixwazim hûn ê bînin cih, ser çava ez ê qehweya we vexwum” û daxwaza gundîyên Heko ji wan ra dibêje. Dibê weşana radyoyê bikin satelayt, (em dibên esmanî) û muddê wî jî dirêj bikin. Ez dibê qey Mele Mistefa dema weşana radyoyê ji wan ra derxste 45 deqe û kirin esmanî (uydu). Êdî piştî wê çaxê bi taybetî 1963 heta vê paşîyê kurdekî Efrînê jî karibû guhdar bikira, kurdekî Bexdayê jî, kurdekî Sêwasê û yekî Qersê jî

karibû guhdarî bike. Me karibû dengê kesên weke Karapêtê Xaço, Şeroyê Biro, Egîdê Têcir, Aslıka Qadir, Sûsika Simo ji Radyoya Erîvanê bibihîsta. Di sala 1963 ez zarok bûm tê bîra min. Di wir da strana Aslıka Qadir ya bi navê “Welatê Me Kurdistan e” ji wê derê tê bîra min. Li ser Fatma Îsa dibêjim, rojekî ez li derê çîyê birêda diçûm. Li wir studyo hebûn, plakên xwe datanîn, ên ku li ser dijitalê datanîn, her yekê dengê jê didane derva. Ji min ra du kilamên balkêş hene di nava temamî kilaman da. Sed dengbêj bi hev ra jî bêjin ez dikarim li du kilaman godarî bikim û ji hevdû derxim. Yek jê kilama “Miho” ye û yek jê jî kilama “Derwêşê Evdî” ye. Versiyana ku Delîl Dilanar dibêje. Versiyon gelek in. Ez û hevaleyê xwe rojek di wir da derbas dibûn (Derê Çîyê). Got “deng tê te?” min got “belê, dengê Fatma Îsa tê min û ew kilama “Miho” dibêje.” Dîsa rojekî bi wî hevalî ra em diçûn got “deng tê te?” Min got dengê Delîl tê min, ew “Derwêşê Evdî” dibêje. Di nav wê qerebalixê da min dengê wan ji hev derxiste. Fatma Îsa dengê balkêş e. Vê paşîyê tabî extiyar bûbû êdî nikaribû bigota û mixabin di jîyana xwe da jî zarokên wê çênebûn. Wê ji bo zarokan mêrê xwe da zewicandin. Heta Fatma Îsa jî mir zarokên hewîyê jê ra digotin dayê. Ew li wan xwedî derdiket. Mesela xwişka wê li Elma Atayê jinxala hevaleyê min e. Wê digot carna dihat cem me, me wê dibir dixtor. Beriya 2010an. Digot “me digot piçek li ba me bimîne, bîna te dertê lê Fatma Îsa digot: “na zarokên min li wê derê ne. Ez ê herim cem zarokên xwe.” Di wê meselê d jibîr neke Letîfê Birûkî hevpeyvînek pê ra bi rûsî kiriye lê ew hevpeyvîn bû kurmancî û tirkî jî. Tosinê Reşîd baş tê bîra min wê çaxê li Hewlêrê bû. Min amadekarîyê dikir ji bo ku li ser Fatma Îsa bername çêbikin ji ber ku wefat kiribû. Sal 2010 bû. Di wir da dîsa Tosinê Reşîd bi vê gotinê dest pê kir: Got xeberek ne bi xêrê me bihîst û behsa wefata Fatma Îsa kir. Tu wî jî bibînê tê ji devê Tosinê Reşîd bibihîzî.

**Hin kes jinan tenê weke stranbêj qebûl dikin. Ji ber ku jinan di dîwanan da cih negirtine wan weke dengbêj qebûl nakin. Hûn li ser nîqaşa dengbêjîya jinan çi difikirin?**

Li ser wê meseleyê gelek munaqêşe hene. Bi min dengbêj ew kes e ku hem stranên xelkê dibêje hem bi xwe jî stranên çêdike. Bi min di dengbêjîyê da ast hene. Ên ku kilamên kesên din dibêjin. Ev astekî ye, ev bi xwe jî jê ra bîrekî lazim e û me’rîfetek, hunerek jê ra lazim e. Ên ku bi xwe stranên çêdikin, hene destanan dibêjin çûnkî destan bavê helbest û pexşanê ye, bavê romanê ye. Di nava destanê da mîtolojî heye. Li “Memê Alan” binêre têda mîtolojî heye, gotin heye, behsa bûyerê dike. Bi bûyerê

ra jî tu dibînî kilamê dike navê. Dibê Zînê weha got Memê weha got. Dengbêjîya ku gihîşt asta destanbêjîyê û beytbêjî jî di nav da, mesela beytên hazir hene, ên Melayê Cizîrî, ên Feqiyê Teyran... Wextê tu gihîştî wê aste maneya wê ew e ku tu li asta herî jor î. Ev taybetmendî di her dengbêjî da tune ye. Mesela yek jê yê ku gihîştiye wê astê Reso ye. Dîsa ev taybetmendî di Şakiro da heye. Ji xwe Evdal û Gula Fileh em behsa wan nakin, ew jî di wê astê da ne. Mesela Laso heye. Navê wî tune ye. Rojekî min û Tosinê Reşîd li ser wê meselê me sohbet kir. Tosinê Reşîd behsa dengbêj Laso dike ku ew dengbêjê Mîr Bedirxan bûye, 1821. Laso bi xwe kurdekî êzîdî ye. Ji ber ku bi kurdî dibêje dewleta osmanî wextê ku davên ser Mîr Bedirxan zimanê wî jêdikin. Ew meşhûr e, bes eserên wî tunene. Şêx Silê ji ber ku mêr bû min behs nekir. Ew dengbêjê dîwana qelenîyê ye, yanî Heyderî yê me yê Rojhilat e. Ne yê vî alî ye, yê wî alî ye. Dengbêjî berê bi mîrgehên hebû mesela bîst û heşt mîrgehên mezin ên kurdan hene. Mîrê Botan ê herî mezin e. Mîrê Miksê (Bahçesaray) heye. Mîr Nurullahê Hekarî vana mîrên herî mezin in. Ê ku dengbêjan û stranbêjan diparastin. Çanda kurdî bi wan li piya bû ama piştî ew ji ortê rabûn îja muessesê şêxîtiyê, bi taybetî nexşîbendîti piştî 1980 dikeve şûnda mîrgehên. Di îslamiyetê da tu zanî şîroveyan cuda hene. Mesela hene dibên def heram e, zirne heram e, saz heram e lê elbane dibên hûn dikarin lêbixin. Hin hene dibên elbane û bilûr heram nînin, wê îcazetê didin. Tesîra wê di nav xelkê da pir e. Di nav xelkên êzîdî da sebebê ku jinên wan jî rihet in, ên filehan ji ber ku di dînê xwe da di wî awayî da jî rihet in karê wan hêsantir e. Ên me (misilman) dibejin gerek dengê jinê ney te. Ê tu kurê wê jinê yî çima dengê wê ney te? Yanî di mesela helalî û heramîyê da esas kes tiştêkî wisa nabêje. Bes alimên çend sal berê hê jî wê munaqeseyê dikirin. Te dî dikare bi jinên xelkê ra rûnê, sohbet bike lê jina xwe piştperde dike, wê vedişêre. Yanî tesîra îslamiyetê heye. Bes li alîyê Serhedê ev dengbêjî wek edetekî ye. Mesela beriya ku van saz mazan derkevin dawetekî çêbibûya illah dengbêjekî, du an sisê dibirin diçûn daweta xwe. Di dîwanê da îlla digotin. Tu zanî her dengbêj kilamên govendê baş dizane. Ji xwe pirê jê ji wê derê dest pê dike. Fatma Îsa yek ji wana ye. Ew kilamên govendê baş dizane. Aslîka Qadir jî wisa ye lê repertuara wê weke ya Fatma Îsa fereh nîne. Mesela dawetên ku ez çûmê jin ji xwe re li alîkî govend digirin, mêr li alîkî digirin. Bes tu lê dinêrî di nav jinan da ên ku kilaman dibêjin pir in. Ev yek li her derê heye ama derketina wan ya ser sehnê ew kêr in. Herkes îzin nade.

## **Hevpeyvîna bi Zeyneb Yaş ra**

**18.10.2021**

### **Hûn dikarin behsa çanda dengbêjîyê û têkiliya wê bi jinê ra bikin?**

Ez wisa difikirim ku têgeha dengbêjîyê ne di cihê xwe de tê bikaranîn. Avabûna wê, peyde bûna wê û bikaranîna wê û şiklê ku îro em bikar tînin. Ev şiklê ku em bikar tînin hinkî şiklê lihevanînê ye bi raya min. Bi raya min dengbêjî di nava civatê de rol modeleke hunera populer e. Yanî çawa populer e, mesela di hunera populer de tiştêk weha çêdibe (eger ku em wek dengbêjîyê lê binihêrin) çîrok, serpêhatî, kilam, stran her çi be naveroka wê gava ku peyda dibe gelek caran dengbêj vê ji civatê digire. Li ser bûyerekî, li ser qewimandinekî, li ser hestekî, li ser hezkirinekî dengbêj ji demê de di nav wê atmosferê de ava dike, çêdike û hunera wê dike. Yanî di warê hunerî da dengbêjî qadeke gelekî pêşketî ye. Bêtir jî mêrane ye. Ji ber ku gava behsa dîwana dengbêjîyê tê kirin zêdetir dîwana mêran tê bîra mirov. Dîwana jinan nay bîra mirov. Di asta dudowa de eger em bêjin behsa şevbêrkên kurdistanê tete kirin wê çaxê jî ku der tê bîra mirov? Odeyên kurdan tèn bîra mirov yanî du sê ewkê wê hene. Yanî ode hene tede şahî hene, an jî dîwanên mîr, beg, axa û malmezinan dîwanên wan hene. Yanî di van her sêkan da jî em dibînin dengbêjan rola xwe û mîsyona xwe zêdetir mêrane listine. Yanî ne wek yê jinan e. Ev tiştêkî din e. Em dikarin belkî wisa binav bikin. yanî ji wê gelek caran ew jinên ku em bêjin xwestine bibin dengbêj an jî dengbêjîyê bikin di rol modela mêranî da tevgeriyane. Mêran berhem ji wan girtine ama ewa rol model wek mêr danîne pêşîya xwe. Mesela gava ku di civatê de.... Di dîrokê de jinên ku karibûn li dîwanekî rûnên û kilambêjîyê bikin ewa dîsa nikaribûye diwanê bigerînin. Wan bi xwe an alikarê dengbêjan bûne an destpêkirina dengbêjîyê, kilaman ji wan dest pê kiriye. Bêtir dîwan bi wî hawî tevgeriyaye. Ji ber ku jinê rûniştîye li dîwanê strankî bêje deh heb

zarok li dû wê de digirîn. Ew divê xwarinê bîne, ew divê avê bîne, malê û mêvanan hilîne û deyne. Rol modela jinê em nikarin di vir de bêjin karibûye wek dengbêjekî dîwanekî bigerîne. Ji ber ku ew dîwan şiklê wê an jî sazûmaniya wê ne li gor jîyana jinekî ye, ne li gorî jinbûnê ye. Asas di vir de jî gere mirov ewilî rola jina kurd di civatê de bibîne. Mesela eger nikaribe dîwanekî bigerîne gelo rol modela wê kêma e? Na. Gelo jinê di rol modela hunerî de kar nekiriye? Belê, gelek kar kiriye. Çi kirine? Stran afirandine. Ew dahênanê afirandina stranê bi xwe ne, ên kilamê bi xwe ne, ên çîrokê bi xwe ne, ên serpêhatîyê bi xwe ne. Yanî eger em weha binav bikin jîyan çawa dest pê dike? Bi zewacê dest pê dike. Pê re çi ye du însan tên ba hev û din, zewacekî pêk tînin. Em dizanin di çanda patriyalkî de jin ji cîkî dî tê ba mêr. Yanî cihe xwe vediguhezîne. Cihekî dihêle û tê cihek din. Gava tê malbatekî li pişt xwe dihêle an jî warekî, welatekî, şûnwarekî li pişt xwe dihêle. Çandekî, zimanekî li pişt xwe dihêle û tê. Gava tê an tevlî dibe an entegre dibe an jî bi xwe sentezek nû çêdike û tiştêkî nû ava dike lê pê re çi dike? Mesela zarokan tîne, zarokan xwedî dike, wan perwerde dike, îşê malê dike, malê digerîne. Gava wê zarokê perwerde dike mamostetîye jê re dike. Wî/wê fêrî çandêke din dike. Ji ber wê em di hemû merhaleyan de dibînin jin bi xwe re gelek tiştan diafirînin. Mesela gava ku zaroka xwe radizîne pêra stran û kilaman dibêje, gava ku şahiyek tê gerandin heta zewacê di çend merhaleyan de derbas dibin. Jin aktîf rol modeleke wê heye wek çîrokbêjekî, wek keseka ku ramana jîyanê dikare veguhezîne însanekî. Heger dengbêjek karibe bibe dengbêj.... Min 110 hunermend di du cildên Şakar (*Şakarên Muzîka Kurdî*) de nivîsîne. Ez dikarim bêjim ji sedî heştê yê wan rol modela wan dêya wan bûne. Di vir de erê jin ne dengbêjên ku em bêjin civata ne. Em ê vê veqetînin ji dengbêjîya ku jin bi xwe diafirîne, peyda dike.... Em ê yekî ji yekî kêmtir an zêdetir nebînin lê karê hunerî dengbêjan kiriye ama bingeh û esasê wê jin e lê belê jinan jî ew tiştê ku jinan kirî mixabin di nav civatê de nehatiye naskirin, nehatiye biqîmetkirin. Ji ber wê yekê navek lê nehatiye kirin. statuyek wan tune bûye. Berê statuya dengbêjan jî tune bûye. Yê ku em pê zanin. Yek jê yê ku min li vir daniye Uzêrê Mico ye. (agahîyên di derbarê wîda di antolojiya Hilmî Akyolda di cilda 3an da ye. Weşanên şaredariya Amedê. r. 9-15) Ew yek ji dengbêjê malbata Bedirxaniyan e. Em li jîyana wî dinêrin 1776. Yê herî kevn ev e. Em dizanin ku wek dengbêjê malbata Bedirxaniyan kar kiriye. Lê di vir de em dikarin tişkî din bibînin ev wek hunermendekî ji xwe di nav malbatê de xwedî rol û mîsyon bûye wek karkerekî jî di nav malbatê de bûye. Tim bi wan ra bûye heta bi wan re hatiye kuştin. Ew dengbêjîya ku rol modela wan bûye

mêrane bêhtirê wê ji odeyan heta ber bi dîwana ye. Lê dengbêjîya şûnve em dikarin bêjin belkî gelek caran jin û mêran jî di malbatê de bi hev û din re kilam gotine, stran gotine. Ev modeleke dî ye. Modela herî arkaîk jî eger ku em bêjin destpêk e ku ew jin di jîyanê de bi xwe re berhemê diafirîne. Em dikarin vê wisa binav bikin. em dikarin terminolojiyek çawa li wan bikin? Ji ber ku navekî tenê tune ye, navekî dengbêjan tenê jî tune ye. Gelek navên wan hene. Delêl heye, dîwane heye, xuwêj heye. Bi dehan navên wan hene.

### **Lê zarbêj?**

Zarbêj tişteke dî ye, zarbêj mekteba ku dengbêj jê mezûn bûne. Zarbêj ew tişt e ku têkiliya wê zêdetir di civatê de ye. Eynî ew jinên ku rol modela wan min behsa wan ji te re kir ew jin afrînerê vê berhemê, vê hunerê û vê rêbazê ne. Wan bi xwe re ... Gerekî em heqê wan bidin wan. Yanî em nebêjin jin an mêt. Di vir de mesele afirandina vê berhemê ye. Lê belê hunerîkirina wê berhemê... Asas dengbêjan wan berheman ji zarbêjan wergirtine û kirine anonîm. Yanî kirine milkê civatê û hunera wê kirine. Yanî mêt tabî bê guman ne weke jinê lê em nikarin bêjin van dengbêjan tenê ev kar kirine. Gelek caran dengbêj hebûne jîyana xwe li ser berdewam kirine, nanê xwe pê xwarine. Dengbêj ne wek hunermendên aniha biçûna konseran û wekî din. An xwe bidana derdora yekê maldar, yekê oldar, axa beg û mîr. Welhasil ew jî nanê xwe dixwar û mineta kesî jî nedikişand. Dibû moral degerên em bêjin wê deverê. Moral degerên wê deverê dihêşt ku ew kesên ku wî xwedan dikir biqîmet bibe. Yanî mesela dengbêjê kîjan dîwanê hebûya ew kes bêtir biqîmet dihate naskirin. Digotin demekî ev mirovekî xweragir e. Dengbêjê wî heye, stranbêjê wî heye, çîrokbêjê wî heye. Bi vî awayî dîwana wî çêdibe. (moral di maneya kêf û şahî û motivasyonê da). Eger em wisa lê binêrin em ê çêtir ji vê meselê fêm bikin.

Zarbêj yek ji wan kesa ye ku çîrok ji zarokên xwe re dibêjin, yek ji wan kesa ye ku serpêhatiya jîyanê her daîm vediguhezînin civatê. Yanî serpêhatiya jîyanê, çanda devkî, dîroka devkî, perwerdekirina zarokan ... Ji ebetiyê bigire heta ku xwedîkirina mal û terş û talan, îdara malê û hemû tiştê heyî vediguhezînin ku tê de kevneşopî hebe yanî weke mîras. Berê ji pêşîyên xwe girtibe li ser wê berdewam dike û vediguhezîne. Di folklorê de ew kesên ku vî karî dikin em bi giştî ji wan re dibêjin zarbêj. Yê ku têkildarê muzîkê ne jî navekî wan tune ye lê belê ez bi xwe dibînim ku hîna jî di wê rol modelê da peyva herî nêz zarbêjî xwiya dike. Ji ber wê jî min

wekî zarbêjî ji hev û din veqetandine. Ew kî ne mesela? Dîsa ew jinên me yên mala ne ku bi stranên xwe zarokan xwedî kirine, mezin kirine, ku bûne îlhama kilam û stran û çîrok û serpêhatî û hemû qewimandinên çanda devkî em bêjin zargotinê vediguhezînin. Dengbêjan, stranbêjan û hemû civatê tevde weke bingeheke em wan wisa qebûl dikin.

**Di pirtûka Abîdîn Pariltî da dersbas dibe dibêje dema êzîdîyan çanda pederşahî zêde tunebû, jin û mêran bi hev re digotin an jin li gor serdemên îslamiyê serbesttir bûn. Statuya jin û mêran ji hev cuda nîne.**

Baş e, ez meraq dikim çima behsa statuya însanan nake di wir de? Ma ne ji xwe ew bi xwe pênc tebeqe ne. Mîrê wan, şêxê wan, qewalê wan heta tê rênçberê wan. Çima behsa wan tebeqeyan nake? Jin û mîr li ku derê bi hev û din re dibêjin?

Dema ku mirov tiştek dinivîse fotorafek di hişê însanan da çêdike, nêzîkbûnîyek jinê, nêzîkbûyînek zilam, nêzîkbûnîyek civatê. Mesela an em yekê pir mezin dikin an pir xerab dikin. An em kêm dibînin an... Em carna ferq nakin ku me çawa wan di wî şiklî da dîtiye. Em bêjin wek Meyrem Xan, Nesrîn Şêrwan û Eyşe Şan ev dengbêjên me yên di dema dawî da hatine naskirin yanî tenê em li wan mane asê. Baş e em ê behsa van jinan nekin? Gerek em behsa vana bikin esas.

Qey êzîdî her û her di konan da jîyane? Êzîdîtî şaristaniyek herî dewlemend e ku li vî welatî desthilatdar bûne. Ma kurd berê çi bûn, ma kurd berê ne êzîdî bûn? Dema Merwaniyan berî hezar salan dike hema bêje. Di 1400 wan de ye...

**Gelo di derbarê avakarê strana “Welatê Me Kurdistan e” da ahagîyên we hene?**

Gotin: Enwer Mayî. Awaz û strandina pêşî: Fexrî Bamernî ye. Mîn (vê agahîyê ) bixwe ji ser zarê Ehmed Zero, Xalid Amêdî, Sefkan Evdilhekîm, Semîr Zaxoyî berhev kir



T.C.  
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

İNTİHAL RAPORU FORMU

Doküman No	M2.RPR.003
Yayın Tarihi	01/01/2022
Revizyon No	00
Revizyon Tarihi	
Sayfa No	1 / 1

Tez Başlığı:

## DENGBÊJÊN JIN YÊN RADYOYA ERÎVANÊ

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarından oluşan toplam 136 sayfalık kısmına ilişkin 22/08/2022 tarihinde **Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü** Enstitüsü Müdürlüğü tarafından “**Turnitin**” adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orjinallik raporuna göre, projemin benzerlik oranı % **16**’dır.

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça Dahil

Alıntılar Hariç

Açıklamalar:

Mardin Artuklu Üniversitesi “**Turnitin**” adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Habibe Polattağ  
Öğrenci No: 19711016  
Programı : Kürt Dili ve Kültürü  
Statüsü : Yüksek Lisans

Tarih ve İmza: 22/08/2022

Danışmanı  
Doç. Dr. Hayrullah Acar

İmza

Hazırlayan (23/11/2021) Kalite Koordinatörü	Onaylayan (24/11/2021) Rektör Yardımcısı
--	---

Önemli: Kalite Yönetim Sistemi'ne ait güncel dokümanlar <https://www.artuklu.edu.tr/kalite> internet sayfasında bulunmaktadır. Basılan dokümanlar “Kontrolsüz Kopya” hükmündedir



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

# **ERİVAN RADYOSU’NUN KADIN DENGBÊJLERİ**

Habibe POLATTAĞ

19711016

Danışman

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mardin -2022